

**PROF. QANATÊ KURDO**

**TARIXA  
EDEBYETA  
KURDI**

**I**


**STOKHOLM 1983**

**PROF. QANATÊ KURDO**

**TARIXA  
EDEBYETA  
KURDI**

**I**







## SERECEM

Tarîxa Lêgerîna Edebyeta Kurdî.....	13
Rola Kovar û Rojnamên Kurdî li Dîroka Edebyeta Kurdîda.....	23
Melûmetiyên Şerefxan Bîtlîsî û Evliya Çelebî Derheqa Şayîr û Zanyarên Kurdanda...	31
Lêgerîna Tarîxa Edebyeta Kurdî li Îraqêda.....	43
ŞÊRBÊJ Î HELBESTBÊJÊN KURMANC	
Elî Herîrî.....	57
Ehmed Mele Batê.....	65
Feqê Teyran.....	70
Meleyê Cizîrî.....	90
Selîm Sulêman.....	103
Ahmedê Xanî.....	105
Xaris Bîtlîsî.....	122
Pertew Begê Hekarî.....	128
Şêx Xalid.....	137
Siyahpûş.....	139
Cigerxwîn.....	140
Osman Sebrî.....	166
Qadrîcan.....	177



## PÊŞGOTIN

Hukmetên stemkar yên cîranên kurd her çar alîya dora kurdan girtine, Kurdistan kirine girtîxanê, kurd qeyd û cîdar kirine, bi sala û zemanan xwestine û dixwezin kurdan li nav xweda bifetîsînîn, bihelînîn, ruh û canê kurdewerîyê ji dil û hinavê wan derînin, wan bêhiş û bêsewda bikin, wusan bikin, ku ew zmanê dayka xwe şîrin, zmanê xwe zikmakî biterkînin, ji bîr bikin, tarîxa xwe, tarîxa medenyet û şaristaniya xwe nizan bin; Hukmetê stemkar bi vir û fistona kurda dixapînin, navê "Tirkên çiyayî", "Farsên çiyayî" û navê "Erebê paşketî û koçer" li wan kirine, ew bê maf kirîne, mal û canê wan dixun, welatê wan talan û tajan dikin. Lê eva yeka heta hetayê nakişîne. Niha zeman li dinyayê hatiye guhastinê, niha ne mîna berêye, niha zemanekî din hatîye, niha her millet hişyar bûye, gelek millet serbest bûne û bi azad û bi serbixwe dijîn. Milletê kurd jî hişyar bûye, rabûye ser xwe, dixweze ew jî serbest û azad bijî, Kurdan jî xwe nas kiriye, neteweyê kurd, çî kurmanc, çî soran, çî zaza, û çî guran, gişk bi xwe hesiyane, xwe nas kirine û bi zûva ew haj pê bûne, îda dizanin ew kîne, çî ji wanra lazime. Ew haj pê bûne, ku ji wanra lazime yekîtî, azadî û serxwebûn. Ku bigihijne vî merem û mebestî, milletê kurd niha dest bi rewşenbîrkirinê kirîye. Di pirsra rewşenbîrkirinêda, di pirsra xwendewerîyêda pirsra here bi qîmet, hêja û nirx ew pirsra, ku milletê kurd pê hesiyaye, baş dizane, ku ew miletekî serbixweye, ku zmanê kurdî zmanekî xwerûye, ku tarîxa kurda, medenyet û şaristaniya wan xwerûne û serbixwene. Niha her mêrekî kurd, her jineke kurd dixwezin tarîxa milletê xwe, ya edebyeta xwe bi zmanê dayka xwe şîrin bixûnin. Li nav civîn û komên xweda gelek caran xort û keçên

Weşanên Roja Nu

Navnîşan:

Box 4038

141 04 Huddinge/Sweden

WEŞANÊN ROJA NU

1. Ronak, Dîwana 4'a, Cigerxwîn, Stockholm 1980
2. Zend-Avista, Dîwana 5'a, Cigerxwîn, Stockholm 1981
3. Kilam û Miqamêd Cimeta Kurda, Cemîla Celîl,  
Stockholm 1982
4. Şefaq, Dîwana 6'a, Cigerxwîn, Stockholm 1982
5. Zozan, Casimê Celîl, Stockholm 1982
6. Hêvî, Dîwana 7'a Cigerxwîn, Stockholm 1983

ISBN 91 7672 007 1

Bokförlaget Roja Nu

Copyright Qanatê Kurdo

Printed in Sweden

Robert Olsson Tryckeri AB

Stockholm 1983



kurd pirs dikin: Ji kurdan kê, kengê û çî di tarîxêda kirîye: Kê bûye xemxur, şerker û têkuşerê milletê kurd? Bersiva van pirsan li tarîxa edebyetêda tê gotinê. Di tarîxa edebyeta kurdîda tê ber çavan, ku li nav sing û berê çiyayên Kurdistanêda gelek mêrên çê, gelek camêr, zanyar, hozan û şêrbêj û helbestbêj derketine, ku di tarîxêda ji nav neteweyê kurd mêrên delîr, qehreman hebûne, tiştên wusa rind û hêja efirandine, ku merivên niha jê ecêb mayî dibe. Ku xwendkar û xwendevanên me delal haj wan hebin, divêt zanyar û ulmdarên kurdan di vê pirsêda arîkarî wan bikin, di vê pirsêda berpirsyarin edebyenasên kurd, divêt ew vî îş û karî bidne ser milê xwe û tarîxa peydabûn û pêşveçûna edebyeta milletê kurd binivîsin, ku xort û keçên me bi başkirin û çaktirîn bixûnin, pê bihêsin û bizanbin li tarîxêda ji neteweyê kurd kê, li kîderê, kengê û çî kiriye, çî nivîsiye û gotiye bo xatirê azadî û serbestîya kurd û Kurdistanê bo xatirê yekitî û hevkarîya qebil û eşîrên kurdan, bo xatirê serbestî û serferazîya wan, bo xatirê hevdestî, hevkarî û aşîtiyê li nav neteweyên Rohilata Pêşin û Navînda. Gelek pirsên tarîxa milletê kurd her di tarîxa edebyeta kurdîda aşkera û e'yan dibin, sebab vê yekê min biryar kir wê ke zanîna xwe, weke fehmê xwe tarîxa edebyeta kurdî binivîsim. Çaxê min kitêb û pertok û nivîstok derheqa vê pirsêda xwendin, ez pê hesiyam, ku niha du form, du liqê edebyeta kurdî hene: edebyeta bi zaravê kurmancî, edebyeta bi zaravê soranî. Min wusa jî fehm kir, ku pîranî kitêb, pertok li ser tarîxa edebyeta kurdî bi zaravê soranî hatine nivîsandinê, ku heta niha bi kurmancî qet xebatek derheqa tarîxa edebyeta kurdîda çap ne bûye, ku kitêbên çapkirî derheq wêda, gişk bi herfên erebî, soranî çapkirîne. Ew kitêb evin: Aladin Secadin, Mêjûy edebî kurdî; Refîq Hîlmî, Edebî kurd; Kerem Sareza, Koyî û şarekanî û çend kitêb û pertokên din. (Binêre, rûpêlê "Lêgerîna edebyeta kurdî li Îraqêda"). Di van kitêb, pertok û nivîstokanda her bi tenê derheqa şêrbêj û helbestbêjên soranda hatîye gilîkirinê. Her di kitêba Aladin Sicadînda çend gilîyên kurt li ser Meleyê Cizîrî û Ahmede Xanî hatine nivîsandinê û çend perçên şêrên wan di kitêba wîda hene. Di kitêba Maruf Xeznedarda jî ya bi rûsî hatîye çapkirinê, her hine xeber li ser nivîsarê Cegerxûn û Qadrîcan hatine nivîsandinê. Herçend xort û keçên me derva zmanê rûsî nizanin, ew nikarin wê kitêbê jî bixûnin û faydeyê jê wergirin.

Di xwendina kitêb, pertokên derheqa edebyeta kurdîda, yên bi zaravê soranî hatine çapkirînê, meriv wusa tê fehmkirinê, ku her bi tenê edebyeta kurdî bi zaravê soranî dewlemende. Bi rastî gotî, eger em baş lê bigerin, emê pê bihesin, ku edebyeta kurdi bi zaravê kurmercî jî dewlemende, ku ew lîteratûra kurdî ya klasîkî bi zaravê kurmercî û guranî gelek dewlemend bûn, ku edebyeta niha bi kurmercî bere-bere bi gavên fire pêşda diçe, bere-bere ciyê xwe layq digire, mîna soranî pêşva diçe.

Sala 1980 li Bexdadê kitêbeke mezin zanyarê kurd Sadiq Behadin Amedî çap bûye. Navê wê kitêbê "Hozanê Kurdî" ye. Eva kitêbeke başe û gelek bi nirxe, bi zaravê Behdînanî, herfên erebî li ser şanzde şayirên kurd hatîye nivîsandinê. Têda jî nengariya wan û nimûnên şêrên wan çap bûne. Xên jî şayirên bi navdar û e'yan (Elî Herîrî, Feqê Teyran, Meleyê Cizirî, Ahmedê Xanî, Pertewê Hekarî) Sadiq Behadin Amedî nav û nişanên jinengarî û nimûnên şêrên di kitêba xweda navê donzde şayirên nehîya Behdînanê nivîsîne. Navê wan evin: Mele Mensûr (1417-1490), Xalîd axa Zehar (905-974), Mela Husêyn Batêy (ji Hekariyê, 1417-1475), Bekir-beg Erzî (1867 hatîye dinyayê), Şêx Nuredîn Brîvkanî (1791 hatîye dinyayê), Şêx Tahayê Mayî (1844 hatîye dinyayê), Huseyn Bamernî (1868 hatîye dinyayê), Şêx Xeyatêdîn Neqşbendî (1890-1944) Mela Enver Mayî (1913 hatîye dinyayê), Taha Goş (1918 hatîye dinyayê), Ahmed Enver Neqşbendî (1891 hatîye dinyayê), Taha Ruşdî (1912 hatîye dinyayê). Jinengarî û parçên nimûnên şêrê wan di kitêba Sadiq Behadinda hatine çapkirinê, sebebê vê xort û keçên me niha, yên vî zemanî nikarin kitêba wî bixûnin û faydeyê jê hildin. Min li pêşîyê xwest matêriyalê kitêba wî jî bikme kurmercîya jorîn û bi herfên latînî binivîsim û çap kim. Lê paşê min dîna xwe dayê, ku xebata min bi tomerî wê gelek wext bikişîne. Min dest jê kişand, eva xebata nekir. Min wusan jî destê xwe ji nivîsandina xebata "Tarîxa Edebyeta Kurdî" bi tomerî kişand. Li şûna wê min biryar kir her bi tenê derheqa şêrbêj û helbestbêjên here mezin û bi navdar binivîsim, derheqa wan şêrbêjanda binivîsim, yên li gulistana şayirên kurdanda têne hesabkirinê mîna gula geş. Min ew gul jî se dan gulên gulistana şêrbêjan hilçandin û derheqa wan û efirandina wanda di vê xebata xweda nivîsandin. Ji ber vê min navê xebata xwe kiriye "Gulçîna gulistana şêrbêj û

helbestbêjên kurdan". Eva nava nîşan dike, ku ji gulistana şayîrên kurdan gul hatine çinîne, gulê here geş, ku her şayîrek guleke geşe bi navdare, gişk bi tevayî baxê gulis tanêne. Bi rastî gotî min hemû gul ji wî baxî çinîne; Dî wî baxîda sedan sed gulên bînxweş, gulgeş hene, min nikar bû derheqa wan gişkanda binivîsiya, nav û nîşanê wan û nimûnên efirandinê wan binivîsiya û banîya ber çavên xwen dekar û xwendevanên delal. Ez lava ji wan dikim vê kêmasî ya min bibaxşîne min. Ez hîvîdarim, ku li paşî vê xebata min zanyar û hozanên kurda wê rabin û bi şarezetiya xwe gulistana hemû şayîr û helbestvanên kurd binivîsin û xezna şayîrên me nîşan bikin.

Eva xebata min parçeke ji wê, dibe bibe hêlan û heyecan bona nivîsandina tarîxa edebyeta kurdî bi tomerî.

Eva xebata min pareve dibe ser sê paran (parçan): "Tarîxa edebyeta kurdî bi kurteberi". Eva parça pareve dibe ser : 1) Tarîxa lêgerîna edebyeta kurdî li nav kurdanda û li Rûsistanêda, 2) Rola (lîska) kovar û rojnameyên di tarîxa lêgerîna edebyeta kurdîda, 3) Melûmetiyên Şeref-xan Bitlîsî û Evlîya Çelebî derheqa zanyar, hozan û şayîrên kurdan da, 4) Lêgerîna edebyeta kurdî li Iraqêda.

Li dû vê xebat pareve dibe ser du parçên mezin : Şayîr û helbestvanên kurmancî, Şayîr û helbestvanên soranî. Di para yekêda her bi tenê gilî li ser jîngariya şayîr û helbestvanên kurmancî têne gotinê, yê li berê şêr û helbestên xwe bi herfên erebî nivîsîne. Min şêr û helbestên wan wergerandine ser herfên latîniya kurdî.

Di para duduwanda gilî li ser wan şayîr û helbestvanên soranî têne gotinê, yê efirandinê xwe bi herfên erebî û zaravê soranî nivîsîne. Min şêr û helbestên wan guhêrandine ser kurmancî û bi herfên latîni nivîsîne. Li vira divêt ez bêjim, ku ez xwe hesab nakim şayîr û helbestvan; Min şêr û helbestên şayîr û helbestvanên soranî weke (qasî) fehmê xwe, qasî zanîna xwe bi kurmancî li hev anîne, wusan guhêrîne, ku fikira wan, mezmûn û naveroka wan mîna berê bimîne, neyê guhastinê, ew çawan hatine nivîsandinê, wusan bi herfên latîni bi kurmancî hatine nivîsandinê, ku xwendkar û xwendevanên me delal karibin wan bixûnin û haj efirandinên şayîr û helbestvanê soranê birê xwe bin, haj

dewlemendiya edebyeta neteweyê xwe bin. Ev bû merem û mebesta min, çaxê min dest bi nivîsandina wê xebatê kir, min dît; sazmaniya kevnejîyîna kurda civakî, nexwedewerî û paşvamayîna kurdan, dûberekîya qebîl û eşîrên wan. Deşt û dol, çiya û banî û daristanên wane bi tirs û xof û xeter, reng û rûyê halê wanî hêsîrî û bindestî, rojên wane reşe tarî, şevên wane bê amin, mûftexûrî û zordariya derebegên kurdan (axa, bega, şêx û pîran), stemkarîya bûrjûwazîya hukmatên zevtkar, û rê û dirbên azadkirina pale, gûndî, rênçber û karkerên kurd ji bin nîrê kolonîyê eva gişk di şêr û helbestên şayirên meda bi xeber xweşi û xweşbêji hatine nitirandnê û xemilandnê. Ev hemû di efirandinên wanda têne ber çavan û hergav nîşanî me dikin çî li nav sedsalîya 18-19'da û li nav sedsalîya bîstanda hatîye serê kurdan. Her şêreke şayirê kurd, her helbesteke wan, yên vê gûlçînê, şîretê, temiyê û wesîyeta li xort û keçên kurd dikin, ew gazî wan dikin bi xîret bin, nîrê azadkirîna kurdan û barê serxwebûna wan bidne ser milê xwe.

Eva mezmûn û naveroka efirandnên piranî şayirên vê gûlçîna min.

Li nav vê gulçîna Gulistana şêrbêj û helbestbêjen kurdda hine şêrbêj û helbestbêj hene, yên ku efirandinê xwe li ser evîna xwe, dildara xwe û dilketîya xwe nivîsîne. Mesele, Elî Herîrî, Pertew-beg Hekarî, Nalî, Edeb Misbah, We-fayî û çend kesên din di şêr helbestên xweda ji birîna evînê, dildarê, dilketîyê yan dikin ah û zar, yan ji xeman dikişînin, dibêjin ew dûrin ji evîna xwe, destê wan nagihîje wê, dildar û dilketîya wan haj derdê dilê wan nîne ew bêûmûd hiştine, gûh nadine ah û zarê wan. Her li efirandinên Meleyê Cizîrîda, Xerîqda şêrên têkel (tev hev) yên dildarîyê û sofîtîyê hene. Lê dîsan eger em bi kûr û dûr dîna xwe bidne ser efirandinên wan, emê di wanda rêzên sosîalî bibînin, rastî rêzên ayîn û jîyîna kurdan ya civakî bîn.

Barê xeberan (xeberberîya) şêr û helbestên hemû şêrbêj û helbestbêjên vê gulçînê ne mîna hevîn. Piranî şêr û helbestên wan rehet û hêsa têne fehm kirinê. Her bi tenê şêrên çend kesan giran têne fehm kirinê. Ew jî ew şêrên, yên ku têda gelek xeberên erebî hatine xebitandinê, yan jî di bin bandûra zmanê beyanî hatine nivîsandinê. Di vî werêda

em dikarin bêjin hine şêr û helbestên Meleyê Cizîrî, Edeb Misbah, Nalî, Wefayî û çend kesên din bi vî cûreyîne.

Di kitabûna pêşgotina xweda ez dixwezim bêjim, ku di gulçîna gulistana şêrbêj û helbestbêjên kurda min her melûmetîyên kurt derheqa sî û çar şêrbêj û helbestbêjanda nivîsîne, navê gelek li vira ne hatîye nivîsandine. Şêrbêj û helbestbêjên me yên kilasîkî û zamanê niha gelek gelekin. Navê gelek şêrbêj û helbestbêjên kilasîkî (yên gurani û karmancî) aşkera ne bûye, em nizanin, lê navê çend şêrbêj û helbestbêjên niha em dizanin, me bihîstîye, mesele, Hêmin, Kamûran, Fayq Bêkes, Ebdûla Peşew û Sebrî Botanî gelekên din. Eger em navê wan tev navê din jî bi yeko yeko binivîsin, wê dirêj be û gelekî bikişîne, bi tomerî nivîsandina navê hemû şêrbêj û helbestbêjên kurd eger bi yeko-yeko bê nivîsandin, wê bibe kitebekê. Bira eva jî bi be îş û karê merivêkî din, merivê bi xîret, xîret bixebite, hemû melûmetîyan derheqa wanda kom bike, nav û nîşanên wan binivîse û bike kitêb, dilê xort û keçên kurd şad bike. Ez bawar dikim, ku ew rojê bê û wê wusa jî be.

Meha Avgûstê sala 1975 min dest bi nivîsandina vê xebatê kir, nav-navara, bere-bere û hêdî min ew dinivîsî. Sala 1981 meha Îlûnê min ew temam kir.

Ez bi dil û can vê xebatê pêşkêşî rêdaksîona "Roja Nû" dikim, ku ew wê çap bikin bona xwendkarên kurd, bona karker gundî û rencberên kurd.

QANATÊ KURDO

25/VI/1982 .- LENINGRAD

## TARIXA LÊGERÎNA EDEBYETA KURDÎ LI NAV KURDANDA Û RÛSISTANÊDA

Berê pêşin sertacê lîtêratûra kurdî, binyat û binaxedarê bîr û bawara kurdewerî, kurdperwerî û wetenperwerîya ser-xwebûna kurd û Kurdistanê, şayîrê kurd ê mezin û bi nav û deng Ahmedê Xanî di "Mem û Zîn"a xweda nivîsîye, ku berî wî şayîr û nivîskarên kurdan hebûne, lê navê wan hatiye ji bîr kirinê, çimkî kesek tune bûye navê wan ji bîr bîne û binivîse, ku kurd jî xudanê şayir û nivîskaran bûne, ku şayîrên wan jî hebûne. Derheqa vê yekêda Ahmedê Xanî ev rêzên jêrîn di "Mem û Zîn"a xweda nivîsîne :

*"Ger dê hebûwa me ji xudanek,  
Alî keremek, letîf danek,  
U'lm û huner û kemal û ezan,  
Şêr û xezal û kitab û dîwan,  
Ev cins biba li ba wî me'mûl,  
Min dê elma kilamê mewzun  
A'lı bikira li banê gerdun,  
Binave ruhê Melê Cizîrî,  
Pê hê bikira Elî Herîrî,  
Keyfek wê bida Feqê Teyran,  
Heta ba ebed bima heyran"*

Li paşê aşkera bû, ku bi rastî ev hersê şayîr (Mele Cizîrî, Elî Herîrî û Feqê Teyran) li berî Ahmedê Xanî hebûne, şêr û dîwan bi kurmancî nivîsîne. Lê sed car heyf, ku di wê demêda kes tune bûye, ku serhatîya wan û nivîsarên wan li nav xelqêda belav bikin. Lê divêt bêjin, ku li nav goveka xwendkar û xwendevanê silsilata derebegên kurdanda navê gelek şayîr û nivîskaran aşkera bû, ku di nav wanda bi nivîsar yan jî bi zargotin gilî dikirin, ku şêrbêj û helbestbêjên kurd hebûne. Sêya serê vê yekê em pê hesiyane, haj pê hebûne, ku navê hinek şayir û nivîskar, hozan û zaryarên kurdan hebûne, ku destnivîsarên hineka mane, goveka axa, bega û mîrên kurdan li cem xwe hiştine, xwe bi destnivîsar li cem xwe nivîsîne, xwedî kirine, hiştine yan jî dane heval û hevkarên xwe. Sêya serê vî edetî li nivê sedsalîya nozdanda gelek xwendevanên kurd û gelek zanyar

pê hesîyan û navê heyşt şayîr û nivîskarên kurd li kitêbanda xwendin. Derheqa wanda berê pêşin malumatîyên ne aşkera bi arîkarîya kurdên xwendewar û rewşenbîr hatine nivîsandinê û çapkirinê.

Li nivê sedsalîya nozdanda Akadêmîya Rûsistanê sparte baylozê xwe Alêksandir Jaba, yê ku li Erzurumê bû, mijûlî komkirina madeyên folklorî, tarîxî, êtnografî û lîtêratûra kurdî bibe, destpêbike nivîsarên kurdî bigere, dest xe û bişîne Akadêmîya Rûsistanê.

Alêksandir Jaba zanînga Pêtêrbûrgê xilas kiribû, bûbû rohilatnas, ewî rind zimanê tirkî, farsî, inglîsî, fransî zanibû. Li Erzurumêda ew dibe nasê hine kurdên xwendewar û zana. Bi arîkarîya wan ew gelek destnivîsarên kurdî kom dike û dişîne Akadêmîya Rûsistanê li Pêtêrbûrgê. Li nav wan destnivîsaranda destnivîsarên rêzmana kurdî, yên folklorî, tarîxî, êtnografî û lîtêratûrî hebûn. Xên ji wê ewî kitêbek bi navê serhatî û çîrokên kurd bi tercma xwe bi zmanê fransîzî nivîsî bû û şandibû Pêtêrbûrgê. Di sala 1960-da ew kitêb bi navê "Recueil de Notices et recits kurdes" li Pêtêrbûrgê çap bûye. Têda têkstên serhatî, çîrok û melûmetîyên li ser heyşt şayîr û nivîskarên kurd bi kur mancî herfên erebî û tercma bi zmanê fransî hatine çapkirinê. Lêgerîna zmanê wan têkstan û melûmetîyan nîşan dîkin, ku ew bi destê xwendewar û zanyarên kurd bona Alêksandir Jaba hatine nivîsandinê. Navê wan merivan eve: Ta-ha Hacî Ebdal Ezîz, Mehemed Xerîb Sulêman, Şah Neze, Mela Mehemed, Hesên Hekîm Başî, Mela Mehmed Beyazêdî, Mehemed Moksî û yên din.

Di kitêba Alêksandir Jabada, ya ku li jorê min navê wê nivîsî, li rûya 13-19-da ev melûmetîyên jêrin li ser şayîr û nivîskar û zanyarên kurd nivîsîne:

**ŞAYIRÊ BERÊ** Elî Herîrîye, dîwançeyek heye, "Şêr û qesayêd Herîrî" dibêjin. Ji gundê Herîrê, ji cih nehîya Şemzdînan di sinça Hekarîyanda ji daykê bûye. Şêr û ebayetê di wî jî di nêv Kurdistanê qewî zêde meşhure û merufe. Texmînan ku di tarîxa çar sedê hîcre peyda bûye û di çar sed û heftê û yekêda mehrûm bûye û di nêv Herîrêda medfûne".

**ŞAYIRÊ DIWÊ** Melayê Cizîrîye, eslê wî ji Cizîra Bohtane, navê wî şêx Ahmede, di tarîxa pênsed û çilîda di nav Cizî

rêda peyda bûye, di wî wextîda mîr Omad Êdîn di Cizîrê mîr bû û xweheke mîr hebû; Ev şêx Ahmed jî li xweha mîr a şîq bûye, xezalyatne gotiye û dîwançeyek tertîb kiriye, dîwana Meleyê Cizîrî dibêjin; Qewî dîwanekî mestihe û li nik ekradan meqbule. Paşê mîr Omad Êdîn ew şêx Ahmed cêrbandîye, ku aşîqê heqîqîye û xweha xwe dayê. Şêx Ahmed qebûl ne kirîye. Ew şêx Ahmed jî di tarîxa pênsed û pêncî şeşê mehrûm bûye û di nêv Cizîrê medfune û zîyaretgaha xelqêye".

**ŞAYIRÊ SISÊ** jî Feqê Teyrane, ku navê wî Mehemedê, eslê wî ji qeseba (bajêroka) Moksêye, ta'ba welatê Hekariyane, di tarîxa heft sed û dudya peyda bûye, hekyata "Şêx Sena'nî" gotiye û qisa "Ber Sîsayî" ji mewzun gotiye û "Qewlê Hes-pê reş" jî wusanê mewzun gotiye û zehf beyt û eşa'r ji qewî me'lum û rengîn gotiye û navê wî jî di şêrêda mîm û heye û muqdarî (nêzîke) heftê pênc salan emir kirîye û di tarîxa heft sed û heftêda merhûm bûye û li Miksê jî medfûne.

**ŞAYIRÊ ÇARÊ** jî Melayê Batêye, navê wî jî Mela Ahmede, eslê wî ji Batêye. Batê navê gundeke ji gundê di Hekariyan, di tarîxa heşt sed û bîstî peyda bûye, zahf şêr edebeyet gotiye, dîwanekî mehsûs heye, qewî qenc û mewlûdekî kûrmancî gotiye, di Kurdistanê ew meqbûle û heştê sal emir kirîye û new sedê hicrê merhûm bûye, di nav gundê Bateyî jî medfûne.

**ŞAYIRÊ PÊNCI** jî Ahmede Xanîye, eslê wî ji tayfaye Hekarîyane, ji eşîreta xanîyane. Bi xwe hatîye Bazîdê, di tarîxa hezarîda tewten kirîye, di zimanê kurmancîda "Mem û Zîn" navê kitebek aşoq û maşoqan gotiye û kitebet lûxet jî bi kurmancî û erebî gotiye, navê Nûbare û zarokê di Kurdistanê di piştî quranê dixûnin û zehf jî xezelyan û eşaran û bayt bi zimanê kurmancî gotiye û di zimanê erebî û farsî û tirkî jî dîsan xezalyat û eşaran û edebiyat zehf gotine, di ulmê fenûnan jî qewî maher û sahib erfane û şayrê di Kurdistanê hemûyan jî meşhûr û fayqe, belke ji hemû şeran meqbûle û di tarîxa di hezar şêst û sêda jî merhûm bûye, di nêv Bazîdêda mizgeftek jî bi navê xwe bi na kirîye û bi xwe jî li kenarê mizgeftê medfûne..

**ŞAYIRÊ ŞEŞÊ** jî şayîrêd Kurdistanê xamile, nave wî jî Îsma yile, eslê wî ji Bazîdêye, ji şagirdê di Ahmed Xanîye, di



hezar şêst û pencê hîcrê peyda bûye, di hezar sed û bîst û yekêda merhûm bûye û kitebekî lûxetan jî "Gulzar" nav talîf kirîye, bi kurancî û erebî û farsî zaru dixûnin û xeyr wê jî zehf xezalyan û eşaran û ebeyat bi zimanê kurancî gotiye, di cîhda meşhûr û merûfe û di nêv Bazîdêda merhûm û medfûne.

**ŞAYIRÊ HEFTÊ** Şeref-xane, ji mîrêd Hekariyane û ji nislê Ebasî, di hezar û sed û yekêda jî li Culamerkê ku cihê hukmeta Hekariyane, peyda bûye, eşar û beyat bi kurancî û farsî gotiye, di hezar sed û şêst û yekêda merhûm bûye, di nêv Culamerkêda medfune.

**ŞAYIRÊ HEYŞTÊ** Murad-xane, ku di Bazîdêda di tarîxa hezar û sed pencîda li Bazîdê peyda bûye; Ew jî muqadarekê xezalyat û eşaran bi zimanê kurancî gotiye û di hezar û sed û newêd û nehêda merhûm bûye û di Bazîdêda medfûne û paşî wî ji kurmancan êdî şayir peyda ne bûye hetî niha.

## ELÎ TEREMOXÎ

Li paşî melumetîyên li ser şayirên kurd di kitêba Alêksan dir Jabada hinek melumetî derheqa ulmdar û zanyarên kurd da hatine nivîsandinê û derheqa Elî Teremoxî ewî nivîsîye: "Elî Teremox ji gundê Teremoxîye, merivekî gelek zana bûye, gelek ulm zanîbûye, zimanê erebî, farsî, tirkî û kurdî rind zanîbûye, gelek gerîyaye, çûye Bexdayê, Musulê Behdînanê û Soran, bi zimanê kurancî "Qewlê yekane", "Kurêd weten", "Morîya yaqut", "Jiyîna heqîqet xewne" û serf û neha kurancî nivîsîne".

Heta niha destnivîsarên wan nivîsarên Elî Teremoxî neketî ne ber destê zanyaran, ku mijûlî lêgerîna wan bibin, lê divêt bêjim, ku her bi tenê destnivîsarên Elî Teremoxî yên "rêzmana kurdî û erebî" e'yanin. Ew niha li kitêbxana bî navê Saltîkov-Şêdrîndanin li Lënîngradêda. Derheqa wan Marûf Xeznedar di pêggotina xweda ya "Destûrî zimanê erebî bi kurdî" da gilî dike û dinivîse, ku "Elî Teremoxî li sedey şanzde-hefdeh demî zayîn jîye û sereta destûre "Serfe zimanê erebî bi zimanê kurdî bona qutaban" nivîsîye" (ruê 22).

## İSMAYL BAYZÊDÎ (XVII-XVIII)

Bi melûmetîyêd A.Jaba Îsmayl Bayezêdî şagirtê Ahmed Xanî bûye, li sala hezar şêst û pêncî hîcrê (1654-55) li Beyzê dê ji daykê bûye, li sala hezar sed bîst û yekêda hîcrê (1709-10) çûye rehmetê. Kitêbek bi navê "Gulzar" ya ferhengê kurmançî, erebî û farsî bona zaruwan çêkiriye, zaru wê dixûnin. Xên ji wê ewî gelek xezal, şêr û beyt nivîsîne bi kurmançî, li welatê xweda gelek meşhur û marifet bûye. Li Bazîdêda mirîye û wêderda jî çal kirine. Heta van salêd paşin qet li cîkî destnivîsarêd wî dest nexistine û çap nekirine. Dibe wextekî edebyetnasêd me kurd li Kurdistanê bigerin, destnivîsarêd şêr, beyt û xezalên wî dest xî, çap kin.

## ŞEREF-XAN (XVII-XVIII)

A.Jaba e'lam dike, ku Şeref-xan jî mîrêd Hekarîyan bûye, ji nesla Ebasîyan, di sala hezar sed û yekêda (1689-90), li Culamêrkêda, ku cîyê Hekaryane, ji daykê bûye, şêr û beyt bi zimanê kurmançî û farsî gotine, di sala hezar sed û şêst û yekêda (1748) mirîye û li Culamerkêda çal kirine. Sed car heyf û mixabin, ku heta niha qet şêrek û beykete vî şayrî (helbestvanî) ne hatine çapkirinê, dibe wexteke edebyetnasêd kurd wan li cîkî dest xî û çap bikin, çavê xwendevanêd me delal lê keve, ew bi serbest bixûnin.

## MÛRAD-XAN BEYAZÊDÎ (XVIII)

A.Jaba di kitêba xweda dinivîse, ku Mûrad-xan di sala hezar sed û pencîda ji daykê bûye û di sala hezar newêd nehêda mirîye û li Bazîdê çal kirine. Ewî jî gelek xezal, şêr bi zimanê kurmançî gotine. M.B.Rûdênko li kitêba xweda ya "Nivîsandina ser û berê destnivîsarêd kurdî"-da nivîsîye, ku li kitêbxana Lênîngradêda ya bi navê Saltîkov-Şêdrînda destnivîsarêd çend xezalêd Mûrad-xan hene.

J.S.Mûsaêlyan li avtorêfêrata xweda ya bi navê "Kurdskaya Narodnaya poêma "Zembilfiroş" i yêyo lîtêratûrna vêrsîya" dinivîse, ku bi melumetîyêd edebyetnasêd kurd beyta "Zembilfiroş" Mûrad-xan nivîsîye.

Ev melumetîyên li kitêba Alêksandir Jabada nivîsandî bi herfên erebî çapkirîne, tercima wan bi zimanê firansizî têda çap kirîne û ew kitêb di nivê sedsalîya XIX-da li Pê têrbûrge hatîye çapkirinê, lê bi rastî berî şûrsa Aktyabî rê kesek haj wan melumetîyan tune bûye. Eger kesekî ew melumetî bixwenda, zanibûya, wê ji zûva derheqa wanda di kitêbekêda, pertokekêda ew melûmet bi zimanê rûsî, kurdî binivîsîyana, bigotana, ku litêratûra kurdî ya bi nivisan dî heye. Lê kesekî guh ne da bû ser wê, nenivisî bû, ku ew melumetî bi hewasdarin. Eva yeka hate nivisandin her di welatê Sovetêda li paşî hazirkirina kadrê kurdnas. Her li paşî hazirkirina kurdnasan li Sovêtistanêda çar û mikan peyda bûn bibne nasê wan melumetîyê Alêksandir Jaba û li ser lêgerîna tarîxa peydabûna litêratûra kurdî bixebitin û isbat bikin, ku litêratûra miletê kurd hebûye, heye û gelek dewlemende. Lê divêt bêjin, ku berî me li derva rew şenbîkerên kurda bi xwe xereqî lêgerîna tarîxa peyda bûn û pêşketina litêratûra miletê xwe bûne.

Mesele, berê pêşin li nav salên 1932-1945-da çapkerê kovara "Hewarê" Celadet Elî Bedirxan melumetîyên baş li ser nivîskar şayîr û hozanên kurdan di kovara xweda çap dikirin. Li hejmara 33-da ewî nivisareke mexsûs derheqa klasîkên kurdanda çap kiriye. Navê wê nivisarê "Klasikên meye" têda melumetîyên Alêksandir Jaba bi zimanê kurmancî çap kirine û serda zêde navê hine şayîr û hozanê kurd hatîye nivisandinê.

Li paşî vê li Sovêtistanêda, xasma li Lênîngradêda, li nav salên 1958-1967-da bi xwestin û arikarîya min şagirta mine rehmetî Margarîta Barisova Rudenko mijûlî hazirkirin û çapkirina destnivîsarên kurdî dibû. Li nav wan salanda ewê çar-pênc xebatên hêja û bi hewasdar li ser edebyeta kurdan çapkirine. Navê wan xebata eve: "Mem û Zîna Ahmedê Xanî" (Moskva-1962), "Şêx sena'n a Feqê Teyran" (Moskva, 1965), "Nivisara Mele Mehmûdê Beyzêdî, Jîyîn û ayîna kurdan" (1963), "Leyl û Mecnûna Xarîs Bitlîsî" (1963), "Nivisandin li nav û nîşanên destnivîsarên kurdî" (Moskva, 1961) û yên din. Li nav wan salanda Maruf Xeznedar ji Iraqê hatibû Lênîngradê, li ber destê min li ser tarîxa lêgerîna litêratûra kurdî bixebitê.

Saya serê xebatên Aleksandir Jaba, M.B.Rudenko her niha

li welatê Sovetîstanêda û li serva pê hesîyane ku miletê kurd jî xudanê bîrewera bi hêja û efirandinên bi qîmet û giranbihaye, ku wî jî gelek tiştên hêja xuliqandine. Bi rastî gotî berî aşkerabûna desnivîsarên kurdî yên Aleksan dir kom kiribûn, û berî nivîsandina M.B.Rûdenko derheqa wanda li Rûsistanê hela hê nivê sedsalîya nozdanda ulmdarekî rûsan bi navê Dittel di xebata xweda "Rêbarî li Rohi latêda (-ya ku li "Jûrnala mînîstêrstva prosvêşênîyada (SPB.-1848, i otdêl VI, belge 1-30) çap bubû nivîsîye."Zî manê eşîrên kurdan kê m hatine lêgerînê, litêratûra wanê zar gotin gelek dewlemende, xên ji wê litêratûrê, litêratûra wane nivîsandî jî gelege, rohilatzan dikaribûn mijûlî wê litêratûrê bibin, litêratûra wan dewlemende, nivê wê ya wan bi eslî serbixweye, nivê din ji zimanê farsî tercimekirîye, navên gelek merivên kurd yên şêrnivîs û tarîx nivîs yên bi nav û deng eşkerane". Sed car mixabin û heyf ku Dittel navê wan di nivîsara xweda nenivîsîye, ewî navê wan di destnivîsara xweda hiştîye û desnivîsara wî li ser kurdan, qebîlên wan û kûltûra kurdan niha li arxîva Akadêmîya zanîntîyêdaye.

Li welatên Evropayêda kesek haj van gotinên Dittêl û melû metîyên di kitêba Alêksandirda nivîsandî nî bû û sebeb wê yekê E.M.Katremer (binêre: E.M.Quatremere: Notice extraite des manuscrits de la Bibliothèques du roi et autres Bibliothèques, Paris, 1836) û G.R.Drever (binêre: 1-The Disruption of the kurds in ancient times, JRAS, 1921, IV, 2- The name "Kurde" and its philological connection, JRAS, 1923, III, 3- Studies in kurdes History, BSOS, 1922, T.II) di xebatê xweda nivîsîne, ku litêratûra kurdî tune. Û eva gotina li xebatên êtnograf, rêbar û zanyarên Evropayêda dû hev dihate gotinê û nivîsandinê. Her di kutabûna sedsalîya nozda û destpêka sedsalîya bîstanda dinya pê hesîya, ku litêratûra kurdan ya nivîsandî hebûye, heye û gelek dewlemende. Eva yeka hate gotin û nivîsandinê saya serê wê yekê, ku kurd bi xwe di wî wextîda mijûlî tarîxa peydabûn û pêşveçûna litêratûra miletê xweva bûn. Ew melûmetî nîşan dîkin, ku eger li nav kurdanda, xasma li nav goveka xwendkar û xwendewarên wanda nav û dengê gelek sayir, nivîskar û zanyarên kurd aşkera ne bûya. Eger wana derheqa wanda ne zaninbûya, bi zar li nav wanda negotina, gilî nekirina, yanê jî bi nivîsar nav û nîşanên wan li

cem xwe nenivîsandîna, nehiştîna, kesekî nîkar bûya ew melûmetî ji Alêksandir Jabara bigota, yan jî binivîsîya. Ew melûmetî nîşan dîkin, ku li nav xelqê kurda berê edet bû serhatîyên şayîr û nivîskarên xwe zanîbin, û gilî bikin, li nav hevdda belav bikin. Saya serê vî edetî kurdên Erzurumê, yê arîkarî Aleksandir Jaba kiri bûn, haj dîroka lîtêratûra kurdî hebûn û zanîbûn û karîbûn derheqa wêda gilî bikin yan jî binivîsin. Eger ew haj pê ne bûna, nav û nîşanên Elî Herîrî, Feqê Teyran, Meleyê Cizîrî û yê din ji Aleksandir Jabara gilî nekirîna, nenivîsandîna ewê ji kiderê karî bûya ew melûmetî derheqa edebyeta kurdîda di kitêba xweda çap bikira, xerêqî lêgerîna tarîxa edebyeta kurdî bibûya.

Li sala 1967-da Marûf Xeznedar kitêba xwe "Oçerkî îstorî sovremennoy kûrdskey lîtêratûrî" (yanê qurt nivîsandîna tarîxa edebyeta kurdî ya niha) çap bû. Li paşî çapkirîna kitebên M.B.Rûdenko û Kitêba Marûf Xeznedar li Sovetîstanêda pê hesîyan, ku edebyeta kurdan hebûye, heye û gelek dewlemende, ku mîletê kurd jî mîna mîletên din xudanê bîrewara hêja pêşkevî û efirandinên bi qîmet û giranbihaye ku kurdan jî tiştên bi nîrx xuliqandine.

Derheqa lêgerîna edebyeta kurdîda di wextê xweda li Iraqêda li paşî şûrşa Aktyabirê kitêb, pertokên bi qîmet hatîne çapkirîne (binêre "Lêgerîna lîtêratûra kurdî li Iraqêda" di vê nivîsara mînda). Lê herçend xebatên wan bi zîmanê kurdî hatîbûn çapkirîne, kesekî kurdnasên Evropayê heta van salên paşin haj pê nîn bûn. Wusan jî kesek ji kurdnasên Sovetê û Evropayê haj nivîsarên Aleksandir Jaba û Dittel nîn bûn. Sebeb vê yekê Katrêmêr E.M, Dravêr G.R. di nivîsarên xweda nivîsî bûn, ku "Lîtêratûra kurdî tune" Eva gotina li paşê di xebatên êtnograf, rêbar û zanyarên Evropayêda li dû hev dihate gotîne û nivîsandîne. Her li kutabûna sedsalîya nozdan, xasma li despêka sedsalîya bîst tînda bi saya serê xebatên zanyarên kurd li Iraqêda û saya serê kitêb û pertokên M.B.Rûdenko û kitêba Marûf Xeznedar dînya pê hesîya, ku lîtêratûra kurdî ya serbixwe heye û gelek dewlemende, ku navê gelek şayîr û helbestvanên kurd di tarîxêda e'yanin, ku di wê edebetêda tiştên hêja bi nîrx û giranbiha hene û layqê mijûlî lêgerîna wê bin.

Li vira jî lazime çend gilîyan derheqa hevbendîya edebet û zargotina kurdî bêjim.

Eşkeraye, ku edebet û zargotina her milletî bi hevra girêdaye, hevbendîya wan bi hevra heye. Zanyarên kurd û kurdnas di xebatên xweda dinivîsin, ku di tarîxa peydabûn û pêşveçûna edebyeta kurdîda zargotina cimaetê (çîrok, hek yatên tarîxî, serhatî û serpêhatîya merivan, beyt, kilam) kanîya edebyeta kurdî bûye. Mesele, Aladîn Sîcadin, Givi Mukarîyanî, Maruf Xeznedar di nivîsarêd xweda (Aladîn Secadî, Mejuy edebetî kurdî, Bexdad, sala 1950) Maruf Xeznedar, Oçêrkî sovremenoy kurdskey lîteratûrî, Moskva, 1965) nivîsîne, ku zargotina kurdî berepêşin kanîya peydabûn û pêşveçûna edebyeta neteweyê kurd bûye. Kurdnasa Sovêtîstana M.B. Rûdênko di kitêbên xweda Meselan tîne ber çavên xwendevanan, ku Ahmedê Xanî "Mem û Zîn" a xwe ji "Mem û Zîn" a zargotin, ji "Memê Alanê" zargotin wergirtiye, nivîsîye, ku Xaris Bitlisî "Leyl û Mecnuna" xwe ji "Leyl û Mecnuna" zargotin wergirtiye, ku Feqê Teyran beyta xwe "Şêxê Seda'na" ji beyta zargotina "Şêrê sisebanê" yan jî ji beyta "Doda gurca" wergirtiye. M.B. Rûdenko wusan jî nivîsîye, ku gelek tiştên baş yê edebetî ketine nav cimaetê, bûne beytên zargotinê. Dengbêj, çirokbêjên kurdî gelek cara bi ezberî hînî stran, gotin û gilîkirina serhatî ya, qeremanên beytên zargotin bûne û li nav cimaetê bî qeydê xwe, bi tertîb û sazmanîya xwe belav kirne. Ev gilîrastin. Mesele, em hildin beyta "Dimdimê", serhatiya "Siyabend û Xecê" ya "Memê û Eysê", ya "Sêva Hacî" beyta "Elî Şêr" serhatiyên "Şêrê Sîsebanê" "Mem û Zîn" yan jî serhatiya "Zembilfiroş" û gelek tiştên din him li zargotin hene, him jî bi şaxê edebetî. Eva yeka nîşan dike, ku şaxên edebetê û yê zargotinê gelekî bi hevra girêdayîne ku hevbendîya wan bi hevra heye. Ew nîşan dikin ku, arîka rîya hostatiya nivîskar, şayîr û çîroknivîs gelek beyt, serhatiyên dildaran, çîrok û hekyatên tarîxî bûne beyt (destan), serhatî û cirokên nivîsandî, bûne şaxên edebetiyê. Mesele, bi arîkarîya aqil û ferasetî û hostatiya Ahmedê Xanî "Mem û Zîn" ê "Meme Alan" yê zargotinê bûne şaxê nivîsandî yê edebetiyê. Bi arîkarîya nivîsara Erebe Şemo beyta "Dimdimê" ("Xanê Cengzerin") bûye remana nivîsandî, bi arîkarîya Semendê Siyabendov şaxê serhatîya "Xecê û Siyabend" bûye poema nivîsandî. Ev şaxên nivîsandî

bi tertîba xweva, bi sazmaniya xweva, bi rengê nivîsara xweva, bi xemla xweva li gelek ciya guhastîne, ne mîna şaxên zargotinê ne. Lê naveroka wan, nêt û meremê wan navê qeremanên wan kêm û zêde mîna hevin. Eva yeka jî dîsan nîşan dike, ku edebyet û zargotina kurdî bi hevra giredayîne, ku hevbendîya wan bi hevra heye.

## ROLA KOVAR Û ROJNAMÊN KURDAN LI DÎROKA EDEBYETA KURDÎDA

Kovar û rojnamên kurdî li tarîxa peydabûn, pêşveçûn û lêgerîna lîtêratûra kurdan cîkî hêja û layq girtîne, çimkî peydabûn û pêşveçûn û lêgerîna lîtêratûrê wê bi peydabûn û pêşveçûna kovar û rojnamên kurdîva girêdaye. Di sirîya xweda peydabûn û pêşveçûn û lêgerîna lîtêratûra miletê kurdî bi peydabûn û pêşveçûna şerê serxwebûna melitê kurd va girêdaye û hevbendîya wan li hemû alîyava bi hevra heye.

Di tarîxêda aşkeraye, ku bernamên kovar û rojnamê xelqê ew bûne, ku propaganda hişyarbûna miletê xwe bikin, ku milet xwe nas bike, û qîmetê ziman, kûltûra xwe zanibe, pêşketîyên efrandkerên lîtêratûra xwe nas bike, qedirê wan zanibe, hêz û qewatên xwe pêşketî bike yek, bi tevayî û hevkar şer bikin bo xatirê azadî û serxwebûna milet.

Eger ew baş mijûlî tarîxa peydabûn û pêşketina kovar û rojnamên kurdî bibin, emê bêne ser wê fikirê, ku nêt, me-rem û mebestê kovar û rojnamê kurdî jî ew pirs bûne, ku bernama wan jî hema ew pirs û daxwaz bûne.

Kovar û rojname wusan jî li cîyê xweda bûne meydan û binga çakirn û belav kirina çîrok, serhatî, şêr, helbest, beyt û dastana. Kovar û rojnaman melûmetîyên kurt derheqa şayîr, nivîskar û zanyarên milet e'lamî xwendevanên xwe dikirin, ew wusan jî bûbûne meydana gelek şayîr, nivîskaran. Wana şêr, xezel, helbestên xwe têda car-caran çap dikirin. Eger kovar û rojname çap nebûna, nivîsarên helbestvanan, çîrokvanan, dîroknasan, û zanyaran têda çap ne bûna, ew nivîsar, ew helbest wê wunda bibûna, wusa pûç bibûna û ji paşketîyanra ne mana. Hema saya serê kovar û rojnaman em dikarin tarîxa peydabûn û pêşveçûna lîtêratûra milet bînin ber çavê xwe û binivîsin.

Rojnama kurdî ya berê pêşin ku çap bûye û di vê rêda rola xwe lîstîye, gazeta "Kurdistan" (1898-1899) bûye. Eva rojnama bi destî kurên Bedirxan-Abdurehman-paşa û Midhat-paşa çap dibû. Hukmeta siltanê Romê çapkirina wê li Tirkîyê qedexe kiribû. Sebeb wê yekê ew mecbûr bûn wê li Qaherê, Londonê, Folkstonê û li cîyê din çap bikin.



Berê pêşin di vê rojnama kurdîda hine gilî-gotin li ser lêgerîna dîroka lîtêratûra kurdî nivîsîne. Mesele, li hej mara wê ya sisîyanda ewê di danezana xweda nivîsîye: "Zanyarekî almanî navê wî Fon Hartmane, hatîye Kurdistanê, mijûlî hinbûna zimanê kurdî dibe, têkstên folklor û lîtêratûra kurdî kom dike bona lêgerîne". Li paşî vê melûmetîyê çapkerê rojnama "Kurdistan" t'emîya li xwendevanên kurdan dike û dibêje wan, ku ew jî "têkstên folklorê û lîtêratûra kurdî k'om bikin, li ser zimanê xwe û li ser neteweyê xwe kurd tişteki binivîsin" (binêre, "Kurdistan", Hejm. N3) Çapkerê vê rojnamê bi xwe li dû hev parçe-parçe têkstên ji dastana Ahmedê Xanî "Mem û Zîn" çap kirine û derheqa Ahmedê Xanî û "Mem û Zîn" a wîda ev gilîyên jêrin nivîsîne: "Sala 1650-da Ahmedê Xanî kitêbek nivîsîye, navê wê "Mem û Zîn" e, li ser aşoq û maşoqên cahil hatiye nivîsandî nê, têda melumetîyên bi hewas yên tarîxî û kûltûrî li ser dîroka kurdan jî nivîsîne, têda wusan jî gelek t'emî, nesîhet, metelok û gotinên nesteqî nivîsîne, ji ber wê pêvîste wê kitêbê bixûnin, ezber zanibin. Em wê bir bi bir çap dikin bona xwendevanên xwe. Ew kitêb du sed sal berê hatîye nivîsandîne, hine belgên wê nayêne xwendîne, dibe wextekê ez karibim wan belgan bixûnim, berpa bikim. Eger li cem merivekî destnivîsara wê heye, ez lava dikim bo min binêrin (bişînin), ku ez wê hember bikim, rast bikim; meremê min heye wê başqe çap bikim. Min hine cî ji wê ter cime kirine ser zimanê tirkî, erebî û ji zanyaranra xwend wan bi dengekî digot: Ji vê kitêbê baştir û çaktir ne dîtîye û nexwendîye "(Kurdistan, hejmara 3. rûyê 3). Disan di wê hejmarêda çapkerê wê rojnamê hine melûmetî derheqa Qadir Koyida e'lamî xwendevanên xwe kirine. Ewê têda nivîsî ye: "Di nav soranda zanyarek hebû, ew par mir, rehma xwedê lê be. Navê wî Hacî Qadir Koye. Di emirê xweda ew gelek xebitîye, kû miletê kurd xwendewer be, xudan ulm û zanîne be. Ewî gelek şêr bi kurmancî nivîsîne, şêrên xwe dişande welatê xwe. Ew xwe bi zaravê soran dipeyve (xeber dide), lema kurd zaravê wî fehmanî. Li ser rûpelê "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî Qadir Qoy bi destê xwe şêrek nivîsîye, têda ew dibêje merivê mîna Ahmedê Xanî û nivîsara mîna nivîsara wî "Mem û Zîn" tunene, ku Ahmedê Xanî û Qadir Koy bînge û binaxa edebyeta kurdî danîne". Li paşî van gilîyan kovarê "Kurdistan" şêra Qadir Qoy li jêrê çap kirine. Ew şêr awa tê gotinê :

Zemanê resmî caran ne mawe,  
 Çiraxî nizam û menşî kujawe,  
 Le dewrî ême zûwan û cirîde  
 Eger çe meqsedî zanîn bawe,  
 Eman qedrî bizane em kitêbe  
 Le dinya êsta ke hemsay ne mawe  
 Lê aynam heyat şêx Xanî  
 Le ser nixeta xetaw nûsrawe,  
 Le lay erbab xoy bi qedîr û qîmet,  
 Xezîneyî wefhere û kîsî dirawe,  
 Le encam mecmûe dul soran û bohtan,  
 Le saye em kitebe nûsrawe.  
 Le kûrdan xeyrî Hacî û şêx Xanî  
 Esase nizame kurdî da ne nawe".

Di vê şêrêda Qadir Qoy dibêje :

Zemanê resmî caran ne maye,  
 Çira nizam û neşrê kujawe hatiyê vekuştînê  
 Li vê dewra ziman û çiridê,  
 Eger çî meqsedê zanînê heye,  
 Hema qedrê vê kitêbê bizane,  
 Li dinya niha hevtayê wê ne maye,  
 Li ayna heyata şêx Xanî,  
 Eva t'ev bi qedîr û qîmet  
 Xezna cewahîr û kîsê giranî,  
 Li cemeka soran û botan  
 Eva kitêba hatîye nûsînî (nivîsandinê)  
 Ji kurdan xencî Hacî û şêx Xanî,  
 K'esekî binaxe nizama kurdî danonî.

Heta van salê paşîn kesek haj vê şêrê ne bû, di dîwana wî da ya sala 1945 çapkirdîda ew şêr tune. Saya serê gazêta "Kurdistan" niha em pê hesîyane, ku Qadir Koy "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî xwendîye, qedîr û qîmetê nivîsarên wî zanîbûye û lema jî nivîsîye "Ji kurdan xencî Hacî û şêx Xanî, kesekî binaxa zimanê kurdî dananî".

Berê kesek haj pê nî bû kengê Qadir Koy çûye rehmetê. Niha saya serê melumetiyên gazêta "Kurdistan" em haj pê bûne, ku ew kî bûye, çî nivîsîne û kengê kiriye, bi gotina wê Qadir Koyî sala 1889-da mirîye.

Li paşî Rojname "Kurdistan" her li destpêka sedsalîya bîs ta li pey hev dest pê dikin têne çapkirinê gelek rojname û kovarên kurdî. Navê wana li kitêba Cemal Xeznedar "Rojname û kovarên" kurdîda hatine nivîsandinê. Ez ji wan her navê çend heban tînime bîra xwendevanên me delal : "Roja Kurd (1911-1919), "Bangî kurd" (1913-1919), "Pêşkewtin" (1918-1919), "Jîn" (1919-1922) li nav salên 1932-1945 kovarên "Hewar", "Ronahî", "Stêr", "Roja Nû" (li Sûrîyêda), "Gêlavêj", "Dengê gîtî teze", "Jîn" (li Iraqêda) çap dibûn. Niha li gelek cîya bi dizî û aşkera gelek kovar û rojname bi zimanê kurdî çap dibin.

Di van kovar û rojnamên kurdîda gelek şêr, helbest û nivîsarê nivîskar, zanyar û edebyetnasên kurdan hatine çapkirinê, mesele, li kovarên "Hewar" û "Ronahîda", yên li Sûrîye çap dibûn, gelek şêr, helbest, çîrok yên şayîr, nivîskarên kurdên Sûrîye û Tirkîye dihatine çapkirinê. Mesele, şêrên Cegerxûn, yên Osman Sebrî, Qadrîcan, Huşyar dî wanda çap bûne. Mesele, di kovara "Hewarêda" ev şêr û helbestên Cegerxûn çap kirîne : "Gotina welat" (H.N.4), "Jî bona Hewarê" (H.N.6), "Pesnê Dêrdike"; ji birayê nazdar û ciwan Qadrîcanra (H.N.5) "Gula dil" (H.N.9), "Jî mele û şêxanra" (H.N.10), "Berdilk" (H.N.10), "Zarînek" (H.N.II), "Zaru dibûn" (H.N.13), "Şêr, piling û rûvî" (H.N.15), "Du bend" (H.N.16), "Ez û dilber" (H.N.25), "Pendname" (H.N.24) "Welatê min" (H.N.26), "Derdê Cegerxûn" (H.N.27), "Marşa rêçenasan" (H.N.26), "Ala rengîn" (H.N.29), "Em Arîne" (H.N.28), "Ke bi ya min dike" (H.N.29), "Divê em bibin yek" (H.N.30), "Berhemê gur" (H.N.30), "Serxwebûna murîyan" (H.N.39), "Marşa keyanî" (H.N.52), "Xanima Ciwan" (H.N.52), "Pêş kevin" (H.N.53), "Ya reb" (H.N.57).

Lê di kovara "Ronahîda" ev şêr û helbestên Cegerxûn çap bûne: "Şahîşaha cihan" (R.N.21), "Leylê" (R.N.20), "Xanim tu dizanî" (R.N.29), "Keç" (R.N.19), "Hey kurd" (R.N.18), "Pira Torê" (R.N.18), "Ew maldarên birçî" (R.N.14), "Jîyîna min" (R.N.28), "Dilber" (R.N.19), "Ey keça kurd" (R.N.15), "Ger nexunin" (R.N.15), "Canan" (R.N.20), "Berdêlk" (R.N.10), "Pesnê Dilberê" (R.N.29) û yên din.

Saya serê kovara Hewarê ev şêr û helbestên Osman Sebrî hatine çapkirinê: "Dongiya Ceqel" (H.N.27), "Marşa Xortan" (H.N.277), "Rûvî û dîk" (H.N.31), "Agrî" (H.N.36), "Marşa

canbêzaran" (H.N.49), "Şêhrên zarokan" (H.N.49), "Marşa Felatê" (H.N.50), "Gelo dem ji zêre" (H.N.52), "Ruvîyê ker" (H.N.52), "Evîn" (H.N.53), Di kovara "Roja Nû" da jî ev şêrên Osman Sebrî hatine çap kirinê: "Xweşxana Çîyayekî" (R.N.14), "Berdêlîya Mihokê" (R.N.19), "Gurê pîr" (R.N.12) Di herdu kovaranda wusa jî çîrok û serhatîyên êtnografî, tarîxî yên Osman Sebrî çapkirîne.

Di herdu kovaranda (Hewarê û Ronahîyê) gelek şêr û helbesten Qadrîcan, Huşyar, Mehemed Emin Botî, Celadêt Bedirxan, Kamûran Bedirxan hatine çapkirinê; Eger ez li vira navê wan yeko-yeko binivîsim, wê dirêj be.

Di van herdu kovaranda wusan jî efirandinên şayîr û nivîskarên kurdan yên kilasîkî çap dikirin, her gav di hejmarên wanda perçe-perçe "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî û şêr û helbestên Meleyê Cizîrî çap dikirin. Xên ji wê di wanda nivîsarên kurd li ser dîroka peydabûn lîtêratûra kurdî çap dikirin, mesele di hejmara 33-da ya kovara "Hewar"ê da nivîsarek bi sernavê "Kilasîkên me" nav û nîşanên gelek şêrbêj û helbestbêj, çîroknivîs, tarîxnivîs û zanyaran kurd e'lamî xwendevanê xwe kirine. Di vê nivîsarê da nivîsîne kê, kengê jîye û çî nivîsiye.

Xên ji wê di kovaranda carna melumetîyên mexsûs li ser cuda-cuda şayîr û hozanên kurd çap dikirin. Mesele di hejmara 54-da ya kovara "Hewar"ê da nivîsarek ser navê "Mela Ahmed" çapkirine. Tê da nivîsîne: "Mela Ahmed şayîrekî ji Heyderane, dîwaneke wî ya şêr û qesîdan heye, niha li cem kurê wî M.Emîne. Ew jî li gundê Xalîtda Nehîya Amûdê dersê şeriyetê dixûne". Li paşî van gîliya nivîsyanê vê gotarê perçe şêra Mela Ahmed tîne ber çavê xwendevanên xwe. Ez sê-çar rêzan ji wî parçeyî werdigirim û li jêrê bona xwendevanên me delal çap dikim :

.....  
*Elaye ey yuhes saqî ji te zati recakarim,  
 Werîn camek meya safî ji hîcrê mest û guzarim,  
 Melulim bê geder saqî mifere-reh bim bi camêra,  
 Mirada min ji destê te badeya sor û gulgone,  
 Belê wextê seher îro xiyale firqetê xwarim"*

..... (Hewar, N.56).

Wusa jî di kovara "Ronahî"da sala 1961 ya ku li Bexdadê bi herfên erebî melumetîyên mexsûs li ser şayirên kurdin yên sedsalîya navîn çap kirine. Mesele, di hejmara duduwanda derheqa Ebdal Semed Babekda Enver Mayî nivîsîye: "Di sala 1932 ez li nav guliya, li gundê Şîlanda feqe bûm, li wêra kevne feqek hebû, navê wî Feqe Mehemed Dirêj bû, keş kuleke wî ya şêrêt kurdî hebû; gelek şêrêt vîjevanêt kurd têda hebûn, wek şêrêt Melayê Cizîrî, Remezanê Cezîrî, mîr Amadînê Hekarî, Feqê Teyra, şah Pertew-beg Hekarî û gelekê di ji vîjevanêt kurdî yê kevne". Li paşê Enver Mayî di nivîse, ku ewî ew di keşkula hine şêrêt kurdîda dîtî, li ser nivîsî bû: "Evdal Semed Babek fermayêd (Yanê Semed di bêje). Li dû vê Enver Mayî dinivîse: "Min kitêba tarîxnasê ereban Ibin Xelkan û kitêba "Keşaf alzenûn" xwend û pê hesîyam, ku bi rastî Evdal Semed Babek şayirê kurde, ji Hekarîyêye, sala 1020, bi gotina Ibin Xelkan, çûye rehme. Şêrên wî bi erebî û kurdîne. "Li paşî van gilîya Enver Mayî du parça şêrên Evdal Semed Babek di nivîsara xweda tîne ber çavan. Şêrek bi zimanê erebî, yek jî bi zimanê kurdî. Li jêrê ez çend rêzan ji şera wî kurdî bi herfên latînî çap dikim, ku xwendevanên me haj pê hebin :

*Dilo şabe, çi xweş dem hat bihare,  
Reşemeh çû, terazan bûn diyare,  
Nihal der bûn, xişâ hat av û cebare,  
Berf ker ker bûbû keftî nizare,  
Kulilk û gul bi kem der çûn li kajan,  
Sivik hat nergîza mest kofi xware.  
.....(Ronahî, Bexdad,  
sala 1961, hejm. 5,6 rûpelê 62-66).*

Eger em hemû hejmarên kovar û rojnamayên kurdî bixûnin, yên ku berê li cî-cîyan, welat û welatan, bajar û bajaran çap bûne, emê esse di wanda rastî melumetîyên bi vî cûreyî bîn, pê bihesin, ku di tarîxêda navê gelek şayir û hozanên kurd heta niha li nivîştok, pertok û kitêbên tarîxa lîteratûra kurdîda ne hatîye nivîsandinê. Eva xebata gelek mezine, wê gelek wext bikişîne, bona wê lazime nek bi tenê zanyarek, lê komeke zanyaran bi vî pirsêva mijûl bin ji hemû kovar û rojnaman melumetîyên mexsûs derheqa şayir û hozanên ne e'yan hilçînin, bikne berevokekê û çap bikin

Wusan jî kovar û rojnamên kurdî yên li Iraqêda çap dibûn, li perên xweda melumetîyên çapkirin, lêgerîna edebyeta kurdên li Iraqê û Îranê çap dikirin. Mesele rojnama "Jîn" kovarên "Gêlavêj", "Dengê gîtî teze" û yên din nivîsar û nivîştokên xwe bi hewasdar li ser şayîr, helbestvan, tarîxnivîs û zanyarên kurd çap dikirin, şêr û helbestên Guran, Bêkes, dildar û yên din li perên xweda herdem çap dikirin û bi vî teherî wana bînge û binaxa (hîmê) lêgerîna lîtêratûra kurdî kilasîkî û lîtêratûra kurdî ya herdemê xwe bere-bere da danîn, gîrsa miletê xwe pê didane naskirinê, ku ew xwe bihesin, xwe nas bikin û haj kelepura kûltûra xwe hebin, qedirê efirandinên şayîr, helbestvan tarîxnivîs û zanyarên xwe zanibin, xwe ber bi rîya rewşenbîrîyê bigirin, bi zimanê dayka xwe şîrin li dabistanandê bixûnin, xwendkar û xwendevan bin, şareza û pispor bin, bona roja oxirmê giran yek bin, bibin hevkar û hevdost, ka ribin bi tevayî şêr bikin bo xatirê azadîya kurd û Kurdis tanê ji bin zulmê û stemkarîyê derkevin û bi azadî, serxwebûn û bextewarî bijîn. Hemû rojname û kovarên kurdî, yên berê çap dibûn û yên niha çap dibin di van pirsanda roleke mezin lîstine û dilîzin û merem û mebestê wan ew bûye, ku kurd ber bi rîya rewşenbîrîyê serxwebûn û bextewarîyê herin.

Lê lazime bêjin, ku kovar û rojnamên kurdî cuda mijûlî nivîsandina tarîxa peydabûn û pêşketina lîtêratûra kurdî ne bûne û nabin, cuda mijûlî analîza (jihevderanîna) janrên (şovên) wê ne bûne û nabin, mijûlî lêgerîna bêş û qafîya helbest û şêran ne bûne û nabin, ew cuda mijûlî rola wê li terbîyetkirina gîrsa miletêda nebûne û nabin, li ser van pirsan xebatên serbixwe têorêtîkî nenivîsîne û nanivîsîn.

Rojname û kovar her bi tenê şemîkin, gava pêşînin di çapkirin û lêgerîna lîtêratûra neteweda. Ew meydana çapkîrîna serhatî, çîrok, beyt, şêr û helbestanin, lê meydana tengin, ne firevanin, di wanda her bi tenê bi kurteberî nivîştok û nivîsarên danezanîni li ser lêgerîn û mijûl bûna lîtêratûrê, tarîxê, êtnografî û folklorê carnan çap dikin. Bona lêgerîna tarîxa peydabûn û pêşveçûn lîtêratûrê, bona lêgerîna janrên wê û yên folklorê netewe, bona lêgerîna kêş û qafîya şêr, helbestan, kilam û stranên netewe û bona lêgerîna rola lîtêratûrê di terbetkirin û ronahî

kirina girsa netewe divêt xebetên cuda serbixwe başqe bê-  
 ne nivîsandinê. Bi van pirsanva merivên zana û edebetnas  
 mijûl dibin, kitêb û pertokên lêgerîna lîtêratûrê dinivî-  
 sin. Bi van pirsanva li hemû parçên Kurdîstana dabeşkirî-  
 da (parçe-parçe kirîda) li berî şerê împêrialîstîyê û şûr  
 şa Aktyabirê kesek mijûl ne bûye, her bi tenê li Iraqê sa-  
 ya serê wê yekê ku kurdên Iraqê mafê xwendin û çapkirina  
 kitêban bi zimanê xwe standibûn, zanyar û edebîyetnasên  
 kurd karibûn dest pê bikin xebatên mexsûs li ser Iêgerîna  
 tarîxa lîtêratûra miletê kurd binivîsin û çap bikin. Mese-  
 le, li destpêka nîvê sedsalîya bîstanda çend kitêb, pertok  
 û nivîstok li ser tarîxa lîtêratûra kurdan çapkirine. Çend  
 sal berê bi zimanê rûsî min nivîstokek li ser wan xebatan  
 nivîsîye û çapkiriye. Navê wê nivîstokê awaye: Îzûçenîyê  
 kurdkoy lîtêratûre vî Iraqê (Binere "Narodî Azî î Afrîkî  
 1975) yanê "Lêgerîna lîtêratûra kurdî li Iraqêda). Li jêrê  
 ez naveroka wê ji xwendevanên me delalra dinivîsim, ku ew  
 haj tarîxa lêgerîna lîtêratûra miletê xwe hebin.

## MELÛMETIYÊN ŞEREFXAN BİTLİSÎ Û EVLIYA ÇELEBÎ DERHEQA ZANYAR Û ŞAYİRÊN KURDANDA

Hine melumetîyên hêja, nîrx û bi hewasdar derheqa zanyar, şêrbêj û helbestbêjên kurdanda di nivîsarên Şeref-xan Bitlîsî û Evliya Celebîda hene. Lê divêt bêjim, ku piranîya melumetîyên wan derheqa îş û karên mîr, xan, beg û serokên kurdanda bûn, lema jî di nivîsarên wanda her bi tenê hatîye nivîsandinê kîjan mîr, kîjan xan, beg û serokê welatê kurdan û eşîrên kurdan xwendewer bûye, zanyar bûye, aqilmend bûye, şêrbêj û helbestbêj bûye.

Hewasdare, ez li vira bêjim, ku wextê Şeref-xan Bitlîsî derheq îş û karê mîr, xan û serokên welatê kurdan û eşîrên kurdên serbixwe dinivîse, gilî dike, ew bi ferx û ku bar e'lam dike, ku di nav wanda merivên xwendewer, ulmdar zana, şêrbêj û helbestbêj hebûn, ku hineka ji wan pêşrev û pêşkevî bûn, di welatê xweda mizgeft, medrese û mekteb çêkiribûn.

Mesele: ewî nivîsîye: "Mîr Dawud kurê mîr Melîk li Xezanê medrese çêkirîye, navê Dawudîyê lêkirîye, niha di wê medresêda şagirt hîn dibin, mêrên zana ders didin"(rûyê 216)

Şeref-xan dinivîse, ku melikdarekî kurd ji binemala Saladdin li Misirê hukumdarî dikir, navê wî melîk Efzal bû. Di nivîsara Yafîda ya bi navê tarîxêda derheqa wîda hatîye nivîsandinê: "Melik Efzal zanyarekî mezin bû, zanîn û alîmê wî gelek kamil bûn, ew li cem ulmdarên navdar di zemanê xweda hînî xedîsê bûbû, di nivîsarên xweda ewî tiştên eceb bi aqilî nivîsîne, di îş û karê xweda ewî gelek qedir û qîmetê merivên zana û pîspor digirt, herdem dikir, ku qencîya, xêrxwezîya rasteqîn bê kirinê, ku li dinyayêda edlayî, aşîtî û rehmdarî hebe, bi xwe tiştên xerab, ne heqî ne dikir, zanayekî bi kemal bû, nivîsarên zanyarî di nivîsîn, şêr û beytên xweşgo dinivîsîn. Wextê kurapê wî Melîk Ezîz û mamê wî Ebû Bekir welatê Şamê jê standin, ewî ev rêzên jêrin nivîsîn :



Axayê min Ebo Bekir û payman girê wî "Osman"  
 Bi zora şûr mafê Elî jê standin  
 Lê bavê destlat jê stand, destê wî da ser wan,  
 Heta destlat li destê wîda bû,  
 Îş û karê welat gişk bi tivdir bû. (rûyê 134-135)

"Wezîrê Melîk Efzal kurê Nasrêdîn bîn Ebîl Kerem Zîyaadîn Muhemed bin Ebdalkerîm Eş-Şeybanîyê Cizîrê bû. Mîna birê xwe Îzzedîn Elî û Mecaddîn Ebu-Sedet nav lê kiribûn, jêra digotin: "Ibo Esîra Cizîri. Ibin Asîra di wextê xweda di hemû ulm û zanîna li ser hemû kesana bû. Di şirovekirina xeber û bêjeyanda, di li hev anîn, nivîsandin û tertîbkirina nivîsarên zanyarîda ewî hunerwerîya bi ecêb diyar dikir û meriva tirê mîna wî kesek tune. Ew li Cizîrê Botan ji dayka xwe bûye, di zarutîya xweda bêhesab zêndar û bîrewer bû, hemû dîwanên Ebo Temam, Buhturî û Mutannabî bi ezber dizanî bû" (rûyê 135).

Şerefxan Bitlîsî dinivîse "Ev nivîsarê jêrin yê Ibin Asî rîne û ewî ew bi zîmanê erebî nivîsîne". Şerefxan Bitlîsî dinivîse: "Di vê nivîsrêda derheqa wan qanûn, sazmanî û tertîba nivîsandina şêr û helbestanda nivîsiye, yê ku es se lazimin bona şêrbêj û helbestbêjan". Şerefxan dinivîse ku kiteba "al-vasî", "al-markum fi xall al-menzum" û kiteba "al-ma'ni al muxtara'at fi sana'at al-înşa" ji yê Ibin Asî rîn (Rûye 136).

Derheqa Melîk Kamil Mehemed bin Melik Adil, yê ku ji bine mala Saladîn bû, Şerefxan van gilîyên jêrin dinivîse: "Her şevên rojên îniyê, dîwana Melik Kamil tijî alîm û zanyar dibûn, ew tevî wan bi pirsên zanyarêva mijûl dibû, bi wanra hemû pirs e'ne'ne dikirin, bi hevra diketne berevanîyê". Di wextê desthilatdarîya xweda ewî li Qehrê medrese çêkir, li ser tirba imamê Şa'fî qubeke bilind danî" (rûyê 139).

Wextê Şerefxan derheqa serek û serkarên Îmadîyê (Amadîyê) Akrê, Zaxo û Dehokêda dinivîse, ew dibêje: "Di wê derê Serkarên Amadîyê mizgeft û medrese çekirine, di wanda ulm dar û mêrên zana û rewşenbîrên Kurdistanê mijûlî zanbûna dîn û dîyaneta dinyayê dibûn û di zanîn, fehmkirin û nas-kirina wêda kamiil dibûn" (rûye 168) "û di wandera gelek merivê zana, ulmdarên mezin derketine" (rûye 169). Şerefxan derheqa walîyê Amadîyêda, Siltan Huseynda dinivîse:

"Ew merivekî gelek zana bû, qanûn û zakonên destlatdarîyê rind dizan bû, bêhed û bêsed arfkarî merivên zanyar, xêrxwez û camêr dikir, neheqî li xelqê ne dikir, merivên welatê wî, mezin û biçuk, dewlemend û belengaz gelekî qedrê wî digirtin û hergav hazir bûn jêra xulamtiyê bikin, biryarên wî biqedînin". (rûyê 170). Şerefxan wextê derheqa mirên Cizîra Botanada dinivîse, dibêje: "Mîrê Cizîrê Bedir beg hemû qanûnên edetê ayîna dîn û diyanetê diqedandin, danîn serî, ji rîya dîn û dewletê dervediket, guhê wî li ser merivên zana û ulmdaran bû, miqatî li wan dikir, lema jî di zimanê wîda gelek merivên zana, ulmdarên bi kamil li Cizîrê kom dibûn û qet zemanekîda hozan û zanyarên mîna yên Cizîrê li tu cîyan tune bûn. Ji wan hozan û zanyaran yên here mezin û bi navdar Mewlana Mehemed Berkela bû Mewlana Ebo Bekir bû, Mewlana Hesên Surçî bû, Mewlana Zeynedîn Babî bû, Mewlana Sehîd Elî bû û yên din bûn. Nivîsarên wan e'yanin û zanyar haj pê hene. Ji van Mewlana, Mewlana Zeynedîn Babî bi zanîn û ulmê xwe ser gişkarane û serrekê ulmdarane, mezine şêxê zemanê xweye" (rûyê 181).

Şerefxan Bitlîsî dinivîse, ku dewrêşek hebû, navê wî Dewreş Mehemedşay Qelecarî bû, ew ji eşîra rojkan bû, di dîwana Rostempaşayê wezîrê siltan Silemra serkarî li îş û karê dîwanê dikir, ewî şêr û beytên rind nivîsîne û bi reng û rûyê nivîsandina şêr û helbestvana diyar dibe, ku ew şagirtê Mewlana Îrdîrîsiye" (rûyê 191). Derheqa mîrê Xizanê mîr -Dawudda Şerefxan dinivîse: "Di Xizanêda ewî medrese çekir, navê Dawudîyê lê kir, Niha (yanê zemanê Şerefxan -K.K) di medresêda gelek hozan û zanyar mijûlî hînbûna ulman dibin û di zanîna xweda kamil dibin". (rûyê 266).

Şerefxan derheqa Yaqub-beg mîrê Dêrzenîyêda van xeberên jêrin dinivîse: "Ew di zanîna dîn û dîyanetda kamil bû, sirûştê (tebîyetê) hemû hiş û aqil dabû wî, ew şîrinbêj û xweşgo bû, gotinên merivên xêrxwez, camêr û dewreşan hez dikirin, mîna sofiyan şîretên yekitî û rehmanîya xwedê di kirin, bi hunurê xweva şêrbêj û helbestbêj bû. Ewî şêr û helbestên filosofîyê û xwedênasîyê nivîsîne. Pîranîya şêr û helbestên wî bi zimanê kurdîne. Dîwaneke şêr û helbestên wî heye" (rûyê 292-293).

Şerefxan derheqa bajarê Bitlîsêda nivîsîye: "Ji bajarê Bit

lîsa bi nav û deng gelek mêrên navdar û zanyar derketine û derdikevin. Yek jî wan Mewlana Ebdurehman Bitlîsîye, ku nivîsara Metele paravêj kiriye, şiro kirîye û mentiq û ma'nî wan ve dike; yek jî Mewlana Mehemed Berqelaye, ji wî rindtir û baştir kesek fikhê û xedîsê nizane, ew serokê ulmdar û şêxên hozanane û sertacê qanunzanînane, paravêj û şirovekirna û li ser Xebîsî û Hindî nivîsîne û ew terxanî mîrê Bitlîsê şeref kirine.

Şêx Emerê Yasîrîê mezin, serekê lêgerîna rastîyê û rasteqînê, perestar û pawanê dîn, ayîn, qayde û qanûnê xwedêna sîyê jî ji Bitlîsêye; ew şêx Ebo Necîmeddîn Suhraverdî ye û temîdar û nesihetdarê şêx Necîmêdîn Qubaye" (rûyê 387) Mewlana Husamedînê Bitlîsî xizna zanîna kûre bêhed, aqilmendê mezin jî ji Bitlîsêye, di soffiyêda ew peyketîye şêx Emer Yasîre. Ewî nivîsara paravêj û şirovekirina ulmê sofiyan li dû xwe hiştiye" (rûyê 388).

Mewlana Îdrîs Hekîm jî ji Bitlîsêye, ew kurê Mewlana Husamedîne, di wextekî dirêjda ew katibê siltanên Ak-Koyunla bû, li paşê li nav gîre-gîrê siltan Selîmda qulixa siltan dikir. Ewî şêrbêj bû, bi şêrbêjî tarîxa jîyîna îş û karê siltanê osmanan nivîsîye. Navê nivîsara wî "Heyşt bu huşte", bi zimanê farsî nivîsîye, têda ewî hezar beyt nivîsîne û hemû zakon û qanûnên wan niqil kirine" (rûyê 389)

Şayir Şukrî jî ji Bitlîsêye, ewî bi şêrbêjî tarîxa bûyerên zemanê xwe nivîsîye, navê nivîsara xwe danîye "Salname". Letif Rom di antolojîya şayrên tirkanda wî hesab dike ke şayrê tirkan. Hostatîya nivîsandina şêrên Şukrî nîşan dike, ku tu şayr li ser wîra tunene, ku şêrên wî nimûnên hostatîya nivîsandina şêrbêjî û helbestbêjîyane" (rûyê 391)

Şerefxan Bitlîsî dinivîse: "Bi gilîkî Bitlîs cî û warê ko mên mêrên şareza, pispor, zana û zanyaran bûye. Hostayê nivîsandina şêr û beytan Mewlana Musa, yê ku li Medresa Şukrîyêda talimdar û nesihetdar bû, bi gotina kalikê (bavpîrê) xwe ji minra gilî kir, ku kalkê wîy sed bîst salî Mewlana şêx Huseyn jêra gilî kiribû, ku nav Behrem-begê serokê Adilcewazê, Erdîşê û Bargîrê û Şerefxanê kalkê mînda pevçûn û berevanî peyda bûbû. Hingê Şerefxan (kalke min) tevî wî (Mewlana Musa) şex Emîr Bitîsî û weke pênçsed şagirt û hozan û zanyarên Bitlîsî tîr û kevanên xwe hildan tevî şêx Emîr çûne Erdîşê şêr. (rûyê 393).

Li Paşê Şerefxan Bitlîsî melumetîyên bi nirx û hêja derheqa dem û dezge, sazmanîya xan û manê Bitlîsêda dinîvîse. Ewî nivîsîye: "Hukumdarên vê derê gelek xan -manên bi xêr û baş çêkirine, wana mizgeft, medrese, xanekên derwêşan, şûr, pira, hemam çêkirine. Di nav bajarda heta bîst pirê bi kevirên şimşat çêkirine, li ser wan piranra her roj meriv tên û diçin, di bajarda şanzde tax hene, heyşt hemam û çar mizgeftên mezin hene. Mizgeftek zûda meçîta ermenîyan bû, niha navê wê mizgeftê "Sor mizgefte". Mizgefta din di zamanê selcukanda hatiyê çêkirinê, navê wê "Mizgefta kevne", li ser diwarê wê sala çêkirina wê bi herfên qufî nivîsîne. Mizgefta sêyemîn ya Şemsîye, mîr Şemsedîn ew li meydana Gek-meydan çêkirîye. Mizgefta çarûm li taxa Merdî nê hatiyê çêkirinê li rex mêvanaxana rêbaran û rêwîya, navê wê mizgeftê Şerefîye, çimkî Şerefxan ew çêkirîye. Îmam û mezinê van mizgefta hene, ew li ber wanin, miqatîyê lê dikan. (rûyê 393-394)

"Li bajarda pênc medrese hene: Xatîbîye, Hacibêkîye, Şukrîye, Îdrîsîye û Ihlasiye. Ya paşîn li rex mizgefta Şemsîyêye, min ew dirust kiriye, niha di wêda tije şagirt hîn dibin.

Mamostayên zana, hunermendên şêrbêj û helbestbêjên xweşgo di medresanda ders didin, mesele di medresa Şemsîyêda Mewlana Xidir Babî ders dide, ji wî rindtir û baştir kesek qanûnên dadgarîyê, hedîsên Quranê û serhatîyê pexember nîzane.

Di Medresa Ihlasiyêda Mewlana Muhemedê Şiransî ders dide, ewî li nav ulmdarên Kurdistanêda bi navdare, bi hiş û aqilê xweva gelekî bi kamile, zanîna wî, pisporîya wî di peravêj û şirovekirina quranêda, di stêrnasiyêda, mentîqêda û alxîmîyêda.

Di medresa Hacibekîyêda dersdayîn spartine Mewlana Mehemmed Zîrakî Sofî; mîna wî kesek qanûnên dîn û dîyanetê nîzane û mîrên mîna wî qencker, camêr, xwedênas û xêrxwez tunene.

Di medresa Idrîsîyêda qulixa talîmdarîyê û nesîhetdarîyê spartine Mewlana Ebdîla Reşk. Ew ji zanîn û pisporîyêda hozanekî bi kamile.

Di bajarê Bitlîsêda hostayên hunermend û pêşekdar û pêşezanê bi navdar gelekî, di bajarêda heta heşt sed dikan hene, gelek xan-manê dîwanê bi xêrker hene.

Cuda lazime çend gilîya derheqa mîrê Wanê Xosrov-paşada bêjim. Ew mêrekî bi camêr, rehmdar û xêrker bû, cî warê wî bûne cî û warên merivên hunermend, pîspor û ulmdaran. Ewî du hemamên bi kevirên mermer çêkirine, du kervansêra çêkirine, heta sed dikanên du derge çêkirine, du çermxane çêkirine, û gelek xan-man û tiştên din çêkirine. Ewî eva gişka mîna waqtê daye mêvanxanên rêbaran, yên li rêvedanin. Xanmanê ewî çêkirine reng û rûyê bajarê Bitlîsê xemilandine. Li ser diwarên van xanmana Mehemed-can Efendî qazîyê wederê sala çêkirina wan nivîsiye. Xên ji wan xanmana ewî li Rehva li nav gundê Tatvanê û bajarê Bitlîsê du kervanserayên mezin çêkirine, li rex wan hemameke baştirîn û çaktirîn, mizgeft û deh hostaxane çêkirine, ji kaniya bîst kilometir dûr karêz kişand, av anî wê wêderê, gişk avedan û şên kir, heta sî malên filan û musulmanan li wira cî kirne, û ew erd û xaliya Siltan Muradxan dabûne Xosrov paşa, dane wan mîna erdê waqfê yê mêvanxana rêbaran. Li wê derê bona rêbarên tirk, fars, ereb û file nan û xurek hazir bû; kî şevê li wê derê disekinî, axa bûya, belengaz bûya, merivê xerîb bûya, ne xerîb bûya, yek bû, cî didanê, jêra ezet û îkram dikirin" (rûyê 394-395).

Xosrov-paşa wusa jî li Wanê mizgefteke mezin, medrese çêkirin, li rex goristanê mêvanxana rêbaran çêkir. Xafizê dengzîz û xweşgo û xetîbê bi edeb û rûspî, muezin, axûndê quranxwên û mucewirê maqul û bî terbiyet nîşankirin, ku qulixê wêderê bikin, maşê wan nîşan kir. Li paşî xwendina dua'yê, ew pênc şûrê (birên) quranê dixunin û dua' dikin bona ruhê wî. Êvarê roja înlîyê û duşembe dua' li gora wî dikin" (rûyê 396).

Melumetîyên bi vî cureyî Şerefexan derheqa hukmdaran Exlatê, Mûşê û bajarên din dinivîse. Hozan û ulmdarên bi navdar ji Exlatêne, mesele, şêx Sehîd Huseyn Exlatî serokê ulmdarên zanbûna dinya derva û hundurê bû. Ew pîsporekî zanbûna cefera camê bû. Bi cadûgerîyê ewî tê derdixist li paşrojê çî wê bibe, biqewîme (rûyê 397). Ji hozan û zanyarên Exlatê yek jî Mewlana Muheddîn Exlatî bû. Ew pîspore zanîna rast û rasteqîn û zanîna stêrnasîyê bû. Westê Na-

siraddîn Tusî bi fermana Xulagu-xan dest pê kir xanîyê stêrnasîyê çêke û tablîsa stêrnasîyê binivîse, ewî gazî Mewlana Muheddîn Exlatî kir. Û ewî tevî Muyeddadîn Aruzî û Necemedin Debîranê Kezvinî ew îş qedand". (rûyê 397)

Ev melumetîyên Şerefexan Bitlîsî nîşan dikin, ku li paşî sedsalên navînda (li zemanê sedsalîyên 15-16-da) kûltûra neteweyê kurd anegorî pêşkevî û pêşrev bû, ku bajarên kurdan bi dem û dezge, bi sazman û tundurust bûn, ku di wanda mizgeft, medrese, mekteb, xan-manên baş û diwanxanên hukumdarîyê hebûn, ku di wanda hozan, zanyar, pispor, hosta û pêşekarên bi rêbirina îş û karê bajar û gunda hebûn. Ew melûmetî îsbat dikin, ku neteweyê kurd, rûniştvanên gund û bajaran bûn, ku ew di jîyîn, ayîn û edebê xweda bi serbest û serbixwe dijîn.

Eger em bala xwe bidne ser nivîsarên tarîxî, yê li paşî nivîsara Şerefexan Bitlîsî hatine nivîsandinê, û eger em wana bixûnin, emê bibînin, ku li paşê jî neteweyê kurd ser edetê xwe, ser ayîna xwe, dem û dezgê xwe maye, jîyê û dijî. Di tarîxêda aşkeraye, ku her melumetîyên hêja û bi hewadar derheqa jîyîna neteweyê kurda di rêbaranda Evlîya Çelebîyê tirkda hene.

Li vira pêvîste bê gotinê, ku Evlîya Çêlêbî melumetîyê baş li ser mizgeft, medrese, mekteb, şagirt, hozan, zanyarên bajarê Diyarbekirê, Wanê, Bitlîsê û çend bajarên din e' lam kirine û di rêbarnama xweda nivîsîne. Mesele, ewî nivîsîye, di Bitlîsêda sêzde mizgeftên biçûk û du mizgeftên mezin (-Mizgefta Şerefexan û mizgefta Xosrov-paşa) hebûn (rûyê 109), têda wusa jî medrese, hucre û haneke hebûn. Di medresên Siltan Şerîfda, Kotek Meydanêda, Warsing Hacî Begêda û medresa Xetibêda xerêqî hînbûna hedîs û tefsîra quranê dibin, di her Mizgeftêda û Medresêda mamosta û dersdarê ulmê civakî hene (rûyê 110), li Bitlîsêda heta heftê mekteb hene, mekteba here baş ya Şerefexane, ya Xosrov-paşaye, ya Xatunîyêye, ya Bazarêye û ya Beşart axaye" (rûyê 110). Ew dinivîse: "Wextê ez li wira bûm, ez bûme nasê heft şayran: Yek Katib Çelebî bû, ew nivîskarê dîwana Xan bû, yek Mele Remezane Çelebî bû, yek Cenebî Çelebî bû, yek Gencî Çelebî bû. Dîwanê şêrên wan hene, dîwanê şêrên Cenebî Çelebî, Gencî Çelebî mîna dîwana Xemse Nizamîne" (rûyê 113).

Evlîya Çelebî wusa jî melumetîyên baş derheqa Mizgeft, medrese û mektebûn bajarê Wanêda nivîsîne. Ewî nivîsiye, ku Wanêda Mizgeft, medrese û Hucra hene: mizgefta Dawud Pêxember, mizgefta Sulêman-xan, medresa Olî, medresa Xorxor medresa Xosrov paşa, mizgefta Tewrêzî, mizgefta Dervazî, mizgefta Esklêp, di mizgeftanda û medreseda dersê ulmê cî vakî dixûnin, mele muslîm û buxarî di wanda gelekin, hedîsê ezber dizanin.

Di Wanêda heta bîst mekteb hene, têda zaru rind û baş bi farsî dixûnin, têda wusa jî nivîsakar û şayr hene; şayr Efendî, ew li behra zanyarêda mewlaneye û şahê şayrane yê din Wanî Çelebî û mîr-Supehrîne. Herdu jî li nav şayranda bi navdarin". (rûyê 217-218).

Evlîya Çelebî bi vî cûreyî jî derheqa mizgeft, medrese, mekteb, mamosta, hozan, zana, pispor û ulmdarên Diyarbekirêda nivîsiye. Ew navê heft-heşt mizgefta hildide, dibêje: Mizgefta Pêxember, mizgefta Îskender, ya Naram-paşa ya Reş ya Îparhîyê, ya şêx Ezîz Romî, ya Şems Efendî, ya Kurê Sîn ya Bêqlî Mehemed-paşa, ya Xalîd kurê Welîd. Di wan mezgeftanda fêrge û dersxane hene (fêrga şêxê Romî, ya tefsîrîyê, ya xwendina hedisan).

Di hemû fêrge û dersxananda mele, zana, pisporê pir zan hene. Di mizgeftanda şêxê xwendina quranê hene, quranê ezber dizanin, wusan jî hedîsbêj di wanda hene, di hemû mizgeftanda xutbê dixûnin, îmamê mizgeftê heye, ew melayê mezîne, ulmê hedîsê dizane. Hedîsbêj Remezane Efendî hemû kitebên Muslîm û Buxarî ezber kirine. Li ber her mizgeftê hedîsbêjek heye". (rûyê 42-45).

Li paşê Evlîya Çelebî dinivîse: "Di Diyarbekirêda çend şayrên xweşgo, zimanşîrin hene. Yek jî wan Fuzulîye, yê din rûhîye.

Ji van hilçanokên jorin, yê min ji nivîsara Şerefxan Bitlîsî û Evlîya Çelebî hilçandine û ji ber girtine, ez tême ser vê berhevîyê:

1- Di sedsalîyên XV-XVI-XVII -da li Kurdistanêda li bajarên mezînda (xasma di Diyarbekirêda, Bitlîsêda, Merdînêda Wanêda û di cî û warên dînda) jîyîn, ayîn, edet, dem û dezge sazmanî û tundurustîya birêbirin û serkarîya îş û karê

rûniştvanên gund û bajarên mîna hev bûn, gişk di zemanê derebegîya here pêşketî û pêşrevda bû.

2- Di vî zemanîda, di vê dewranêda şaristanî û kûltûra neteweyê kurd bi gavne mezin pêşketî bû, pêşda çû bûn. Di bajarên xan, mîrên welatê kurdanda, xasma di bajarên Bitlîsêda, Diyarbekirêda, Wanêda, Exlatêda û yên dinda mizgeft, medrese, mekteb, fêrge û dersxane hebûn.

3- Di wan mizgeft û medresanda merivên zana, ulmdar, pisporên hemû zanîna dinyayê hebûn; ew mijûlî lêgerîna hemû ulman dibûn, kitêb, pertokên hêja û giranbiha yên xwedêna sîyê, stêrnasîyê, dinyanasîyê, edebyetnasîyê û zimanzanî-nîyê dinivîsîn, tefsîr û hedîsê quranê dinivîsîn û dixwendin, peravêj û şirovedikirin, di medresanda, mektebanda ders didan, mele û feqî hazir dikirin.

4- Melumetîyên Şerefxan Bitlîsî û Evlîya Çelebî nîşan dîkin, ku di zemanê derebegîyêda pîranîya hozan, zanyar, pisporên îş û karên dîn û diyanetê û civakê mîr, xan û serokên bajar, welat û eşîrên kurdan bûn. Melumetîyên wan nîşan dîkin, ku hineka ji wan nivîsarên xwe bi zimanê farsî nivîsîbûn, hinka jî bi zimanê erebî nivîsî bûn, ku li nav wan xan, mîr û serokên bajar û welatên kurdanda şayîr hebûn, yên şêr û helbestên xwe bi kurdî jî nivîsî bûn û dîwanên wan bi zimanê kurdî hebûn.

Ev melumetîyên Şerefxan Bitlîsî û Evlîya Çelebî wê gotinê û nivîsarê îsbat dîkin, ya ku li pêşgotina kitêba A. Jabad "Recuil de notis et recits kourdes" (yanê Cimayî risal yan û hekyatyan bi zimanê Kurmancî, Peterburg, sala 1860) da hitîye nivîsandinê. Di wê pêşgotinêda nivîsîne: "Berê zaf muderis di welatê Kurdistanêda hebûn û şuhreta eliman jî gelek hebû. Di kafa bajêr, qeza û qeseba û gundîda ehlê îslamêd Kurdistanêda elbete file bit, medrese yek, dû sê, belku êdî zêde hebûn. Û bela derece diqet û ehteman ji kenarêd walî û ehlîyan derheq emrêd muderis û eliman hebûn. Li nik mezin û biçûkêd Kurdistanê qedir û refeta ulm û eliman hebû, melayêd qewî zû fenan di Cizîr, Emadî û Soran û Sêrt û etrefanda zaf bûn. Telebeyêd Kurdistanê he tî Bexda û Besra û Musulê diçûn û dihatin, Tehsîl ulman dikirin û mubtedêt ekradan ji îbtîda hece quranî dixûnin, paşê "Mewlûda Kurmancî", paşê "Nu behar" û "Pendê Etarî", paşê jî "Şeriyetê Icaz" û "Mehr û Enverî" dixûnin. Îcarê



"Îbaretê tesrîfê û Zuruf û Terkîba Mela Yûnisê Helqetanî dixûnin, ku ewê hersêna bi zimanê kurmancîne. Paşê jî Serf Se'dine û Se'de'lla ji mentîqa Hesankatî û qewlê Ehmed û Şêrê şemîyê û xelasê bi tertîbê donzde ulman dixûnin û mintehî û mazun dibin" (A. Jaba, Recuil de notices et recits kourdes, rûyê 18-19).

Eva gotina û nivîsarên Şerefxan Bitlîsî û Evlîya Çelebî li hev tînin û nîşan dîkin, ku bi rastî û rasteqîn şaristanî û kûltûra neteweyê kurd li zemanê serxwebûna xan û mirên derebegên kurdanda ne paş ketîbû, û niha kesek nikare mîna şovînîstên tirk û farsan bêje, ku kurd berê-berêda hovî bûn, li serê çîya diman, bi zimanê xwe nenivîsîne, ne xwendine û hîn nekirine. Ew mesele (berge) nîşan dîkin, ku di zemanê derebegîya navînda kûltûra neteweyê kurd ji ya tirkan, farsan kêmtir nî bû, ku di wê dewranêda hozan, mamosta, ulmdar û zanyarên kurd, şayr û helbestbêjên kurdan gelek bûn, ku wana jî mîna şayr, mele û ulmdarên tirkan û farsan nivîsarên xwe bi zimanê kurdî û bi zimanê erebî nivîsîne, ku nivîsarên geleka ji wan ji nivîsarên tirk û farsan danaxun. Mesele, nivîsarên Ibin Asîrî, Mela Îdrîsî, Şerefxan Bitlîsî û gelekên din, yê nivîsarên xwe bi farsî û erebî nivîsîne, bi eslê xwe kurd bûne. Nivîsarên wan mane, dinya haj wan heye, lê sed car hef û mixabin nivîsarên gelekên din, yê bi kurdî, erebî û farsî nivîsbûn, ne mane; ne mane, çimkî zulmkarên tirkan û farsan bi talan birine, li kitêbxanêd xweda veşartine, çap na kin, naxwezî dinya pê bihesê ku mele, hozan, ulmdar û zanyarên kurd berê hebûn û çî nivîsîne. Merem û mebesta wan ewe, ku kurd û Kurdîstanê di tarî û tarîstanêda bihêlin, bi zorê wan li nav xweda bihêlinin, pûç bikin, mal û dewleta wan yê welatê wan talan û tajan bikin.

Evlîya Çelebî di rêbarnama xweda nivîsîye, ku wextê sereskerê tirkan Melik Ehmed-paşa li ser Bitlîsêda girt, şerekî giran bi xanê Bitlîsêra Ebdulle xanra kir û li paşî şikes tina eskerê Ebdulle xan ewî barê heft hestiran (devan) bî hezaran kitêb, pertok, nivîsar û gelek hûr-mûrê (kel-pelê) hêja, xişirê zêr zîv û sifir, çek û silih û hacetên bi nîrx ji koşk û sera Ebdulle bi talan birin. Evlîya Çelebî nivîsîye, "Di nav wanda gelek nivîsar û dîwanên merivên bi nav û deng hebûn". Heta niha kesek nizane çî anîne se-

rê wan kitêb, nivîsar û dîwanên bi nîrx, hêja û bê hevta. Dibe li nav xweda bela kirine, pêpes kirine, sotandine. Bi piranî wana kitêb, pertok, nivîsarên bi zimanê kurdî dişewitandin û çapkirina wan bi zimanê kurdî qedexe dikirin. Sebeb vê yekê çapkerên rojname "Kurdistan" (sala 1898) mecbur bûn rojname xwe li welatê der çap bikin, di sala 1920 da wextê rewşenbîrkerên kurdan "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî çap kir, zulmkarên tirka ew kitêb şewitandin, nehîştin be la bikin, bi aşkera bifiroşin. Şovenistên tirkan wusan jî nehîştin wê nivîsara Ahmedê Xanî bi tercima Mehemed Emin Boz Erslan çapkirî bû, bê belav kirin, wana ew kitêb qedexekir. Lê divêt bi aşkera bê gotinê, ku zulmkarên tirkan û farsan zanibin, ku çiqas ew bikin, nekin, bi talankirin sotandin û qedexe kirina çapkirina kitêb, pertok, rojname bi zimanê kurdî, ew nikarin bigihîjne meremê xwe. Ji destpêka sedsalîya XVI heta destpêka sedsalîya XX siltanê rûmê û şahê Îranê eva dikirin, danîne serê neteweyê kurd, lê wana nikarbû bigihîjne merem û mebestê xwe. Niha jî, li zemanê hilşandin û şikestîna sistêma kalontîyê, li dewrana azadbûn neteweyan û qewînkirina hevkarî û dostîya neteweyan li dinyayêda ne şovenîstê romê, ne jî şovenîstên mîna Ayatola û meytolayên Îranê nikarin bigihîjne wî meremî û wî armançî, kurd nemirine û namirin û kok û reha wan pûç ne bûye û pûç nabe, her roj her sal digihîjin, çiqas xwe ber didin, dibişkivin, dibin gul, her digirin, toximê xwe rûya xwe li deşt û çiyayên Kurdistanê direşînin û dîsan digihîjin, dibişkivin, berê xwe digirin û wê rojekê tevî rêncber, xebatkarên tirk, fars û ereb zulmkar û şovenîsttan bikine gorê, gor bo gor bikin, û tertîba hevkarî, dostîyê û aşitîyê li nav xweda li welatê xweda saz bikin. Ez bawar dikim, ew zemanê bê, û rewşenbîrkerên kurd tevî rewşenbîrkerên tirk û fars û ereb bi serbestî û serefrazî bêtirs û bêxof li welatê xwe bigerin destnivîsar, kitêb û pertokên bi zimanê kurdî û dîwanên şayir û helbestvanên xwe kom bikin, çap bikin û mijûlî lêgerîna wan bibin, dewlemendîya zimanê xwe û kûltûra milletê nîşan kin. Li jorê saya serê melumetîyên Şerefhan Bitlîsî û Evlîya Çelebî em pê hasîyan ku li sedsalîyên navînda hozan, mele, alim û zanyarên kurd hebûn, wana navê çend kesan e'lam kirine.

Gelek alîm, zana, ulmdar û zanyarên kurd berê hebûne, lê sed car heyf em hela hê haj pê nîn. Her bi saya serê ko-

var, rojnamên kurd yên vî zamanî em pê hesîyane, me navê çend heba ji wan bihistîye û şêr û helbestên wan xwendine Derheqa Pertew Beg Hekarîda cara pêşin li kovara "Dengê Gitî Tezeda" hate beyankirinê, derheqa Ahmedê Xanîda û "Mem û Zîn" a wîda û derheqa Meleyê Cizîrîda û dîwana wîda li kovara "Hewar"êda hate beyan kirinê. Saya serê kovarên "Hewarê", "Ronahî" û rojnamên "Roja Nu" û "Stêr" yên li nav salên 1932 û 1945-da çap dibûn, me cara pêşin nav û dengê Cegerxûn, Osman Sebrî, Celadet Bedirxan, Kamuran Bedirxan, Mele Enver, Qadrîcanên şêrbêj û helbestbêj bihîst û nivîsar û efirandinên wan xwendin. Eger ew kovar û rojnama çap nebûna, şêr û helbestên wan çap nekirina, em tu cara haj pê ne dibûn, ku şayr û helbestbêj û hozanên kurd wusan hêja hene. Şerefyan Bitlîsî û Evlîya Çelebî navê çend şayîr û helbestbêj gotine û nivîsîne, ku dîwanên wan hene. Lê sed car heyf em nizanin dîwanên wan mane yan na, niha li Kurdistana parçe-parçe kirîda hene yan na. Dibe wunda bûne, hatine talankirinê yan jî hatine sotandinê, yan jî dibe mane, li cem melan, şêxan, feqîyan û bîreweranan mane, ew xwedî dikin, ji tirsan nîşanî kesekî nakin, yan jî dibe nivîsarên hozan û ulmdarên û dîwanên şayîr û helbestbêjên li cem kur, nevî û nevîçîrkên wan mane, û ew wan xwedî dikin wek (mîna) bîranîna kalbav û bavpîrên xwe û ji tirs a zulmkarên hukmetê veşartine.

## LÊGERÎNA TARÎXA EDEBYETA KURDÎ LI ÎRAQÊDA

Wextê meriv bi xwe îş û karê mala xwe nake, berhevî û hatubera mala wî ne risqê wîye, bi zimanê kurdên Sovêtîstanê vê metelokê dibêjin: "Bêdera bi destê malxwê malê nê hatbe kutanê, xirmanê wê bêderê ne risqê malxwê malêye".

Li vira ji wextê em dixwezin çend gilîyan li ser lêgerîna edebyata kurdî bêjin: Eger mêrê kurdê camêr û milethez bi xwe ne fikire, nexebite, mijûlî lêgerîna tarîxa edebyeta miletê xwe ne be, ew haj pê nabe, pê nahese, ku bi zimanê dayîka wî şîrin edebyeta kurdî heye û ew qet tu caran sûdê û karê ji wê edebetê nastîne, bi ferx kubar, bi serbilind û serferaz ji cînar û merivên ejnebîra nikare bêje edebyeta kurdî bedewî heye, ku nivîsarên tarîxî, fîlosofî dîn û dîyanetê hene, miletê kurd jî efirandinên bi qîmet û hêja efirandine.

Di vê pirsêda divêt em bêjin: berî şurşa Aktyabirê parçekî Kurdistanê di bin hukmeta siltanê tirkda bû, parçeyê din di bin destê şahê Îranêda bû. Hûkmeta tirkan û hukmeta farsan kurd hesab dikirin mîna xulam û dardestê xwe, xwendin û çapkirin bi zimanê kurdî qedexe kirbûn, gelek mîr, axa, beg û şêxên kurd bûbûne dardesdê wan herdu hukmetan. Milet di tarî û tengîyêda dihiştin, rewşenbîrî û ronakbîrîya miletva mijûl ne dibûn û hela li serda jî digotin "xwendin û nivîsandin bi zimanê farsî û tirkî edete, bi kurdî xwendin nabe û guneye". Lê dîsan divêt em bêjin: wexta em dîna xwe didinî tarîxê, dîsan em dibînin, ku li nav sîng û berên jinên kurd, ji nav berpala û şaxên çîya û daristanên Kurdistanêda mîfên xiretkêş, camêr û milîthez radibûn, derdiketne meydana ronakbîrê, bi zimanê kurdî şêr, çîrok, serhatî dinivîsin, îsbat dikirin, ku zimanê kurdî ji zimanê cînarên kurdan danaxwe, ku bi kurdî jî tiştên baş û giranbiha têne efirandinê. Û bi rastî ji wusane. Eger em baş lê binihêrin, temaşe bikin, emê pê bihesin, ku bo xatirê xwenaskirin û pêşveçûna neteweyê kurd li nivê sedsalîya XX hema xut li paşî şurşa Aktyabirê mêrên camêr û xiretkêş û milethez peyda bûne. dest pêkirine mijûlî lêgerîna tarîxa lîteratûra kurdî bûne. Bi kitêb û nivîsarên çapkirî em pê dihesin, ku mêrên wusan berê pêşîn li Kurdistanê Iraqê rabûne û dest pê kirine dîroka li

têratûra kurdî nivîsîne. Ji wan mêran yên bi navdar û ê-yan Aladîn Sicadîne, Refîq Nilmiye, Kerim Şarezaye û çend merivên din bûne, ku bi xwe her yekî ji aliyê xwe dest pê kirîye dîroka lîtêratûra kurdî nivîsîye.

Lî vira ezê her derheqa xebata wan camêranda kurt binivîsim. Lê berê pêşin divêt bêjim ku di Iraqêda lêgerîna lîtêratûra kurdî bi çapkirin û derketina kovar û rojnamên kurdîra giredayîye.

Derheqa vê yekêda ezê li jêrê di cîyê lazîmda bêjim :

Em dikarin wextê lêgerîna lîtêratûra kurdî li Iraqêda parvekin ser sê zemanan: zemanê pêşin dest pê dike li Kuta yîya sedsalîya XIX û destpêka sedsalîya bîstanda, berî şurşa Aktyabirê. Li nav van salanda kovar û rojnamên kurdî "Kurdistan" (1898-1899), "Rojî kurd" (1911-1913), "Bangî kurd" (1913-1919), "Peşkewtin" (1917-1921) çap dibûn, di wanda şêr û nivîsarên nivîskaran û helbestvanan çap dikirin, ronakbîr û xwendkarên kurd pê didine naskirinê. Di wî zemanîda her bi tenê di rojnama "Kurdistanêda" bi kurteberî hine melumetî derheqa Ahmedê Xanî, "Mem û Zîn" a wîda û Qadir Qoyîda nivîsîne (binêre "Kurdistan" N.3). Rojname û kovarên din her bi tenê şêrên helbestvanên kurd çap dikirin, di wanda pîrsa tarîxa lîtêratûra kurdî ne dihate danînê.

Zemanê duduwan (duwemîn) yê çapkirin û lêgerîna lîtêratûra kurdî li paşî şurşa Aktyabirê dest pê kir û heta salsaliya sedsalîyê kişand. Hema xût li nav van salanda tevgera (livîn û bizutina) şerê azadî û serxwebûna kurdan dest pê dike û çiqas diçe, ewqas bi hêz û qewat dibe. Hema di wî zemanîda ruh û hestê wetenperwerîyê û welathezîyê li nav neteweyê kurdda belav dibe. Ew ruh û hest di wexte hûkumdarîya Kurdîstana Jêrin tê danînê (çaxê li nav salên 1919-1921-da şêx Mehmûd hukumdarê Kurdîstanê bû.) Hema di wî çaxîda ronakbîrên kurd dest pê dikin nimûnên efirandinên kurdî kom dikin û li kovar û rojnamên kurdîda çap dikin, mesele, kovarên "Rojî kurd" (1922), "Dengî Heq" (1923), "Jiyanewe" (1924), "Jîn" (1923), "Dengî Kurdistan" (1922-1926), "Diyarî Kurdistan" (1926), "Zarî kurmanc" (1926-1932), "Ronahî" (1927).

Di pêşgotina dîwana wan şayiranda bi kurtberî serhatî, jî-

yîn û kirna wan her yekî nivîsîne, di pêra ji derheqa xey setê hunurê nivîsarên wan bi gişteberî nivîsîne. Lê bi te herê zanistî heta niha efirandinên wan analîz nekirine, jî hev dernexistine.

Li kutabûna salên 1930 du berhevokên şêrên şayirên kurd hatne çapkirinê. Di sala 1938-da Ebdula Kerim Hezaz berevokeke şêrên şayirên kurd çap kir. Lê di sala 1939-da Elî Kemal Bapir Gulçîna Gulistana şêrên şayirên hevdemê xwe çap kir (şêrên Ahmed Muxtar, yên Bêxûd Mela Mehmed, yên Piremêrd, Tewfîk Sahibqiran Ahmed, Nûrî Şêx Salih).

Zemanê sisiyan yê lêgerîna edebyeta kurdî ji salên 1940-î dest pê kir. Li sala 1941-da çend berhevokên komelatî û sîyasî û edebî di Bexdadêda nivîskarê bi navdar Refîq Hilmî berhevokeke bi navê "Edebî kurdî" (şêr û edebiyatî kurdî) çap kir, di wê kitebêda ewî bi tomerî şêrên şayirên hevdemê xwe çap kirine, û lêgerîna wanva mijûl bûye, nîşan kiriye, ku nivîsarên wan raberî derebeg û çawsenkerên millet hatine nivîsandinê.

Refîq Hilmî di kitêba xweda mijûlî lêgerîna şêrên van şayiran bûye: Hemdûn, Bêxûd Mehmed, Mehmed Xakî, Xeste, Ebdulxaliq Esîrî, Hemdî Saybqiran, Ahmed Muxtar Caf, Fayq Bêkes, Piremêrd, Xerîq, Hacî Qadir Qoyî.

Li nav salên 1940-1941-da gelek nivîsar û gotar li ser nivîskarên kurdan çap dikirin, mesele, Refîq Hilmî li kovara "Gelevêjda" hejmara 1,2 -da yên sala 1944-da derheqa şayirê kurd Salimda çap kirîye. Rojbeyanê nivîskar derheqa kêş û qafiya edebyeta kurdîda (şêrên şayirên kurdan) gotareke bi hewasdar li kovara "Gelavêjda, hejmara 2 -da sala 1944 çap kirîye, dîsan di wê kovarêda û wê hejmarêda Cemîl Bendî Rojbeyanî gotarek li ser edebyeta kurdî çap kirîye, lê Givî Muqrîyanî gotara xwe û derheqa şayirê klasîkê kurd Muhemed Reşîd Dizêy li kovara "Dengê Gitî Teze" da, hejmara 1-da çap kirîye, li kovara "Nizarda" hejmara 19-da ya sala 1948 -da nivîsarek derheqa şayirê kurd Bêkesê cahil-da çap kirne.

Wusa jî hine gotar û nivîsarên din bi navê "Edebyeta kurd û rabikirina sedsalîye li ser wêda" çap dikirin, di pêncî salîya vê sedsalîyêda çend berevokên mezin bi regekî firriwan lêgerîna tomerîva hatne çapkirinê: kitêba Aladîn Si

cadîn, ya Refîq Hilmî, ya Maruf Xeznedar û kitêba Kerîm Şareza. Sala 1952-da li Bexdadêda Tarîxnas û edebyetnasê bi navdar Aladîn bi cara pêşin bi zimanê kurdî bi navê "Mêjûy edebî kurdî ji zemanê berê kevn heta kutabûna nivê sedsalîya bîsta" çap kirîye. Li nivîsara xweda Aladîn Sicadîn dewlemendî, xwerûya efirandinên helbestvanên kurda tîne ber çavên xwendekaran, nîşanî wan dike, ku ew bixûnîn haj pê hebin. Di kitêba xweda ewî anîye ber çava çawa mîletê kurd mîna mîletên din pêşda çûye, rabûye ser xwe, bi tevî mîletên dinyayê bûyê hevkarê efirandina kûltûra dinyayê. Ewî di xebata xweda, di komkirin û lêgerîna cûre-cûre zaravada zehmetekî gelek mezin kirîye û baş bi hûr û kûr mijûlî lêgerîna peydabûn û peşveçûna edebyetê bûye. Berî wî kesek bi vê pirsêva mijûl ne dibû, melûmetîyên baş yên serhatî, îş û karên nivîskar û helbestvanên kurd gişk ne eyan bûn, Aladîn Sicadîn ev gişk hildan, dane ser milê xwe û bi camêrî û serferazî nivîsara xwe wek monografîya binaxe û wek xebatên zemanê xwe çap kir. Bona nivîsandina wê ewî gelek çavkanî bi zimanê kurdî, farsî, erebî dawê xebitandinê.

Aladîn Sicadîn di vî îş û karên xweda tîne ber çavan, ku berê-berêda peyvendiya edebyeta kurdî bi edebyeta gelek kevnra hebûye, ew basa edebyeta Mîsrê (belgê 559-582), edebyeta farsî (belgê 572-580), edebyeta Çînî (581-583), edebyeta yahûdî (597-605), edebyeta yûnanî (605-618), edebyeta romanî (618-624), dike lê ewî mesele ne anîne, ku gotina xwe îsbat bike. Ew pêvandîya edebyeta kurdî û edebyeta van mîletên kevn bi arîkarîya yeksanî û yek rengîya folklorê kurdî û edebyeta van mîletan îsbat dike: dinya zordarî û şerê qewat û hezên pak û xîrab, parêzgarî ya destûr, edet û nerêkîya li nav mîletê kurda, parêzgarîya wê desturê, wî edetî û nerêkiyê, yên, ku li nav destur, edet û ayîna mîletên kevn, mîletên rojhilata navîn da tîne gilî kirinê û gotinê.

Bona nivîsandina kitêba xwe hêja û bi qîmet Aladîn Sicadîn sûdî ji nivîsarên nivîskar û lêgerînkêrên Evropayê û rojhilatê wer girtîye, hemû matêriyalê bi qîmet û nîrx jê hilçandîye, anye ber çavên xwendewerên xwe. Kêmasîyên nivîsara wî ewe, ku ewî ew matêriyal bê kritîk daye xebitandinê û lêgerîna kûltûra mîletê kurd bi abûr û jîyîna civakê (cîmaetê) ra girênedayê.

Di sala 1956-da kitêba Refîq Hilmî "Şêr û edebyeta kurdî" derheqa şayirên kurd yê hevdemê xwe li bexdadêda çap kir. Di kitêbêda ew bi dûr û dirêj basa komeke şayran dike û mijûlî lêgerîna efirandinê wan dibe, kê m û zêde rama na wetenperwerîya wan tîne ber çavên xwendeweran, xasma efirandinên Dildar (1917-1948), Remzî mela Maruf (1912-1956), Ziwer (1879-1948). Ewrehman begê Salim (1905-1959), Selam (1892-1959), Elî Kemal Bapîr (1887-1975), Goran (1904-1962), Nûrî şêx Salih (1896-1958) ji hev der dixê, bîr û bawara wan wetenperwerî, kurdewerî, milethezî bi nîşan kirina perçên şêrên wan tîne ber çavên xwendeweran. Li sala 1961-da Kerîm Şareza Kitêba xwe bi navê "Koye û şayirên wê" çap kir, di we kitêbêda ewî derheqa şayir û ronakbîrên bajarê Koyêda nivîsîye. Ewî li ser wan şayrên Koyêda fikir û ramana xwe nivîsîye, yê ku li kitêba Aladîn Sicadînda derheqa wanda tiştê ne hatibû gotine, xencî Hacı Qadir Koyî. Ew wusan ji derheqa hine şayira bas dike, yê ku bi kurdî nenivîsîne, bi zimanê ciranê xwe şêr nivîsîne, mesele, Menfî (Husêyne mela Resûl), Hesêyn Seyd Ahmed, Şêx Muheydîn Nihanî. Wana bi zimanê farsî şêrên xwe nivîsîne, lê me Xafizê Mexzûn, kak Mustefa Safî şêrên xwe bi erebî, kurdî û farsî nivîsîne.

Li nav wan salanda ji kitêba Maruf Xeznedar ya bi navê "Axanê Kurdistan" bi zimanê erebî çap bûye, têda basa şayirên Kurdistanê kirîye, ku miletê ereb bibe nasê kurdan û edebyeta wan. Di pêşgotinêda doktor Ebdulganî Neccar nivîsîye, "Miletê kurd miletêkî mezine, gelek şayir, nivîskar, zanyar û karkerên hukmeta ereba ya pêşînda îş kirîne". Ew basa rola miletê kurd li tarîx û rewşenbîrkerîna neteweyê rojhilata Nêzîkda dike û dibêje, ku Saladînê Eyûbî dewletek li Misire saz kirbû, xaçparêz ji nav weletên Rojhilatê derxistibûn û kûltûra wan parastibû ji zeftkaran.

Maruf Xeznedar kurt qedir û qîmete şayirên kurd yê bi nav û deng gilî dike û gelê ereb dike nasê dewlemendîya lîtêratûra kurdî. Di kitêba xweda kê m û zêde derheqa formê şêrên miletê kurd dinivîse, ji wan navê wan çarrêzan, beytanstranan (Guranî, heyran, stran) li rex şêran datîne û basa kêş û qafiya wan dike. Bi kurteberî serhatî û naveroka deh şayrên kurd bi zimanê erebî nivîsîne, navê wan şayirên jî li berê di monografîya Aladîn Sicadînda hatibû nivîsandinê.



Maruf Xeznedar navê van şayîrên jêrin tînê ber çavan :

Di kurmancîda : Ahmedê Xanî û Mihreban Xatûn.

Di soranîda : Pîremêrd, Dildar, Bêkes, Nalî, Bexûd, Goran Mirza Şafî, Baba Tahîr û Welî Dîwane.

Di vira ew guh dide ser nivîsarên du şayrên kurd, şêrên wan bi tercima erebî tîne ber çavan û derheqa wanda gilî dike mîna şayîrên nenas. Xênc wê nimûnê çend çarrêzan bi ser dialêktan çap kirîye. Li kutayêda ewî gotareke kurt ya zanyarê kurd bi navbang Taufîq Wehbî çap kirîye, di wê gotarêda -ewî bîranîna xwe li ser tarîxnivîsê mezin Muhammed Emîn Zekî nivîsîye.

Xwedînivîsên van lêgerîna heta niha her bi tenê bi kurteberî li ser nav nîşanên şayîran û naveroka efirandinên wan anîne ber çavên xwendewana û çend nimûnên şêrên wan nîşanî wan kirine. Wana guh ne daye ser rêç û rêbazîya nivîsarên wan. Nivîsandina efirandinên wan bi tarîxêra bî girêdan lê nenihêrîne, mijûlî berepêşçûna cimaeta kurd ne bûne û nivîsandina şêrên xwe bi tevgera kurdanva girê ne dane. Eva gotina her tê li ser legêrînên Kerîm Şareza û Maruf Xeznedar. Eve kêmasîyê wan herduwa.

Li nav salên 1950-da çend nivîsar û lêgerînên baş li ser edebyetê hatine çap kirinê, ew nivîsar û lêgerîn jî li ser efirandinên çend şêrên kurd edebyetnasên kurd di kovara û rojnamên kurdîda çap dikirin. Mesele, li kovara "Hî va"da ya sala 1958-da li hejmara 2-da Muhemed mela Kerîm nivîsarek bi navê "Mesela edebyeta kurdî" çap kirîye. Refîq Hilmî di hejmarên 5 û 6-da yê kovara "Şefaq"da ya sala 1958-da gotara nivîsara xwe "Neteweyê kurd û şer" çap kirine.

Refîq Hilmî nivîsîye: "Eger di zemanê bihirîda şayîrên kurd mîla xwe didana ser hezkirin û dildarîyê, siruşt û ayînê, niha ew wusan nîne, şayîrên niha ne mîna yê bîrêne ew niha bûne hîva millet û millet hîvîdarê wane bo xatirê bextê xwe pêşwextîyê.

Li kovara "Şefeq" hejmara 1-da ya sala 1961 Osman Sebrî gotara xwe "Şakarê Şayranê kurdî" çap kirîye, têda ewî hî ne nivîsarên şayrên hevdemê xwe anîne ber çavên xwendeweran û bi kirîtkî li nihêrîye, mijûlî lêgerîna wan bûye.

Li gotareke xwe dinda, ya ku hejmara duduwanda ya kovara "Şefeq" sala 1961 çap kirîye, navê wê gotarê "Rola edeb" (yan rola helbestvan) li vejîyandina ruh û bîra milet li rewşenbîrkirina neteweyê kurdda, çap kirîye.

Navê wan gotar û nivîsarên jorê nivîsandî nîşan dike, kî komeke nivîsarên wan hatine terxan kirinê bona lêgerîna şêr û helbestên şayîrên kurd, hinek gotar û nivîsar ji hatina çapkirinê, ku haj edebyatê bin, xwendeweran kurd bikne nasê edebyeta miletê kurd. Lê eger em baş lê binêrin, emê bikarbin meselan bînin û nîşan bikin, ku li nav salên 1960-da çend lêgerîn, kitêb û portokên cuda yên lêgerîna monografî li ser lêgerîna tarîxa edebyeta kurdî û çend têbinên din li ser efirandinên helbestvanan û nivîskaran têne çapkirinê. Di wan xebatanda bi gotina firiwan lîtêratûr, folklor û kûltûra neteweyê kurd têne ji hev derxistin, bişkavtin û verisandinê. Xebatek ji wan xebatan xebata Muhemed mele Kerîm tê hesab kirinê, navê wê xebatê evê: "Hacî Qadir Koyî şayîrê qonaxa nûye li jîyîna neteweyê kurdda". Eva pertoka sala 1960-da li Bexdadê çap bûye. Di wê kitêbêda derheqa jîyîn, îş kar û naveroka nivîsarên Qadir Koyîda tê gilîkirinê, Mela Kerîm bi hûrgilî bîr û bawara pêşkevtin, ruh û hestê niştimanperwerîya Qadir Koyî nîşan dike, şêr û xebata wî pêşberî derebeg û siltanê romê, şahê Îranê gilî dike, şiro dike, ku Qadir Koyî paşrevê Ahmedê Xanî bûye, mîna wî xelq şîret kirîye, ku yek bin, ber bi rewşenbîrîyê herin, şer bikin bo xatirê serwebûna kurd û Kurdistanê.

Li paşê sala 1968 Muhemed mele Kerîm kitêbeke din bi navê "Gencina folklorê kurdî" (komek lawuk, heyranok) li Bexdadê çap kirîye. Di vê kitêba xweda çend kilamên mîrenîye û hezkirinê bi zaravê kurmançî hatine çap kirinê.

Di sala 1968-da Muhemed Emîn li Pertoka Xweda "Goranî û Jîyan" (yanê kilam û stran û jîyîn" çap kir, têda ew rola folklorê kurdî di jîyîn û tarîxa miletêda tîne ber çavan.

Di kitêba xweda "Ferhenga şayîrên kurdan" ya ku li sala 1968-da li Bexdadê çap bûye, hunurê edebetê di perwerdekirina qîz û xortan nîşan dike. Di kitêba xweda ya bi navê "Ferhenga wîjeyê şayîran" -da Ahmed Reşwanî bi van pir sên jêrînva mijûl dibe: dilxwezî, xweşî, hîvîdarî, ronakî

behar, hezkirin, dildarî, rindî û bedewîya jinan nîşan di ke; kî ew gîşk li edebyeta kurdîda hene.

Di sala 1970-da Muhemed Resul Hawar li Bexdadêda kitebêke mezin li ser şakaranê şayîrên kurd yên bi navdar Pîremêrdê bi navdar) çap kirîye. Ew li aliyê ramana hunerîyêva mijûlî lêgerîna şêr û helbestên Pîremêrd dibe.

Li sala 1962 Ebdula Bîmar kitêbeke monografî li ser lêgerîna şêr û helbest çap kirîye ew têda mijûlî lêgerîna pêwendîya folklorî millî û hostatîya şayîranva dibe û nîşan dike, ku Pîremêrd di efirandina xwede çîrok, efsene, serhatî û pendên pêşinan dane xebitandinê û nîşan dike. Pîremêrd şêr û helbestên xwe bi kêşa sîlabî (rêzebenda bangan) nivîsîne.

Di salên 1970 (li Bexdadê) 1971 (li Hewlerê) kongresên nîvîskarên kurd hatine gazîkirinê, di wan kongresêda pîrs danîn bona pêşxistina edebyeta yekîtî ya kurdî. Di wan kongresêda biryar kirin, ku edebyeta kurdî biparêzin, hemû çar û mikana dest xin bona pêşketin û lêgerîna edebyeta kurdî, guh bidine ser kel û pure netewê, gencîna wê bi parêzin. Li paşî çend kitêb û pertokên din li ser edebet û folklorî kurdî hatine çap kirinê, mesele, kitêba Sadiq Bahadî, "Şayîrên navça Amedîyê", berevoka kovara "Nûserê Kurd" (sala 1970, hejmara 2), Ezîz Gerdî, "belgên dîroka edebyeta neteweye kurdî", gotara Mela Xidir Deştî "Birayetî" -da hejmara 8-da ya sala 1970 çap bû, Şêx Mehemed Xalî "Reza Talebanî" deftera "Kurdewerî" hejmara 1-3 li Bexdadêda sala 1970-da çap kirin, Kak Felêh hinek şêrên Mehwî li rojnama "Birayetî" da hejmara 8-9 da yên sala 1970 çap kirine. Mahmud Yusif miqala "Edebyeta kurdî" li rojnama "Birayetîda" hejmara 8-da ya sala 1970-da çap kirine.

Li paşî şurşa sala 1958 dest pê dikin gelek lêgerîn li ser edebyeta kurdê Iraqê çap dikin. Lê bi rengekî rastî her li paşî derketina "Beyannama martê sala 1970, wextê mafê avtonomîya Kurdistanê li Iraqêda dan, zemanekî nû li edebyetnasîya kurda dest pê dike. Li nav salên 1960-1970 da Edebyetnas û zimanzanan dest pê dikin destnivîsarên kurdî çap dikin, mesele, çend dîwanên şayîrên kurd yên sedsalîya navîn çap kirin. Navenda çapkirina dîwanên şayîran Baxdad, Sulemanî, Hewlêr û Kerkûk bun. Ji sala 1958 heta sala 1970 li Baxdadêda 26 dîwan çap kirine, li Sulê-

manyêda -32 dîwan çap kirine. li Hewlêrêda 15 dîwan çap kirine, li Kerkûkêda 7 dîwan çap kirine. Xêncî wê di kovar û rojnamanda gelek gotar û nivîsarên kirîtkî (rexnegirî) li ser şêrên şayîran û li ser pirsên zanyarî lêgerîna edebyeta kurdîva mijûl bûne, çap kirine. Mesele, Kak Mem derheqa bîranîna Şêx Selemê Nemirîda nivîsarek li kovara "Hîwa"da hejmara 23-da, sala 1961 çap kirîye, Ebdul Rezaq Mehemed derheqa Şêx Riza Talebanî li hejmara 31 -da ya kovara "Hîwa"da çap kirîye. Ebdulxaliq Aladîn li hejmara 32-da ya sala 1961 miqala xwe "Li goşeye edebyetda" çap kirîye.

Li du wan komên rêxistina pirsên lêgerîna ziman, edebyeta kurdî û bona efirandîna zimanê edebyeta kurdî yekîtî pirs hatine danînê.

Dîsan di wî çaxîda Muhemed mela Kerîm di kovara "Hîwa"yêda li hejmara 9-10 ya sala 1959 miqala xwe bi navê "Şakarê şêrê Edebyetî" çap kir bû, têda mijûlî lêgerîna efirandîna şayîrên kurdî kilasîkî bûbû.

Li dû wê van zanyarên jorin her yekî bi serbixwe û cuda bi lêgerîna edebyeta kurdîva mijûl bûn, ew zanyar ev kes bûn: Maruf Xeznedar, Êzzedîn Mustefa Resûl û Îhsan Fuad bûn. Herse kes jî li Sovetîstanêda bawernama xwe ya navê doktorîyê standine.

Maruf Xeznedar du kitêb çap kirin, ya pêşin navê wê "Kêş û qafî li şêrên kurdîda". Ewî ew kitêb li Lînîngradêda nivîsî, lê li Baxdadêda çapkirîye. Ew di wê kitêbêda îsbat dike, ku sazmaniya şêr û helbestên kurdî yên berê bi rengê bangane bû, ku kêş û qafîya şêr û helbestên kurdî yên zemanê niha mina hevîn, ku şayîrên niha di wê pirsêda ser edetê berê diçin, şêran bi bangane dinivîsin. Ew dinivîse ku di şêrên wanda heft bangirî, sêzdeheng zedetir jî dibin. Kitêba Maruf Xeznedar disêrtasîya wî bû, navê we "Lê niherînek di tarîxa edebyeta kurdîda" bû, ew sala 1967 li Moskva yêda çap bûye. Di wê kitêbêda ew tarîxa edebyeta kurdî ji sala 1890 heta sala 1960 rewşen dike, tîne ber ronahîyê. Di wê xebatêde Maruf Xeznedar rola rojname û kovarên kurdî li pêşketin û pêşveçûna lîtêratûra kurdî ya niha tîne ber çavên xwendewaran, nîşan dike çawa hal û wextê sîyasetîyê tîm û raberîya lîtêratûrê û guhastîne

diguhêzin. Ew mēla xwe dide ber qanunê lîtêratûrê, nîşan dike, ku efirandinên şayîrên nivê sedsalîya nozdan û şayîrê nivê sedsalîya bîsta di lîtêratûra kurdîda cîyên pêşin digirin. Ew şayîrên nivê sedsalîya nozdan yên here mezin hesab dike Şêx Riza Talabanî (1842-....), Xerîq (1865-1904), Adîb (1859-1916), ew zamanê nav salên 1918 û 1945 he sab dike zemanekî nû yê pêşveçûna lîtêratûra kurdî. Di xebata wîda xwendevan pê dihesin, ku Ahmed Muxtar (1897-1944), Hemdî (1878-1936), Ebdal Nurî (1809-1944), Zîwer (1875-1948), Bêkes (1903-1948), Dildar (1918-1948) di efirandinên xweda guh dabûne ser pirsên sosîalîyê û ser mesela hal û wexte miletê kurd.

Li kutayîya xebata Maruf Xeznedar qise dike, ku li paşî şerê dinyayê duwemînda di rêveçûna lîtêratûra kurdîda rîya rēalîstîyê peyda dibe, şayîr di şêr û helbestên xweda derheqa tevgera (lipata) şerê azadkirina miletêda derheqa şerê çînanda dinivîsin, şayîr li şûna hûnandin û tindirust kirina bi edetê eruzî dest pê dikir efirandinên bi sîlabî (bangebendî) dinivîsin. Ew dinivîse, kî vî rengî (bi curê bangebendî) Pîremêrd, Selam, Goran, Cegerxûn, Dilzar, Hejar, Ibrahîm Ahmed û Maruf Berzencî şêr û helbestên xwe nivîsîne.

Li sala 1966-da li Bêrûtê kitêba Êzêdîn Mistefa Resûl derheqa "Realîzm li lîtêratûra kurdîda çap bû. Ew xebat di sêrtasîya wî doktorî bû. Ewî li Bakuyê nivîsî bû û pawan kiri bû. Di wê xebatêda nimûnên rēalîzm di folklorê û şêrên şayîrên kurdî yên klasîkîda tîne ber çavan û nîşan di de, ku wîne û şiklê jîyîna milet, çewsandina neteweyê kurd şerê çînan, şerê azadîxweza kurdan û neteweyên Rojhelat di efirandinên şayîrên kurdanda cîkî mezin girtine. Êzêdîn Mustefa xeysetê rēalîzm û bînga wî di lîtêratûra kurdîda nîşan dike û wan li rêza lîtêratûra dinyayê pêşveçûnda da tîne û dinivîse, ku raman û bîr û bawara wêda gilîyên azadî, dostî, hevkarîya miletan tîne gotinê, pirsên bextyarî serbestî û wekhevîya hemû miletan li nav neteweyên dinyayêda tîne danînê û gotinê.

Li sala 1966-da li Moskwayêda Îhsan Fuad kurteberîya bawernama dîsêrtasîya xwe derheqa "Şêrên Hacî Qadir Koy"da çapkir. Ew jî kurdê Iraqê bû û xebata wî jî gîredayîye bi lêgerîna lîtêratûra kurdîva li Iraqêda. Li berî wî derhe-

qa Qadir Koyîda li xebatêd xweda Aladîn Sicadîn, Gîvî Mukrîyan nivîsîbûn, Mehemed mela Kerîm jî xebateke başqe bi hurgilî li ser naveroka efirandinên wî, bîr û bawara wî çap kiribû, lê Îhsan Fuad diha bi firevan û kûr mijûlî lê gerîna efirandina wî bû û diha baş û rindtir qedir û qîmê tê kirna Qadir Koyî û efirandinên wî rêzber kir. Eva kirna baş û lazim bû, çimkî ewê xebatêva xelqê rûs dibe nasê efirandinên Qadir Koyîyê helbestvan û şayîrên mezin.

Li pêşîyê Îhsan Fuad basa zeftkirina Kurdistanê dike û di nivîse, ku li 1514-da Rome û Îranê Kurdistan li nav xweda parevekirin û jî wî wextî heta niha mîletê kurd li bin hukmeta herdu dewletanda maye, çend caran mîr û serokên kurdan rabûne, nikar bûne serkevin, çimkî li nav kurdanda li nav axa û begên wanda xayîn û xwefiroş gelek hebûne, di roja oxirmê giranda çûne piştî neyar û dijminên mîletê kurd.

Ew elam dike, ku Hacî Qadir Koyî şayîrê Kurdîstana jêrîn bûye, li du Nalî (1787-1855) Salim (1800-1866), Kurdî (1879-1849), derketîye meydana nivîsandina şêran û mîna wan şêrên xwe bi zaravê soranî nivîsîne, Îhsan Fuad nîşan dike, ku xezalên Nalî li bin bandûra nivîsarên Ahmedê Xanîda bûne, ku Qadir Koyî jî di bin bandûra bîr û bawara Ahmed Xanîda (sedsalîya Hevdeh) bûye, ku ew di bin bîrbawara Ebdulrezzaq û Bedîrxanda bûye, ji ber vê yekê ewî li şerên xweda li ser yekîtiyê û hevkarîya hemû kurdan nivîsîne, bang û gazîya van kirîye, ku yek bin. Xwendin li nav mîletda belav bikin. Çapxana vekin, bi kurdî biçûkan hîn bikin, mîna Evropa hîn bin, pêşa hîn bin bo xatirê azadî û serketîna kurdan, bo xatirê Kurdistanê gazî mîlet dikir, ku zimanî kurdî hez bikin û biparêzin, mafê xwe sîyasetî û parastina ayîna gelê kurd biparêzin. Ev merem û mebestên şêr û helbestên Hacî yên rewşenbîrkerên Tenzîmatê li Tirkîyêda bûn.

Di vê nivîsarêda min bi kurt û sere berra nîşan kir, ku cara pêşîn kurd bi xwe mijûlî lêgerîna tarîxa edebyeta kurdî bûne, ku eva kirina rewşenbîrkerên kurd, şayîr û edebyetnas û zanyarên kurdên Iraqê bi vî îş û karîva, mijûl bûne. Bi nivîsar û rêzber kirina nivîsara wan ez tême ser wê nêtê û gotinê, ku gotina zanyarê rûs Dîttel raste: edebiyeta kurdî dewlemend heye, ku heta niha xwendkar, zana û

rojhelatnas heta niha haj pê tune bûn. Saya sere xebatên kurdên Iraqê zana niha em bi serferaz dikarin bêjin, ku lî têratûra kurdan gelek dewlemende, ji zûva kurdan bi zimanê xwe şêr, beyt, destan û nivîsarên tarîxî, filosofî, ayînê, dîn û dîyanetê nivîsîne, ku di tarîxêda berepêşîn wana bi zaravê kurmançîya jorin û bi guranî nivîsîne (ji destpeka sedsalîya X heta sedsalîya XVII-XVIII), Paşê ji destpeka sedsalîya hîjdeha heta niha lî têratûra bi zaravê kurmançîya jêrin tê nivîsandinê.

Lêgerîna wê lî têratûre her li destpeka sedsalîya XX-da destpê bûye. Lê divêt bêjim çi heta niha di vê pirsêda ha tîye kirinê, kême, ne kûr û ne firivane, niha pêvîste lî lêgerîna wê lî têratûrêda van pirsên jêrinva mijûl bin :

- 1- Lêgerîna edebyeta kurdî bi tomerî.
- 2- Veresandin, ji hev derxistina şêr û helbestên şayîran başqe-başqe,
- 3- Lêgerîna dîwanên şayrên kurd yên soranî, kurmançî, goranî,
- 4- Lêgerîna jîyîn û kirina şayîrên kurd şên mezin li Iraqêda, Îranêda û tirkîyêda.
- 5- Wergerandina şêr û helbestên şayîrên kurd bi zimanê rûsî, evropî, erebî, farsî û tirkî,
- 6- Lêgerîna bîrûbawara wetenperwerîyê di lî têratûra kurdî da (kurmançî, soranî û goranî).
- 7- Nivîsandin û çapkirina ferhengok û ferhengên zimanên şayrên kurdî yên klasîkî.

**Şêrbêj û Helbestbêjên Kurmanc**





## ELÎ HERÎRÎ (X-XI)

Kurdnasê Rûsîstanê Aleksandir Jaba di kitêba xweda ya bi navê "Recuîl de notices et recits kurdes" da nivîsiye: "Şa şîrê kurdan yê pêşîn Elî Herîrî bûye. Ew li gundê Herîrê nehîya Şemdînan sincaqa Hekarîyêda sala 400 hîcrê (yanê sala 1009-1010) ji dayka xwe bûye û sala 470 hîcrê (yanê 1078) çûye rehmetê û hema li wêderê jî hatîye çal kirinê"

A. Jaba nivîsiye, ku "Dîwaneke Elî Herîrî ya şêran û beytan li Kurdistanêda meşûr û merufe". Lê sed çar heyf û mi xabin, ku heta niha ez haj pê nînim dîwana wî li kîdêrêye li cem kêye û li kîjan cîyî destnînîsara wî dest dikeve. Li kitêbên tarîxa edebiyeta kurdîda û li berevokêd edebiyeta kurdîda qet şêreke Elî Herîrî û qet beyteke wî çap nekirine. Kamuran Bedirxanê Rehmetî di nivîsara xweda ya bi sernavê "ferbûna xwendina kurdî" da (Parîs, sala 1968, rûyê 42) nivîsiye giva "Elî Herîrî soran bûye", lê Bedirxan qet şêreke Elî Herîrî ne bi zaravê soranî, ne jî bi kurmançîya jorin di kitêba xweda çap nekirîye, ne anîye ber çavê xwendevanên xwe.

Li kovar û rojnamên kurdîda carnar melumetîyên cî-war û wextê bûyîna wî ji daykê e'lam kirine, lê melumetîyên din derheqa Elî Herîrîda min li kitêb û nivîskarên kurdîda he ta van salên paşîn ne dîtine, her bi tenê berê pêşîn Albert Sosin li berhevoka xweda ya bi navê "Kurdische Samlungen (Peterburg, sala 1887, rûyê 278)" şerek bi sernavê Elî Herîrî çap kirîye. Ez li vira wê şêrê çap dikim. Bi fikra min ew bi rastî nivîsara Elî Herîrîye, çimkî bi kêş û qafîya xweva bi hev anîna rêz û bendên xweva mîna şêrhelbesta şayîrane, ne mîna strana zargotinêye. Bona xwendevanên me delal haj wê hebin, ez wê şêrê li jêrê bi herfên latînîya kurdî çap dikim :

*Ger hûn bibînin nalê eşq,  
Tenê li bom zarî dîkin,  
Her kes bizanêt halê eşq  
Bi hîle dijwarî dîkin.*

Bi halê eşq bexîl bûbûm  
Her dem di dem zelîl dibûm,  
Bê rêh û bê delîl dibûm  
Her kes bi xemxwarî dikin.

Hûn bar mekin xemên di zor,  
Le hesreta vardên di sor  
Çavê di reş bisk têne dor,  
E'niya bi nûr tarî dikin.

E'niya bi nûr zilf têne ser,  
Rengîn dibin şems û gemer,  
Reşmar ji perdanê neder,  
Li e're'ra yarî dikin.

Hoş û e're'ra şimşa diket,  
Teşmîn reva sebir û xîret,  
Qahu medet, ahu medet  
Çeşman çi xubarî dikin.

Çavê li rojê bîne kom,  
Came mey anî ji bom  
E'mir kir lazim vexom,  
Mestî ji min jarî dikin.

Mest û şerab qendavê,  
Êsir û bendêt vê şevê  
Ger vesfê yarê ez bibêm  
Hûn terkî huşyarî dikin.

(A.Sosin, Kurdische Samlingen 278-279).

Lî sala 1972 li Lênîngradêda berhevoka rojhilatê hejmara sisiyan bi zimanê rûsî çap bûye. Kurdnasa Sovêtîstanê M. B.Rudenko li wê berhevokêda mîqala xwe ya bi navê "Nêopûb lîkovannîyê stîxî kurdkîx poêtov" (yanê şêr û helbestên şayîrên kurd yên çapnekirî) çend şêr -xezalên Elî Herîrî çapkirine. Ewê ew şêr li nav destnivîsarên kurdîda li kitêbxana Saltîkov-Şêdrînda dîtibûn. Şêr bi herfên erebî çapkirîne, lê ez wan li vira bona xwendevanên me delal bi herfên kurdî çap dikim. Sernavê şêrê bi vî cûreyî hatîye nivîsandnê: "Elî Herîrî fermayed" (yanê Elî Herîrî dibêje) :

Xelqno, werin bibînin,  
 Çi husneke bi kemale,  
 Heyran ji dil bibînin,  
 Ji sene' zewal celale.

Sene' xwedê ku danî,  
 Sifhe ji nûrê danaye,  
 Enber li ser kêşaye,  
 Enber xet di xale.

Xalên di şibê enberî,  
 Dêm her wek qemerî,  
 Ez t'êr nabim ji munzerê,  
 Min naçit ji xeyalê.

Min qet naçî ji bîrê  
 Zilfêt şibê herîrê,  
 Wê li ser be di mûnîrê,  
 Dagirt bûn helale.

Ebrû helala eyde,  
 Dêm her wek xurşîde,  
 Eblek şibê Nahîde,  
 Cibhet meha bi kemale.

Cibhet meha tevave,  
 Rû sor gula bi xunave,  
 Reyan hatne hindave,  
 Nesrînyan da û pale.

Nesrînyan çû wext beste,  
 Min nêrî pê hoste,  
 Eqlê min çû ji deste,  
 Heyran kirim der hale.

Heyran bûm ez ji dinê,  
 Sohtim ji dest evinê,  
 Ji xwe nakim hîvya jînê,  
 Li-m kêm bûn mah û sale.

Li-m kêm bûn mah û salan,  
 Metne ji lam û dalan,  
 Ji ber zehmet û eşkelan,  
 Ez t'êr dikim miqale.

Çavê min xûn jê dibarî,  
 Ji ber eblqêt xumarî,  
 Wekî ava di carî,  
 Bê wext û bê macale.

Gerden şûşa nebatê,  
 Lêvê şerbeta heyatê,  
 Ji hisna bit welatî,  
 Bi min cahî helale.

Methê di nazenînan  
 Û sefê di xûn şîrinan,  
 Wekî dûr û yasinan  
 Ez her dikim emale.

Baxê ku sed bihar lê,  
 Bilbilê lalezar lê,  
 Ku sed gulê bi xar lê,  
 Bilbilî nala-nale.

Ji Hindê bînin taracî,  
 Ji Mermerî bînin xeracî,  
 Ji Romê bistînin bace,  
 Ji bo xemla şepale.

Dêma xalê di hûr lê,  
 Eyna zilfêstûr lê,  
 Rû nîva guhê tûr lê,  
 Mehbûbe bê misale.

Hisna te ya hebîbe,  
 Dilekî min jê xerabe,  
 E'î tu bikî nesîbe,  
 Dest bidit wesale.

Hisna te ya dilxahe,  
 Dilber lebsî sîyahe,  
 Bi min kaa'be Ella,  
 Tewaf dikim her sale.

Ji Hind bînin talanî,  
 Bikin gilî sibhanî,  
 Ji bo çavê şa - siltanî,  
 Dema bêtin ser sale.

Çend bibêje Elî sadîq  
 Ji esrar û di qayq,  
 Ji wan wesfê di layq,  
 Ji hisna ya delale. (rûyê 113-124)

Di kiteba xweda ya bi navê "Hozanêt kurd" ya li sala 1980 da li Bexdadê Çapbûye, zanyarê kurd Sadîq Behadîn Amedî çend parçên şêrên E'lî Herîrî çap kirine, ez hine parçan ji wê kitêbê li vira çap dikim bona xwendkarên me delal. Bi fikra min bi teher û rengê nivîsara xweva ew şêr yên E'lî Herîrîne :

Disan ji nu eşqa berê,  
 Pir anderûnim ateşe,  
 Zulfa muzeyen enberî,  
 D'wa d gel xala reşe.

Xala li deme dil reva,  
 Sed ruh û canim bin veda,  
 Sotim gelo çû di min nema,  
 Terkim kirin aqil û hişe.

Aqil û hişim bûne esîr,  
 Dinya ku geh geh têne bîr,  
 Dem suhbetê bedra munîr,  
 Zulfa ji werdê bîn xoşe.

Werdan ji nêv zulfa derên  
 Şula binefşê tê werin,  
 Bala û qed e'rerim,  
 Hejiyan ser marê reşe.

Disan hey têt û tiçit,  
 Ehiya emvatan dibêt,  
 Wê cihan mufam nûr jê diçit,  
 Dêm şuhbete şe'ma geşe.

Şema' şebistanê eve,  
 Werda gulistanê eve,  
 Sirî tebistanê eve,  
 Şoxa Herîrî dil geşe.

Ecêb, letif û cindiye,  
 Ezman nezan û romiye,  
 Ageh ji eşqbazan niye,  
 Mest û xumar û serxoşe.

Serxoşî cama şerbete,  
 Horî tu baxê cenetê,  
 Dêm şuhî de'ma zulmetê,  
 Serdaê çendin mehweşê.

Mehweş ku westan sef bi sef  
 Ew hate der Misrî di kef,  
 Wan got: "E'Liyo latxef  
 Mi bi mirdin qewi xoşe".

.....  
 .....

Didara te ez zîn kem,  
 Heta kengê ruh te teng kem,  
 Keser bûm carekê bîn kem,  
 Xudana têt û destmala.

Xudana têt û cebhet bê,  
 Xerac û erd û qîmet bê,  
 Didara te bi qîmet bê,  
 Li Eyd û cejn û sersala.

Evel kar û kesê min tuy,  
 Yeşin firna dersê min tuy,  
 Kesê min û besê min tuy,  
 Li zer û mal û pir nala.

Li zer û mal û pir rencim,  
 Kesadim, şahibim, gencim,  
 Li bajêra guhêr sencim,  
 Sefer diwêre heta mala.

Sefer di werê şebê tarî,  
 Ey E'li û tu pir ray,  
 Da bikeyn zikir cebarî,  
 Belki li me xoş bêt sala. (235)

.....  
 .....

Gulustana xuda riste,  
 Li etraf dilan xweste,  
 Binefş û nêrgiza meste,  
 Cinsiri lee'l û reyhan têt.

Reyhan sosin û werdin,  
 Li şêx E'lî xerîb ferdin,  
 Weristin ehmer û zerdin,  
 Her ro sed car efxan têt.

Ji efxanan ne maym têt,  
 Dua'goyê te ez bê fêr,  
 Bibete ser du esleh dêr,  
 Heta vê qasdê can têt.

Bibîne rewşê malînê,  
 Were hindava balînê,  
 Ji dest ahan û nalînê,  
 Çi reng firyard ji esman têt.

Bi firyard û heware,  
 Ji dest ahan min ew kare,  
 Melazim bendeyê jare,  
 Ji seydayê çî ferman têt.

Seyda heq nezer vêra,  
 Di iqliman gêra,  
 Fitara gewheran vêra,  
 Ji nêv kana Bedexşan têt. (237)

.....  
 .....

Ger hûn bibînin narê eşq,  
 Tenî li bom zar diken,  
 Er kes dizanêt halî eşq,  
 Bexil û dijvarî diken.

Bi halê eşq bexil dibim,  
 Her dem bi dem zelîl dibim,  
 Bê rah û bê delîl dibim,  
 Her kes bi xem xwarî diken.



Hûn yar meken xemên di zor,  
 Ji hezreta derdên di mor,  
 Çavên te reşin bisk tên li dor,  
 Eniya ji nûr tarî diken.

Eniya şerif bisk tên li ser,  
 Rengîn dibbin şems û qemer,  
 Reşmal ji hebisan têne der,  
 Li ereraye yarî diken.

Xoş e're'ra û şemsa du qed,  
 Ji min revand sebir û xîred,  
 Dad û meded, dad û meded,  
 Çeşman çi xemare diken.

Cot xumaran kirme def,  
 Tefsîr diken sune'y sedef,  
 Roj xemilîn her çar teref,  
 Bi miskê tar tarî diken.

Biskan li rûyê lê bûne kom,  
 Camê mey êna bom,  
 Hukmî dikir lazim vexum,  
 Mestî li min carî diken.

Huşim çû bûn, mabûm di hom,  
 Her dem bi demlew ten bi coş,  
 Mera qewî zewq û xuroş,  
 Bi şahî xundkarî diken.

Bi şahî wan dan û kerem,  
 Xizmet diken turk û ecem,  
 Miridê eşqê dem li dem,  
 Li neqşê ceharê diken.

Neqş û nigarê navşan,  
 Dîwan û wesfet şawşan,  
 Hey hey li cotêt padşan,  
 Ecêb xoş serdarî diken.

Serdarî şaha rewneqe,  
 Mue'ciza remzet ebleqe,  
 E'lı û mebêje ehmeqe,  
 Li bazarê inkar diken. (239-240)

## EHMED MELE BATÊ (1417-1491)

Bi melûmetîyêd A.Jaba Ehmed mele Batê li gundê Batê wela-tê Hekarîyê sala 820 hîcrê (1417) ji dayka xwe bûye û sala 900 hîcrê (1491) çûye rehmete. M.B.Rûdenko li xebata xweda dinivîse, ku bi gotina A.Jaba dîwaneke mezin ya Mele Batê ya şêrêd evîndarîyê heye, aşkeraye, ku her em haj du destanêd wîne, ew destan jî evin: "Zembîlfiroş" û "Mewlûd" (yan jî Mewlûda pexember yan jî Mewluda şerîf). Dest nivîsara "Mewlûdê" niha li nav destnivîsara A.Jabadaye, li kitêbxana Saltîkov-Şêdrînda li Lênîngradêdaye, têda heta 576 xaşxan hene, gîşk perevedîbin ser 17 sernavan.

Li sala 1978 folklorîsta kurdnasa sovêtê Jakêlin Sûrênov-na Mûsaelyan dîsêrtasîya xweda ya bi navê "Kurdsкая poëma "Zembîlfiroş" î yê folklorîyê vêrsîî (yanê "Dastana kurdî" "Zembîlfiroş" û şovêd wê folklorî" pawan kir. Ew li vê xebata xweda mijûlî lêgerîna destana Ehmed mele Batê û şovêd wê zargirtîne bûye. Ewê li xebata xweda nivîsîye, ku xên ji destnivîsara Ehmed mele Batê li nav destnivîsarêd kurdîda li kitêbxana Saltîkov-Şêdrînada destnivîsareke din jî heye, ew destnivîsar bi destê Mûrad xan Bayzêdî hatîye nivîsandîne û bi reng û rû û naveroka xweva mîna destînivîsara Ehmed mele Batêye, lê li sedsalîya XVIII-da bi nûva hatîye vejîyandin û tezekirinê. J.S.Mûsaelyan xên ji tercima kirin û şirovekirina şovêd nivîsarêd Ehmed mele Batê, Murad-xan Bayzêdî wusan jî mijûlî lêgerîna naverok û kêş û qafîya li hev anîna rêz û bendêd deh-dozde şovêd zargotin yê "Zembîlfiroş" dibe, wan raberî hev dike û pevgirêdana wan nîşan dike û tîne ber çavan. Lê sed mixabin heta niha xebata wê ne hatîye çapkirinê, eva çend sale li çapxanêdaye, her avtorêfêrata wê "Kurdsкая poëma "Zembîlfiroş" î êyê folklorîyê vêrsîî, (Moskva 1978) sebeb wê yekê ez mecburim li jêrê çend perçan jî destînivîsara xwe ya şova folklorî li sala 1935 li şeherê Tîblîsê ji zarê Zîna Qeroyê Fero ji qebîla şerqîya gundê Korbilaxê nebîya Abaranê hatîye nivîsandîne, eva şaxa mîna şexê li berhevoka A.Sosînda hatîye çapkirinêye.

## ÇEND PARÇE JI ŞOVÊD "ZEMBILFIROŞ"

JI BEREVOKA A.SOSIN

*Ey dil werin dîsan bicoş,  
Carek ji caran mey binûş,  
Bikin qiseta Zembilfiroş,  
Da seh bikin hikayetê.*

*Zelbîlfiroş lawkê rewal bû,  
Bi kilfet û ehl û eyal bû,  
Husnekî Usif li bal bû,  
Heq rizaqê qismetê.*

*Qewîn ew lawê feqîr bû,  
Dayme xwedê debîr bû,  
Pêşê xweda jêr bû,  
Ew bi dest hebû sene'ete.*

*Şixulê wî selik û tebeq bû,  
Qîmeta selkan wereq bû,  
Dayma ew rast heq bû,  
Pê debirî kilfetê.*

*Ew bi dest zembîl bi dest,  
Dibirê bazarê bi qesd,  
Xwarin nan dihat bi dest,  
Razî dibû qismetê.*

*Her dema selkan ku tîne,  
Xatûnek jorda dibîne,  
Bi dil û can dihebîne,  
Dil kete pêla muhbetê.*

*Muhbetê keç muhtela kir,  
Sur li carîya aşkera kir,  
Lawukî qelbim cuda kir,  
Min ji eşqa xew ne tê.*

*Law rast bû bi xwedêra,  
Pir ji wê genca dikêra,  
Go min ji te navê tu zêra,  
Tu min xilaskî ji zehmetê.*

Xatûn dibê ev xeber tunîne,  
 Şerm meke, were nav nivîne,  
 Min bi te day evîne,  
 Da em bibînin heşmetê.

Taw dibê tirsim ji xebere,  
 Dev hereme, têne riyare,  
 Agirek bi wanda dibare,  
 Narî cama şerbetê".

Xatûn dibê tu lawê beyanî,  
 Lew dibem da tu bizanî,  
 Min tu ji bo dilê xwe anî,  
 Da em bikin misilhetê.

Law bi xatûnêra debetê,  
 Tu mixazîya dil devete,  
 Daym ji heq nekin vehetê,  
 Rû spiyin d axretê.

Xatûn dibêje bavêje xeyalan,  
 Were ser doşek û palan,  
 Bihn ke zulf û xalan,  
 Law dibe zilfê herîre.

Pîroz be lawê mîre,  
 Çi hede lawê feqîre,  
 Tev bide vê misilhetê,  
 Xatûn dibê lawê verêvan.

Were nav reyhan û sêvan,  
 Tu şekir bimêj bi her du lêvan,  
 Şibhe cama şerbetê,  
 Law bidê tu qenca temamî.

Her wekî şekir di camê,  
 Bi ser û p'eyan tu li min heramî,  
 Tirsim ji roja axretê.

#### JI DESTNIVÎSARA MIN FOLKLOR

Zembilfiroş selikan dibe-tîne,  
 Mal bi mal digerîne,  
 Bejn û bala vî nûrîne,  
 Jin û bûkan ji îmanê der tîne,

Rojek hat, roja bi xûr,  
Zembilfiroş kire tivdir,  
Selik hildan, selikê di hejîr,  
Birin, gerîya li nav bajêr.

K'ûçe-k'ûçe dizvirî,  
Ber xanîkîra bihîrî,  
Jina mir lê nihêrî,  
Huba wê serda firî.

Ewê gazî carîya kir,  
Sur li e'niye aşkera kir,  
Got: "Hûn caringê mine delal  
Zû-zû bikin, herin ji mal,  
Lawek li jêre, herne li bal,  
Bêjnê mir te dixweze dîndar"

Ew caringê k'eleşin,  
Zû-zû ber jêr dimeşin,  
Şîrin-şîrin dibêjin :  
"Zembilfiroş, lewkê delal,  
Te sene'eta selkê di al,  
Hinek husnê Usib li bal,

.....  
-Hûn caringê husn û cemal,  
Min bihistîye mirî ne li mal,  
Selika bi k'êra bikim bazar ?"

Zembilfiroş çû bi derda,  
Gul xatûn rabû li berda,  
Şekir barî ji dev û lêva,  
Zembilfiroş got: "Way xatûna, gerden zêr"  
Carîya ez anîme vê derê,  
Selika bifiroşim naz û nederê.

Gul xatûnê got: "Tu ser sera herdu çava,  
Bazar bazara min û teva,  
Motaca teme bi dil û çava.

-Xatûna delal, zende bazin,  
Tu li min meke gazin,  
Jin ne layqe bike bazar,  
Xeber rastin têne ser zar,  
Selika bi kêra bikim bazar ?

-Ya bi xêr te kir, lawkê nezan,  
Ez rast bêjim, tu bizan,  
Te xweş kir, tu hatî vir,  
Tu hem şayî, hem şevbihêr,  
Eve ji tera bazar û xêr.

-Wey xatûna gerden zer tê,  
Em xeberdin ji cimaetê,  
Ew xeber ji estê minra bê qeyde tê.

-Zembilfiroş lawkê feqîr,  
Tevî bide zilf û herîr,  
Rabe, rûnê li doşeka mîr,  
Gotina min ji tera toq û zincîr.

-Xatûnê, li min meke van henekan,  
Ew pê kenînê qîz û bûkan,  
Min berde, herme sûkan,  
Bifiroşim van selikan,  
Pê bikirin nanê zarokan.

-Lawko bese biki van gilîyan,  
Ezê bidme te memkê xumriyan,  
Li te wer kim çeka cindîyan,  
Te derxim ji tar û tengîyan,  
Guh mede sofi û sunîyan.

Gul xatûnê vekir bişkokê di pêsrê,  
Memkan sipî kir ne ji minra,  
Ew çavkanî bûn bona mîran,  
Ew ne risqê me feqîran.

.....  
Zembilfiroş çûn reng û rûva,  
Lê şkestin ejmû û gave,  
Tevizê da dil û hingave,  
Got: "Li eslê minda eva nave".

-Lawkê nezan, tu çima şermîni ?  
Silav bike van memkêd zêrinî,  
Tuê ji wan xêrê ji xwera bibînî,  
Te ez bi dil canva birim,  
Te nebînim, ez dimirim,

*Rojê şayî diçin, derbas dibin,  
Gul digihîjin, diçilmisin,  
Tu kêf bike, kêfa mezin.*

*Bira gunê te ji min bixwezin.*

*- Lawko, were ser şekir û sêvan,  
Wan bimije bi dev û lêvan,  
Sîng û berê min ji tera meydan,  
Li ser swar be, bajo heyran.*

*-Wey xatûna aqil temam,  
Tu şerbet bî av li cam,  
Bedena te li min heram.*

## FEQÊ TEYRAN

Nav û dengê Feqê Teyran şayir û dengbêjê kurd mezin zûva li nav xelqê kurdda e'yan û aşkeraye. Gelek şêr, beyt, xwaşxan û stranên wî li nav cîmaetêda belav bûne, hatine gotinê, stranê û nivîsandinê. Beyt, şêr, xwaşxan û stranên wî nek bi tenê derheqa hezkinê û evînêda hatine gotinê û nivîsandinê, lê ew wusan jî derheqa siruşt û fîlosîfîyêda hatine nivîsandinê û lûlandinê. Şêr û beyt û lûlanên wusan li nav xelqê kurd belav bûne, ku bi pîranîya xweva bi zargotina cîmaetêra hatine girêdanê, li nav wanda gelek caran xwaşxan, malîk û bendên şêran, beytan ji folklorê ketine nav nivîsara wî, û wusan jî gelek şêr û beytên wî ketine nav zargotina cîmaeta kurdan û têne hesabkirinê hu nurê zargotina cîmaetê. Bi nihêrîn û nezera xelqê kurd Feqê Teyran şayir û dengbêjê batinîye, ewî zimanê teyr û terewulan dizanbû, dengê siruşt zêndî û nezêndîta xeber di da, sebeb wê yekê xelqê kurd navê "Feqê Teyran" li wî kirine. Navê wî bi rastî "Mehemed Feqî bûye", yan jî Mehemed Feqê Teyran bûye, ewî bi xwe li ser nivîsarên xwe navê xwe kurt dinivîsî: Mîn-Mihê". Alêksandir Jaba dinivîse "Şayrê din Mîm Mihêye", Mehemed Feqî Teyran, ew jî Muqsê welatê Hekarîyê li sala 702 hîcrê (1375-76) hatîye dinya-

yê, beytên "Şêxê Senan", "Hespê reş" û "Ber Sîs" nivîsarên wîne". Ebdulreqîb Yûsûb li nivîsara xweda "Destnûsa Ber Sîs li berhevîya Feqê Teyranda" dinivîse: "Feqê Teyran yeke ji şayrên kurdan, yê ku binaxa edebîyeta kurdî danîye. Teyran şayrekî paybilind bûye, gelek berhevî li dû xwe hiştîye, berhevên nivîsarên wî gelek sade û sazrevanin û nêzîkî şopa qisekirina camêrîya xelqêne. Em dikarin bêjin, ku berhevîya nivîsarên Feqê Teyran parevedibin ser dû cûran: a-) Şêr, helbest û qesîdên belav - belav, b-) çend çîrok û dastanên aynê û netewetî. Feqê Teyran yek ji wan kesan bûye, ku çîrok bi kurdî nivîsîye. Şêr û helbestên Feqê Teyran gelek li nav xelqê belav bûne û çend pertok û kitêbên wî, yên ku em navê wan dizanin, eve jêrînin :

1. "Şêxê Senan" yan jî "Şêxê Senanyan" li sala 1030-da nivîsîye. Eva çîroka 720 rêzên şêrîne, bi tevî wê li destnîvîsarêda sê heb destnivîsar hene: a) Hespê reş, b) Sîseban c) Ber sîsê Abid, û d) Dimdim.

Hinek dibêjin , ku çîroka "Ferx û Sitî" jî ya Feqê Teyrane".

Bi fikira min ji wan beytan, yeku Ebdulreqîb Yûsûb çîrokan lê kirîye, her beyta "Dimdimê" ne nivîsara Feqê Teyrane, beyta "Dimdim" li sedsalîya XVI û destpêka XVII -da peyda bûye, têda derheqa xanê kurdan, xanê çengzerînda tê gilî kirinê, dibe, ku beyta "Dimdim" dengbêj yan şayrekî kurdî din li hev anîye, ji ber xwe derxistîye û ew li axa Behdînan yan jî li axa Cizîra Botan belav bûye û bi ser navê Feqê Teyran hatîye nivîsandinê.

Ebdulreqîb Yûsûb li nivîsara xweda, ya li jorê min navê wê got, dinivîse: "Destnivîsara ku "Ber Sîs Abid" têda hatîye nivîsandinê, ji 28 belgane, her belgîda 23 rêzên şêrîne, her tenê li du-sê belganda du-sê malikin, destnivîsar bi hubra reş li sala 1969 li gundê Barmîyê li rojava Cizîra Bohtan bi destî kurê Hacî Reşîd Kefşanî hatîye nivîsandinê". Li folklorê me kurdîda navên beytên "Şêrê Sîsebanê", "Hespê reş", "Ferx û Sitî" têne gotin û gilî kirinê mîna beytên zargotinê. Mesele, navê wan li berhevoka folklorê kurdîda ya Albêrt Sosin li sala 1880 li Petêrbûrgêda çap bûye, hatîye nivîsandinê û gilîkirinê. Wusan jî



navên gelek şêr û helbestên Feqê Teyran li folklorê zar-gotinêda têne gotinê, mesele "Feqê Teyran û av", "Feqê Teyran û roj", "Dilberê" û yên din. Li van salêd paşin çend şayir û nivîskarên kurd helbest û şêrên xwe bi navê Feqê Teyran nivîsîne, kitêbokê xwe biçûk bi navê Feqê Teyran çapkirine, mesele Etarê Şero, Du dunya, Êrêvan, sala 1953, rûyê 40-58, A.Çaçan, Gulbihar, Êrêvan, s.1957, rûyê 7-46; Egîtê Ahmed, dizîka Feqê Teyran, Êrêvan, 1970, O.Celîl, Celîlê Celîl, Zargotina kurdî, Moskva, 1978, I, rûyê 53-78.

M.B.Rûdenko li xebata xweda ya bi navê "Opîsanîyê kûrds-kîx rûkopîsêy Lênîngradskîx sobranîî, Moskva, sala 1961" (yanê "ser û ber nivîsandina destnivîsarêd kurdî yên li Lênîngradêda komkirî") dinivîse, ku A.Jaba nivîsîye li "Beyta newala Sîsebanê" nivîsara Feqê Teyrane(67), lê "Qew la "Hespê reş" hikyata Elî Herîrîye" (72). Li paşê M.B. Rûdênko dinivîse: li dema ez mijûlî lêgerîna efirandinêd Feqê Teyran dibûm, ez hatme ser wê fikirê, ku "Hekyata şe rê serhatîya Dimdimê di gel qizilbaşan" ne nivîsarên Feqê Teyranin.

Bi gilîkî edebetnasên kurd têne ser wê fikirê, ku her bi tenê beytên "Hespê reş", "Şêxê Sanan" (yan jî "Doda gurcan), "Ber Sîs" û şêr û helbestên derheqa siruşt, fîlosofîyê û evîndariyê, yên ku li nav xelqê kurda zefîn û belavin, nivîsarên Feqê Teyranin.

Naveroka beytên "Şerê Sîsebane" (yanê jî "Newala Sîsebane"), "Hespê reş" û "Dimdimê" zûva aşkera û e'yane, ew li berhevokêd folkloranda hatine çapkirin û tercime kirinê (binêre A.Sosin, Kurdishe Sammlungen SPT. 1880; Hacî Cindî Emînê Avdel, Folklorê kurmancî, Êrêvan, sala 1936, Kurds-kîyê pesnî-skazî, Moskva, 1960). Naveroka destana "Şêxê Sanan" ya nivîsara Feqê Teyran nêzîkî naveroka beyta "Doda gurcane", lê ew bi rengê bedewî, bi qeyde, form û kêş û qafîya edebetî hatîye hûnandinê û xemilandinê (binêre, Feqê Teyran, Şeyxê Sanan, Moskva, sala 1965, bi pêşgotin, tekstên nivîsandina Feqê Teyran, tekstên folklorî û terci ma wan bi rûsî, ya M.B.Rûdênko). Heta van salên paşin naveroka beyta "Ber Sîs" ne aşkera bû. Dinivîsin û digotin, ku ew destnivîsara Feqê Teyrane, lê mezmûna wê, naveroka wê me nizan bû. Ebdulreqîb Yûsûf li nivîsara xweda ya ku

li jorê min navê wê got, bi kurt naveroka beyta "Ber Sîsê" nivîsîye. Ewî nivîsîye: "Padşakî cinan bi navê Ber sîs ge lekî xwedêtirs li welatê Şamê hebûye, ew li şikevtada tevî pezkûvîya dima, şev û roj tevî wan li çolê diçêrîya, xwerina wî av û gîha bû, ew gelekî jar dibe, li e'mrê xwe da digihîje deraca Ewliyên xwedê, xwedenasî, siphîtî û qencîya wî li nav xelqêda belav dibin, xelq tèn cem wî, jêra xêr û bêrê tînin, ew du'a li wan dike. Bi xwe ne şêxê wî hebûne, ne jî rêberên wî.

Şeytan gelekî zorê didine xwe, ku Bersîs ji ser rîya rast derxî. Şeytanekî biçûk, nevê wî Wesîs bûye, dibêje bavê xwe şeytan: "Xema mekişîne, ezê Ber Sîs ji ser rîya rast derxim". Ew cil û bergên merivan li xwe dike û diçe cîkî li nêzîkî Bersîs dimîne, gelekî ecêb dimîne, ku ew merive kî gelek salih û qence. Bersîs tê cem wî û ew dibîne hevalên hev, bi tevayî nivêj û du'a dikin, basa pexemberan û merivên sipîhê û qenc dikin. Bersîs 69 salî bû ebadetî xwedê dikir. Rojekê hevalê wî (kurê şeytan) jêra dibêje: "Divêt şêx rêberê te hebe". Ew jî dibêje: "Rêberê min Xidir Eylase". Kurê şeytan dibêje: "Eger min bikî şêxê te rêberê te, ezê te têxme ser binçenga xwe, emê bifirin, herin li cîyê xwedê bilind". Li ser derîya firîn, îblîs firî hat, bû teyrekî û Bersîs li ser perê wî suwar bû, firî ser derîya Osmanê, li paş vê Bersîs bawarîya xwe li kurê şeytan anî û ew kire şêxê xwe.

Mîrek û desthiltadarek dewlemend hebû, qîza wî gelekî şox û şeng bû, gelek rind, bedew û dilrevîn bû, şeytan hatibû xewna keçikê mîna dev, lêv û çavên beraz lê bû, wek kabûs zimanekî cehneme lê bû, li cîda dibe sehê tajî û li guhê wêda dike qîrîn, li axirîyê eva li keçikê dibe ta û lerzîn û bedewîya keçikê namîne, bavkê wê çend stêrnas û remildaran kom dike, wekî bizanbe nexweşîya qîza wî çîye. Lê ew çiqas li kitêb û defteran dinêrin, dikin nakin tê derxistin, nav û nîşanê nexweşîyê lê nabînin, hinek dibêjin: "Belkî çav lê ketine", li paş vê bê hêvî dimînin. Îblîs diçe xewna dayka keçikê, dibêje: "Eger hez dikin qîza wê sax bibe, qenc bibe, bixemilînin, bibîne cem Bersîs, bira şev û rojan li cem wî bimîne". Bavkê keçikê ji wezîrê xwe pirs dike, lê wezîr pêra-pêra razî xewna wî nabe, dibêje: "Eva îşa herame". Mîr bi qîsa wezîr nake, keçikê bi ciwan

tirîn dixemilîne, dibe cem Bersîs, ku wê qenc bike. Lê Bersîs temaşa bedwîya keçikê nake, naçe cem wê, Îblîs diçe cem keçikê, digirî, perdê ji ser rûyê wê dide alîkî, dawa ji Bersîs dike, ku wê qenc bike. Çaxê çavê Bersîs li keçikê dikevin, teyrê dilê wê difire ser keçikê, li niqumî rindî û bedewîya wêda dibe, xwe nagire, îşê xerab pêra dike, lê paşê pojman dibe, dibêje îblîs: "Wî hesab dike şêxe xwe, ev guneha pêra kirîye, Ew ji dibêje: "Tobekirin hemû gunehî dibe", lê ditirsim qîza min hemle bibe". Got wê baş dibe, tu keçikê bikujî, ku destê me jê xilas be, em rastî şermezariyê nebin".

Bersîs keçik kuşt û li cikî çal kir. Şeytan dîsan hatîye xewna bavê keçikê û jêra gotîye, ku Bersîs qîza wî kuştîye û li filan cîyî çal kirtîye. Bavê keçikê diçe Bersîs digire û qîza xwe jî çalê derdixe, ferman dike Bersîs li sêdarê xin. Çaxê xerêx dibin Bersîs sêdar bikin, şeytan li ber Bersîs dişekine, Bersîs lava lê dike, ku wî azad bike Ew jî dibêje: "Eger sûcê min bibî ser xwe, ezê te rizgar bikim". Ew sûcê wî dibe ser xwe û ji dîn dîyanet der dike ve. Hingê şeytan xwe pê dide naskirinê, Bersîs jî li sêdarê dardakirî dimîne û heftê salê ebadetkirina wî badîhewa diçin.

Bi vî cûreyî serhatîya Bersîs li destnivîsara Feqê Teyran da kuta dibe".

Li kutayîya nivîsara xweda Eldulreqîb Yûsûf dinivîse, ku "serhatîya "Bersîs" berê pêşin li nav yahûdîyanda bûye, paşê ketîye nav ayîna îslamê. Navê "Bersîs" jî du xeberan çêbûye: ber û Sîs. Ber bi zimanê yahudî yanê kur, bersîs yanê kurê Sîs. Dibe ew li kitêb û pertokanda hatîye nivîsandinê û Feqê Teyran ew jî ber kitêban wergirtîye, bi şova helbestî gelek rind li hev anîye, geş kirîye û rengê dastanê yanê jî beytê nivîsandîye bi kurmancî".

Dibe bi rastî wusan jî bûye, lê bona vê gotinê pêvîste edebetnasên kurd baş mijûlî lêgerîna dastana hilbestî ya Feqê Teyran "Bersîs" û "Bersîsa" çîrokî bin, li hemû alîyanva hev bikin û qedir û qîmetê "Bersîsa" wî nîşan bikin

Li jorê min got, ku gelek şêr û helbestên bi navê Feqê Teyran li nav xelqê kurda hene, çend heb jî wan li destnivîsarên A. Jabada hene. M. B. Rûdênko li xebata xweda, ya

ku min navê wê li jorê nivîsî, her navê du helbestan dinivîse, ew dibêje: "Li destnivîsara A. Jabada helbestên "Ey av û av" û "Ji rengê Dilbera horî" helbestên Feqê Teyranin" (88).

Çend helbestên Feqê Teyran li kovar û rojnamên kurdîda û berhevokêd folklorê kurdîda hatine çapkirinê. Xwendevanên me delal derheqa wanda dizanin. Min bi xwe li nav salên 1934-35 -da çend heb ji zarê kurdên nehîya Abaranê ya Ermenîstana Sovêtê nivîsîne û ez wan li jêrê çap dikim.

## DİLBER

Êy Dilbera gerden zeri  
Way nazika dêm qemerî,  
Qamet ji mûma fenerî,  
Wêran ezim, malim xirab.

Êy Dilbera gerden letif,  
Way nazika qamet elif,  
Qamet ji reyhana xeffif,  
Wêran ezim, malim xirab.

Êy Dilbera gerden zuzac,  
Way nazika misli zuzac,  
Qamet ji reyhana qirac,  
Wêran ezim, malim xirab.

Êy Dilbera qamet misal,  
Way nazika dili hejar,  
Te ji xandinê kirim betal,  
Wêran ezim, malim xirab.

Êy Dilberê, way Dilberê,  
Feryad ji destê k' eserê,  
Avik ji ava K' ewserê,  
Wêran ezim, malim xirab.

Êy Dilbera gerden zirav,  
Dê m şûşeye, t'ijî gulav,  
Êy duxtera bejna zirav,  
Wêran ezim, malim xirab.

Çavan ku hiltîni bi meste,  
 Ew çend ya misrî bi destê,  
 Li kuştina min te bi qeste,  
 Wêran ezim, malim xirab.

Tu bi gesta min dikuji,  
 Tu bi k'ifra dil nasojî,  
 Gelek sotim, kirim rijî,  
 Wêran ezim, malim xirab.

Gelek sotim, kirim k'ibab,  
 Kirye bi min sed reng xirab,  
 Ya leytenî kunrû turab,  
 Wêran ezim, malim xirab.

Ya leytenî kunrû ve xar,  
 Wey nazîka min te ji dûr,  
 Bêhiş kirim zilfê di hûr,  
 Wêran ezim, malim xirab.

Bêhiş kirim zilfê di reş,  
 Biskê siyah, bîhnê di xweş,  
 Êy duxterê, çapik bimeş,  
 Wêran ezim, malim xirab.

Bêk'êf kirim zilfê di reş,  
 Biskê siyah, zilfêd qemer,  
 Eşq û muhbeta min li ser,  
 Wêran ezim, malim xirab.

Sotim, berşatim bê hesab,  
 Lê pirsî bo kirme k'ebab,  
 Kirye bi min sed reng ezab,  
 Wêran ezim, malim xirab.

Sibhan ji şahe bi t'enê,  
 Xalik li xala gerdenê,  
 Ez dîn kirim, berdan dinê,  
 Wêran ezim, malim xirab.

Eşqa mezac p'eyda bûye,  
 Îro li min dijvar bûye,  
 Hivî dikim heqîqiye,  
 Wêran ezim, malim xirab,

Eva helbesta Feqê Teyran "Dîlber" berê pêşin li k'itêba S.Movsêyanda ya li navê Zimanama kurmancî (kin) li sala 1935 li Êrêvanê çap bûye, min ew ji wê k'itêbê wergirtîye çimkî bi fikira min ew aslî ji destnivîsara Feqê Teyran hatîye wergirtinê. Min her li wêda rêzên benda 8 guhastîne, di kitêba S.Movsêyanda ew rêz bi vî cûreyî hati bûne çapkirine :

*Ew be qesta min bikujî,  
Ew k'afira dil nasojî,  
Gelek sotim, kirim rijî,  
Wêran ezim, malim xirab.*

Li sala 1935-da ez çûbûme nehîya Abaranê, li wêderê kûrsêd hazirkirna mamostayên mektêbê kurdan vebûbû. Min li wêderê, li gundê Camuşvana mezinda dersê zimanê kurdî û lîteratûra kurdî dida dersdarêd kurd.

Hema li wî çaxî min çend helbest ji zarê Qaçaxê Kokil, 28 salî, ji qebîla rojkan, li gundê Sengerê, nehîya Abaranê ser Ermenîstana Sovetê nivîsîn. Ji wan helbestan min ev helbest nivîsîne: "Hey av, hey av", "Feqê Teyran û quling", "Feqê Teyran û roj", "Feqê Teyran û evîna dil", "Feqê Teyran ji dilra", "Feqê Teyran û bilbil", "Feqê Teyran û dîlber". Bi fikira min bi hev anîna xweva, bi k'êş û qaffiya xweva bi li hev hatina rêz û bendê xweva ev helbestana nêzîkî eslî nivîsara Feqê Teyranin. Lema jî ez wan li vira çap dikim, ku xwendevanên me delal haj wan jî hebin.

### HEY AV

*Her av, mal xirab, bi bez,  
Qewî bî fûr dik'işî her lez,  
Şewata tu li ser, wusa jî ez,  
Herê avê, tu maşoqa dilê xweyî,  
Ne şivêta qelpê mayî,  
Metlûbekî dilê te jî hebî.*

Avê got: "Hey malxirab, li me çûn qelem zeman,  
Em dixulxulin bê qeyas û deman  
Hatin dunyayê gelek pêxember,  
Ewan ji me ne kir pirs û hewal,  
Pêxemberan aqil hebûn,  
Ew hewcê pirsan ne bûn,  
Ewan ji zor metleb hebûn.



Feqî got: Her av û her av, her av û her av,  
 Qewî têyî bi şev û roj li ser hev,  
 Tu sewt didî bê gelp û dev.  
 Ez motacim, tu hewasî,  
 Ji ulmdaran naqim qelsî,  
 Gotin ji minra serfinazî.

## FEQÊ TEYRAN Û EVÎNA DILA

Nero dilo, dilê bazî,  
 Çi ji halê min dixwezî,  
 Bese biki hewar û gazî,  
 Te ez kirme belengazî.

Îro siveke ji her sivane,  
 Ez xiyala dilda mame,  
 Nizanim, Şerqê hatme Şame.

Nero dilo tu bi tifiq,  
 Tu rêwiyî heta mifriq,  
 Hero dilo, çira wusa dik'ewgiri ?

Bese, biki şin û girî,  
 Hesab bite -qet ne li virî.  
 Çira ji evna zor digirî ?  
 Birîna dilê min sax û silî,  
 Ji kezevê da dixilî,  
 Her dil bike şin û girî.

Dilê min însanê bê ziman,  
 Li min dike hewar û ferman,  
 Gelo ji bo çi ez li vir na mam ?  
 Sed û pênc salê min bûn tamam.

Vê seyadê li min da bû,  
 Li min behra mezin rabû,  
 Hero dilo ji xewê rabe,  
 Xema dil wê belav be,

Ji Belqizayê nayê cabe,  
 Koffya hilkev xemilî serda,  
 Keçik hat, rabûm berda,  
 Gelo kê ji dilê min xeber da,

Şerbeta lewz û k'ilaman  
 Da dest xas û aman,  
 Dilê min însanê bê ziman,  
 Li min dike hewar û ferman.

Bû payîz li van deran,  
 Xezan zer bûn serê daran,  
 Sefa nabe li wan deran.

Dilo çima tu ha xwarî,  
 Tu ji minra bê îtbarî,  
 Gelo heye însanê ne mirî ?

### FEQÊ TEYRAN Û DİLBER

Way Dîlbera dêm bi şemal  
 Bo te digerim war bi war,  
 Her bo te bûm xirab mal.

Tu Dîlbera esil zade,  
 Te ji min biriye çax û wede,  
 Qinyat dilda bûye bê sewde.

Tu dîlbera mine E'nela,  
 Îro qewî ji min bûyî cuda,  
 Ez mame bêhiş û bê sewda.

Tu dîlbera derê bê qeyayê,  
 Bi husul cemal tifiqî rû dinyayê.

Qewî iro min ced kirîye,  
 Dirhem li xelqê zef kirîye,  
 Sê sed şest beyt hazir kirîye,  
 Li nav xelqê belav kirîye,  
 Havekî rind li xwe kirîye.

### FEQÊ TEYRAN Û QULING

Hey qulîngo xwe newestîne,  
 P'er û baskan her hilîne,  
 Here, ji tebîyetê ji minra giliya bine,  
 Îro li ser rîyan ez rêwîme,  
 Tu li hewa xweş cibar be,  
 Ser gaz û gêdûka bilind xwar be,  
 Hema ji derdê dilê min hişyar be.



Hey mal xirab, tu gudarî ke,  
 P'er û baskan li ser min sî ke,  
 Min jî di gel xwe rêwî ke.  
 Çend giliyan li min safî ke.

Malxirab bike li min qirîn,  
 Dil û cegera min tev biwarîn,  
 Ezim iro bê sewda serîn.

Gelek refêd mîna te li min dabihirîn,  
 Hey qulingo tu difirî li dinyayê,  
 Here cihabê bide E'ynelayê,  
 Bêje Feqê Teyran niha nayê.

### FEQÊ TEYRAN Û ROJ

Roj hilat û ava bû,  
 Erş û ezman çîkî rawesta bû,  
 Dunya bi tebiyetê şên û ava bû.

Hey roja sor bi rengê xweva,  
 Bê te hêşîn nabî gul û gîha,  
 Te nîn be rêwî get rê nabet,  
 Tu rojeke amin û taqet,  
 Bê te najîn însan û muxulqet,  
 Bi te dibin hergav firêqet.

Tu bilindî, hergav perwazê,  
 Erd jî te hergav dizê,  
 Tu mîna pêlêt agir li ezman,  
 Germê didî deşt û zozan,  
 Tu germ dikî ser û bine,  
 Teva û re'wur bi te dibin xinc.

Pêvîste li vira çend xeberan derheqa dastana Feqê Teyran "Şêxê Sena'anda"bêjim.

Dastana Feqê Teyran "Şêxê Sena'n" berê pêşin li welatê Sovetîstanêda hatîye çapkirinê. Li sala 1965-da M.B.Rûden ko têksta nivîsara Feqê Teyran "Şêxê Sanan" bi tercimâ rûsî û pêşgotina xweva bi lênihêrîn û serdarîya min çap kir.

Ji ber ku heta niha dastana "Şêxê Sena'an" ne hatîye çap-

kirinê bi herfên latîni, min li vira biryar kir, ku her bi tenê çend parçên wê çap bikim bona xwendevanên me delal, ku ew haj bi teher û qeydê nivîsara wê bin. Min li jorê got, ku naveroka dastana "Şêxê Sena'n" mîna naveroka beyta "Doda Gurca"ne, ya ku li berhevoka "Folklorê Kurmancî"-da çap bûye. Yê dixweze vê yekê bizanbe, dikare wan beramberî hev bike.

### ŞÊXÊ SANA'N

*Sena'nîyan şêxêk hebû,  
Ew aşiqê bi xwe xwe bû,  
Qet mêle di dinyayê ne bû,  
Dûr bû ji vê mişulxetê.*

*Dûr bû ji ev dinya fanî,  
P'ir digirî, kêr dikenî,  
Kul bû ji ber sicde anî,  
Di kar û zewada axiretê.*

*Wî her zewade kar dikir,  
Zikrekî bê hejmar dikir,  
Ji dinyayê iftîxar dikir,  
Dûr bû ji her çi şibhetê.*

*Dûr bû ji efalê bi şek,  
Ji emir û bekir xûşk,  
Ma kes nakit li nik,  
Nakit qebûl vê xeybetê.*

*Nakit qebûl van xeberan,  
Medhê civan û dilberan,  
Ma kes xeber nakit pêra,  
Behs û qisê mihnetê.*

*Dûr bû ji ber minahîyan,  
Ne dihate eyd û şahîyan,  
Ji şerma selwat û çêyan,  
Şîrîn dihate taetê.*

*Taet dikir daym medam,  
Ge ji qewd, ge ji qîyam,  
Heftê û heft salê tamam,  
Xalî ne bû ji xizmetê.*

Her xizmeta bi xwe dikir,  
Zikirê mezin ji pê dikir,  
Bi çêhîyan xelq çê dikir,  
Danî rêya hedayetê.

Her çê li şêx guhdar dibû,  
Dinya ji çavan ser dibû,  
Axret bi wîra yar dibû,  
Ji wez û pend û şîretê.

Şîret û penda hekîman,  
Xeberê pîrê ezîman,  
Dilberî ehlê helîman,  
Kes ne dîkit qîmetê.

.....

Emrê wî bi hed cema bû,  
Yek mûyek reş tê ne bû,  
Horîk dî û tima bû,  
Rohniya fendê ketê.

Rohniya fendê ketê  
Horiya bekira gihîştê,  
Di li ser banê kenîştê,  
Di ku keç ban dîketê.

Bi tenê keç vexwendî,  
Perdê ji ber xwe hiltîni,  
Şêx di xûnêda dibîni,  
Cam û tasek mey didinê.

Xemir û şerab pîr dike,  
Şêx di xûnêda fir dike,  
Nezer li ya dêm dur dike,  
Dîn bû di nîva xelvetê.

Di nîva xelvetê ew dîn dibû,  
Tijî demax xûn dibû,  
Şihba sipî rengin dibû,  
Ew hal û reng get jê netê.

Nayêt li şêx ev hal û reng,  
Eybe li wî ew nav û deng,  
Pîr coş dibû ji dest zilfêd şeng,  
Îtber bi dinyayê xetê.

Ji zilfêd reş dîn bûn gelek,  
 Kezema kevan reş helek,  
 Firyadê şêx çûne felek,  
 Ah û fixan jê ne tê.

Ah û fixan der bûn hezar,  
 Hingê hebû derwêş û yar,  
 Hemîyan li şêx kir pirsyar,  
 Bajar û ehlê hêşetê.

.....  
 .....  
 Şêx gote wan qîr qîr mekin,  
 Zikirê xwe fro pir mekin,  
 Kêfê li min bê ser mekin.  
 Xweş nîne sewta ji we tê.

.....  
 .....  
 Şêx li xwe nekit stran,  
 Aşkera xwe gote yaran,  
 Ah ji destê dohta kafiran,  
 Birme dîne şerketê.

Bê mezheb û bê dîn kirin,  
 Bê xwendin û yasîn kirim,  
 Ji yar û biran şermin kirim,  
 Wardek xêla min ne tê,  
 Lê neşem werdan bixunim,  
 Bijengê nazik dibînim,  
 Dîn dibim wir dimînim,  
 Dil ji min bir qametê.

Qameta sekran û mestan,  
 Horiya lolo di destan,  
 Birme dêra xaç perestan  
 Xelviya xem xanetê.

Hem nû kirim, hem bad kirim,  
 Ku wê ez îsaykirim  
 Ji vê terîqetê der kirim,  
 Kafir kirim bê mirwetê.

.....

Husna keçê bû mezhere,  
 Ew horîya dêm qemere,  
 Şêr dî bû, cihan çû ber,  
 Şerm û edeb qet jê ne tê.

Şerm û edet çû wê demê,  
 Nalî ji tira şermê tê,  
 Bûye kenîni alemetê,  
 Avît kirasê rûmetê.

Li nav komên destnivîsarêd kurdîda yêd kitêbxana Saltîkov  
 Şêdrînda destnivîsarek heye, bi herfên erebîye, jêra di-  
 bêjin "Heza" (yanê eva) beytê Feqê Teyran bi avêra xeber  
 daye. Eva têksta ji destnivîsara herfên erebî J.S.Musael-  
 yan hatiye wergerandine ser herfên latînîya kurdî.

### HEZA

*Beyta min pir xweşe, guh bidin, xudan kemal*

*Ey av û av, hey av û av,  
 Ma tu bi eşq û muhbetî,  
 Mewcê pêlan davê pêlan,  
 Bê sekunî û bê rehetî.*

*Bê rehetî û bê sekinetî,  
 Yane eşqa ya xwe xwenetî,  
 Yan şihbeta qelbê minî,  
 Ji eşqa na tebitî,*

*Ji eşqa tu têyî hey,  
 Hetî bi k'u kengê hey bêy,  
 Ji minra bibê, heyrana te bim,  
 Da ez bizanim qise'tê.*

*Da ez bizanim vê sirê,  
 Ji hindikî heta pirê,  
 Ji me'niya vê gur-gurê,  
 Ji k'êra dikî vê tae'tê.*

*Ji k'êra dikî zikrê bi hal,  
 Qet K'işkişê nakî betal,  
 Teşbiye min rehet û e'mal,  
 Qet bi şev û rojan xew ne tî.*

Lo şev û rojan bê xewî,  
 Ji mihnetê li yek ditewî,  
 Şev tariyan qet nehewî,  
 Ji emrî bi lez ketî.

Ji emrekî tu têtî bi lez,  
 Sewda serê teşbiye ez.

Tu weha diherî vê xizmetê,  
 Xizmet dikî bê p'ê û dest,  
 Çendî dikî çûna guhest,  
 Xudê ne go gavek qewest.

Dayîm diçî, dengê te têtî,  
 Dengê te têtî bi roj û şev,  
 Tae't dikî bê qelb û dev,  
 P'êl ra dibin ji mewcê k'ef,  
 Seyrane ji rengê qudretê.

Geh-geh sipî teşbiye şîr,  
 Mislî te qet naçin çu şîr,  
 Avê ha diherî yar têtî te bîr,  
 Mêla hebîbê bi çûna te têtî.

Lazîm te mehbûbek heye,  
 Yan mêl û metlûbek heye,  
 Yan dost û meqsûdek heye,  
 Yan sire' û mermozek heye,  
 Lo bê libas û kesotî,  
 Lo bê libas û tazîyî,  
 Di sêr û reqs û gazîyî,  
 Ji k'êra dikî esqê bazîyî,  
 Remzan û xweş eşaret.

Van teşbihan ji k'êra dikî ?  
 Remz û sewadan vêkra dikî,  
 Hemîyan ji bal xwe ra dikî,  
 Digerî ji mehela xurbetê.

Digerî devê pire dinê,  
 Qet nanivî, nasekinî,  
 Reh şibhete qelbê minî,  
 Ji mihneta new zehmetê.

Bê fem û qîl û qala bi sirî,  
 Ji minra bi lefzê hal bibêj,  
 Her mîmo ha û dal bibêj,  
 Minnet û beyana k'axetê.

Vê k'axetê esbat bike,  
 Qeyd û sir extyar bike,  
 Qenc vê sirê binyad bike,  
 Da em bizanin rebê benî.

Dinya û eslê ser temê,  
 Avê birî vê a'lemê,  
 Tu hadisî yan qudsî,  
 Yan tu nizanî hikmetê.

Ger çi ne meşruh av sûxenî,  
 Rojekê ji binyada mezin,  
 Bihena qedem jî hate min,  
 Yanê ji binyada delal.

Avingê dibêje ava zelal,  
 Borî, li min ku çend sal,  
 Qet kes ne kir ev reng sewal,  
 Heta niha vê sehetê.

Hetî niha ne vê demê,  
 Cayek ne bû ji vê a'lemê,  
 E'bdêk jî pişta ademî,  
 Bifikir da hewalê şetî.

Gava vizîna şet zû diçê,  
 Hingê xudê danî cinîn,  
 Adem ne kir pîrsek ji min,  
 Ji enbîya û ometê,  
 Feqî dibêt ava şetê.

P'êxemberan aqil hebû  
 Qet hewce pîrsê ne bû,  
 Wan dest giha bû mîhbetê,  
 Ji sihbeta sir ve ketê,  
 P'êxemberan zanî şixal,  
 E'ybe li bal ehlê aqil,  
 Tiftîş bikin me'rifetê.

Me'rifetê tev bikin,  
Pirsê ji bona pêş bikin,  
Qenc vê qisê tiftîş bikin,  
Ji a'rifan kirahetê.

Xelqê xudê aqil kirî,  
Hem a'rif û kemal kirî,  
Nûrek di dilda hilkirî,  
Eslê qisa wî pê ketê.

Ey misilman elm û xet,  
Mecnûnekî heywan sifet,  
Tiftîşa pirsan ew diket,  
Lo maku lêpe li omete.

Pirsa Feqî bo çî ne bû,  
Lara di firqetê hebû,  
Erşe xudê li ser avê ve bû,  
Avê gelo di bîra te tê.

Avê cewab daye sûxanê,  
Ba ziman hal wî gotê min,  
Min remz û sir ji şahê mezin,  
Sibhan ji wî siltenetê.

Sibhan ji me'budê li ber,  
K'ê dî ji xudê kit xeber,  
Em carekê îname der,  
Genc bûn di kinêza qudretê,  
Genc bûn kinêza eqdemê,  
Genc bûn di kenêza eqdemê,  
Ba xwe ji eşqa ademê,  
Îname karê a'lemê,  
Zahir kirin vê sûretê,  
Zahir kirin em çar bakire,  
Av û hewa ax agirê,  
Hewan hemî jê çêkire,  
Dar û nebat û dê qîmetê,  
Dar û nebat û le'al dûre,  
Heywan û esnaf di pire,  
Teyr û tewir behrî û ber,  
Terkîb kirin ji netefetê,  
Teşbiye me na qericîn,  
Însan ji tîne xaricîn,



Lo çîn ji narê mar çîn,  
 Rojek ji min yek tebiyetê,  
 Em çar tebe'tan vêkra xelidîn,  
 Hin ateşîn, hin bardîn,  
 Ji behra hewa pê walidîn,  
 Melbus kirin bi vê û cihetê,  
 Bi çar cihan em la bin,  
 Qedîm niye, em xadisin,  
 Loma ji tîna babisin,  
 Hindî dixwazin refe'tê,  
 Hindî mêla efraz dikin,  
 Hindî dişên gazî dikin,  
 Em carek bînin rewyetê,  
 Carek bînin em car xehetê,  
 Bê misilhet nageretê,  
 Ji xuşyetî naleretê,  
 Cuda kirin ji wesletê.

Ji wesletê cuda kirin,  
 Hetî qeyam sewda kirin,  
 Ser kişte bûn di hezretê,  
 Raste gewî ev mêla,  
 Eslê qisê zanî mela,  
 Hêna ku bû qal û bela,  
 Ma bûn nebûn di hizmetê,  
 Di hizreta me hûn ne bûn,  
 Le latîfî pê deste bûn  
 Di xizmeta ba xewê xwe bûn,  
 Hetan roja xîretê.

Ey hûn werin, lêzim werin,  
 Cînar û xelqê hêşetê,  
 Hûn ra yekê li min çar bikin,  
 Îro gewî girîna min tê,  
 Îro gewîn me tîn girîn,  
 Sosin dergan xeyrîn,  
 Sed heyf li lêvê şekirîn,  
 Îro venaxun şerbetê.

Lêvêd le'l û şekir,  
Kêm bûn ji wan dur û xeber,  
Sed ax û kovan û keser,  
Heyf e'yn lam çûn ji hicretê,  
Heyf e'yn û lam ji yek ne bûn cuda,  
Hezin û girîn dîsan te da,  
Em razîn ji e'mrê xuda,  
Her çê ji dergê te tê,  
Her çi dike, ew mîr dike .  
Daxan di qelban bîr dike,  
Xêr û şeran teqdîr dike,  
Sotim bi narê firqetê.

## MELEYÊ CIZÎRÎ

Li cara pêşin me'lûmetî derheqa Meleyê Cizîrî di k'itêba Alêksandir Jabada "Recueil de notices et recits kurdes" (11-12) li dereca derheqa nivîsk'ar û şayîrêd kurdanda ha tîye nivîsandinê. Alêksandir Jaba nivîsiye: "Şayîrê duyî Melayê Cizîrîye, eslê wî ji Cizîrêye, Cizîra Botan, navê wî Şêx Ehmede, di tarîxa pêncsed û çilîda (1145-6) di nîva Cizîrêda p'eyda bûye. Ew Şêx Ehmed jî li xoha mîr aşiq bûye, xezaletne zehf gotine û dîwançeyek tertîb kirîye "Dîwana Meleyê Cizîrî dibêjin".

Di tarîxa pêncsed û pêncî şeş merhum bûye (1160-1161). Bi van me'lumêtîyan aşkera dibe, ku giva kê mîr û zêde Meleyê Cizîrî şanzde sal jîye. Helbet ne wusane. Sebeb vê yekê zanyar û edebyetnas her yek ji wan derheq salêd bûyîn û mirina Meleyê Cizîrî fikirekê dibêje.

Edebyetnasê kurd Aladîn Sicadî li kitêba xwe "Mejûy edebê kurd" da dinivîse, ku "Meleyê Cizîrî di sala 1407-da hatî ye dinyayê, di sala 1481-da mirîye". Inglîsê kurdnas D.N. Makkênzî dinivîse, ku Meleyê Cizîrî li nav salêd 1570-1640-da jîye (binêre, D.N. Makkênzî, Mala-ê Cizîrî and Faqî Teyran, Yad-name-ye Iran-ye Minorskî, Tehran, 1969). M.B. Rûdenko di pêşgotîna xweda ya "Ahmed Xanî, Mem û Zîn" (Moskva, sala 1962) dinivîse, ku Meleyê Cizîrî li sedsalîya XII-da jîye. Di miqala xweda "Me'lumetîyêd teze derheqa şayîrê kurd yê sedsalîya navîn Meleyê Cizîrîda" Wezîrê Nadîrî dinivîse, ku Meleyê Cizîrî di sala 1101 hatîye دنیا yê, di sala 1169 mirîye.

Ev gotinêd jorin yêd zanyar û edebyetnasêd kurd derheqa salêd bûyîn û mirina Meleyê Cizîrî li hev nayên, çimkî her yek ji wan mesele û berge îsbatkirina fikira xwe tîne. Aladîn Sicadî û li dû wî D.N. Makkênzî dibêjin, ku Meleyê Cizîrî hevdemê Xafîzê Şîrazîye (qurna XIV), çimkî Meleyê Cizîrî şêreke xweda nivîsiye :

*Ger leleya mensûrê ji nazimê tu dixwezî,  
Der şêrê Mele bîn, te bi Şîrazî çî hacet.*

Wezîrê Nadîrî di miqala xweda ya li jorê min navê wê got, dinivîse, "Herdû rêzêd şêrê ne yêd Melene, ew li paşî mi-

rina mele ketne nav dîwana mele, gelek mesele û berge din hene, ku îsbat dikin, ku Meleyê Cizîrî di sedsalîya donzanda jîye. Ew mesele evin: Mele li şêrêd xweda navêd ereb, tirk û firingêd zeftkar hiltîne, li şêrêd xweda gilî dike, ku di wextê wîda çi qewimîye, çi hatîye serê kurdan ku çaxê ew bû şayîrê koşk û sera mîr, ew çil salî bû, ku mîrê Cizîra Botan Omed-dîn bûye, ku ewî li sedsalîya XII-da mîrtî li Cizîrê kirîye". Wezîrê Nadîrî dinivîse, ku "Çaxê Selçûqan li ser kurdanda girtin, Cizîr û Hekkarî zevt kirin, xelqê kurd revî, çû topraxa Musulê, ku Meleyê Cizîrî êrîşa aguzan li ser Cizîrê bi çavê xwe dîtîye, ku ewî dîye çawan tirk kurdêd Xezbanîyê li sala 1038-da qirkirin". Wezîrê Nadîrî li kutayê dibêje: "Meleyê Cizîrî derheqa wan merivanda û wan qewlmandinanda li şêrêd xweda di bêje û dinivîse, yêd li nav salêd 1160-da qewimîne, bûne û ewî bi çavê xwe ew dîtine". Bi ser hîm û binyata vê gotinê û bi ser hesabê xwe Wazîrê Nadîrî dibêje "Bi texmîna min Ahmedê Cizîrî li sala 1101 hatîye dunyayê û li sala 1169 mirîye".

Bi fikira min eva gotina nêzikî rastîyêye. Meleyê Cizîrî nivê sedsalîya XII-da jîye.

Heta van salêd paşin kesek mijûlî lêgerîna efirandina Meleyê Cizîrî ne bûye. Li welatê Sovetêda li nav salêd 1945-1947 her wezîrê Nadîrî mijûlî lêgerîna dîwana Meleyê Cizîrî dibû. Lê sed car heyf mirina wî ecel hat, sala 1946 ew mir û pêra ne gihîşt destnivîsara xwe hazir bike bona çap kirinê. Ew her pêra gihîşt miqaleke biçûk bi navê "Me'lûmetîyêd teze derheqa şayîrê kurd Meleyê Cizîrî yê qurna navîn" nivîsî. Nûra Polatova jina Wazîrê Nadîrî ew miqalê da min, ku ez wê hazirkim bona çapkirinê. Min li cî-cînan miqale ser rast kir, li ser maşînkê xist û ji koma kurdna sêd Erêvanêra şand, ku ew li berhevoka xweda çap bikin. Heta niha, sed car mixabin, çap nekirne. Min paşê reşekî çapkirina wê li ser maşînkê ji nivîskarê me Elî Ebdurehmanra şand, ku ew li gazêta Rîya Tezeda çap bike. Ewî jî heta niha çap ne kirîye. Dibe, ji wîra çetine ji rûsî wergerîne ser kurmancî. Dibe jî çap nekirîye, çimkî di miqalêda her tercîma şêrêd Meleyê Cizîrî bi rûsî bû, têkstê kurdî di miqalêda tune bûn. Niha reşekî miqala Wazîrê Nadîrî li cem min maye, ez sûdmendîyê jê wer digirim, çi ewî

derheqa Meleyê Cizîrî, derheqa şêrêd wî û bîr û bawara wî da gotîye û nivîsîye, ezê wan ji jêrê binivîsim. Wazîrê Nadîrî dinivîse: "Meleyê Cizîrî ji eşîreta hesenîyê êzdîyanê, dengbêj û şayîrê mîr Omed-dîn bûye, ew mîr kurê Eksan qere ji eşîra bohtan bûye. Xelqê ji Melera digot "Şêxê Cîzîrê", "Reys el -şuara" yanê serokê şayîran". "Li pêşîyê ew şayîrê azad bû, ewî bona lezeta xwe, k'êfa xwe straye, lûvandîye û şêrêd derheqa reng û rûyê tebiyetê, evînîyê û şerabêda nivîsîne, paşê, çaxê dilê wî k'etîye qîza Omed-dîn, ewî şêrêd hezkirina xwe û wê nivîsîne. Mîr Omed -dîn pê hesîyaye, ku dilê mele ketîye qîza wî, mîr dixweze bizanze bi rastî ew qîza wî hiz dike ew dibêje "Ez qîza xwe didime te". Mele dibêje: "Ez xulamê teme , ez naxwezim". Mîr dibêje: "Şêx Ahmed dersdarê meye". Wazîrê Nadîrî şiro dike çima Meleyê Cizîrî nexwestîye qîza mîr Omed-dîn bistîne. Ew dibêje: "Eşîra Botan çûbû ser dînê musulmana, lema Meleyê Cizîrî nexwest qîza Omed-dîn bistîne". Ew ji qîza wîra dibêje: "Tirkên te ruh û dilê min talan dîkin". Wazîrê Nadîrî dinivîse "Di wextê Meleyê Cizîrîda yek pêncanîke para kurdan dînê êzdîyan dihebandin, li wextê wîda şêx û pîrêd kurdêd musulman qedexe kiribûn, ku xelqê reat kitêbêd dîn nexûnin û mijûlî xwendin û nivîsandinê nebin"

Wazîrê Nadîrî dinivîse, ku Meleyê Cizîrî merivekî gelek xwendewer bûye, şareza û zana bûye, pisporê edebyeta ereban, farsan bûye, ewî li Bexdadê xendîbû, nivîsarên nivîs karên ereban, farsan yên dînnasîyê, fîlosofîyê, stêrnasîyê û tebiyenasîyê xwendibûn. Li wextê Meleyê Cizîrî navê sûfîyê li tevgera cîmaetêda belav kiribûn. Sofîtiyê e'tae 'teke (bandûreke) mezin kiribû li ser pêşveçûna edebîyeta kurdî. Sûfîtiya berê pêşin ne mîna sûfîtiya paşê bûye, su fîya berê fikir û bîra bawara hemû xelqê bela dîkir, lî pişt wan digirt, pêşberî çînenê derebeg û axa began şer dîkir".. Ev gotinêd Wazîrê Nadîrî derheqa Meleyê Cizîrî û nivîsarêd wîda li ser hîm û binyata xwendina destnivîsara dîwana Meleyê Cizîrî hatine nivîsandinê ya ku niha li hej mara 54 li kitêbxana dewletê ya Êrêvanêda li dereca kitêbêd kêmanîdaye. Wazîrê Nadîrî dinivîse: "Di wê destnivîsa rêda xên ji şêrêd Meleyê Cizîrî, şêrêd Mela Batê, Feqê Teý ran û şayîrê farsa Xafiz jî hene".

Ev bûn fikir û nêtêd Wazîrê Nadîrî derheqa Meleyê Cizîrî

û nivîsarêd wîda. Bona îsbatkirina wan ew li miqala xweda li cî-cîyan çend rêzêd tercimêd şêrêd Meleyê Cizîrî bi rûsî anî bûn ber çavê xwendevanan.

Sala 1978 li Bexdadê zanyarê kurd Sadiq Bahadîn Amedî têksta rexalgirî ya dîwana Meleyê Cizîrî çap kir. Ewî ew têkst li ser hîm û binaxa beramberkirin û hemberkirina he mû têkstêd dîwanê yêd berê çapkirî hazirkirîye û çap kirî ye. Lê berê têkstê dîwana Meleyê Cizîrî li Stembolê (1924 da), Erbîlê (1964-da), li Bêrlînê (1904-da), li kovara Hewarêda (hejmared 35-58 nav salêd 1941-1943-da) hatibûne çapkirinê. Sadiq Bahadîn xên ji van dîwanan çend destnivî sarêd wê dîwanê dest xistibûn :

- 1- Dîwana bi fotokopî Fon Hartman sala 1904 li Bêrlînê çapkiribû.
- 2- Dîwana li Stembolê sala 1924 çapkiribû.
- 3- Dîwana li sala 1964 li Hewlêrê Gîvî Muqrîanî çap kiri bû.
- 4- Dîwana li rûpêlê kovara Hewarêda (NN 35-58) li Şamê, sala (1941-1943) çapkiribû.
- 5- Dîwana destnivîsara Mele Tabî Bekir Elî Wanî ji Zaxo.
- 6- Dîwana destnivîsara Enver Mam Zaxoyî.
- 7- Dîwana destnivîsara Mehemed Ewnî.
- 8- Dîwana destnivîsara Mele Mehemed Botî Bizêvkî.

Sadiq Bahadîn li îş û karê xweda li ser beramber kirina van dîwanêd çapkirî û destnivîsarda gelekî xebitîye, hemû xeber û şêrêd wan hemberî hev kirine û gihandîye têksta dîwanê ya eslî.

Cudatîya xeberan û rêzêd şêran li dîwananda nîşan kirîye û li peravêjanda nivîsîye. Ewî li çapkirina xweda navê he mû berhevokêd nivîsîye û nîşan kirîye li kîjan berhevokê da û li kîjan miqalêda derheqa Meleyê Cizîrîda nivîsîne. (binêre belgêd 1-30). Li pêşgotina xweda Sadiq Badîn gilî dîke çawan ewî li kîdere çî destnivîsara dîwana Meleyê Cizîrî û dîwanêd wî çapkirî dest xistine; ew fikira xwe bîr û raya xwe derheqa xebat û miqalêd çapkirî dibêje, hemû melûmetîyêd di wanda derheqa Meleyê Cizîrîda çapkirî di pêşgotina xweda dinivîse û fikira xwe derheqa salêd bû yîn û mirina Meleyê Cizîrîda, dibêje, derheqa kakilî nivîsara wîda dinivîse. Ewî nivîsîye "Meleyê Cizîrî li nîvê

sedsaliya panzdanda jîye, li mala şêxan hatîye terbiyetkirinê, li xortaniya xweda li cem şêx û mirîdêd xwendewer hîn bûye, şayîr û dengbêjê mîrê Bohtan Omed-dîn bûye, li wextê şayrêd farsanda Xafiz Şîrazî sala 1389), Canî(1492) şêrêd xwe sofîyê û evînîyê nivîsîne, nav û dengê wî, qedirê wî li nav xelqê kurda gelek bilind bûye, ew li wextê xweda merivekî gelek zana û xwendewer bûye, nav û dengê wî ji topraxa Bohtan der belav bûbû".

Li kutayê pêvîste ez bêjim, ku Sadiq Bahadîn mijûlî lêgerîna şêrêd dîwana Meleyê Cizîrî ne bûye. Merem û mebesta wî ew bûye, ku hemû dîwanêd wî çapkîrî û hemû destnivîsarêd dîwana wî kom bike, wana li kitêbekêda beramberî hev bike û bide çapkirinê. Pêvîste bêjim, ku ewî bi serfirazî û serbestî eva îş û kara bi cî anîye û baş qedandîye.

Çapkirina dîwana Meleyê Cizîrî bi têkstêd rexnegirî ne îşekî rehet û hesa bûye, bona wê divêt meriv zana be, xwe terxan bike. Bi rastî jî gotî Sadiq Bahadîn bi vê xebata xwe zanîna xwe baş nîşan kirîye û gelek hiş û qewata xwe terxan kurîye, ku xebata xwe bi camêrî bîne serî. Bi xebata xweva Sadiq Bahadîn hemû çar û mikan bona lêgerîna dîwana Meleyê Cizîrî peyda kirine. Eva çapkirina wî li paşwextîyê wê bibe binyat û binaxa lêgerîna zanîstî ya dîwana Meleyê Cizîrî.

Berê piraniya zanyar û edebîyatnasêd kurd, Evropê dinivîsin, ku şêrêd Meleyê Cizîrî şêrêd sufîyêne, derheqa dînperestîya sufîyanda hatine nivîsandinê. Her bi tenê Wazîrê Nadîrî û Sadiq Bahadîn nivîsîne, ku dîwana Melê Cizîrî bi fikir û kakilê xweva pare ve dibe ser du koman: Şêrêd evînîyê û şêrêd sufîyê. Lê bi fikira min şêrêd Melêye Cizîrî bi piraniya xweva şêrêd evînîyêne, her nivê şêrêd wî yê sufîyêne. Li şêrêd wî sufîyêda gelek xeber û cumlêd erebî hene, ew baş nayêne fehmkirinê (binêre, Dîwana Meleyê Cizîrî, çapkirina Sadiq Bahadîn, belgê 1 heta 80), lê şêrêd evînîyê gişk bi piraniya xweva bi kurmanciya xas, zarê şîrin hatine gotinê û baş û rind têne fehmkirinê, xwe rûya wan şêran ewe, ku di wanda gelek caran rêzêd derheqâ jîyîn, ayîn, halê xelqê kurda gotîye û lûvandîye. Di gelek şêrêd wîda ew nek bi tenê derheqa derdê dilê xweda, hezkîr û evîna xweda dilûvîne, dibêje, ew wusan jî li gelek şêrêd xwe dildarîyêda durêz û sêrêz û çarêz navra di-

ke û dibêje, ne mîr, ne axa, ne jî beg guh nedane û nadne ser xelqê belengaz, ku ew çewsenkerêd rêncber, gavan şivanin. Li hinek şêrêd wîda wetenperwerî û neteweperwerîya wî têne ber çavêd xwendewaran. Bona nimûnê ez çend parçêd şêrêd Meleyê Cizîrî ji dîwana wî, ya ku Sadiq Bahadîn li Bexdadê sala 1977-da çapkirîye, tînim ber çavan.



Sef sef turk û moxol du k'eş û hindî li kemîn,  
 Bi eceb hatne cengê hebeş û rom û fireng,  
 Mîr û kurmanç li holan qederek westane,  
 Lê di nivê bi sef û tîpê ereb hatne ceng. (283)

Zorbe wê têtin ereb têk çivandin geseb,  
 Qencî bi çevan me dê ceng û cidala cemel,  
 Şûr û rîman vêkra pence biran têkra,  
 Lew me dikin jêkra qîmê dikin dil di gel. (288)

.....  
 Turim bi dil û peyrevê Mûsayîm ez,  
 Ateşperes û nûrê tecelayîm ez,  
 Barê ji weelem ku xeberdarî kirim,  
 Îro tu bizan ademê esmayîm ez.

Înşayê ulmê li dinê çunke mi zanî,  
 Zanî bi heqîqet ku çî îşame ez,  
 Herfên reqemê lewhîê wicûda me, bixûn,  
 Da qencî bibînî ku çî imlayîme ez. (216)

.....  
 Mihnet û halê esîran kê li mîran erze kit,  
 Dê bitin pîrsê li min lew pur bi rehm û şefqeye,  
 Ger bipîrsit carekê xatûn li halê sixteye,  
 Bend û zincîr dê vebîn, cerhên di gul dê xweş bikît,  
 Le kû navê dîlberê dermaneê derdê bendeye. (355-6)

.....  
 Geh dil geh can dibên terkê te tîn,  
 Nikarin yexma û talanê xalet,  
 Meşrebê tirkan furat û nîle kir,  
 Teşne leb çû terefê Osmanî xelet. (257)

.....

Rom û ecem ji her teref,  
 Ceng û suwaşe wan bi xef,  
 Hindî û zengî sef bi sef,  
 Hatne ber lîwayê zulf. (263)

.....

Sef sef me dîn hindî û zeng,  
 Cêngîz hat, Teymûrî leng,  
 Xef wan reşandin dil xedeng,  
 Teşbihê tîrên xan Şeref,  
 Tîrek ji qewsê mal zirav,  
 Bi dil wê bavêje nav,  
 Xûn tê pur teşbihî av,  
 Feryad û efxan sed esef. (267)

.....

Mûyekî ez ji te nadim bi sed Zîn û Şîrinan,  
 Çi dibit ger tu hesabkî mi bi Ferhad û Memê,  
 Te Fireng û Erebestan û Mecer têkî standin,  
 Celebê xweş vegeîn hatiye newba ecem. (232)

.....

Dil geşte, min ji dêrê naçim kenîşteê,  
 Mehrabe wê bi minra wer da biçine Laliş,  
 Mehbûbe wek stêre, govend û işqbazî,  
 Têkel biçin semayê, hişyar û mest û serxoş. (234)

.....

Pir e'mrê min çû bi suxtey,  
 Lê şikir xwezim ji bextî (361)

.....

Lazime li sultan û mîran  
 Pirskirin li halê êsîran,  
 Em kirin armancê tîran,  
 Suxteye dermandeye,  
 Hêj nizamim mîr dê birin,  
 Zanist em sî sal êsîrin,  
 Çavnêrî pursek emîrin. (366)

.....

Iro ji nû pur ateşim,  
 Dîsan ji remza dîlberê,  
 Mecrûhî qewsî pur weşim,  
 Tîr dane nîva cegerê.

Tîr dan ji qewsê ewsedê,  
 Şahzade edya şîrin qede,  
 Kuştine wek min çend sedê,  
 Wê padşahê û beglerê.  
 Xeşmê li feqîran meke zu padşahê min,  
 Purse bike carek li xeta û gunahê min,  
 Teftîşê bi mûmê bike, er em bi xetayîn,  
 Hinca nêbêtin di welatî, di cehê min,  
 Cewra te bihêtin, û cefaya te peritin,  
 Qurbana te bim, guh bide carek gilehê min,  
 Zanî ku ji ber cur û cefayan elemin dil,  
 Rehmê bi gedayê xwe ke, sultan û şahê min,  
 Sê sale ji derd û belayê te hlakim. (309-310)

.....

Çîn girtiye ser ban û serser bi kef kef,  
 Xunê wê dirêjin kul şîran cemidî kef,  
 Dunya bûye leylan ji lixavan diwerit kef,  
 Rom û ecem girtiye ew xilme sef bi sef,  
 Cohte moxolan hatne cengê hebeşê. (427)

.....

Vewestaym di ferverê,  
 Li ebdê xwe ke fermanê,  
 Di fermanê vewestaym ,  
 Di benda xidmetê daym,  
 Wekî go bê ser û paym.

Heman lê di tu çewganê,  
 Li ber çewgan û kaşoyan,  
 Ji derba turk û hindoyan,  
 Dibe zim her wekî goyan,  
 Dema ew têne meydanê.

Dema ew tên bi bazi tên,  
 Di gel qewsê şîrazî tên,  
 Çi mukarin di tazî tên,  
 Bi de'wa têne lêk danê.

Bi de'wa tên me yexma kin,  
Di a'mê sur gewxa kin.

Wê beglerê pur kuştine,  
Engûşt bi xwûnê riştine,  
Ma ehlê dil qet hiştine,  
Sohtine mislê mecmerê. (447)

.....

Ma Cizirî şibhedarî textê heft îqlîm bit,  
Hem bi hukim û seltenet Eskender û Fexfur bit,  
Mislî cem cama zerin xalî nebê te ji badayê,  
Da ji xemra şadmanî "dayma" mexmûr bêt.

Ma di baxê îş û nûşê her bi saz û erxewan,  
Kamran û kambexş û dil xweş û mesrûr bêt,  
Çendeke şîrin puser derbendê dîwana te bêt,  
Bendê şapûrê te bin ta Xosrow û Şapûr bêt. (423-4)

.....

Ney tenê Tebrîz û Kurdistan li ber hukmê elemdarê te bin,  
Sed wekî şahê Xurusanê di ferwarê te bin,  
Ger çi der îqlîmê rabe' hate textê sultanet,  
Padşahê heft îqlîman selamkerê te bin.

Paşî newşîrvan dibêm dê hakimê adil tuyî,  
Mislî Hatem dê bidanê der cihan meşhûr bî,  
Ma Cizirî şubhedarî textê heft îqlîm bî,  
Hem bi hukim û sultanet Eskender û Fexfur be. (432)

.....

Rendî bi xwe qendî şîrin û şepalî,  
Qencî û bi xencî û bi nazî û delalî,  
Mehbûb bi textî, bi rextî, bi xwe bextî,  
Umrê te mera bit sed û deh sal helalî. (525)

.....

Dilberê, serdare, xoban, ez nizam agah heye,  
Di hebs û zîdanê êsîr û girtiyê dermandeye,  
Girtiyem, mam ez di hebsê, kî gelo mehder bikit,  
Carekê navê me bînit, pur sevabek zêdeye,  
Mihnet û halê êsîran kê li miran erze kit. (335)

.....

Sîwaş û fitneyan rakîn,  
 Bi şîr ew têne talanê,  
 Dû talanê meşûr tê,  
 Ji mee'dana enî kafûr tê,  
 Di têkel zulmet û nûr tê.

Me kufre dê di îmanê,  
 Ji şerqê zulmet û şam bê,  
 Ji zulfan enberê xam bê,  
 Kenarê xal û nişanê,  
 Du zulfê enber efşanîn,  
 Du lele şekeristanin,  
 Dilê min wan xedeng danê,  
 Dilê min wan xedeng lê da,  
 Di burca zuz û şeb têda. (437-8)

.....

Burca ku hakim lê du mîr,  
 Min dît li textê keşwerî,  
 Textê di mîr û begleran,  
 Meydanê coça gwêgeran,  
 Eslan û cotê meyxuran,  
 Mey dan şeraba saxerî.

.....

Saxer bi dest serxoş û mest,  
 Wextê sehergeh dest bi dest,  
 Xeflet û begler meyperest,  
 Kuştim bi derba xencerê,  
 Kuştim bi derba xenceran.

Gezme û xedenga awuran,  
 Remz û îşaret û soran,  
 Dan dil ji nîva pencerê,  
 Dan dil ji ber husna bi nûr,  
 Berqa tecelliyê sedûr,  
 Lew sohtime wek guhê tûr,  
 Hub û evîna enverî. (450-1)

.....

Latu husnî û şahê xubanî,  
 Bi xwe hem xanî û hem xaqanî,  
 Yûsûfê sanî tu îro xanim,  
 Ku bi husna xwe nedîrî şanî,  
 Bi sur û heybet û sehmê xwe perfî,  
 Bi te şîn li Bohtan sultanî,  
 Bi teblxaney şahî, were text,  
 Ku tu îro şahî Kurdistanî,  
 Kagulê berde bi ser xal û xetan,  
 Ku musilsil bi nimûnê reyhanî (456-7)

.....  
 Tu mebê bê ser û bê samanîm,  
 Gulê baxê îremê Bohtanim,  
 Şebçiraxê şebê Kurdistanîm,  
 Çi tebîyet beşer û insanîm,  
 Lîla-el hemd çi alî şanîm,  
 Di rîya yar li rêza saanîm,  
 Lew di îqlîmê suxen xaqanîm,  
 Sibahê eyd û ez pêzanim. (509)

### DIL JI MIN BIR

Şoxê û şengê zuhre rengê,  
 Dil ji min bir, dil ji min bir,  
 Awurên heybet pilingê,  
 Dil ji min bir, dil ji min.

Wê şepalê miskî xalî,  
 Dêm dorê gerden şepalê,  
 Cehbeta biskan semalê,  
 Dil ji min bir, dil ji min.

Zulf û xalan nûn û dalan,  
 Wan ji min dil bir bi talan,  
 Goşeye qewsê helelan,  
 Dil ji min bir, dil ji min.

Dêm nedîrê bo enbîrê,  
 Xemrî û gîso herîrî,  
 Sîne kir armancê tîrê,  
 Dil ji min bir, dil ji min.

Sor şîrînî nazenînî,  
 Kuştîm û nakit yeqînî,  
 Wê bi çengela evînê,  
 Dil ji min bir, dil ji min.

Fitil û taban da xuraban,  
 Ebleq û cohtê şebaban,  
 Dame ber pence û kulaban,  
 Dil ji min bir, dil ji min.

Xoş xeramê, ez xulamê,  
 Nazikê, şîrin kelamê,  
 Tutiya eyvan meqamê,  
 Dil ji min bir, dil ji min. (324-326)

.....

### WERE BINAHIYA ÇAVAN

Were, binahiya çavan,  
 Bibînim bejn û balayê,  
 Zerîfê nazikî şengê,  
 Sifet horîyê, perî rengê,  
 Bi rojêra tu hevdengî,  
 Du reştözên siyah rengî,  
 Kîşandin, lê ne wek caran,  
 Xedengê qewsê nûbaran,  
 Ji rengê şîr û mukaran,  
 Weşand sine wek baran,  
 Ji wê zerbê pir êşanim,  
 Sibah li xêr ya xanim,  
 Were binahiya çavan,  
 Bibînim bejn û balayê,  
 Veke carek xet û xalan,  
 Li ser van mesned û palan,  
 Bixûne, lê me ebdelan,  
 Bibînin eyd û sersalan,  
 Îcazet de me destûrî,  
 Perî rengê, sifet horî,  
 Ji nîva zulmet û nûrî,  
 Binûşin mey di ferfûrî,  
 Ji dil talanê xalanîm,  
 Sibah li xêr ya xanim,  
 Were binahiya çavan,  
 Bibînim bejn û balayê. (476-478)

## SELİM SULÊMAN (XVII)

Heta van salêd paşin edebyetnasêd kurd haj pê nîn bûn, ku li sedsalîya XVI-XVII helbestvanekî kurd bi navê Selîm Sulêman hebûye, bi kurmancî şêr, beyt û destan nivîsîne. Her li paşî çapkirina xebata M.B.Rûdênko "Nivîsandina ser û berê navnîşanê destnivîsarêd kurdî" aşkera bû, ku li kitêbxana Lênîngradêda ya bi navê Saltîkov-Şêdrînda bi melu metîyêd A.Jaba li nav nivîsarêd kurdîda, yêd ewî anîbûnê Pêtêrbûrgê, destnivîsarek bi sernavê "Ûsib û Zelîxe" heye ew destnivîsar ya Selîm Sulêmane. A.Jaba nivîsîye, ku Selîm Sulêman hevdemê Şeref-xan Bitlîsî bûye (XVI-XVII), şayir û dengbêjê mîr-Şeref mîrê Xizanê bûye.

Xên ji vê em tiştêkî zêde derheqa wîda nizanin, ne e'yane kîjan salê, li kîderê û ji kîjan neslê ew ji daykê bûye. Li axirîya dastana xweda ya "Ûsib û Zelîxe" da ewî her nivîsîye, ku ew hêsîrê mîrê Xizan bûye :

*Selîm dil men Sulêmanim,  
Êsîrê mîrê Xizanîm.*

Sala 1973 M.B.Rûdênko dîsêrtasîya xwe ya bi navê "Ûsib û Zelîxa" "Kûrdskaya lîtêratûrnaya û folklorîyê vêrsîî" (ya nê "Ûsib û Zelîxa kurdî ya edebyetî û şaxêd wê zargirtî-nê". Nivîsîne, ku A.Jaba berê nivîsîbû, ku Selîm Sulêman dastana xwe ji zimanê farsî ya "Ûsib û Zelîxa" Camî wer girtîye. M.B.Rûdênko raberî vê gotinê dinivîse û îsbat dike, ku Selîm Sulêman ne ji wê wergirtîye, ne jî ji serhatîya "Ûsib û Zelîxa" Ferdewusî. Ew dinivîse: "Em her di karin bêjin dastana Selîm Sulêman nivîşkanîye, li navbeyna nivîsara Camî, Ferdewusî û gelek şaxêd kurdî yêd zargotinê hatîye tertîbkirinê, bi kovek û kêrta xweva ew jî dastanêd Camî û Ferdewusî cudatire, gelek qîsekirina cîka rêd wê ji yêd wan herdu şayrêd farsî cudatirin, ne mîna wanin. "Ûsib û Zelîxa" Selîm Sulêman her li alîyê kompozî



sîyê û sûjêtêva mîna "Ûsib û Zelîxa" Camî û Ferdewusîye , têda çend êpîzod mîna yêd şaxê dastana Ferdewsîn mesele, qisekirina derheqa wêda, ku Ûsib li ser gora dayka xwe digirî, ku ew rastî hûtê binê behrê tê, ku birê wî tên ge nim bibin, mîna yêd şaxê Ferdewusîne. Wusan jî qisekirina êpîzodê: Bazik keçekê hez dike, Zelîxê xewnê dibîne, yêd ku li dastana Camîda têne gilkinê, li Ûsib Zelîxa Selîm Sulêmanda hene. Çend êpîzod jî di Ûsib û Zelîxa Selîm Sulêmanda hene, ku mîna êpîzodêd dastana tirkîne ya Elî Şeyad Xemzene. Berepêş gotî, li Ûsib û Zelîxa Selîm Sulêman da çend êpîzod hene, ku li şaxê Ûsib û Zelîxa Ferdewusî û Camî û Şeyad Hemzeda tunene. Mesele, di dastana Selîm Sulêmanda tê gotinê, ku Yaqub digirî, kurê wî wunda bûne, ku ew ji gura pirs dike wana ew nedîtine, ku gur sond dixun goşt li welatê Yaqubda nexun.

Bi fikira min M.B.Rûdênko li berhevîya nivîsara xweda rast dinivîse, ku "Ev mesele nîşan dîkin, ku dastana Selîm Sulêman "Ûsib û Zelîxa" dastaneke kurdî serbixweye, ku ew li ser binyat û binaxa şaxêd here kevn çêbûye, li hev hatîye ku di wêda her çend êpîzodê şaxê farsî, tirkî û êpîzodêd kurdî zargotinê ketine nav wê. Eva gişk nîşan dike, ku edebyeta kurdî li peydabûna xweda bi edebyeta farsî, tirkî ra û folklorê kurdîra girêdaye". Li dû van gilîyan M.B. Rûdenko dinivîse, ku li nav destnivîsarêd kurdîda yê li kitêbxana Saltîkov-Şêdrindanin, wusan jî destnivîsareke din bi navê Ûsib û Zelîxe heye, bi gotina A.Jaba ew destnivîsar ya Xarîs Bitlîsîye (8). Lê ew ne wusane M.B.Rûdenko îsbat dike, ku ew destnivîsar jî ya Selîm Sulêman hatî ye nivîsandinê, di wêda her cî-cîna hatine berdanê û li şûna xeberêd erebî, farsî yêd kurdî nivîsîne. Bi texmîna wê ew guhastin mîna wan guhastinanin, yêd destnivîsara Ûsib û Zelîxe, ku van salêd paşin ewê li Ermenîstanê li ma la Elî Ebdurexmanê nivîskar, xebatkarê gazêta Rîya Tezê dest xistîye.

Li paşî vê M.B.Rûdênko kurt naveroka şaxê destnivîsar ya Selîm Sulêman dinivîse. Li dû wê ew derheqa şaxêd zargotinê dinivîse. Ew e'lam dike, ku ew li nav kurdêd pişt Kavkazê û kurdêd Turkmenîyê weke donzde şaxêd zargotinê kom kirine, wan jî mîna şaxê Selîm Sulêman bi tercima rûsî hazir dike bona çapkirinê.

## AHMEDÊ XANÎ

Sala ji daykbûna Ahmedê Xanî ne aşkeraye. Her bi tenê aşkeraye çî wextî, kîjan salê ewî nivîsarên xwe dastana "Mem û Zîn" û "Nubar" nivîsîne. Bi gotina Aladîn Sicadîn Ahmedê Xanî "Sertacê nivîskar û şayirên kurdane" li tarîxa lî têratûra kurdanda dinivîsin, ku Ahmedê Xanî berî gişka ala xwerûya serxwebûna kurdan, ala yekîtî û hevkarîya eşîr û qebilên kurdan bilind kir bo xatirê azadkirina kurd û Kurdistanê, bo xatirê sazkirina dewleta kurdan.

Nav û dengê Ahmedê Xanî berî pêşin li Rûsistanêda belav bû. Aşkeraya bû, ku li nav salên 1860 û 1885-da qonsulê (bay lozê) rûsan li baylozxana rûsanda li Erzerumê dixebitî. Wî wextî akademîya Rûsistanê sparte wî, ku ew destnivîsarên zimanê kurdî yê tarîxî, êtnografî, lîtêratûrî û folklorî kom bike û bi rêbîke Pêtêrbûrgê. Bi arikarîya alîm û zanyarê kurd mele Bazîdî ewî gelek destnivîsarên dastan, çîrok, hikyat, beyt, şêr, kilam û stran û serhatîyên dîrokî şandine Pêtêrbûrgê. Di nav wan destnivîsaranda melûmetîyên kurt derheqa neh şayir û nivîskarên kurdan hebûn. Ew melûmetî di gel hikyat û serhatîyên tarîxî di kitêba A. Jaba bada ya bi navê Recueil de notices et recits kurde (sala 1860 li Pêtêrbûrgêda) hatine çapkirinê.

Piştî çapkirina vê kitêbê dunya pê hesîya, ku şayir, tarîx nivîs, alîm û zanyarên kurdan jî hebûne. Bi destî A. Jaba hate zanîn, ku miletê kurd jî xwedî edebiyete.

Aleksandir Jaba çend destnivîsrên "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî jî anî bûn bajarê Pêtêrbûrgê. Di kovara "Mêlanjê Asîatîk" cildê 3-da naveroka "Mem û Zîn" a A. Xanî bi zimanê fransîzî hatîye çapkirinê. Li paşî vî îşî ulmdar û zanyarên kurd bi "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî mijûl bûn. Heta niha wan "Mem û Zîn" bi herfên erebî sê caran çap kirine. Cara pêşîn li sala 1920-da "Mem û Zîn" li Stembolê çapkirin. Lê hukmeta tirkan kitêba wê çapkirinê şewitandin. Berî vê çapkirinê li sala 1898-da parçe-parçe "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî li kovara "Kurdistan"êda hatine çapkirinê.

Li paşê 1947-da li bajarê Helebê Hemze-axa "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî bi pêşgotina xwe çap kir. Dû wê sala 1953 li bajarê Hewlêrê edebiyetnas û tarîxnasê kurd Gîvî Mukrîyanî "Mem û Zîn" bi pêşgotina xwe bi zarê soranî çapkir.

Ya rast jimara van hemîyan ne gelek bûn û niha jî ew bi dest nakevin. Yekê ji ew çapkirin bi tenê ji nimûnekê an jî ji du nimûnan hatibûn çapkirinê û heta van salên paşin "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî bi zimanê Evropayî ne hatîye tercimekirinê.

Li nav salên 1932-1945 car-cara li kovara "Hewar"êda "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî bi herfên latînî dihatine çapkirinê. Li sala 1933 li Êrêvanê konferênsîya kurdnasan biryar kirin, ku nimûnê edebyeta kurdî ya klasîkî çap bikin. Di wî biryarîda hatibû nivîsandinê, ku "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî bi herfên latînî bona kurdên Sovêtîstanê çap bikin. Lê ew qîrar, ew merem heta van salên paşin ne hatibû qedandinê. Niha kurdnasîya Sovêtîstanê bi serbilindî û serferazî dikare bêje, ku ew dastana giranbiha û cewahir bi zimanê kurdî û tercîma wê bi zimanê rûsî li rex û çap bûne. Bi çapkirina wê dastana Ahmedê Xanî heykela mezin ya medenye ta miletê kurd tê ber çavên xwendkar û xwendevanên kurdan û goveka miletên dinyayê û aşkera dibe, ku kurd ji xwedî medenîyete, ew jî mîna miletên din hevkarê efirandina kûl tûra dinyayêye. Zûva qedir û qîmetê "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî li kitêb, pertok û kovaranda hatîye gotinê û nivîsan dinê. Ulmdar û zanyarên kurd Ziya Xalîdî, Emin Zekî, Şêrko, Celadet Bedirxan û Kamûran Bedirxan, Aladîn Sicadîn, Huznî û Gîvî Mukriyanî û yên din gelek gotinên bi qîmet û ferz derheqa Ahmedê Xanî û "Mem û Zîn" a wîda nivîsîne. Wusan jî rohilatnasên Evropayê A. Jaba, P. Lêrx, I. Orbêlî, A. Soun, V. Minorskîy, R. Lêsko û T. Bua li kitêb û miqalên xweda kêm û zêde pesne Ahmedê Xanî û "Mem û Zîn" a wî dane û nivîsan dine.

Lê dîsa lazîme em bêjin ku ji gotin nivîsandina wan şikil û wineyê A. Xanîyê "Mem û Zîn" a wî baş nayên ber çavên çî ewî li "Mem û Zîn" a xweda nivîsîye. Yekê ji heta niha "Mem û Zîn" a wî qet tu caran nehatîye tercimekirinê ser zimanê Evropayê. Bona wê yekê min hazîrkirina wê û terci-makirina wê sparte şagirt û hevkarê xwe jina rûs M. B. Rûdênko. Ew gelekî ser hazîrkirina û terci-makirina wê bona çapkirinê xebitîye. Berê ewil ewê hemû têkstên destnivîsar yên li kitêbxana Leningradê ya bi navê Saltikov - Şêdrin û li înstîtûta rohilatnasîyêda hebûn, hemberî hev kirine û têkstên binyatî yê baş cuda kirine. Hemû xebat û

şaşîşê têda serrast kirine, paşê ewê ew têkst hemberî têkstê çapkirina Helebê û Hewlêrê kirine û bi wî teherî gihandîye têkste eslî. Li rex têksta bi zimanê kurdî M.B. Rûdenko tercima wê bi zimanê rûsî nivîsîye. Nivîsara M.B. Rûdenko di sala 1962-da li Moskwayê ji çapxanê derketîye.

Di pêşgotina vê kitêbêda ev pirsên jêrin hatine nivîsandî nê:

"Ne e'yane kîjan sale A.Xanî ji dayka xwe bûye, lê eşkera ye, ku di qurna XVII-da ewî poêma xwe "Mem û Zîn" û ferhengeka xwe ya erebî-kurdî nivîsîne. Aladîn Sicadîn di kitêba xweda "Dîroka edebyeta kurdîda" nivîsîye, ku navê bawê wî Eylase, ew ji qebîla xaniyaye. Qebîla xaniya sala 1562 li erdê Bazîdê cîwar bûbû. Berî wî çaxî di sala 1514 da Kurdistan hatibû du parkirinê, parek ketibû bin destê siltanê Romê (Tirkîyê), para din ketibû bin destê şahê Îranê. Di nav herdu paranda mirtîyên serbixwe, yê derebeg û milkdarên kurdan hebû, lê mîr, xan, derebeg û milkdarên kurdan bêtifaq bûn, bi hevra şer dikirin, arîkarî hev ne dikirin, ku qewatên xwe bikin yek, qebilên kurdan kom bikin, yekbin, pêşberî dijmin tev şer bikin bona xatirê serxwebûna kurd û Kurdistanê.

Ahmedê Xanî ew halê bindestî û hejarîya miletê kurd baş zanibû û li erdê Bazîdê ewî bi çavên xwe belengazîya kurdan dîtibû û bûbû xemxur û xemkeşê derdê miletê xwe. A.Xanî di "Mem û Zîna" xweda pirsê bindestîya kurdan, duberekîya wan, şerê wan di nav xweda û derd û kulên wan nivîsî û anî ber çavan, ku milet xwe bihese, qewata xwe bike yek bona azadkirina xwe. A.Xanî merivekî xwenderwer, bîrewer û zana bû. Ewî zimanê erebî, farsî û tirkî baş zanî bûn.

Kurdnasê navbang I.A.Orbêlî di pêşgotina xweda, ya ku li kitêba bi navê "Heykelên Zemanê Şayîrê (gurca) Rûstalêlî" da hatiye çapkirinê, derheqa A.Xanîda ev xeberên jêrin nivîsîne: "Wextê em dibêjin şayîr nivîsara xweda nezikî milete, bi milet û xelqra girêdayîye, hingê em bê hemdî xwe lazime navê sê şayîrên mezin yê rohilatê wek hev bikin û beranber bikin, ew hersê şayîr evin: -yek Fîrdevusê Îranîye, yek Rustavêliyê gurce, yek jî A.Xanîye kurde. Hemû mileta A.Xanî ji bîr kirine. Bi rastî gotî kesekî ji miletê derva A.Xanî nas nake, lê her bi tenê kurdan ew ji bîr nekirine û li nav Kurdistanêda nav û bangê wî aşke

raye û hemû kurd bê gotin A.Xanî hesab dikin şayirê miletê xwe, navê wî dizanin û nas dikin".

Ev gotinên Orbêli rastin. Kurdan navê Ahmedê Xanî ji bîr nekirîye û qet tu caran ew navê wî ji bîr nakin. Binyata poêma A.Xanî "Mem û Zîn" çîroka miletê kurde. Em dikarin bê şik bêjin, ku hemû kurd, biçûk û mezin çîroka "Mem û Zîn", yanê ya "Memê Alan" dizanin û hez dikin. Wexta çî-rokbêj û dengbêj "Mem û Zîn" dibêjin, distirên, her kurd bi dil û can û bi heyecan guhdarîya wan dikin. Kurd vê çî-rokê hez dikin û bi navê wê serferaz û serbilindin û ku-bar dibin, ku dastaneke wan wusa heye.

Ferdewîsî jî "Şah-nama" xwe ji çîrok û dastanên miletê î-ranî hildabû û bi şêrî nivîsîbû. Nizamî jî "Leyl û Mec-nûn" a xwe "Ferhad û Şîrin" a xwe ji nav xelqê hîn bûbû û bi şêrî nivîsîbû. Van herdu şayiran pesnê şaha dabûn, fê-rizî û qehremanîya mêra û evîniya mêr û jinan anî bûn ber çavan û pesnê dostîya helal dabûn û bedkarîya merivên xi-rab di nivîsarên xweda neqîşandibûn.

Di vê derecêda A.Xanî jî wusan reng û ruyên ferizê dasta-na xwe, şiklê qeremanên wê nitirandibûn û anî bûn ber çavan. Lê bi fikira min qedir û qîmeta "Mem û Zîn" a A.Xanî ji nivîsarên Ferdewusî, Nizamî û Rûstavêli bilindtîre, çim-kî têda A.Xanî bîr û bawara kurdewarîyê, bîr û bawara paşketin, peşvamayîna xelqê kurd nivîsîne û aşkera berna-ma şerê serxwebûn û serbestîya miletê kurd Neqîşandîye. Se-beb vê yekê hemû kurdnas bi dengêkî dibêjin û dinivîsin : "Lazime navê A.Xanî li tenişt û rex navê Ferdewusî, Niza-mî û Rûstavêli bê gotin û nivîsandinê.

Bi fikira min navê A.Xanî, qedir û qîmetê nivîsara wî li ser nav û nivîsara Ferdewusî, Nizamî û Rûstavêlî dikeve, çimkî ewî di poêma xweda ne ku bi tenê qeremanî, dostî, bi-ratî û evîniya rast û rasteqîn anîye ber çavan, ewî wusan jî pîrsa bindestî, belengazî û hêsîrîya miletê xwe anîye ber çavan û rê û dirb nişan kirine, bi çi teherî ji wî ha-lî derkevin û azad bin. Poêma A.Xanî "Mem û Zîn" edebyeta serbixweye, bi fikira xweva, bi tertîb û sazmaîya xweva ew ji "Mem û Zîna" bi zar gotin baştîre û hêjatîre. Di wê da A.Xanî şiklê jîyîna kurdan yek bi yek anîye ber çavan. Ewî bi rastî û rasteqîn hal û ehwalê miletê xwe yê belengaz, hejar û bindest û qeydkirî anîye ber çavên me. Wî di

poêma xweda bîr û bawara xwe, fikir û idêya xwe seyseti û sinîfî (çînayetî) bi zelal nivîsîne. Pirsên binyatî yên ku A.Xanî di poêma xweda gotine û neqîşandine, ew pirs şî rovedikin, ku paşketin û paşdamayina medeniyeta kurdan jî tunebûna dewleta kurdane, jî parkirin û dabeşkirina erd û welatê wane, jî tunebûna dewleta wane, jî bêtifaqî û dube rekîya qebil û eşîrên kurdane. Derheq vê yekeda A.Xanî awa nivîsiye :

*Ger hebûya me îtfaqek,  
Vêkra bikira me inqîyadek,  
Rom û ereb û ecem temamî,  
Hemîyan ji mera dikir xulamî,  
Tekmîl dikir me dîn û dewlet,  
Tehsîl dikir me hukmet,  
Temir dibûn ji hev miqalet,  
Mumtaz dibûn xudan kemalet.*

Eva parça ji "Mem û Zîn" a A.Xanî xuyan dike, ku A. Xanî baş zanibû, ku neteweyê kurd gelekî lehemge, gelekî bi hêz û qewate, ji bo serketina wî yekîtî û pevgerêdan û ye kîtî eşir û qebilên kurdan pêvîste...

Şerê kurdên Iraqê û şerê qeremanê kurdên Îranê pêşberî diktatorîya wan welatan nîşan dikin, ku kurd bi hêzin, ger yekîtîya wan hebe, ger eşîr û qebilên wan pêşberî hev şer nekin, ewê serkevin, mafê xwe bistînin.

Kurd niha li Iraqê û Îranê şer dikin, ne ji bona wê yeke, ku ereb û ecem jî wanra xulamîyê bikin, bona wê yeke, ku gelê kurd di gel (tevî) ciranên xwe ereb, ecem û tirk bi wekhevî bijî, partiyên kurdan niha şer dikin, serwerîyê li pirsê neteweyê xwe dikin bona wê yekê, ku kurd û ereb, kurd û fars, kurd û tirk bi dostî, hevkarî, wekhevî û aşîtî di nav hevda bijîn, berbi rîya dêmoqratîya rastî û rasteqîn herin.

Li kutasiyê divêt ez kurt çend xeberan derheqa naveroka "Mem û Zîn" a A.Xanî bêjim. Bi temamî "Mem û Zîn" a wî ansîklopêdîya jîyîna milletê kurde. Ew dastana kurdewerîya, têda ayin, jîyîn, hal û negbetiya milletê kurd li navbeyna qurnen 16-17-da tên ber çavên xwendeweran. Dastana "Mem û Zîn" ser çar binyat û binaxan hatiye nivîsandinê. Ew bin-

yat û binax evin:

- 1- Evîniya camerî û bi camerî û maqulî hev hezkirina jin û mêran.
- 2- Bi qeremanî û fêrizî xwe terxan kirin bo xatirê destebirakîyê.
- 3- Nifir û nelet li wan merivên xêrnexwez, boxtanker kirin, yê bûne sebebê mirina mirazxwezan (aşoq û maşoqan).
- 4- Wetenperwerî û neteweperwerîya kûr û firewan.

Di dastana "Mem û Zîn" da kurdewerî bi teherekî kûr û fire hatiye nivîsandin û nitirandin, têda xwerû, xeyset û siruşt merivan, ayîn, edet û tarîxa medenyeta milletê kurd bi zarê şîrin, kurdîya xas, bi şarezayî rind û qeşeng hatine nitirandinê. Di wêda gelek şîret, nesîhet û pendên pêşinan bi aqilmendî bi kar anîye û daye xebitandinê; gelek gotubêjên şîrin yê dîyanetê û ferasetê di dastanêda hatine nivîsandinê. Ev gişk ziman, kakilê dastanê dixemilîn. Her kesê vê dastanê bixûne wê pê bihese û bizanbe mezinîya Ahmedê Xanî, wê bizanbe qedir û qimetê Ahmedê Xanî di tarîxa edebyeta milletê kurdda. Gelek sedsalî wê bîn û herin, gelek merivên xwendewer, bîrewer û camêr li vê dunyayê bîn û herin û bênav bin, bê ser berate bin. Lê Ahmedê Xanî, kirina wî qet tu caran nayên ji bîr kirin, çimkî bîr û bawara wî bûye fikir û bawarîya gelek şayir û bî wêjên kurd yê xwe li ser rê û bîr û bawarîya A.Xanî girtine, ji destpêka Qadir Qoy nemirî heta şayirên qurna bîstan yê navdar wetenperwerî û neteweperwerîya Ahmedê Xanî tene gotinê. Gelek şayirên milletê me yê mezin û hêja ser bîr û bawarîya A.Xanî diçûn, mesele, Qadir Qoy, Pîremêrd, Goran, Bêkes, Wursî, Qane, Cegerxûn, Osman Sebrî, Qadrîcan Hejar û geleke din. Heta navê van şayîran bimîne li nav milletê kurdda, navê A.Xanî bimîne li dunyayê, çimkî ew bîr bawarîya xweva, bi kurdewerîya xweva bi hevra girdayîne, çimkî wextê em gotubêjan derheqa Qadir Qoyda gilî dikin, em mecbûrin A.Xanî binin bîra xwe, wusa jî çaxê em derheqa şayirên me din (Goran, Hejar, Cegerxûn û Osman Sebrî û geleke din) gilî dikin, xeber didin, yan jî dinivîsin, em esseyî navê A.Xanî tînin bîra xwe û bi navê wî serbilind û kubar û fexir dibin.

Neteweyê kurd niha bi navê gelek şayirên xwe navdar serbilind û ferxdare, ew şayir niha diruşma Ahmedê Xanî ya wetenperwerîyê ya neteweperwerîyê û kurdewerîyê berz û bilind kirine, bi serkariya partiyên xwe pêşketî, bi arîkarîya dêmoqratên welatên Rojhelata naverast û pêşin û partiyên Kurdistanê bikin yek, azad û serbest bin û bi jîyîna bextewerî, aşîti, dostî û hevkarî tev neteweyên ciranê xwe bijîn, bixebitin û ber bi rîya pêşkevtî, dêmoqratîya rast û sosyalizmê herin.

Ahmedê Xanî qedir û qîmetê zimanê kurdî baş zanibû. Ewî zanibû, ku bona pêşveçûn û pêşketina milletê kurd, bona qayim kirina yekîtiya qebîl û eşîrên kurdan, bona azadbûn û serxwebûna kurdan lazime her kurd biçûk û mezin zimanê dayîka xwe gelekî baş bizanin, pê çîrok, hikyat, beyt, şêr, tarîxa xwe binivîsin, ji ber vê yekê ewî bona zarokên kurdan medrese bi kisî xwe vekir û bi xwe medresêda dersê zîmanê zikmakî dida zaruwên kurdan. Ewî ferhengoka xwe erebî-kurdî nivîsî bû bona ku zaru û mindalên kurdan bi zîmanê xwe bixûnin û baş hînî zimanê erebî bibin, şareza bin û pêşkevin. Ewî nivîsiye :

*Ji paş hemd û selwetan,  
Ew çend kilme ji luxetan,  
Vêk êxistine Ahmedê Xanî,  
Navê lê nûbara biçûkan danî,  
Ne ji bo sahib rewecan,  
Belki ji bo biçukêd kurmancan,  
Ku ew ji quranê xilas bin,  
Lazime sewad û çav nas bin.*

Ahmedê Xanî poêma xwe "Mem û Zîn" nivîsiye, ku xelk nebêjin bi zimanê kurdî nivîsar tune, nebêjin bi zimanê kurdî nanivîsin, kitêb û edebyeta kurdî tune, nebêjin, ku hemû dinya xwedî kitêbin, xwedî edebin, direj ne kin û dom nekin nebêjin milletê kurd bê sewwad û bêarmance. Ewî ev rêzên jêrin derheq vê yekêda awa nivîsiye :

*Xanî ji kemala bê kemalî,  
Meydana kemalê dit xalî,  
Yenî ne ji qabil û xebirî,  
Belki bi tee'sub û eşirî,*



Hasil ji enad eger ji bidad,  
 Ev be'dete kir xelaf medad,  
 Safî şinirand vexwer durdî,  
 Manendî derî lisanê kurdî,  
 Enaye nizam entezamî,  
 Kêşaye cefa ji bo a'mî,  
 Da xelk nebêjin ku ekrad,  
 Bê me'rifetin bê esil û binad,  
 Evna melil xudan kitêbin,  
 Kurmanc tenê di bê nesîbin,  
 Hem ehlê nezer nebên ku kurmanc  
 Eşq nekirin ji bo xwe armanc.  
 Têkda ne di talibin ne metlub,  
 Vêkra ne muxibin û ne mehbub.  
 Bê bêhrese ew ji eşqbazî,  
 Farix ji heqîqê û micasî.  
 Kurmanc ne pir di bê kemalin,  
 Emma di êtim û bê mecalin,  
 Fi-l cimle ne cahil û ne zanin,  
 Belkî di sefil û bê xudanin.

Jî berî Ahmedê Xanî gelek şayîr û bivêjên kurdan hebûn, me sele Elî Herîrî, Mele Batê, Feqê Teyran, Xalis Bitlîsî, Mele Cizîrî û yên din. Lê kurd û Kurdistan hatibûn duparkirinê û ketî bûn bin destê dewleta romê û eceman, navê wan şayiran ji bîr kiribûn, qedir û qîmetê wan kesekî baştir nizan bû. Piştirî van camêr û delîran her Ahmedê Xanî tenê ala serferazî û serxwebûn û serbixwe bilind û berz kir kesek tune bûn bêjin em jî xwedî medenyetin, em jî milete kî serbixwene û dixwezin bi zimanê xwe binivîsin, hîn bin û hîn bikin. Derheqa vê yekêda ewî awa nivîsiye :

Ger dê hebûya me jî xudanek,  
 A'lı keremek letife danek  
 E'lm û huner û kemal û ezan,  
 Şêr û xezal û kitêb û diwan,  
 Ev cins biba li ba wî me'mul,  
 Ev neqû biba li nik wî meqbul,

*Min dê elma kilam mewzun  
Alî bikira li ban gerdun  
Binave rehma mele Cizîrî,  
Pê hê bikira E'î Herîrî,  
Kêfek ve bida Feqê Teyran,  
Hetanê ebed bimay heyran.*

Pirsên binaxê û binyatî yên A.Xanî di "Mem û Zîn" a xweda gotine û neqîşandine, ew pirsîn ku ew dibêje belengazî û hêsîrîya kurdan ji parkîrin û zevtkîrîna axa wane, ji tune bûna dewleta wane, ji bêtifaqî û bêtîfaqîya kurdan û qe-bil û eşîrên wane. Derheq vê yekêda ewî ev rêzên jêrin ni vîsîne :

*Ger dê hebûya me itfaqek,  
Vêkra bikira me inqiyadek,  
Tekmîl dikir me dîn û dewlet,  
Tehsîl dikir me elm û hukmet,  
Te'mir dibûn ji hev miqalet,  
Mumtaz dibûn xudan kemalet.*

Ahmedê Xanî zanibû, ku kurd azad bin lazime dewleta kurdî yekîti hebe, zimanê wan edebyatî hebe û hemû kurd xwendkar û xwendewer bin. Ewî ev gillî, ev bîr û bawar di poêma xweda bi safî neqîşandine. Ji vê der ewî di poêma xweda evîniya bêhed, bê ser û binî, dostî û biratîya qeremanên poêmê ya Qeretajdîn, Çekan, Erfan, Sitî, Memê û Zînê bi rengên gulgeş nivîsîne û xemilandine; navê Memê û Zînê, navê Qeretajdîn, yê Çekan, yê Erfan û Sitiyê di nav miletê kurdda bûne nimûn û nişanên evniya merivan ya îdîalî (rastî û rasteqîn), bûne nimûn û nişanên biratîya şîr helal û dostîya qereman û fêrizên sadiq yên ku di e'mir û jiyîna cimatîyêda hene, rastî hev tên bê hed hev hez dikin û ruhê xwe, mala xwe bona hev qurban dikin. Her mêrê kurd, her jina kurd, her qîz û xortên kurd van qeremanên poêmê "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî yan yên dastana "Mem û Zîn" a zargotin di dostî û hezkîrîna xweda, di îş û karê xweda ji xwera dikin nimûn û mesele û hesab dikin; jina kurd, qîza kurd dixwezin mîna Zînê û Sitiyê bin, her mêrê kurd, her xortê kurd dixwezin mîna Qeretajdîn, Çekan, Erfan û Memê Camêr û delîr bin û bi biratî û dostîya helal û sadiqda bin. Biha û nîrxê "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî û "Mem û Zîn" a zargotin di vî alîda yekin, mîna hevin, eve

yekîtiya herduwan. Lê "Mem û Zîn" a A.Xanî nivîsara şayîrî ye, ya bi vêja tendirustîye, bi xemla nivîsandina xweva ji ya zargotinê baştir û hêjatire, bi raman û bîr û bawara xweva nivîsara nemirîye, wê heta hetayê bijî, namire wê bijî, navê wî dê bimîne heta hetayê, Kurd qet caran navê wî ji bîr nakin. Gelek bivêjên kurdan yê sedsalîya XIX (Qadir Qoy, Kurdî, Zîver û yê din) di rêç û şopa Ahmedê Xanîda diçûn. Niha jî di sedsalîya meda şayîrên kurdan yê bi nav û deng (Bêkes, Pîremêrd, Guran, Cegerxûn, Osman Sebrî, Celedê Bedirxan, Qadrican û yê din) mîna Ahmedê Xanî ala wetenperwerî, ala şerê serxwebûna kurd û Kurdistanê berz û bilind kirine bo xatirê azadbûna miletên Rojhilata Nêzik ji bin destê împêriyalîstan, stemkaran û diktatora faşistî, bona xatirê wê yekê, her milet bi serbixwe bijî, bi hevra bi aşîtî, dostî, wekhevî, biratî bijîn bi hevkarî ber bi rîya sosîalîzmê herin, bextewerî bijîn.

Parçên jêrin bona xwendinê ji "Mem û Zîn" a A.Xanî hatine jêder kirininê :

*Ez pilewerim, ne gewherîme,  
Xudresteme, ez ne perwerîme,  
Kurmancim û kuhi û kenari,  
Van çend xebatêd kurdewerî,  
Emza biken ew bi hesen etlaf,  
Eswa biken ew bi îsmê ensaf. (355)*

*Ev name helal û ne herame,  
Bê perdeye, lê ne bê miqame,  
Kurdî, erebî, derî û tazî,  
Terkîb kirin bê hezil û bezî,  
Hindik ji efsaneyêd Bohtan,  
Hindik di bihane hin di bi ten,  
Bohtî, Mehmûdî û Silîvî,  
Hin lel û hinek ji zêr û zivî,  
Xirmehre û morik û mirarî,  
Hindik d şitaf û tarî,  
Tersih kirin weku biçûkan,  
Înane bi qesir û sûkan,  
Hin qise û hin ji wan misalin,  
Hindik d helal û hin heramin (186)*

Da bêne sere hikayata pêş,  
 Xelqê ku ji derd eşqê dil rêş  
 Herçend ku bê hedd qiyas bûn,  
 A'mê xudan û hewas bûn,  
 Lakin ji xwadamêd mumtaz,  
 Sed law sehe qedd û serefraz,  
 Heryek d miqam husin rojek,  
 Heryek bi kelim sine sozek,  
 Her yek bi kemal bi der mahek,  
 Her yek bi cemal sedir şahek,  
 Ev jê hemî aşiqin d talib,  
 Ev jî hemî talibin d raxib,  
 Bel-cumle di xidmeta emîr bûn,  
 Fil-cumle ji sirrê hev xebîr bûn,  
 Serhelqeye wan perî misalin  
 Sertacê ewan melek xusalin.  
 Tajdin digotinê ciwanek,  
 Guderz ziman pehlewaneke,  
 Nesil û nesib û husb e'yan bû,  
 Serdefter û serwerê kurdan bû,  
 Babê wî digotinê Skender,  
 Lakin ereban digot Xezenfer,  
 Lewra bi şêr şibê şêr bû,  
 Roja şerrê ew hezar mêr bû,  
 Tajdîn du bira hebûn d qellaş,  
 Manendî du şahbaz cemmaz,  
 Daym dil dijminan disotin  
 Yek A'rif û yek Çeko digotin,  
 Emma wî ji cimle xas a'man,  
 Ji ew çend bira û maman,  
 Lawik kiribû bira ji bo xwe,  
 Ney ez xultem cira ji bo xwe,  
 Roja ku ewî bira nedîta,  
 Teşbih şeva çira nedîta,  
 Dinya li wî têk dibû tarî,  
 Roj bû ku li wî fikir qewarî,  
 Mem jî li wî aşiqek tamam bû,  
 Ne şibhê bira û bab mam bû,  
 Enbaz ferih şirik xem bû,  
 Ser geştaye xem bi navê Mem bû,  
 Herçend birayê axret bû,

Te digo d dinê û axret bû,  
 Tajdin weledê debîr diwan,  
 Mem jî xelte debîr diwan,  
 Ew herdu ciwan li yek du aşiq,  
 Ew her du bira û pêkva sadiq,  
 Yek qyasê zemanê, û yek Leyla,  
 Yek Wamiqe Eser û yek Ezra,  
 Ew yar ji dil ne ser serî bûn,  
 Bêh şibhetê mehir û muşterî bûn,  
 Yar û birayî muwaxat,  
 Nabit birayê meqalet,  
 Yari ne hêsaye, cefaye,  
 Meqsûd ji yari wefaye  
 Axir te eger nekir wefayîş,  
 Ji eveel mede ber xwe cafayê. (49-51)

Xelqê ku didîtin ew kemer gah  
 Hazir dikirin ji xur dil gah,  
 Zahir dikirin ku zend û bazin,  
 Êdî ne dima gilî û gazin  
 Herçend ku herdu şibhê can bûn,  
 Ew herdu bi husin tewaman bûn,  
 Herçend Sîfî ve nazîn bû,  
 Lê Zîn ji misal hor e'yn bû,  
 Herçend stareweş bû,  
 Lê Zîn berxan hîva geş bû,  
 Ew herdu wekî şeb çiraxan,  
 Gava dimeşîne bax û raxan,  
 Nalan dikirin cemad û heywan,  
 Talan dikirin nebat û insan,  
 Kûvî ji ciwaharan mukellel  
 Kotir ke ji netirka miselsel,  
 Serbend qeseb didan cebinî,  
 Aşiq dimirin ji derdê evinê,  
 Ev zeynet û xemil û qest û xenbel  
 Ew pêş û pis û yemin û qenbel,  
 Gava dimeşîn perî digel wan,  
 Welê dikirin welê di xelwan,  
 Ger şêx û ger mela û miran,  
 Derwêş û xênî û ger feqîran,  
 Kes nîne ne talibe cemalî,

*Kes nîne ne raxebe wesalî,  
 Hin raxeb û husin layzalin,  
 Hin talib qalib bi talibin,  
 Lakîn hemîyan yek eqin dost,  
 Ferqa ku heye ji ferq ta post. (47-48)*

Van salên paşin li Iraqê hine xebatên baş hatine çapkirinê li ser lîtêratûra kurdan. Mesele, dîwana Nalî, dîwana Bêkes, dîwana Mele Cizîrî, dîwana Pertew-beg Hekarî û "Nubar" a A.Xanî. Herdu dîwanên pêşin bi zaravê soranî çap bûne, zanyarê kurd mele Mehemed Kerîm ew çap kirine, lê herduwan paşin bi destî ulmdarê kurd Sadiq Behadîn Amedî hatine çapkirinê. Çapkirina dîwanê şayîrên kurdan yên kla sîkî gelekî ferze bona lêgerîna tarîxa pêşdaçûna lîtêratûra kurdî. Dîwanên Mele Cizîrî û Pertew-beg Hekarî bi zaravê kurmançîne, li ciyê xweda min di vê xebatêda nivîsîye û nimûnên şêrên wan anîne ber çavên xwendkaran. Li vira ez dixwezim derheqa "Nubarêda" hine gilî bêjim.

Navê "Nubara" Ahmedê Xanî zûva li dîroka lîtêratûra kurdî da aşkeraye. Gelek ulmdara: Ziya-Eddin Xalidî, Aladîn Sicadî, Celadet Bedirxan, Gîvî Mukrîyanî û yên din derheqa wêda nivîsîne. Heta niha çar nivîsarên A.Xanî e'yanin. Navê wan evin: "Mem û Zîn", "Nubar", "Eqîda Îmanê" û "Şêrên filosofî. Ji wan her "Eqîda Îmamê" çap nebûye. Bi gotina zanyarê kurd Mehemed Emîn Boz Erslan "Eqîda Îmamê" niha li kitêbxana Stembolêdaye, sed car heyf heta niha nehatîye çapkirinê. Di sala 1979-da li Bexdadê Sadiq Behadîn Amedî "Nubara" A.Xanî çap kir di herfên erebî. Ewî navê wê danîye "Nohbehara Seydayê mezin Ehmedê Xanî". Ewî pênc şaxên destnivîsarî yên "Nubarê" hemberî hev kirine. Ew şax evin: Nubara Ebdulselam, ya dest nivîsara çapnekirî, ya Ûsifê kurê Ebdule, ya Lekok (ya sala 1943 li Berlînê çapkirî). Sadiq Behadîn nûbara Ebdulselam kiriye şaxê bingeyê beramberkirina şaxan. Li kitêba xweda ewî nivîsîye, ku fotokopî ji du şaxên çapkirî hildane, her şaxek fotokopî belgeke zêde nîne. Li pey wan ewî bîr û bawara xwe li ser nivîsarên A.Xanî wek zanîna xwe nivîsîne, pesnê "Mem û Zîn" a wî daye, li paşê ewî nivîsîye "Çavan û kengê dest bi tiwajindina "Nubara" Ahmedê Xanî" kiriye. Di virada ew gilî dike kîjan şax wî ji kîderê destxistîye û paşê xebat bi tomerî nivîsîye. Ew dinivîse: "Nûbar ne tenê ferheng-

ke ziman zanînêye, lê ew wusa jî nivîşteke perwerdekirinê (terbiyekirinê) ye. Bona îsbatkirina vê gotinê ewî her te nê ev rêzêd jêrin ji pêşgotina "Nûbarê" anîne ber çavan :

*"Ji paş hemd û selwetan,  
Ev çend kelme ji luxetan,  
Vêk êxistin Ahmedê Xanî,  
Navê nûbar ji bo biçûkan danî,  
Ne ji bo sahib rewecan,  
Belkî ji bo biçûkêt kurmancan.*

*Wekî ji quranê xilaz bin,  
Li van tebiyet melekan,  
Derê zehne vebitin,  
Her çî bixûnêt, zehmet nebitin,  
Bed a'me bîr bînin,  
Fathe ji mera bixûnin (13)*

Ji hemû rêzên jorê çapkirî tê ber çavan, ku merem mebesta A.Xanî ew bûye, ku biçûkên kurmancan hînî xwendinê bike, ku ew bi zimanê dayka xwe bixûnin; di wan rêzanda wusan jî hatîye gotinê bi çî teherî, kengê û sebeb çî xwendinê hîn bin. Ku ew xwendewer bin, serferaz û serbest bin, lazîme ew "Bed a'mê ji bîr bikin, wextê betalin fathe bixûnin", "Wekî ji quranê xilaz bin", lazîme "Li sewad çav nas bin".

Di ferhengêda li nav tercimên xeberên erebî bi kurdî, yê bi beytê kêş û qafiyê nivîsandî, Ahmedê Xanî li cî-cîna fikir û ramana xwe li ser hînbûnê, hînkirin û xwendinê ev rêzên jêrin nivîsîne :

*Heta tu dewr û dersan nekî tekrar û mesruf,  
Di dinyayê tu nabî meşhur û ne jî me'ruf (31)*

*Perde ku rabin ji ber erzê dilistanê xoş,  
Dil ji xeman bête der, bilbil gulistanê xoş.(34)*

*E'rfê ku bi qencî me'ruf bit,  
Dê helim û sebir û me'wquf bit (39)*

*Ger dê te meqaudek hebî, lazîm divê lêkî bi lez,  
Xasma te me'budek hebî, daym di emrê wî bibe(43).*

Her çî u'lme bi cahil kir mubdel,  
Sifrê xwe wî kir bi zer mukelîl (47).

Yê ku te kir daym kirîye ji bo xwe murekeb,  
Evel tu bo bikeye, paşê bikere merkeb (49).

Şêx û sofî keramet û hem xwendin û emel,  
Xelwete hucret terîqa te şerîet be xelet (53)

Ger tu divêtin tu bibî mîr û ser mue'tber,  
Kezeb û xulafî mebêj, ger te bikin ker bi ker (60)

Her çî ji dinya berdaste da min bû,  
Bê subhet diniv a'me efraşte gerden bû (67).

Ger tu divêtin ku beraber nebitin kes bi tera,  
Ulm bixun hem emele tu bike sinet ji xwera (70)

Her çî kese elmekî qenc xwendîye,  
Dewlete ger wî bi esil zanîye (74)

Di fesla nûbaharêda di gel dilber biçin geştê,  
Ji ew xweştir nabit li min ew hal qewî xoş tê. (79)

Muelim bila dil wekî ber bitin,  
Divêtin ku şagirt dilber bitin (84).

Di van rîzên jorê nivîsandîda pîrsên şîret û nesihetîya hînbûn û hînkirina hatine gotinê, di wanda gilîyê talim û terbiyetkirina biçûkên kurmancan nivîsîne, di wanda wusa jî gilîyê rewş û reftara wan di dersxanêda, di dersxanê der hatine gotinê. Bi gilîkî "Nubara Ahmedê Xanî nek ferhenga hînbûn û hînkirina zimanê erebîye", ew wusan jî şî retnama metoda xwendin hatiye gotinê. "Heta tu dewr û der san nekî tekrar û meruf, di dinêda tu nabî meşhûr, ne jî meruf", "Ger te divêtin ku beraber nebitin kes bi tera, ulm bixun, her emele tu bike sinet ji xwera". Ev rîz tev rîzên din nîşan dîkin, ku li tarîxa dersdayîna zimanê daykê û hînkirina biçûkên kurmancan" bere pêşîn Ahmedê Xanî destpêkirîye, ku li "Nûbara" xweda ewî qeydê, qanûn û prînsîpên hînbûn û hînkirin zimanê daykê û yê beyanî nivîsîne û binyat û binaxa mêtoda dersdadayna pêşkevî û dîmoqratî li nivîsara xweda danîye, pêk anîye û bi xwe jî qedandîye (Li Bazîdêda ders daye, eve yeka e'yane). Celadête rehmet di nivîsara xweda "Kilasîkên me" (hewar, hejm.9) dibêje :



"Di pey mirina wîra şagirtê wî Smaîl bîst salên di wê dabistanêda guhdar bû û dersê kurmancîyê têda gotin". Ew dîsan dibêje: "Li gora tiştê min bihîstîye, Xanî kitêbeke cografîyê jî çêkirîye û têda qala ezman û stêrkan kirîye. Herçend ez gelek lê gerîyam, ew kitêb neket destê min". Ahmedê Xanî herwekî bi xwe gotîye "Mem û Zîn" ji xwera kirine behane û bi vê hêncetê kula dilê xwe bi der daye, derdê miletê xwe ê ker û lal bi ziman kirîye û ew axivandiye. "Mem û Zîn" ji bo Ehmedê Xanî rêzên Kurdistanê, rêzike we latê wîne. Xanî di bin rêzkên wînda, di bin kurmacê din bi zimanina din dixunin û dinivîsin. Bi rêzkên miletê din va diçin, belgên xwe ên nijadin ji xwe tavêjin, dike rengê miletê din û bi wî awayî û rêva bindestîya wan dîkin.

Seyda dibêje :

*Sazi dil kul-bi zir û hem bit,  
Sazendeye eşqî Zîn û Mem bit,  
Şerha xemî dil bikim fesane,  
Zînê û Memê bikim behane.  
Nexme we ji perdê derînim,  
Zînê û Memê ji nûva vejînim,  
Derman bikim ez ewan dewa kim,  
Wan du mededan ji nûva rakim,  
Meşhur bikim bi terz û uslub,  
Mumtaz bikim mihib û mehbûb,  
Ew reng bikim ji nû serferaz  
Da bêne temaşeyê nezerbaz,  
Dilber li Memê bikim girîné,  
Aşiq bikenin bi derdê Zînê.  
Ev meyve eger xerabe, ger qenc  
Kêşaye di gel wî me dused renc,  
Ev meyve eger ne avdare,  
Kurmancîye, ew qeder li kare.  
Ev tifle eger ne nazenîne,  
Nubare, bi min qewî şêrine,  
Ev meyve eger ne pir lezîze,  
Ev tifle bi min qewî ezîze,  
Mehbub û libas û guşvare,  
Milkê di minin ne mişteare,*

*Ez pilewerim, ne gewherîme,  
Xudresteme ez ne perwerîme,  
Kurmancim û kuhî û kenarî,  
Ev cend xeberin di kuredeweri.*

Celadet Bedirxan ev rêzên jêrin ji eqîda Ahmedê Xanî çapkirine:

*Sifete di sibhe ji bo zilcelal,  
Bizan heftin ey arifê pir kemal,  
Xweşî, şîn û zanîn û vên û kelam,  
Bihîstin di gel dîtî bû tamam.*

Ew derheqa Ahmedê Xanîda dinivîse "Pexemberê diyaneta me a milî, pexemberê ola me a nijandin". Xanî di wextê wele- da rabû koberiya niha bi sê sed û neh salan-ne li cem me, lê li Ewropayê jî xelk hej ji milîyet û li nijadê xwe hişyar ne bûbûn û zelumên ji yek miletî hev û du bo katolîkî an protestanîyê dikuştin. Di heymake wele da Ahmedê Xanî bîra miletîya xwe, bîra kurdaniya xwe birî bû û ji kurdan ra gotibû hûn berî her tiştî kurdin, rabin ser xwe dewle- teke kurdî çêkin û bindestîya miletên din mekin".

## XARIS BITLÎSÎ (XVIII)

Xarîs Bitlîsî ji dayka xwe bûye sala 1758-da, sala mirina wî ne e'yane. Bi gotina A.Jaba û M.B.Rûdenko Xarîs Bitlîsî du dastan nivîsîne: Dastana "Usîb û Zelîxe", "Leyl û Mecnûn". Dastana "Usib Zelîxe" berê pêşin Salîm Sulêman (sedsalîya XVIII) nivîsîbû, lê paşê li dû wî Xarîs Bitlîsî nivîsara wî li cî-cîyan wergerandibû, xeberên farsî û erebî derxistibûn, pak kiribû, gihandibû xeberdana zargotina kurdî. M.B.Rûdenko dinivîse: "Bi gotina A.Jaba li qurnêd XVII-XIX da li medresêd nav kurdanda nivîsara Xarîs Bitlîsî "Usib û Zelîxe" dixwendin, çimkî zimanê nivîsara wî pak û temiz û ferih bû, rind dihate fehmkirinê.

Bona ku xwendevanên me haj yekîtî û cudatîya Selîm Sulêman û Xarîs Bitlîsî li dastana "Usib û Zelîxê" da hebin ez çend nivîsarêd wan jêrê hemberî hev dikim. Ew rêz min ji nivîsara M.B.Rûdenko derxistine (58-50).

### JI DASTANA SELÎM SULÊMAN

*Ema bi sedat û bi envan  
Besê bikin em ji pîrê Kenan,  
Ev reng ji axretê di mezherî,  
Yûsif bi cemal bûye meşhurî.*

*Xûna xwe ji bo mêra beyan ke  
Te qerîr bike li me eyan ke  
Yaqub hebû keçekî xebersaz  
Wextê ji pider bihist ev raz  
Beyt bi mera kuh û deştan  
Reh şihbetê teyreki bihiştan*

### JI DASTANA XARIS BITLÎSÎ

*Ema bi sedat û bi envan  
Besê me dikin ji pîrê Kenan,  
Ev reng ji lawê wî di mezhorî,  
Usif bi rindî zehf bû meşhurî*

Xûna xwe ji bo mêran beyan ke,  
 Tu bibêje ji mira li min eyan ke  
 Yaqub wî hebû qîzekî pak  
 Wextê ji bav bihîst ev dak  
 Beyt bi mera çiya û deştan  
 Teşbiyê teyrekî bihiştan.

Li paşê M.B.Rûdenko dinivîse, ku sernavêd pêşin, yêd ku têda Selîm Sulêman pesnê xwedê dane, li nivîsara Xarîs Bitlîsîda hatine berdanê (yanê Xarîs Bitlîsî ew li nivîsara xweda nenivîsîne).

Li sala 1965 M.B.Rûdenko têksta destnîvîsara Xarîs Bitlîsî ya "Leyl û Mecnûn" bi tencima rûsî û pêşgotina xweva çapkir. Li pêşgotinêda ewê nivîsîye, ku Xarîs Bitlîsî li sala 1758-59 da dastana xwe "Leyl û Mecnûn" nivîsîye, ku ewî ew dastan bi xwesteka keçeke kurd hûnandîye. Derheqa wêda ewî li destpêka nivîsara xweda ev gilîyêd jêrin nivîsîne :

*El-qise di vê behara gilhêz,  
 Ez bûm li nivê yekî dilavêz,  
 Rûniştim û ez li pencereyê,  
 Fikirîme seharê û hewayê.*

*Niga mi dî derî kişa bû,  
 Şimsik ji nivê mineala bû,  
 Ji evelva silam û merheba kir,  
 Pirsî me kir, û dilê mi şa kir,  
 Rûnişt û bi leb kerem mesref,  
 Exbar û qise kirin mesref,  
 Esraf kirin ji ber kilamê,  
 Behsa me gihîşte vê miqamê,*

*Ku şêr û wezin çî xweş kilamin,  
 Meqbûl cemi'e xas û a'min,  
 Nasil li me kir kemal teglîf,  
 El-hah û tesleffek bitesif,*

.....

*Pirsî me wê miraz meknûn,  
 Got tercima kî ji "Leyl û Mecnûn",  
 Kûrdî tu ziringî da bizanin,  
 Lo em çî bi farsî nizanîm.*

Ev xeber nîşan dikin, ku giva bi xwesteka keçekê kurd Xarîs Bitlîsî "Leyl û Mecnûn" ji farsî wergerandîye kurdî. Lê ewî li pêşgotina xweda çavkanîyê "Leyl û Mecnûna" xwe nenivîsîye, ne e'yane ewî ji kîjan dastanê wergerandîye. Lê pêvîste bêjim, ku kovêk û kêrta dastana Xarîs Bitlîsî mîna ya Nizamîne. Lê têda çend cîkarêd qisekirinêd wusan hene, ku li dastana Nizamîda tunene. Mesele, di wêda tê gotine, ku Mecnûn Zaru bûye, girînekî bûye, her li ser singê-berê şîrdayena rinde bedew aram û ker dibe, ku Leylê û Mecnûn li mektebêda kitêbêd xwe pev diguhêrin, ku bi me' nîya wê rastî hev bîn, hev bibînin, di dastana Xarîs Bitlîsîda wusan tê gilî kirin, ku Mecnûn postê mîya li xwe dike, ku tevî kerîya pez here cî-warê Leylê û Leylê bibîne, di wêda wusan jî tê gilîkirinê, ku terewul Îbin Selam vedikevizînin û ew dimire. Têda wusan jî temîyê dîya Leylê tê gotinê, xên ji wê di dastana Xarîs Bitlîsîda navê çend merivêd dastana Nizamî nayê gotinê, mesele, navê Selam-Amîrît û Selam Bexdadî û kirêd wan li dastana Xarîs Bitlîsî qet tune, xên ji wê li dastana wîda sernavê çarde yê dastana Nizamî tune. Eva nîşan dike, ku dastana Xarîs Bitlîsî nivîsara xwesarî xweye, ne terciya dastana Nizamî ye.

M.B.Rûdenko dibêje dastana Xarîs Bitlîsîda 740 çar xanin, têda bîst sernavin, bi naverok û mezmûna xweva ev pare ve dibe ser van parêd jêrin :

- 1- Keykawûs dua'ji xwedê dike, ku kurekî bidê,
- 2- Destpêka evintîya Leyl û Mecnûn,
- 3- Miraxwez naxwezîna sêra civintîya wan e'yan be.
- 4- Mecnûn li çolê dikeve.
- 5- Mecnûn diçe Kaabê.
- 6- Xwezgîntîya bavê Mecnûn
- 7- Xwezgîntîya Îbin Selam
- 8- Naufal xwe li navra dike.
- 9- Mêrkirina Leylê
- 10- Mecnûn dîsa li çolê dikeve.
- 11- Leyl û Mecnûn hev dibînin
- 12- Mirîna dayk û bavê Mecnûn
- 13- Mirîna Leylê
- 14- Mirîna Mecnûn.

Bi şirovekirina M.B.Rûdenko eva nîşan dike, ku şaxê dasta

na Xarîs Bitlîsî mîna şaxêd Mektebî û Navaye. Mektebî bi xwe dibêje, ku ewî dastana xwe "Leyl û Mecnûn" ji ya Niza mî û Xosrovî hildaye û bi xwe li kenarêd nîvada ereban lî qurna XV ji zarê ereban bihîstîye. Bi melumetîyê Îbin Batûlî li sedsalîya XIII koçêd kurdan li dor berê kenarêd nîvada ereban digerîyan, dibe wan kurdêd koçer ji zarê ereban ew şax bihîstîne, li nav xweda bi kurdî belav kiri ne û wusan li nav wanda maye heta niha. Dibe ew şax lî nav kurdanda maye û bûye binyat û bingê dastana Xarîs Bitlîsî. Xên ji wê M.B.Rûdenko dinivîse, ku şaxê zargotina Serhatîya "Leyl û Mecnûnê" ne mîna ya Xarîs Bitlîsîye, li şaxê zargotina serhatîya "Leyl û Mecnûnda" kovek û kêrta qisekirna wê bi cûrekî dinêye, di wanda awa qise dikin : Mecnûn kurê dayk û bavê belengaz Leylê hez dike, Leylê qîza mala dewlemend bûye, Mecnûn dixweze jêra Leylê bistînin, dayka wî diçe xwezgînîyê, dayk û bavê wê nadin, dayka wî pojman vedigere malê, wê navno dike, dixweze ew wê hez neke. Mecnûn ji mal derdikeve, diçe ber kanîya Sindcan (yan jî kanîya Masabûl) ku her gav keç diçine avê. Li ber kanîyê Leylê û Mecnûn hev dibînin. Mecnûn pê dihese, ku Leylê ji wî hez dike. Roj li wan dibihire, berî êvarê Leylê xwe dihese, ku li malê hêvîya wêne, ew dixweze here bibêje Mecnûn ewê zûzû bê cem wî. Mecnûn wê ber nade, dibêje hinekî li cem wî bimîne. Leylê morîya xewê dike guhê Mecnûn, bi xwe vedigere malê. Dibîne mala bavê wê barkirî ye, diçe zozana. Ew leze-lez diçe, digihîje koça mala bavê xwe. Gelek wext diçe. Kerba Leylê nayê, Mecnûn li ber kanîyê li xewêda maye, ew nikare here cem. Ew ji rewîya derheqa Mecnûn pirs û pirsyaran dike, kesek tiştêkî nikare jêra bêje. Carekê teyr ji ber kanîya Sindcan difire. Leylê jê dipirse û pê dihese, ku Mecnûn hê li xewêdaye, li ber kanîyê çivîkê helûna xwe li porê serê wîda çêkirîye û cûcûk derxistîne û qamîş li nav rîşîyêd wîda gihîştîne. Leylê xwe ji malê vedidize, ber bi Mecnûn diçe, li ber kanîyê ew hev hemez dikin. Hingê birêd wê bi wanva derdikevin. Leylê ji tirsê bira dua' dike, ku xwedê wan bike steyr, ew bifirine ser ezmanan. Xwedê wan dike du steyra, ew difirine ezmanan, salê du caran: biharê û payz ew rastî hev tên.

Li paşî têksta dastana Xarîs Bitlîsî "Leyl û Mecnûn" û tercima wê bi rûsî M.B.Rûdenko şaxekî zargotina "Leyl û Mec-

nûn" di kitêba xweda çap dike, ew şax ewê ji zarê Qerexanê Şerefyan kurdê kela Çiristane (Xurasan) li Aşxabadê ni vîsiye.

*Ne mumkûne eşq bit nihani,  
Henek hebitin, heye e'yanî,  
Şagirt di hucre pê bi yek bar,  
Bi cumle ji hal bûne xeberdar.*

*Ev sêr nuha eşkera bû,  
Cî-cî geriya û bela bû,  
Xeybet qewî ji bo etbê,  
Agah kirin diya hebîbê,  
Wê abdiya efîf û salih,  
Wextê ku bihistine ev tirane  
Hal hal girî, rûy gil serî,  
Serbend birî û ser helkirî,  
Rabû bi xezb vehate Leylê,  
Ber kir bû qehr misalê Sêlê  
Rûnişt ber li lay qizê,  
Gotê ku lewend bi temizî,  
Hala bi bihistiye ciwabek,  
Aşiq li te bûye şabek,  
Hikmet ne ewe, tu jê şa bî,  
Aşiq kir bû ya dil kuta bî.*

*Ey doxtera min, eva çi kare ?  
Ev kar ji bo te zêde a're,  
Ferze ji tera hub û perde,  
Royê te kesek bibîne derve,  
Bike te heyn hezar aşiq  
Aşiq bona te ne layq.*

*Te namûs û nisf li me bi ba kir,  
Loma ereba li me rewâ kir  
Derzê te bibine belkî a're,  
Bikişîne di çavê li tare,  
Min bed bikî dê biçî ji xanî,  
Bê nav benî di nêv zemanî,  
Êdf meçe mektebê tu caran,  
Çûna te niha qewî mubaran,*

Êdî tu biçî ji mal bi derva  
 Teyrok te bibarin bi berva  
 Dê bêje bav û xizm û mamam,  
 Xûna te vexun bi tas û caman,  
 Keç a'r û heyane, tek berayê,  
 Ya qenc ewe, ew ne bin ji dayê,  
 Yanê kur bin, bilind ser bin,  
 Piştî bi her dera xeber da,  
 A'r û edeba xwe wê bi der da,  
 Gewher bikevit destê xakan,  
 Dê ku bikitin bi miqteba pan,  
 Ya bê heya û şermin û xamuş,  
 Nav çadir û pêçeka serpûş,  
 Înkariya Leylê ji eşqê bawerîya,  
 Dayê me'ne kirîye wê mektebê.

Leylê ku bihistin ew kilame,  
 Go Dayê ji te ecêb dimane,  
 Ev terz xeber çî bi hale,  
 Însaf bike, çî qîl û qalîn (54-55-27-28)

.....  
 .....  
 Leylê sekini çadira xwe,  
 Ev renge xiste xatira xwe,  
 Ku carek biçê lay Mecnûn,  
 Kanê bi çî hale ew Cegerxûn.



## PERTEW-BEG HEKARÎ (XVIII)

Li sala 1976-da li Bexdadê zanyarê kurd Sadiq Bahadînê navdar dîwana Pertew-beg Hekarî çap kir. Dîwan bi herfêt erebî ji destnivîsara herfêt erebî hatîye hazîrkirinê û çapkirinê. Di pêşgotina xweda ya di kitêba "Dîwana Pertew begê Hekarîda" Sadiq Bahadîn Amadî nivîsîye, ku tarîxnas û edebyetnasê kurd tişteki safî û ron derheqa Pertew-beg da nenivîsîne, serguzešta (serhatîya) wî ne e'yane, her nivîsîne, ku ewî dîwana xwe li sala 1221 hicrê (1802) -da nivîsîye.

Sadiq Bahadîn Amedî dinivîse, ku berê pêşin her tarîxnasê kurd Emin Zekî, rewşenbîrêd kurd Necimêdîn mela, Mehemed Elî Ewnî û edebyetnasê kurd Aladîn Sicadîn nivîsîne, ku Pertew-beg Hekarî dîwana xwe li sala 1221-da hicrêda nivîsîye.

Sadiq Bahadîn Amedî wusan jî li pêşgotina xweda dinivîse ku cara pêşin hine xezalêt Pertew-beg Hekarî li kovara "Dengê Gitî tezeda" li hejmarêd 3,4,5 yê sala 1944-da hatine çapkirinê. Bi gotina Sadiq Bahadîn du helbestê Pertew-beg li kitêba li "Dîwana kurmancîda" (rûyê 93-94, 95-96) hatine çapkirinê. Xên jî wê ew wusan jî e'lam dike ku sê-çar xezal û xweşxanêt Pertew-beg li kovara "Nuserî kurd da" N 2 -da sala 1971 hatine çapkirinê. Ev mesele gişk rastin, zanyarê xoşevîst Sadiq Bahadîn gelek wext û hêzê xwe terxan kirîye, gerîyaye, ku destnivîsara dîwana Pertew-beg li nav xelqê kurd destxe, hazîr bike û bide çapkirinê. Ew dibêje "zanyarêd kurd tişteki rast derheqa jî-yîna Pertew-beg Hekarîda e'lam nekirine, bi fikira min Pertew-beg ji binemala mîrêt Hekarî bûye, ji ber wê bi na vê Şa-Pertew navdare, ji mala camêr, xweşmerê balber û xêrxwezda hatîye dinyayê, ji dayka xwe bûye û mezin bûye, cî û wergêd ew têda mezin bûye, cîyê sirişt, rengîn, bi deşt û çîya, gol û havingê û zozan bûye. Ew cî warê zanîst û torê kilasîkî kurdî bûye, li wira rabûne gelek merivêd pîspor, zana, gelek mîrêt rewşenbîrêt kurd xasma li sedsalîya 14-19, zanayêt wek Elî Teremoxî, Elî Herîrî, Feqê Teyran, Melayê Batê, Ahmedê Xanî, Ismayl Bayzêdî, Mûrad xan, Şeref xan, Siyapûş, Ebdulselam Babî û gelekê din jî ji vî wergehî rabûne û dûmayî kirina wan, berhevîya îş û

karê van mêrêt navdar li nav xelqê kurda li Hekarîyêda belav bûbû. Kêm û zêde Pertew-beg haj nivîsarêd wan hebûye û bi xwe" ji binemala xwendkar bûye".

Bi fikira min Sadiq Bahadîn Amedî li paşgotina xweda, ya ku li paşî dîwanê hatîyê çapkirinê, rast dibêje, ku "Bê guman Pertew-beg ji şagirtê Cizîrî bêt, cist û çelek bûye, li ser rêça seydayê xwe helbestê dîwanê bi seng û lêk înan û vehandî û avaz sazê wî vehandîne. Ev hozanvane heta niha her nav bûye, bi belavkirina dîwana wî, zîrek pelewani û desthatina wî dê bo rewşenbirêt kurd û biyanî wekî heye çardê û roja nivro rohin bêt". (228-229)

Helbestê dîwana Pertew-beg Hekarî bi naveroka xweva p'iranî (zorbe) şêr û helbestê û dildariyêne, kêm û zêde hi nek şêrêd wî dildarî mîna şêrêd Meleyê Cizîrî têkelin, dî wanda hem fikira evintîyê, hem ji şêrêd bi fikira çînayetiye (ya dewlemendî û belengaziye) tê lûlandinê, her bi tenê çend şêranda mîna şêrêd Meleyê Cizîrî bîr û bawara sofîtiyê di şêrêd Pertew-begda têne gotinê.

Li pêşiyê divêt bêjim, ku şêr û beyt û helbestê Pertew-beg Hekarî mîna şêr û helbestê Meleyê Cizîrî bê sernav hatine nivîsandinê, ew her bi tertîba herfê erêbî li dû hev hatine rêz kirinê û nivîsandinê.

Li jêrê ez çend şêr û helbestê wî bi herfê latîni bona xwendevanê me delal çap dikim, ku ew bixûnin û haj qeyde û naveroka nivîsara wî bin. Li bendanda min navê çend şêr û helbestên Pertew-beg ji ber xwe nivîsîne.

(*Dermanê derdê întizar*)

*Ez nizanîm dê çi bit dermanê derdê întizar,  
Qet xilas nîne min esla ji derda întizar,  
Ne deme tê seate tê roje, nê mahe, nê sal,  
Dayme pê der pê ez kuştîm vê derdê întizar  
Ay ella ha min reha ke, qet neşêm çû der hed  
Êş û janan dil bi dêrda zêde derdê întizar,  
Huş û daniş, aqil û saman, fehîm û zanîn û xered  
Ber bi talan leşkerê xem kirme derdê întizar  
Merhemek nîne ku da halê dilî bo bikem beyan,  
Ya tebîbek da biket derman derdê întizar,  
Kes bi kes naket xudanî, nasojet dil bi kes*

Dê heta kengê bikişim ez vî derdê întizar,  
 Bo ezîzek xerqê derda întizare Pertewî,  
 Çi kirin gazinde ev gotin ji derdê întizar.

(Dil ji min bir)

Wê ji nû cezba evinê dil ji min bir, dil ji min,  
 Eşweyek wê hor eynî dil ji min bir, dil ji min  
 Agirê hubê bihetim, dil kire mislî kebab  
 Bi avran wê sur şîrinê dil ji min bir, dil ji min,  
 Sebir û aramek nema min her wekî li dêmê semek,  
 Dûriya wê nazenîne dil ji min bir, dil ji min.

Mehroyê exter misalî aftaba tele'tê,  
 Lê me eya nûra hebîbî dil ji min bir, dil ji min,  
 Car bi nazan, car bi xemzan, car bi xeşm û car bi k'în  
 Car bi envaêt kenîni dil ji min bir, dil ji min,  
 Çeşim mestê, fitne qestê, sahrêt cadû sifet,  
 Hatîni û ketne kemîne, dil ji min bir, dil ji min,  
 Ez nîzanim dê çî bêjim zulmîya vê dilberê,  
 Kes ji min naket yeqînê, dil ji min bir, dil ji min,  
 Kirne êxsîrêt du çavan sed şeh û siltan û mir,  
 Ma tenê wê xemrevîne dil ji min bir, dil ji min,  
 Ez kirme mecruhê zexman lê bi lee'lan kir deva,  
 Merhema daxa kirîne dil ji min bir, dil ji min  
 Pertewî dil şubhî wê kî wê li ser narê evîn  
 Ateş çoşa kelîmê dil ji min bir, dil ji min. (176-177)

(Saqî, demekê min bike bêhuş)

Hêdî bihejîn badî seba torey dildar,  
 Her tayekî pê bestne sed zexmî û bîmar,  
 Saqî demekê min bike bêhuş ji bade  
 Rehet bibitin belkî dilî jarî bilindar,  
 Qurbanî te bim rehn û murvet go te nîne,  
 Ji zulm û sitemê bîr bike vî canî li mi yekcar,  
 Canê min û eşqa te ne îroke demsaz,  
 Belkî ji ezel yekin û yeknûrin û yek nar,  
 Dişmin li me dilxoş neke, ey serwerê xuban,  
 Derdê wî da bikitin aşîq qerar,  
 Ji k'erbêt wî ew hingizî bed fel û bed encam,

Rû mede zelîlan û me êdî qe maye zar,  
 Yusif ke rem û nîne biha lêk wekî pîr,  
 Neqda dil û can Pertewe ênandiye bazar. (121-122)

(Pertew were guh bide)

Pertew, were guh bide vê nesîhet (ê)  
 Emma ji dil û can bi diqqet (ê)  
 Da çend xeberêk ji bo te bêjim,  
 Lel û gewher û duran birêjim,  
 Belke ji tera bête zadek,  
 Teşbihê xizir delîlî carek,  
 Hişyar bibe carek ji xeflet,  
 Bîdar bibe ji xewa saqlet,  
 Ger umir bitin te çend sed sal,  
 Axir ecele, menal her hal,  
 Gava ecelê tu bîne bîrê,  
 Kes nîne ji vî biket gizîrî,  
 Zêde ji hezar me li rê ne,  
 Ne xayfê gotina nezîran,  
 Ne wehmê sexire û kebîran,  
 Ne ta'bê gerdena ji eşîyan,  
 Ne nadmê xefleta ji nisîyan,  
 Ne tirs ji hatina eqabê,  
 Me bêm ji muhelka ezabê,  
 Ne xef ji gehra rebê Qehar,  
 Ne şerm ciwabê şahê cebar,  
 Şermende û şermsar û rû reş,  
 Tomarê emel ji bedkarê reş,  
 Bes nîne ji bo te hinde xeclet,  
 Roj û şev û mah û sal û xeflet,  
 Lehzek tu ne hazîrî hizûrî,  
 Daym tu jî îngîyan nifûrî,  
 Carek bike şerm ji dîn û mezheb,  
 Rû mal bibê li dergehê reb,  
 Pir girye û zarî û fixan ke,  
 Rohnika tu birêje û eman ke,  
 Çavan bike nezer bo girînê,  
 Lêvan bike dijminê k'enînê,  
 Ker ke cihan ji seme' û guftar,  
 Destan ke seqet ji xubsê kirdar,

Ezman bike lal ji gotina pîs,  
 Çavan bike kor şibhî îblîs,  
 Çolax ke piyan ji qencî reftar,  
 Bê can bike qenc ji fêlê bedkar,  
 Mehdum bike ezema fisq û infaq,  
 Meksur bike cezma hesreta a'q,  
 Xalî ke dilê ji keber û nexwet,  
 Mesqel ke qewî ji rengê qeswet,  
 Haff te ku sineyê ji k'inê,  
 Bê k'ine bike cihe yeqînê,  
 Pir pak bike dil û hinavan,  
 Newmî ke heram li herdu çavan,  
 Pir nûr bike şevê di tarî,  
 Mesrûr bikê dilê xubarî,  
 Tae't ji xwera bike Misîr,  
 Da can û demax bibin metir,  
 Şehva dilê xwe ji cin û şeytan,  
 Mehdum bike şibtî şere wêran,  
 Paqij bike, gir ke ji kursî (37-43)

(Pertew bes bibêj)

Teze çavêt te belke hatne me tîr,  
 Zilfe bî zincîr bend girtim û kirme esîr,  
 Naz û nezaket cuda xemze û avîr cuda,  
 Esweger ji me cuda bû, nîne ji min rah gir,  
 Ew senema mest xweş hat ji nik meyfiroş,  
 Gote me hanê binoş saxir û bade gir,  
 Ku te mey noş kir, aqil feramuş kir,  
 Helqe me der guş kir, bende wekî ebdê pîr,  
 Xaneyê dil bû xerab, qalib û cismîn kebab,  
 Ger ez nekim ya sewab qet li me eybek megîr.

.....  
 Pertewya bes bibêj, lalê rewan bes birêj,  
 De te bikin kas û gêj dost wekî kuzvir. (123)

(Rez û xak hemû yêk denge)

Bi kerîman rez û xak hemî yek denge,  
 Pêş çavêt hebîban heme dinya tenge,  
 Ger çî rezaq didit rizqê bi her qenc û xirab,

Ku xurî bade bi beq xud tera şîr ninge,  
 Her kesê mest bitin ji meya roja alist,  
 Av saqî vexutin badeye ya xud çinge,  
 Ger ti gulsarê cuhan ser û sinewber guhenge,  
 Dilbera min ji ewan zêde şepal û şenge,  
 Sinbil û yasemîn û nesterin û çiçek û gul,  
 Nirgis û lale hemî ceme' rexê gulrengê,  
 Seherê wextê gulan ku bêy mişkile pir,  
 Yek terefê badeykê me'rb û yek ca cenge,  
 Dê bikim wê xezalê gulşena gulzara bihar,  
 Lê çi bikit Pertew qafiye pir tenge. (194)

(Ji ehwal qîl û qal boşe)

.....

Serxoşê sermest û rendan gote texmînan û bendan  
 Zêde ger dîne duçendan kes nema ba fehm û huşe,  
 Hem birin reyhan û sor gul, hemserin, nesrîn û sinbil,  
 Egreban dîv dane ser mil, efe'ya ser dane doşe,  
 Hesleban û u'd û enber sendelîn û misk û ezfer,  
 Dûr bûye hale li mehcer ezeta xoş e'yûş û nûşe,  
 Aqil û zanîn çûn bi talan, niqte û ezman şibtî lala  
 Lew ji van ehwal û halan qîl û qalek zêde boşe,  
 Zêde van şah û emîran, begler û xan û emîran  
 Kevtne nalêt êsîran, Pertewî helqe bi goşe. (195)

(Rast û Çap)

Îro ke ceyšê kafîran rê-m da hesarê rast û çap,  
 Hindî û tirkî û hebeş hatin dîyarê rast û çep,  
 Tirkêt te mest û bê eman bakêşe û tîr û keman,  
 Êriş bire qesra cibin xelqê te tarî rast û çep,  
 Bû rizme-rizma zirguwan, bû hurme-hurma bişkuwan,  
 Têt û metirk û qumçîyan hatin kenarê rast û çep,  
 Meydan tijî bû eskeran, çavan bi girê keybîran,  
 Cuznan bi tîrêt hawran çûne hewarê rast û çep,  
 Nesrîn ji xûna sor gulan sor bûn wekî bergê gulan,  
 Çavan ji xûna qatlan tîr jê vexwarî rast û çep,  
 Geh sert çû hoşa herîm, geh dihat çû xala herîm,  
 Car bû şev, car bû tav li dêm ta binguha rê rast û çep,  
 Perto tu zêde sahirî, rû mumîn û dil kafirî  
 Ya her di xûnan mayl me kir û tera rê rast û çep (98)

(Hewar ji destê firqatê)

Vê firqetê sewda kirin, firyad ji destê firqetê,  
 Mecmunekî şeyda kirim, firyad ji destê firqatê,  
 Dûr bûm ji didara şerîf, ji derd û xeman bûme nehîf,  
 Bê muns û yar herîf, firyad ji destê firqatê,  
 Avê birîn kesb û sey' umrê ezîz li min bû zey'  
 Heyv-m sera erzê ebley' firyad ji destê firqatê,  
 Îşqa ezîzan ateşe her dem ji nû taze geşe,  
 Ger çi bi min halek xweşe, firyad ji destê firqatê,  
 Eman ji hecra bê eded, geh agire, geh cemed,  
 Dad û meded, dad û meded, firyad ji destê firqatê,  
 Hecir û ferqata namdar bêbextîya çerxa xeder,  
 Têkda kirime tar û mar, firyad ji destê firqatê,  
 Şewqek ji eşqê hate coş, vir dane nav muhbet bi toş,  
 Heyrîne aqil û fehm û huş, firyad ji destê firqatê,  
 Ev firqata dûzex, sifet cehnem ku hefzî jê diket,  
 Bes Pertewê dê çi biket, firyad ji destê firqatê (212-213)

(Saqî demeke min bike bêhuş)

Hêdî bihejin badê seba torey dildar,  
 Her tayek pê beste sed zexel û bîmar,  
 Saqî demeke min bike bêhuş ji bade  
 Rehet bibitin belkî jarî birîndar,  
 QURBANÎ TE BÎM? rehm û mirwe go te nîne,  
 Ji zulm û stemê bîr bike vî canê li mi yekcar  
 Canê min û eşqa te ne îrok ne demsaz

Belkî ji ezel yekin û yek nûrin û yek nar,  
 Dijmin li me dilxweş neke, ey serwerê xuban,  
 Derdê wê ewe da bikitin aşîq gerar  
 Ji kerbêt wî ew hingizî bed fêl û bedencam,  
 Bû deme zelîlan û me êdî meya zar  
 Yusif ke remo nîne biha lêk wekî pîr,  
 Neqda dil û can Pertewê îrandîye bazar (121-122)

(Derdê te bêje, Ey dil)

Çiye derdê te, bêje ey dil, ey dil,  
 Ji çavan xûn birêje, ey dil, ey dil,  
 Ji bo teskîna îş û hireqeta dil,

Heme derdan birêje, ey dil, ey dil,  
 Ji min ehwalê kovanan mepirse,  
 Ku halatek dirêje, ey dil, ey dil,  
 Heçî dax û birîna min li sîne,  
 Ji vê bejna dirêj, ey dil, ey dil,  
 Ne froke te terka aşnayê  
 Ku geta' te jimêre, ey dil, ey dil,  
 Me zanî eşqa me cuban belyayê,  
 Heçî di sûs û gêje, ey dil, ey dil,  
 Wekî te guh neda pendet Pertew  
 Ti marê xem birêje, ey dil, ey dil. (126)

(Nizanim dê çi bêjim)

Were ey eftar husin, ey siltan ferzane,  
 Nizanim dê çi bêjim ez aqilî bûme bêgane,  
 Gelek medhuş û sermestim, li ser hale qet nawestim,  
 Wusa bê pa û bê destim, li min gum bû rîya xane,  
 Wekî tesîrê eşqane, esîr êxiste canê min,  
 Wê bê huşim ji sewda te hedê can peymanê,  
 Di dil eşqa te ger nehêla feg û serpoşek,  
 Cihanek bûye efsûn, cihanek bûye efsane,  
 Omîda min ji cananê, heyata min bi weslê ket  
 Min can mirwet sehraza ezîza min Silemane,  
 Li min taze perîşan kir, dil û xatir, riyal û fikir  
 Gilê nazan di çavan ku zulf îmamê pir şane,  
 Tu Pertew xane rewşen ke ji eşkan dîde gulşen ke,  
 Çiraye meclîsan can hat, hemî can bûne perwane (185-186)

(Heta kengê dê zincîran bimînin)

Şehê cana li textê dil sime'na emir ber ça ke,  
 Welê edilê bike, pêda binyaê zulmê wunda bike,  
 Qiyamet qameta bala bi law afeta canê,  
 Ji balayê bila bêne qiyamet ji qametê rake,  
 Bi qurbanê te bim, cana çi bê dîn da te ev telîm,  
 Di bezma meyxur û rendan du çavan mest û şehla ke,  
 Heta kengê di zincîran bimînin şibtî êxsîran,  
 Kerem ke min bi van tîran bikuj ya bende aza ke (192)



(Feqîran dê keve bikin hewar)

Wê ji xezman ku me dîtî şuhmetî koma teter,  
Fitne peyda bûn ji her yek goşeyê sêsed hezar,  
Eskerê tirkan û mestan bûn ji etrafan diyar,  
Way ber halê feqîran, dê bikin keve hewar,  
Nîne esla melceyek cuz saye zilfa eqab. (65)

Çûye seyra gulşena gulcehre ya gul pîrehin,  
Têk mijîn kirne bax û baxçe, deşt û çîmen,

Meyxur û meynûş û mestexafle ew sêmeten,  
Nîne qet ageh ji halê bilbilê dewra weten,  
Ma dê hîeran û firaqê aşiqê malik xirab (66)

Xûnxur û xûnrêj û xûnê qatle ew mehleka,  
Meyxur û mexmur û mesta serxoşa can ez feda,  
Şehsewarê şîr û kêre seyde bend merheba,  
Sed wekî min fîl û eslan kirne zîndana bela,  
Şibhî sîrê dil kesek ma seyda humnan nebû (67)

(Ew qeder Cavr û cefa min dîtine)

Ser wê azad û qed eşnayî te yeksane li min,  
Sibhî halê me serê zilfê perîşane li min,  
Ew qeder cewr û cefa û stem dîtine min,  
Dize yek lutfê te qîmet bi du sed cane li min,  
Derheqî min te wekî nîne serî rehma kerem,  
Ji lebe le'lê dur û yek te ehsane li min,  
Sebir û saman û sekûn pir li me dijvare gelek,  
Ecel û merg û mirin haleteke asane bi min,  
Ger çî min nîne li nik te qedrê mû di qedir,  
Bendeyê xakî, diret mislî silemane bi min,  
Ji xetê hizretê min dîdey can rewşen bû,  
Çî hedê Pertewê yara wê bende bibet,  
Makim û malikê rûxan sekî cananê bi min. (178)

## ŞÊX XALID

Kamûran Bedirxanê rehmetî di kitêba xweda "Fêrbûna zimanê kurdî" da derheqa Mewlana Xalîda van gilîyê jêrin dinivîse: "Şêx Xalid Zîyaêdîn di terîqeta neqşbendîye, şibha xa lîdî danîyê. Ji kurdê Silemanîyê ye. Li sala 1242 -an ê hicrîda li şamê mirîye. Di çîyayê Çilyaranda veşartîye. Şayrekî mitesewife, dîwanek nivisandîye, lê di bêjeyê wîda gelek yên farsî hene. Ji ber ku zimanê wî ne xwerûye hinek dibêjin wî bi nivkurdî nivîsandîye". Kamûran Bedirxan şêreke Mewlana Xalid di kitêba xweda çapkirîye. Ez wê şêrê jî li vira çap dikim, ku xwendevanên delal bixûnin û haj wî merî jî bin.

## ÇI TEDBİR EY MUSULMANAN

<i>Çi tedbir ey musulmanan</i>	<i>Kî men xûdra nemîdanem,</i>
<i>Ne tersa me, yahûdîyan,</i>	<i>Ne gebr û ne misilmanim,</i>
<i>Ne berîyem, ne behrîyem,</i>	<i>Ne şerqîyem, ne xerbîyem,</i>
<i>Ne ez erkanê tebhiyem</i>	<i>Ne ez eflaqî gerdanim,</i>
<i>Ne ez çînim, ne ez hindim,</i>	<i>Ne bûlxar û maçînim,</i>
<i>Ne ez milkê Iraqê me</i>	<i>Ne ez xakî Xurustanim,</i>
<i>Ne ez avim, ne ez bame,</i>	<i>Ne ez xakim, ne ez ateş,</i>
<i>Ne ez dînya, ne ez îqba</i>	<i>Ne ez Firdewesê Radwanim,</i>
<i>Nîşanim bê nîşan başed</i>	<i>Mekanim lame kan başed</i>
<i>Ne ten başed, ne can başed,</i>	<i>Ne men ez canî cananim,</i>
<i>Ne babame, ne dada me,</i>	<i>Ne ema me, ne xala me,</i>
<i>Li ser weche çiraya me,</i>	<i>Dikim îro di efxanim,</i>
<i>Ji efxana bese salek</i>	<i>Ji maşoqan bese yarek,</i>
<i>Ji bo mibihan hero carek</i>	<i>Walî bim ez bi çeşmanim.</i>

Dil kedef kir tîr li min dan,  
 Bê eded cewher bi min dan,  
 Xemzeyê pir mekr û fendan,  
 Lê li min berda girînê,  
 Bê sebeb ketme nivînê,  
 Lê ji ber husna şerînê,  
 Kanî hura ser zemînê,  
 Ev bi xef, halim bibînî,  
 Zilf û xal û xemrevînê,  
 Zilf û xal û mest û naze  
 Gerdenê gerden firaze,  
 Cerd dîkin ehlê mecazê,  
 Xef dîkin esrar û raze,  
 Ez çi kim sewm û nemaze,  
 Min ji dest tembûr û saze,  
 Dil ebir û mest û mîrê,  
 Da li min derbek bi tîrê,  
 Kirme hibba zemberîrê,  
 Kanî Meleyê Cizîrê.  
 Xanî şêxê Babeşîrê  
 Xemrî û gîs û herîrî  
 Şev dikim nalîn û zarî  
 Ey Sîyahpûş tu xumarî  
 Çend Sîyahpûş tu sitarî  
 Dir û yaqût û mirarî  
 Hespê şahê şahsiwarî  
 Dilberê ehlê dilan bû

Lê ji halê meste mendan  
 Lewme noşê can bi der dan  
 Lê li min casusî bû.  
 Muhbeta wê nazenînê,  
 Ax û efgan û enînê,  
 Şeq bû bedra yasemînê,  
 Carekê bête girînê,  
 Merhema bavê birînê,  
 Bo me calinosî bû,  
 Îşweyê wan xemzebaze,  
 Lê ji eşqa rûyê taze,  
 Ta serî yasî û gaze  
 Kar û şixil bê niyaze,  
 Dil wekî naqusî bû.  
 Begler û şah û wezîrê,  
 Ta li mirînê min vebîrê,  
 Sîne kir arman li tîrê,  
 Mek-kî û Eliyê Herîrî.  
 Ben li dengê min feqîrê,  
 Şev li min kabusî bû.  
 Şihbetî teyrê biharê,  
 Sahibê edeb û karî,  
 Lêbi eşqa dil nikarî,  
 Misk û enber jê dibarî,  
 Angeh ez pabûsî bûm,  
 Qatilê cergê pijan bû,  
 Qasidê ruh û can bû.

## SIYAHPUŞ

Li nav xelqêda navê Sîyahpûş e'yane wek şayre, lê heta niha qet kesekî nav û nîşanê wî nenivîsiye, ne aşkeraye jî kîjan erdê Kurdistanêda, kengê ji dayka xwe bûye. Dîbêjin ku li nav kurdanda nav û dengê wî belave û perçên şêrên wî jî li nav xelqê bi zar dîbêjin, dixûnin. Lê sed car heyf heta niha kesekî dest nivîsara şêrên wî, yan jî dîwana wî heta niha dest ne xistiye. Dibe li paşwextiyê merivên kurdperwer, hezkerê ziman û edebyeta kurdî lê bigerin û ji wanra bext lêxe, li cîkî destnivîsara wî, yan jî be-revoka şêrên wî dest xî n û çap bikin. Li vira ez her bi tenê dikarim perçekî şêra Sîyahpûş çap bikim bona xwendevanên delal. Ew şêr li kitêba doktor Kamûrane Bedirxanê rehmetîda ya bi navê "Fêrbûna zimanê kurdî", Paris, sala 1968, rûyê 47) çapbûye.

## DİLBEREK MIN DÎ

*Dîlberek min dî bi çavan  
Agirek berda hinavan,  
Şemh û rihniya zîlamê,  
Zîlf û xalên di temamî,  
Şerbeta şîrin kelimê,  
Sed şikir fro selamê,  
Şerh û teqrîrê îslamê,  
Reng û elwanê di Camî,  
Şihbetî çavê di rengê,  
Mirarê tîra xedengê,  
Kes ne dî qet wî çi rengî,  
Qet ne ma qet wî çi rengî,  
Sifdera mêrê di cengê,  
Sed hezaran wek bi şengê,  
Min qebûle hikmê rindan,  
Lê çi bêjim qewl û bendan  
Zehmetek wan pîr bi min dan.*

*Sed elif pabûsi bû,  
Şemh û der fanusi bû.  
Agirek berda di amê,  
Qeyd kirin mehbûs bi damê,  
Terkî min ne dît midamê,  
Kir li min teze xulamê,  
Fikir û teswirê kelimê,  
Şihbetî tawûsi bû.  
Qews û ebrûyê di bengê,  
Zîlf û xal û xinçe rengê,  
Nexşê maçîn û firengê,  
Hikmeta Têmûr û lengî,  
Şêr û mexmur û pilingê,  
Hikmekî kawusi bû.  
Serxweş û sûret lewendan,  
Ketme tora lehl û xendan,  
Kefşe bim wek gaz û sindan.*

## CEGERXÛN

Cegerxûn şayirê azadîxweza neteweyê kurde, dengbêjê dostî û hevkarîya milletane, şerkarê aşîtîya dinyayêye, nav û denge wî li her çar parên Kurdistanê parevekirîda belav bûye. Di zemanê meda derheqa wî û efirandinên wîda gelek gotar û miqale nivîsîne û kovar û rojnamanda çapkirine, qedir û qîmetê helbestên wî anîne ber çavan, dinya pê hesiya ew çî mêre, çawan jiye, çî kiriye û efirandîye. Heval û hevkarê delal Kemal Burkayî di pêşgotîna xweda ya ku di "Rona-kêda" (dîwana Cegerxûnda) çap bûye, nivîsîye, ku wê gelek dûr û direj bikişîne, eger meriv bixweze bi ser Cegerxûn û efirandinê wî binivîse. Bi rastî jî wusane, meriv nikare li ser jiyîna wî, kirina wî û efirandinê wî yekoye gilî bike yan jî binivîse, wê gelek dirêj be. Bi kurteberî gotî Cegerxûn li sala 1903 jî daykê bûye, navê bavê wî Hesenê kurê Mehemed, Mehemedê kurê Mehmûdê kurê Elî. Di biçûktîya xweda berxanî, şivantî û gavantî kiriye. Berî wê bavê wî çûbû rehmê, ew sewî li cem xuşka xwe Asê maye. Piştî vê yekê çav daye xwendinê û ketiye rêza feqehan. Li cem mele Ubeyd dersê şeriyetê hin bûye, şadnama xwe ya ulmê şeriyetê standiye, li Kurdistanê Iraqê û Îranê bi metelî gerîyaye, belengazî û hêsîrîya milletê xwe bi çavên xwe dîtîye û bûye xemxur û dilêşê milletê xwe, navê cegerxûn li xwe kiriye. Dest bi nivîsandina şêr û beyta, helbestan li ser jiyîna milletê xwe kirîye û nivîsîne. Heta niha pênc dîwanên wî çap bûne. Du dîwanên wî li Sûrîyê çap bûne, sê dîwan jî li Swedê çap bûne. Osman Sebrî, tekoşerê neteweyê kurd di pêşgotîna xweda ya ku li dû dîwana Cegerxûn ya duwemînda çap bûye, ev gilîyê jêrin nivîsîne: "Eva dîwana ji dîwana seyda a pêşin bi gelekî xweştir û hejattir derketîye. Di dîwana pêşînda seyda ne hinde xurt û ne ji armanca xweda durbîn û yekrû bû, lê ev dîwan li ser armancake xuya hatîye nivîsîn û rû û rêça wî têda xweş diyarin".

Niha şikir hemû dîwanên Cegerxûn çap bûne, em dikarin bi kurteberî çend gilîyan derheqa efirandinên wîda bêjin. Mezinayîya Cegerxûn, qedir, qîmet û hejaya efirandinên wî, jiyîn û kirina wî baştir û çaktirin têne ber çavan çaxê meriv nivîsarên wî, helbestên wî dixûne, bi xwendina efi-

randinên wî meriv bi zanîn, hozanî, marifetî, camerî, mê-ranî û deliya wî dihese, bi çavê xwe dibîne ew kî bûye, çî kiriye û kîye; wî rojên xwe li nav agir û alava Kurdistanêda derbas kirine û gihîştîyê wê rojê, wî zemanî çaxê kurd ji xewa kibir hişyar bûne, berê xwe dana ser rîya şerê azadî û serxwebûna xwe û welatê xwe. Bextewarîya wî di jîyîna wîda ewe, ku nav û dengê wî li nav parçên Kurdistanê parevekirîda belav bûne, biçûk û mezinê kurdan navê wî bihîstîne, keç û xortên kurd yê delale delir, xûnşîrîn û dilverin nivîsarên wî xwendine, bi ezber helbestên wî hîn bûne, rêzên wan li ser ala azadkirina kurd û Kurdistanê nivîsîne, dane ser milê xwe û derketine meydana şerê serxwebûna welatê xwe, bûne heval û hevkarên azadîxwez û aş-tîxwazên dinyayê, bûne dost û hevkarên pêşrevên demokratîya rastî li welatên Rohilata Nêzik û Pêşînda.

Hemû efirandinên Cegerxûn bi naveroka xweva pareve dibin ser komê jêrîn:

- 1- Şêr û helbestên li ser jîyîn, ayîn û halê kurdan,
- 2- Şêr û helbestên li ser zana, hozan û şayîrên kurdan,
- 3- Şêrên dildarîye û evîntîyê,
- 4- Şêrên li ser bajarvanîyê (yên dostî û hevkarîya neteweyan û aş-tî li nav wanda).
- 5- Şêrên tarîx û dîroka şerê serxwebûna kurdan,
- 6- Şêrên pêşberî muftexuran (axa, began, şêx, pîran, bûrjuwazî û kapîtalîstan),
- 7- Şêrên pêşberî zulma faşîzmê,
- 8- Şêrên rewşenbîrkirina (ronahîkirina) neteweyê kurd,
- 9- Şêrên pêşberî dîn, dîyaneta û ayîna kevneperestî,
- 10- Şêrên filosofîyê (binêre pêşgotina min li dîwana Cegerxûnda ya bi navê "Zend-avêsta, dîwana 5-a, Stockholm, sala 1981). Naveroka van komên şêrên Cegerxûn, bîr û bawara wî bûne bîr û bawara her xortekî kurd, her qîzeke kurd; her pênc dîwanê wî bûne qurana her mêrekî kurd, her jineke kurd bûne dîn û îmana azadîxwez û aş-tîxwezê kurd.

Li vira ez çend şêr û helbestên wan dîwanên Cegerxûn ji xwendevanên me delalra çap dikim, ku ew wan bixûnin û mijû lîya xwe pê bikin.

P.S. Berf ku ev kitêba çap bibe, du dîwanên Seydayê Mezin Cigerxwîn dinê çapbûn: Dîwana 6'a, Şefaq û Dîwana 7'a Hê-vî.

### XEWA BIRÇIYA NAYE

Birçibûnê serî xwe hilda ev deh salin,  
 Kurdên reben li hawîr birçî û bê malin,  
 Hin dewlemend û têrmal û pir zêr û gundin,  
 Lê pirên wan belengaz û reben û bê şalin,  
 Kurdên jor bi ser ên jêrda hilweşiyar tîn,  
 Xort û gedek û şîrmij û keç û pir û kalin,  
 Dewlemendan kodik xistiye nav lingên xwe,  
 Guh nedêrin ka belengaz çima nale-nalin,  
 Li alîkî zarok û şîrmij birçîne, diqirin,  
 Xewa birçiya nayê, tev zarok û mindalin,  
 Xuyaye, kurêd dijminê felekêye her dem,  
 Dijminên felekê di her çax û deman mirdalin.

Kes kesî xwedî nake, lê talanên hev  
 Ji çolê dibin, hin Rostem û hin Zalin,  
 Ji dijminra egît û comerd û nandarin,  
 Ji xwera parsek û bêmîrês û pergalin.  
 Ma ji xwedê rewaye herkes nanê wan  
 Bixwin û ew parsek û evdalin.  
 Heçî maldarin, ji xwe bi xaltik û xalin,  
 Lê heçî bê malin, ji xwe bê xaltik û xalin.  
 Herkes bi xwendin bûn xudanê tang û top,  
 Bê em derwêşin, bi xişt û xencer û kopalin.  
 Şal û qumaş ji me standine dijmin tev,  
 Li cihan dest tengin, bê pirtî û pertalin.  
 Cegerxûn xemhilgire, li ser we dinalî tim,  
 Mal nine, lê xem di ser dilê wîda qerpalin.

## DESTÊ ŞÊX MAÇI MEKIN

Destê şêx maçi mekin, ew şêx ne qutbê razîye,  
 Tac û şewket tev xebata destê sar û tazîye,  
 Ew ne dîne, dîn mebe, dîn serxwebûna milete,  
 Ser mebe ber lingê şêx, kengê xwedê jê razîye,  
 Ma ji bo dîn şer dikin xortê Feranse û Înglîz ?  
 Wa li Misirê xwîn dirêjin, bûn şehid û gaziye,  
 Ger nexûnin dê beg û axa me tim talan bikin.  
 Ev nezani cangirani kareki nasaziye,  
 Rêncberê şêx û melayî, karkerê axa û beg,  
 Ê hinan pê karine, lê ê hinan canbaziye,  
 Ew kesê zana divêt tim wek Cegerxûn bikin qîr,  
 Raste, wî zincîr di milda tim bi qîr û gaziye.

## XANIYÊ COTYARA

Xanîki kûr teng, li dor çar dîwar  
 Lî ser wî pûş, û lî bin beşt û dar,  
 Sifre û şîrîk bi kunc û eywan,  
 Bi kulek û refik hem bi nerdewan.  
 Her çar dîwarên wî ji ax û av,  
 Mal û sermiyan zar û zêc di nav.  
 Kulav û balîf û doşek û mitêl,  
 Beroş û merşef, hem teşt û hem sêl,  
 Qadulk û kodik kaxik û hizik,  
 Meşk û eyazşîr, cewdik û dizik.  
 Mîşin û legan sêni û rûnpêj,  
 Moxil û bêjing, serad û girbêj.  
 Hestîv û maşîk, tîfik, xacîrgan,  
 Bêr û zembîl û bivîr û dustan.  
 Kevçî û kefgîr, derxwîn û berfmal,  
 Heçî û weris, werqil û çengal,  
 Xaş û bendek, û çewal, tûr û têr,  
 Şûjin û derzî, çawbir û hem kêr.  
 Di ber zavêda xencerke neriz,  
 Li serê malxwê zêr-taca Hurmîz,  
 Keçîk wer digirin şar kesrewan,  
 Di ber datînin çiçek û reyhan.  
 Dilxweşin her wek Sitî û Tajdîn,  
 Cegerxûn, welat man wek Mem û Zîn.



## KONÊ REŞ

Konê reş bi pişkoj û rewake û çît,  
 Bi pêşmal û perde û pargon û şîrît.  
 Di binda çewal û tejber û kulav û nivîn,  
 Bi pez û deve û hêstir û dewar û mehîn,  
 Kebani sipîdê radibe, pir çelenge, bê xew,  
 Sêpiyê li dar datîne û li dar dixê meşka dew,  
 Mast dibe dew û bi ser dikeve nivîşkê zer.  
 Nivîşkê xwe xwê dike û davêji binê hîz,  
 Li welatê jêr hîze, li welatê jori dîze.  
 Sivika hundur keçe, yan bûke yaxud qerwaş,  
 Benik li desta û tûrê rengî li paş.  
 Kom dikî quncik û siturik û sergin,  
 Malxo rûniştiye Çeko, Ferzende û Gurgin.  
 Pez tê ser dana û bêrfivan diçin der,  
 Şivan pez dike kom û serbêrî li ber.  
 Şîr didoşin û vedigirin ciwanik û pîr,  
 Kod bi desta û li nav piştê eyarşîr.  
 Êr varî agir û pêti geş dibe li nav konan,  
 Wek çirax û loks yan stêrên li ezman.  
 Rencber û malxo bi tifingîn, bi qîrçîr û gizgîz,  
 Terşê xwe diparêzin ji dijmin û gur û diz.  
 Çend rojan li warê xwe dimînin ew koçer,  
 Bar dikin hêstir û bergîr û huştir û ker.  
 Bi ir û zir deng ji wan tê geh bi sehîn û kalîn,  
 Koçer diçin, swarin, xort û kal û keçên narîn.  
 Wardozî tim diçin, digerin li waran,  
 Dengê pez tê, kalîna berxa û warîna karan,  
 Kona datînin şerîta vedirêşînin paş û pêş rind,  
 Li pişt hev rêz dikin wek bajar û gund.  
 Mêkut radibe ser serê sing û di binra pêwend,  
 Pev diçin pêşîr û bend û quffik û bazin û zend.  
 Diçêrînin kulîlk û hoşib û gîhayê rengreng,  
 Li wan diborin sal û dem û gav û çax û beng,  
 Bi şadî dilxweşî dimênin bê keser û bê şîn,  
 Li cihan temaşa nakin ey seydayê Cegerxûn.

## DÛRÎ DIJWARE

Vê dûriyê ez dîn kirim, eman ji destê dûriyê,  
 Bê xwendin û bê dîn kirim, eman ji destê dûriyê,  
 Dûrî ji pêta agirî, dil girtiye qet namirî,  
 Her dem ji ber nal û girî, eman ji destê dûriyê.  
 Tirsim ji pir dûr kevim, dîsa di axa kûr kevim,  
 Nêv pence mar û mûr kevim, eman ji destê dûriyê.  
 Vê dûriyê em da kirin, çavên belek wunda kirin,  
 Em girtiye derdan kirin, hewar ji destê dûriyê.  
 Çavên di reş, dêmên gulî biskan xwe da ser wî milî,  
 Tîr dane dil çî bikim gilî, hewar ji destê dûriyê.  
 Cênîk û zilf û bisk û bêş wek top û tang û tîp û geş,  
 Min dil ji wan her dem bi êş, hewar ji destê dûriyê.  
 Êdî bese, ey dîlberê, carek ji pişt perdê derê,  
 Wer cem rûnê wek berê, hewar ji destê dûriyê.  
 Wer em herin nêv baxçe tev, bade binoşin roj û şev,  
 Rengê gulên dil bidne hev, eman ji destê dûriyê.  
 Her du dilan pir xweş bikin, em sor gulên rûgeş bikin,  
 Van bilbilan şûreş bikin, hewar ji destê dûriyê,  
 Bilbil dike qîr û eman, تنها li cem wî gulciwan,  
 Ne gihaye remza ebriwan, eman ji destê dûriyê,  
 Ew çav li didara te kî, wê ariyê li yara xwe kî,  
 Bezî ji gulzara xwe kî, hewar ji destê dûriyê.  
 Şanî bide wextê seher, zilfên di reş, xalên di qer,  
 Cênîk û zêran deyne ber, hewar ji destê dûriyê.  
 Da çav li wê bejna te kî, carek li ber min tobe kî,  
 Pesnê gulên dîsa nekî, hewar ji destê dûriyê.  
 Rengê gulê ew kiriye dîn, her dem dike qîrîn û şîn,  
 Wek min ceger nabî bi xûn, eman ji destê dûriyê.

## SERXWEBÛN

Kurdino, merdino, pir xweşe serxwebûn,  
 Ew demên tar û teng ko din vane çûn,  
 Dest bidin hev hemî, pêş kevin em hemî,  
 Da biçin bo welat yan mirin yan felat.

Roj li me hate der, zû şîyar bin ji xew,  
 Ev dema ceng û şer paş ketin êdî hew,  
 Dest bidin hev hemî, pêş kevin em hemî,  
 Da biçin welat yan mirin yan felat.

Min divê ol û bext, min divê pêşveçûn,  
 Min divê tac û text, min divê serxwebûn,  
 Dest bidin hev hemî, pêş kevin em hemî,  
 Da biçin bo welat yan mirin yan felat.

## TA KENGÎ

Ev reng biratî me navê ger timî wa bin,  
 Hevsar me girêdayî bi turtanê kera bin,  
 Ew begler û axa û emê jar û geda bin,  
 Ew rencbêrê dijmin û emê rencberê wan bin,  
 Ey karker û cotkar bese, dem hatiye, rabin,  
 Ta kengê emê karkerê axa û bega bin,  
 Ta kengê emê hestiyê bin lingê sega bin,  
 Ta kengê emê kole û riswa û ebîd bin,  
 Bin destê merivên wek Beyar û Seîd bin,  
 Ta kengê li sinora wekî birc û kilîd bin,  
 Ta kengê ji hevra hemî mêrxas û egîd bin,  
 Ey karker û cotkar bese, dem hatiye, rabin,  
 Ta kengê emê karkerê axa û bega bin,  
 Ta kengê emê hestiyê ber lingê sega bin,  
 Çawa ko dizanim tu timî şerkar û mêrî,  
 Deng daye di Şerqêda bi xwe fêris û şêrî,  
 Îro tu çima wer biwe tirsok û newêrî,  
 Perda gidiya ser xwe veda, da xwe veşêrî,  
 Ey karker û cotkar bese, dem hatiye, rabin,  
 Ta kengê emê karkerê axa û bega bin,  
 Ta kengê emê hestiyê ber lingê sega bin.  
 Perda gidiya carekê xweş rake, hilîne,  
 Çavê xwe veke, guh bide hawar û qîrîne.

Lingê terasan zû tu ji axa xwe derîne  
 Îdî tu metirs hemdemê cebarê te çîne,  
 Ey karker û cotkar bese, dem hatiye, rabin,  
 Ta kengê emê karkerê axa û bega bin,  
 Ta kengê emê hestîyê bin lingê sega bin,  
 Pir şerme ko em deh ser milyonê nifusin,  
 Pir şerme ko em abîdê dinar û filosin,  
 Pir şerme ko em birçî û bê mad û mirusin,  
 Heyfe ji mera hemdem û hemxakê Urisin.  
 Ey karker û cotkar bese, dem hatiye rabin,  
 Ta kengê emê karkerê axa û bega bin,  
 Ta kengê emê hestîyê bin lingê sega bin,  
 Ta kengê di zindana bibin, hebsî û girtî,  
 Dara li ser û lingê me xin begçî û şirtî  
 Ta kengê bixun ev beg û axa me bi xurtî,  
 Ta kengê emê dey li we kin her we bi sirtî,  
 Ey karker û cotkar bese, dem hatiye, rabin.

### HÛN ÇI ZANIN ŞER ÇIYE

Pîj û ber dibarin fironek, top û tang,  
 Bi girrîn, bi xumîn bûye şer, bûye ceng,  
 Kumişîn, hilweşîn xan û bircên belek,  
 Genî bûn, kurmî bûn pir kelaş, pir cedek,  
 Bi sîngo, bi gule didirin, dikujin,  
 Ser gever, çav belağ, dev ji hev mêr û jin,  
 Dil bi tirs diçin hev bi quluz, di dizî,  
 Ser hasin bi tiving, bê hêvî, bê xwezî,  
 Şevereş bi birûsk, bi çirûsk, bi tavan,  
 Bi qêrîn, bi nalîn, bi hawar, bi aman  
 Ber diwar pîr û jar tev sêwî, tev bê cî,  
 Bi hêstir, bi girî, tev tazî, tev birçî,  
 Ser bi xwîn, dilbirîn, hemî jar, perîşan,  
 Rû kirêt bi zincîr, bi merbend di zîndan,  
 Nizanin diçin ku, ji bo çî dîkin şer,  
 Wan dajon ber kêrê xwînfiroşên beşer,  
 Dikirin me ji hev bi dolar, bi peran,  
 Me dîkin qurban ji bo xwe wek beran,  
 Destê xwe didin hev xwedî mal, xwedî gund,  
 Me didin ber gulan da bijîn serbilind.

Em hemî belengaz tev cotkar, tev karker,  
 Me digirin bi zorê, me dibin ji bo şer,  
 Em hevdu dikujin tev birçî, tev tazî,  
 Ew li mal dadigirin serên xwe bi nazî,  
 Divê em şiyar bin, destê xwe bidin hev,  
 Li ser xwe hilînin perda reş weke şev.  
 Koledar, xwedîmal, xwedî gund bikujin,  
 Serbilind, rû bi ken, tev bijîn mêr û jin.

## HALÊ GUNDIYA

Xanî ji kelpîç pir teng û nexweş,  
 Reş û bê ronî ji dixanê reş,  
 Hin pez û dewar di nav çavên wan,  
 Kufletên wan pir, ne pênc û ne şeş,  
 Wek kuna rovi govik û şkeft,  
 Rindin ji derdan bûne wek heneş,  
 Kûrin weke koz tev gemar û toz,  
 Jê tê bîhna pîs tev av û dilop,  
 Tev mêş û kelmêş pêşî û dûpişk  
 Kolma sehê reş, hêlîna miqrop  
 Li dora birê teqan û çirav,  
 Her der weke hev ne rêş û ne şop,  
 Hawîrdora gund tev qerş û gemar,  
 Sergîn û tepik gihane ber dev,  
 Jin û keçên wan li guhera pez,  
 Pişkul û rixan her ro didin hev,  
 Ba û babilosk toz û tirabelk,  
 Li wan diderin bi roj û bi şev,  
 Sergio li ber der pir xweşe ew der,  
 Her kes diçin ser odeyê ew nav,  
 Li hev dicivin ji cî nalivin,  
 Hin bi tifold, hin jana zirav,  
 Ava devê hev hemî vedixun,  
 Bi şadî û ken çî xweşe ew nav  
 Hawîr nexweşî li ser wanda tê,  
 Derman ji doktor çawa bikirî,  
 Xwe xwedî dikin sal bi sal bi zor,  
 Zor dane ser wan sorik û xurî,  
 Her kes dil bi xem zor û stem,

Qêrîn û hawar nalîn û girî,  
 Tim bi reş û şîn hemî dilbirîn,  
 Hin kor û bawî hin keçel û kop,  
 Axa û began ew kirne talan,  
 Tebeqa mêrkuj tebeqa zirzop,  
 Malê wan nîne, hemî birçîne,  
 Tim davêjin top, tim davêjin top  
 Şev û roj xebat dîsa tev birçî,  
 Yan nan zebeş yan nan û mehir,  
 Pirê wan pêxwas, bê şal û kiras,  
 Cixare vexwar ne hiş û ne bîr.  
 Kulla pir giran besa li ser wan,  
 Van şêr û melan ew hiştin feqîr,  
 Cotkar û karker tev bê ser û bêr,  
 Birçî û reben hemî palevan,  
 Comer û camêr hemî wek şêr,  
 Her şev li cem wan rêwî û mêvan,  
 Ne xema waye çiqas birçî bin,  
 Çiqas tazî bin, hemî dilovan.

### PEMBIWÊ MEYE LÊ EM TAZÎNE

Te av didin ey pembû ! bi hêstirên çavên xwe,  
 Te xweş dikin, geş dikin, bi van dest û gavên xwe,  
 Xebat hemî li ser me, di dest meda tevr û bêr,  
 Bi zor em te pêk tînin, paşê digihê xwedî zêr,  
 Tu pemiwê erdê me, lê em rût û tazîne !...  
 Yek ji sedî digihê me, hê em jê razîne.  
 Hewqas giran bihayî, qedrê te em nizanin,  
 Bê xwendin û gundîne, lewra em jî xizanin.  
 Ev kaniyên hemî zêr ji rex gundên me tên der,  
 Zend û bendên me pir xurt em tev cotkar û karker.  
 Dixebitin şev û roj, şerme hê jî birçîne,  
 Welat li ser navê me, lê em têda bê cîne.  
 Dewlemendên polperest tim tim dixwin malê me,  
 Bê îman û bê wijdan ew guh nadin halê me,  
 Ew qerêja destê me dixwin li me napirsin,  
 Em tev tazî û birçîne, ew ji xwedê natirsin.

Erdên me û avên me, lê bê fêdî dixwin ew,  
 Paşdamayî belengaz, tev bê xwedî dixwin ew,  
 Xebata me kara wan, em rençberên dizane,  
 Berên rezan dixwin ew, em pêwanê rezane...  
 Ew xwêdana milên me tê, ji wanra dike zêr,  
 Heta şîyar nebin em tev, ew li jor, em li jêr,  
 Şîyar dibin hin bi hin, em bi zorê dibin yek,  
 Hindik maye bişkenî serê axê, serê beg.  
 Ji bo were bimînin ev qas gund û dexl û av,  
 Kes nikarî xelas bi bi gotin û lavelav.  
 Divê hinik dijwarî di vê rêda bibînin,  
 Yanê em çî biçînin, emê wî zû hilênin,  
 Hevalên me li her der, ji xwe gelek dan kuştin,  
 Heta ax û av û mal hemî ji bo xwe hiştin.  
 Di vê rêda em rabin, weke şêr û weke mêr,  
 Ev pembû û ev genim ji bo wera dibin zêr,  
 Gundên me jî xweş dibin, dibin qesir û ronahî,  
 Xwendigeh û sînêma, hemî av û şinahî...  
 Ev hasin û trektor tevda dibin malê me.  
 Îdî nabin gêj û kor, pir xweş dibe halê me.  
 Bi serbestî, dilxweşî bikin kar û barê xwe,  
 Mêr û jin û keç û kur rûgeş herin karê xwe.  
 Ne hêstir û ne girî, ne kuştin û ne talan,  
 Weke xûşk û bira bin, dewlemend û xwendevan.  
 Di nav meda nemînin ne axa û ne jî beg,  
 Destê xwe em bidin hev, di her tiştî bibin yek,  
 Bi çepik û lîlandin, bi devkan û xwedîtî,  
 Hemî bijîn bi hevra; bijî bijî yekîtî.....

## HOZAN Û ŞAYİRÊN KURD

Xortên kurd hozanên welatê te,  
 Evin, rabûne ji şax û latê te.  
 Li seyda guh bidêrê, ez bêjim,  
 Çend dilopan ji xamê birêjim,  
 Her yeke seyda melayê Botî,  
 Di xoşxanêda evîndarî di totî,  
 Ji kurdara wî çêkiriye yek diwan,  
 Di balexeta xweda wek quran,  
 Yekî di heye, rêberê kurde, Xanî,  
 Di xoşxanêda Firdewuse sanî.  
 Wî çêkiriye ji kurdara yek diwan,  
 Lê temaşê kin kurdno sed aman,  
 Ma ne bese Nubar û Mem û Zîn,  
 Gazî dike bi zarê şîrin û qêrin,  
 Yekî di heye Feqê Teyran,  
 Li şolan herdem girtiye seyran,  
 Bi rastî murxê di benda evîn,  
 Bi kurdî dibê bi zarê şêrin.  
 Yekî di heye seydaye Sîyahpoş,  
 Di welatê meda çerxa gerdoş,  
 Seyfulnuluk çîroka vê merdî,  
 Li Misrêye, lê bi zarê kurdî.  
 Yek Mewlana Xelflê Sferdî,  
 Swarê hespê kêmweşê kurdî,  
 Nivişteke bi navê nehecn leman,  
 Bi zarê kurdî, lê ji bo xas û am.  
 Yek mewlana Selimê Hizne.  
 Kurdperwer û mezin û rêzane,  
 Wî di ber kurdada xwe da kuştin,  
 Çend xoşxan bi şûna xweva hiştin.  
 Yekî di dibêjne wî feqê Reşîd,  
 Di zarê kurdî fihris û egîd,  
 Nivişteke wî heye bi navê Sermehşer,  
 Zarokên kurdan dixwenin ezber,  
 Şeyx Eburehmane ew ji Axtep,  
 Hawîr lêdaye geh rast û geh çep,  
 Nivişteke çêkir wî Rewduneim,  
 Çîrokên kevnare û gotinên qedim.



Melaye Batî bi zarê durdî,  
 Mewludek nivisandiye kurdî,  
 Swarekî çelenge ew serdar,  
 Şêrê laxer berdaye bê hefsar.  
 Pertewê jîr hozanê Hekkarî,  
 Xoşxanê wî wek dur û mirarî,  
 Yekane gewherin mane bê rumet.  
 Kurdno bese, xirete, rabin sed xiret.  
 Melayê Xasî mewluda zazî,  
 Bi zarê zazî çêkiriye, ne tazî,  
 Cengnama kurd û ermen nivîsî,  
 Wek agir berdî me di îsî.  
 Hozanekî jîr û zanaye Bêdarî,  
 Bi zarê kurdî tim dikî zarî,  
 Axawikê hoşxanê wî kevnar,  
 Ji Bêdarê gelek jar û bêdar.  
 Hozanekî hêjaye Brivkanî,  
 Di serê wîda hoşxanê kanî,  
 Murxê şahîne di baxê evîn,  
 Li xunçê gul girtiye kemîn.  
 Mîr -Miheye Hozanekî Miksî,  
 Li ser Sînem dibêje û dipirse,  
 Sotaye ew ji ber derdê evîn,  
 Digirî û dinalî li hawar û şîn.  
 Yekî di heye, seydayê Licî,  
 Xoşxanê xwe wî kirne du cî,  
 Pesin û dijûna dike ew wek min,  
 Dostê şêxan û ji wanra dijmin.  
 Yekî di heye, Yusifê Kenanî,  
 Di rastîda wek Yusifê sanî,  
 Şêrek çêkiriye li ser Semsiddin,  
 Feqeh ji ber dixûnîn wek yasin.

## EY HEVAL ROBSON

.....  
 .....  
 .....  
 Ey heval, Pol Robson,  
 Derdê min û te, ev derdê giran,  
 Zordestîya ko kete nav cihan,  
 Hin mezin, bilind, dehqan xanedan,  
 Hin reben bindest mane perişan.  
 Ji vî derdê Marks, Ingels,  
 Bûne du rêzan, bûne du hozan,  
 Lénin, Stalín rê şanî me dan,  
 Pale şîyar bûn, xebat û lebat,  
 Roj hilat, roj hilat....  
 Xelas bû rojhilat,  
 Roja sor, roja zer,  
 Ji Mosko hate der,  
 Tava xwe da Balkan, da Elman,  
 Xwe berdaye ser Çín, Çín,  
 Çîna mezin, Çîna giran  
 Şewqa xwe da Hînd,  
 Tev dagirt cihan, cihan ...  
 Ey heval Pol Robson,  
 Karker û rencber, cotar şîyar bûn,  
 Reben perişan bi hevra rabûn,  
 Bi tang û top diçin şêr û ceng,  
 Li her der Qêrîn, li her der Hawar,  
 Li hawîr bû deng,  
 Dixwezin azadî, serbestî wekhevî.

.....  
 .....

## DESTÊ TE MAÇ NAKIM

Şêxê min destên te îdî maç nakim ez, bese,  
 Kavil û wêran te hiştin ev sera û medrese,  
 Şêxê Evropa binêre, wana hasin birne jor,  
 Em bi xişt û def û dilan paš ketin, tev mane kor,  
 Her keşakî deh zimana zanî rengê Eflatûn,  
 Em çima hov û nezanin, ser di berda paşveçûn ?  
 Qet bi sîwaka te dijmin paşve naçin gavekê,  
 Bo çî tev mane perîşan, dil û bendê davekê.  
 Xortê kurda tev şiyar bûn, dil bi pêta agirî,  
 Bayê zanîne li wan da, gur dibe, qet namire.  
 Dev ji vê paya xwe berde, ev tiralî ma çîye,  
 Me ne şerme, rût û xwase, kurd jar û taziye,  
 Bes di pişt perdêda rûnî, ey cwanmêr xwe binas,  
 Dijminê jîna welatî, tim bi dest te tevr û das.  
 Hêj bibêjim, tê bibêji ev Cigerxûn gawure.  
 Na, di bextê tew xwedêda, dil bi pêt agire,  
 Ez dizanim pir dirêj kir min li te peyv û kalam,  
 Ger tu kurd û kurdperest bî, em birane, weselam.

## MEHRECAN

Pêkva em xortê ciwanin,  
 Tê n ji her şop û cîhan,  
 Mehrecan bo me ciwanin,  
 Her bijî ev mehrecan.  
 Doza me her azadiye,  
 Doza me dimoqratiye,  
 Doza me her aşitiye....  
 Ger bi vîn û ger civîn,  
 Yan xebat û keferat,  
 Her divê em herne pêş,  
 Her divê em herne pêş  
 Bo felat û bo welat.  
 Em hemî dost û hevalin,  
 Bo çî bend û berberî ?  
 Têkda nûhatî, delalin,  
 Ev çî ceng û şerkerî ?  
 Doza me dewlemendiye,  
 Doza me ser bilindiye,  
 Doza me her aşitiye.....

## DINYA PÊLÊ EVÎNIM

Cana xwe derîne tu ji pişta çeperê,  
 Perdê tu hilîne, ku li min roj bi derê,  
 Şevreş bike ronî, tu bi loks û fenerê,  
 Maçek ji du lêvan bide, ey lêv şekerê,  
 Ewe dermanê birînê û kul û derd û kederê.  
 Ronakê dilim, dawarê vê jin û evînê,  
 Carekê tu bizane sebebê nal û girînê,  
 Sozek bide min, ko ji mera bête civînê,  
 Bi nedînê dikujî min, vedijênî me bi dinê,  
 Maçek ji du lêvên teye dermanê birînê.  
 Ey hor û perizanê, şepal, nazik û rindê,  
 Wey xesrewê rindan û şehê bale bilindê,  
 Ma qey tu nizanî şewitîm, ez wekî findê,  
 Sed bendik û zincîr te girêdane li zendê,  
 Ta kengê bihêlî me di vê davik û bendê ?  
 Carek tu were xweş veke van bendik û dava,  
 Destim bihejîne û li dil awirê çava,  
 Tu bi lêvên şekerî min bide ber pirs û silava,  
 Van ah û kulan der bixe carek ji hinava,  
 Jîna me ne maye, li me roj va çiwe ava,  
 Heta bi sipîdê me li ser hev nalî û gazin,  
 Ma qey tu nizanî, ji te ka em çi dixwezîn.  
 Ahan vedirêsin, bi şevan dev wekî sazîn,  
 Sed tîre di dilda me ji birhên te di bazîn  
 Ronik me ji çavan dirêjin, dê çilo razîn ?  
 Wer da ko binoşim, ji lêban şîr û şerabê,  
 Zaza ji mera lê bidî aheng û ribabê,  
 Heta ku bipîdê biderê bayê sehabê,  
 Jîna me li ser destê perî, çengê xurabê,  
 Kestî me şkest, mane di nav pêl û ibabê.

## KEÇA KURD

Keçê rabe, serî hilde, di vê çaxê weha nâbî,  
 Binêr, jin çûne ezmana, heta kengî di xewda bî,  
 Dixwezim zû bixûnî xweş, ji ser rû rakî çara reş,  
 Tu gavan pêşda bavêjî, wekî Ander û benda bî,  
 Çine ev çarik û pêçî, di rextada xwe rapêçî,  
 Bi destê te kelaşnikof, bera zana û xwenda bî,  
 Ji dijminra tu merkuj bî, di hindurda tu paqij bî,  
 Ne xav û bê xuy û rijî bî, meger çendan li gundan bî,  
 Berê gundi û recber bî, welatparêz û perwer bî,  
 Sipî bî yan tu esmer bî, wekî fanos û finda bî,  
 Wekî findê dikî ronî, li bajêr yan li gund rûnî,  
 Dîya şêr pilinga bî, hevala ser bilind bî,  
 Erê şoxê, erê şengê, bi hevra em herne cengê,  
 Girêdayî heta kengî bimînî dîl û winda bî,  
 Dixwezim ko wekî min bî, bi dijminra tu dijmin bî,  
 Di cengêda wekî cin bî, ne rengê bûm û kunda bî,  
 Were, xûşkê, tu zû rabe, di şêrda rengê şêra be,  
 Berê ala meye rengin li ser şaxan te hilda bî,  
 Di rojên şahî û cejnê, binêrim ez li wê bêjnê,  
 Bi hevra em herne dansê, tu padişahê rinda bî,  
 Şêrin û nazik û rind bî, şeker lêv û sipî zend bî,  
 Were, em hev bikin hemêz, bere fetwa xwe min da bî,  
 Keça zana û jêhatî, bibe partî -Dimoqrati,  
 Bera dîsa tu şêrina dilê xorta û seyda bî.

## GULA ROJHILATIM

Gula baxê bihişta Rojhilatim  
 Di tarîxa şevê rojim, hilatim,  
 Ji nav sînga demê pijiqîme îro,  
 Di tarîxê fireh hatim, Feratim,  
 Hemî jînim, dixwezim xweş vejînim,  
 Hezar û nehsedî şîn bûme, katim,  
 Birûskim, pir çirûsk û hewr û tavan,  
 Bi himhim têm, ji ezmana welatim,  
 Lehîme ez di ser hevda diborim,  
 Dixwezim nû bikim rêz û civatim,

Birûsk û pêt û ar û kevne sojim,  
 Ji pût û lat û lahuira şewatim,  
 Disojim, lê dikin ronî şeva reş,  
 Çira koraye ev kar û xebatim ?  
 Di rêva ez diçim, lê seg diqorin,  
 Fidakarim, li ser rêça felatim,  
 Dixwezim ez ser hevra bifurim,  
 Xebatim, şorişim, xweş keferatim,  
 Cihan tevda wekî pingav û derya,  
 Têne jêra wekî çok û qenatim,

.....  
 .....

### KÎ HILGIRÊ VÎ BARÊ MIN

Qet nerm dikî dilê neyar  
 Ev hewar û gazîya min ?  
 Pişt xuze, barê min giran,  
 Kî hilgire vî barê min ?  
 Her roj û her êvar û şev,  
 Hewar û nalîn tîn ji dev,  
 Guh nedne dengê me tev  
 Heval û hem cinarê min.  
 Kurdên nezan û rê nenas,  
 Jar û reben, birçî û pêxwas,  
 Petrol di binda, bê kiras,  
 Nabîne xweş vî halê min.  
 Bi dest neyar top û tiving,  
 Bi dar dixwezim herme ceng  
 Hewar dikim, qêrîn û deng,  
 Şkestîye ev darê min.  
 Gazî dikim kurdên xewar,  
 Rabin ji xew carek şfyar,  
 Hawîr li dijmin bidne dar  
 Tev gundî û bajarê min.

## REWŞA WELAT

Şoriş dest pêkir, qêrîn û gurmîn,  
 Gule barandin, li hawîr xurmîn,  
 Dijmin hilweşand tev gund û bajar,  
 Zar û zêçên me jar ber dîwar,  
 Li jor balafir, li jêr tang û top,  
 Ji xûnê sor bûn hemî şûn û şop,  
 Welat carekê dane ber şewat,  
 Milet perîşan, bê kar, bê xebat,  
 Birçî û tazî, hemî perîşan,  
 Bê mal û bê cî, ne xew, ne razan,  
 Eriş tinin me ew gurên devlok,  
 Derketin çolan hemî pîrhevok.  
 Ji ber firokan hewar û gazî,  
 Jar û birçîne, pêxwas û tazî.  
 Tev tirs û sawir, din û sergever,  
 Gelî dagirtin axîn û keser,  
 Di ber lingan çûn jin û keç û bûk.  
 Li ser lep diçin zarok û biçûk,  
 Ser û dest û pê sor bûne ji xwîn,  
 Cegerxwîn bigirî, bigirî dilbirîn !

## EVÎNA DIL

Evîna dil, te dil kiriye birîndar,  
 Bihara min, hemî zer bûn gul û dar,  
 Me ew rojên ciwanî dan bi tolik,  
 Ketim heştê, ji nûva bûm evîndar,  
 Diran û çav pêkva şkestin,  
 Û porê min sipî bûye bi yek car,  
 Bi her caran dibî xort, dibî pîr,  
 Ji bona min nema hêjane her çar.  
 Ne zanim ez, di gel jîne dibarim,  
 Weke berxê di nav pencên gurê har.  
 Dinya pêkva di çavê mînda xweş bû,  
 Niha pîrim, di çavê mînda bû sar,  
 Şeva reş pêj vedane, hate ser min,  
 Kî roja min li ber avaye, êvar,  
 Ciwan bûm, ez bi dost û yar û kes bûm,  
 Ku pîr bûme, hemî kes bûne neyar.

Evîna min weke hespê çelenge,  
 Revandim ez, ne zengo û ne hevdar.  
 Li ku dimirim, ezê çî bikim bi Hesar ?  
 Ketim heştê û ser jêr bûme deştê,  
 Ne ew lat û ne ew hîm û ne ew dar...  
 Berê rengê pilingan ez bi saw bûm,  
 Ji ber xapan niha ez bûme keftar.  
 Bi ber pêlan ketim bê doz û daxwaz,  
 Dinalim ez wekî hirçê birîndar,  
 Cigerxwîn bes bibêje, pîr dirêje,  
 Bese kurdo, ji xew rabe tu hişyar !...

Stokholm 18-6-1980

## ZIMAN Û HÎNKIRINA ZIMAN

Vejêne zimanê xwe, ey xwendevan,  
 Nebûye mîlet hiç kesek bê ziman,  
 Zimanê me xoş û xeroş û ciwan,  
 Eger baş bizanî, tu nakî zyan,  
 Tu kurmançiya xwe ji bîra nekî,  
 Eger baş nizanî, divê zêde kî,  
 Elifba û dîwan û rîstan bixwîn,  
 Heta ku wekî min nebî dil bi xwîn,  
 Binêre, zimanê te çend dewlemend,  
 Li bajêr tu carek xwe bigihîne gund,  
 Bibêne çî şêrine ev reng ziman,  
 Çî paye bilind û çî rûmet giran,  
 Bi pirsên xwe nazik, bi dengên sivik,  
 Ne pirsek biyanî be, nabe girik.  
 Tu paqij ke, zarê xwe şêrin bike,  
 Bi kurdî tu baxêv û qêrin bike,  
 Tu binivîse, çêke hezaran nivîşt,  
 Nivîştixan li herder ji wan bine mişt,  
 Wî bigihîne rêza zimanên mezin,  
 Zimanê beyanî dixwênî çira ?  
 Zimanê xwe carek naxwenî, bira  
 Sedan sal, hezaran zimanê meye,



Wekî me di bin destê dijmindaye,  
 Çi gernas û mêrê di meydanê ceng,  
 Ne şûr û ne mertal, ne top û tiving,  
 Xwe parast ji dijmin wek pehlewana,  
 Gelek efirandin wî pirsên ciwan,  
 Meger lê xuyane hinek toz û jeng,  
 Ne guhnê wiye, em şiyar bûn dereng.  
 Eger ko hebûna me Firdewisek,  
 Weyan Xaniyek, yan ji Kercosiyek,  
 Zimanê me xweştir dibû ji farisî,  
 Belam bûye nanê ceh û garisî  
 Li alikî lor, li alikî gor,  
 Li alikî kurmanç û kelhor û sor,  
 Wekî me gelek perçene tev li jêr,  
 Kesî guh nedaye mizgeft û dêr.  
 Mirîşo bi tazî me tazî dikin,  
 Di rojêda pênc car me gazî dikin,  
 Li mizgeftê tazî dibêjin mela,  
 Binêrin, çî deng tê ji dêrên fila,  
 Bi tazî dixwênin wekî tazîyan,  
 Dijîn em bi hovî, çîye ew jîyan ?  
 Bi çîrok û helbestê û folklor,  
 Payê zimanê me xweş çûye jor,  
 Di ristêda carek mebê bêkese,  
 Ji bo payedarî Hesarî bese,  
 Cizîrî û Xanî, çî gernase ew,  
 Weke Dicle û Zab û Arase ew.  
 Siyahpoş û Nalî û Batî bibîn,  
 Tu Miksi û Nurî û Hacı bixwîn,  
 Tu ristên evan Sehsiwaran bikêş,  
 Bi daxwaz û pirsên qelew çûne pêş,  
 Bi lêvên gulana wan şikandin şiker,  
 Ku hingî bimênin, bixwênin ji ber.  
 Li bûka ciwanî kirin xeml û xêz,  
 Le meydanê tore bezin pir bi hêz.  
 Bi xema xwe dir siftine wan gelek,  
 Bi saza xwe awaz gihandine felek,  
 Ku yaqut û elmas û mircan bi rist,  
 Bi hûnan ristin civandin dirist.  
 Ji bûka zimanra ku pêşkêş kirin,  
 Zimanê me yê xweş bi pêşve birin,

Niha jî hinek nû bi pêşve diçin,  
 Jin û mêr û kal û ciwan û keçin.  
 Bi tîrê ji bîrê duran qul dikin,  
 Bi xwêdanê xaman gula şil dikin.  
 Bi awir cewahir dîkin parepar,  
 Ku millet bi wan awiran bû şîyar,  
 Serê xwe ji xew rake, şerm û fehêt,  
 Mexeyde çî bêjim li bejna me têt.  
 Zimanê xwe bixûne her dem ji dil,  
 Were da bi hevra herin mil bi mil.  
 Li alîkî destê xwe bavên tiving,  
 Mehêle zimanê te jî bigire zeng.  
 Meger ko zimanek ne ber tişte, lê  
 Millet bê ziman wek girara ber kelê.  
 Zimanê me xweşê, ne sade qerêj,  
 Eger yek nizane, tu jêra bibêj.  
 Eger raste, tu hozanî, ey bîrewer,  
 Rîya rast eve, ez dibêim pêda wer,  
 Tu rêzan û hozan û hem xwendevan,  
 Çima wer dixwezî bimîni nezan.  
 Eger min dirêj kir li te pirsyar,  
 Dixwezim tu şîyar bî, ey xwendewar.  
 Dizanim xwendin çiraye, çira,  
 Çima xwe li me geş nakî, ey bira ! ?

## KARKER Û COTKAR

Bi destê te pale, cihan xweş dibe,  
 Nezanî ko bextê te wer reş dibe,  
 Bi roj û bi şev her li bajar û gund,  
 Li ser hev dikî xan û qatên bilind,  
 Tu hasin dikî top û tang û tiving,  
 Di ser dijminanda dikî qîr û deng,  
 Firok û gerokên xweş bi pehlewan,  
 Bi hêzê milên xwe têni cihan,  
 Xwedî sermiyan vê gemarê dibin,  
 Di rojekê dehyek bi dest nakevin.  
 Tu kara xwe ya pir dixî dest ewan,  
 Bi zor derdixî roj bi roj kinc û nan,  
 Bi pişta xwe ya xûz û destên gemar,  
 Xebata xwe bi erzan didî destê neyar,  
 Çi gernas û mêrî, çî dêwê xebat,  
 Ji bo dijminaye hemî keferat..  
 Tu eywanê Kesra mezin çê dikî,  
 Pir û xanên bilind lê dikî,  
 Tuwî dawerê wan kelat û sera,  
 Li pêşîya merivan tu bûyî çira.  
 Tu çêkrox û lêkirox û xweş dawerî,  
 Tu dêwê xebatêye xweş karkerî,  
 Dikî û didî, lê tu birçî û jar,  
 Ne jendî, ne xwendî bi destê neyar,  
 Tu xav û ne ristî, bi sistî diçî,  
 Bi karên di zendê tu rû qerçimî.  
 Tu piştxûz û milxwar û ser tim li ber,  
 Bi xore şev ro dikî ceng û şer.  
 Çi xurtî? Çi dêwî? Çi milhasinî,  
 Çi kohe bilindî wekî dasinî ?  
 Tu Zagros û Cudî, bilind û stûr,  
 Ku ev çende daxwaz ji te kûr û dûr,  
 Ji xwe rabe, carek şiyar be tu zû,  
 Di jînê tu xweş zanibe arezû,  
 Bizane seranser cihana teye,  
 Eger ranebî, tev ziyana teye,  
 Divê hilgiri çek wekî pehlewan,  
 Bi destê xwe bigirî seranser cihan,  
 Li dar xî tu rista xwe ya wekhevî,  
 Bibe wek bihiştê li her der zevî.

## PARTIZANÎ

Bibe partîzanek bi rist û dirist,  
 Di gel partizanan here dest bi dest,  
 Ji miletra rê xweş ve kin rengê şêr,  
 Eger xurtemêrî bibe wek stêr,  
 Tu ronî bide karker û gundîya,  
 Tu xweş bike dilê bav û xuşk û diya,  
 Tivingê tu bigire, girêde tu rext,  
 Herin ser çîya, yan ji text, yan ji bext,  
 Bibe partî, hem bibe partîzan,  
 Eger serbilindî dixwezî bizan,  
 Nikarî bibî serbilind, nav giran,  
 Heta ko serda nebî wek beran.  
 Li ser van çîyan ko nekî qîr û ceng,  
 Bi êriş û hawar û halan û deng.  
 Tu nabî serferaz û azad û kurd,  
 Li çolan tu dimirî wek Yezdigurd.  
 Bi dijminra çendan bibî dost û yar,  
 Dibî rencber û koleyê koledar,  
 Ciqas şerme û pîse wilo dil bi tirs,  
 Dibî koleyê turk û tazî û firs.  
 Kurê Keyqubad û kurê Erdeşêr  
 Çi şerme wilo ko te ser daye jêr.  
 Here ser çîya, lê bi top û tiving,  
 Şerê dijminê kurd bike wek piling.  
 Te dijmin deranî, dibî xweş mezin,  
 Bi lîl têne pêş te kemerzêr û jin,  
 Li eywanê Kesra dibî şehreyar,  
 Xwedî rist û destûr û ferman û dar.  
 Dibî payedar û xwedî mêr û pişt,  
 Welatê xwe yekser dikî bihişt,  
 Dibî wek çira geş di nêv rohilatê,  
 Bi te geş dibin tev çîya û kelat,  
 Divê bîr û bawar bibî wekhevî,  
 Xwedî par û pişk bin bi mal û zevî,  
 Eger wek dibêjim bikî, yan bibî,  
 Derê zezemînê li min de vebî,  
 Bi paye bibin em hemî serbilind,  
 Li we dê binêrin hemî şox û rind.  
 Di xan û seranda bijîn dilxweşî,  
 Ji nav me bîqestî, herî çavreşî.

## SERBESTÎ Û BINDESTÎ

Tu serbest bijî, pir xweşe ev jîyan,  
 Ne tenha ez û tu, belê tev cihan,  
 Tu serbest bibêje, tu serbest biger,  
 Tu serbest bixwaze, tu serbest binêr,  
 Tu serbest bilîze, tu serbest bixwe,  
 Tu çi bikî, bike, ger bikarî bi xwe ?  
 Mehêle ziyana te bigihê kesî,  
 Di kar û xebatêda bibe Markisî,  
 Tu kara xwe pêşkêş bike bo hemî,  
 Bira û merovin hemî ademî.  
 Bibe rêberê karker û palevan,  
 Wekî roj tu tava xwe bidî cihan,  
 Tu pir teng menêre li royê zemîn,  
 Eger seza bî, bibe durebîn.  
 Belam ger di qada xwe serbest neji,  
 Bizane, tu tava xwe nadi xwe ji.  
 Tu xwîna xwe birêjîne, serbest dibi,  
 Divê rê cikûs bî tu bindest dibi,  
 Tu serbestiyê wa hêsani mebin,  
 Hevîrek strandî bi ronik û xwîn,  
 Ne şerme hezar sal tu bindest diji,  
 Çi bêjim, bi van gotinan napiji.  
 Divê ko bixwîni, bibi xwendewar,  
 Di bîr mijîda nemêni gemar.

.....  
 .....

## XWENDIN

Xwendin nebi kes naçe pêş,  
 Peyda dibin pir derd û êş,  
 Her dem di bin destê neyar,  
 Em dê bidin xûki û bêş,  
 Ev tac û şewket xwendine,  
 Ev dîn û dewlet xwendine,  
 Ev serbilindî xwendine,  
 Ev dewlemendî xwendine,  
 Herçî nexwendî rêncbere,  
 Ê ku bixwêne rêbere,  
 Her dem di nêv xan û sera,  
 Serkar e, ya serwere,  
 Ev tac û şewket xwendine,  
 Ev dîn û dewlet xwendine,  
 Ev serbilindî xwendine,  
 Ev dewlemendî xwendine.  
 Xwendin divê hem pir xebat,  
 Bo milletê kurd û welat,  
 Kurdno ji xew rabin hemî,  
 Mizgîn li we, roja me hat.  
 Ev tac û şewket xwendine,  
 Ev dîn û dewlet xwendine,  
 Ev serbilindî xwendine,  
 Ev dewlemendî xwendine.

## OSMAN SEBRÎ

Li paş Cegerxûn şêrê serê çiyayê Kurdistanê yê duwemîn Osman Sebrîye. Di rewşenbîrkirin û şerê xwenaskirina kurdanda û di şerê serbestî û azadkirina kurdanda gelek roj û salên giran li pêşîya wî mêrî bûne. Lê ew li îş û karê xweda ji rîya xwe venegerîyaye, xebitîye, şer kirîye bo xatirê serxwebûn û azadîya neteweyê kurd.

Osman Sebrî di sala 1905-da li gundê Narincê (Kurdistana Tirkîyê) ji dayka xwe bûye. Bavê wî serekê eşîra mirdêsan bûye. Di sala 1915-da bavê wî çûye rehmetê. Apê wî Şukrî ew xwedî kiriye, daye ser xwendinê. Sala 1922-da Osman Sebrî dibistana "Ruştîyê kuta kirîye. Herdu apên wî Şukrî û Nurfî ji ber têkelîya şûreşa şêx Sehîd li sala 1925 li Amedîyê (Diarbekirê) hatne dardakirinê. Zar û zêçên malapanê Osman Sebrî mîna zar û zêçên malên kurd bi hezaran dikevne nav rojên reş û giran. Osman Sebrî tev hevalên xwe, tev xortên bi xîret dikeve derdê neteweyê xwe, tevî wan bi dizî û aşkera dest bi şerê azadkirina neteweyê xwe dike, dixebite. Hukmeta roma reş wî digirin, davêjine hepisxana û ew di girtîxanada dimîne heta sala 1928. Di sala li 1929-da careke din li Malatîyê wî didine ber dadga herbîyê. Gava rê dikeve ber Osman Sebrî, ew berê xwe dide Suriyê û 24-XI sala 1929 derbasî sînora dibe. Di Suriyêda ew xebata xwe wetenperwerîyê dom dike, di zivarî, belenga zî û rojên reşda dijî û ji ber xebata şureşgiriye li cîkî natevite, li nav welat û miletê xweda digere û bîr û bawera serxwebûn û serbestîya kurd û Kurdistanê belav dike. Sebeb vê yekê ew gelek caran tê girtinê. Têkuşerê neteweyê kurd Hemereş di nivîsara xweda, ya ku li pêşîya dîwana Osman Sebrîda ya bi navê "Apo" sala 1976 li Evropê çap bûye, dinivîse: "Osman Sebrî 12 caran hatîye girtinê, car caran ji mal û welat sirgun kirine, 5 caran ketiye ber çav-nêriya polîsa Suriya".

Bi gotina Hemereş û Nûrêdin Zaza Osman Sebrî xwendin û nivîsandina kurdî li cem Celadet Bedirxanê navdar û emekdar hîn bûye, bi saya serê jêhatî, zirekî û fehmdariya xwe ew li nav demeke kurtda baş hîn bûye û dest pê kirîye bi pirsên dîrok, civakîya mijûl bûye, gotarên tarîxî li ser kurd û Kurdistanê nivîsîne, serpehatî, hikyat û çîrok ni-

vîsîne. Ji her tiştê bêtir û baştir ewî jêhatî û şarezatî ya xwe di meydana nivîsandina şêr û helbestanda nîşan kirîye. Ewî gelek şêr û helbest nivîsîne. Nivîsarên wî dîrokî, yên serpehatî, yên hekyatî û çîrokî û şêr û helbestên wî li nav salên 1932-1945 li kovar û rojnamên kurdîda yên Celadêt Elî Bedîrxan û Kamuran Bedîrxan çap dikirin, dihatne çapkirinê. Xên ji wê hine şêr û helbestên Osman Sebrî li kovara "Çîyada" hatine çapkirinê. Heta van salên peşin berhevokên nivîsarên Osman Sebrî ne hatine çap kirinê, her bi tenê di sala 1979-da Hemereş dîwaneke wî biçûk bi sernavê "Apo" çap kirîye. Ewî di pêşgotina xweda nivîsîye çima ewî navê wê dîwanê lê kirîye "Apo". Ew dibêje: "Di nav Kurdîstana navînda pîrsa "Apo" gelek giranbihaye û ew kesên ku têne hezkirin û pê bawarkirin, an ji navsal, xwendin zanîn û serpehatine, ji wan kesanra bi vî rengî dibêjin "Apo". Gotina "Apo" ya van kesan tê bihîstî û her kes hîvîya rindîyê, qencîyê, lêbanîne, alîkarî û şîretan ji wan dikin". Hemereş dibêje "Ji wan kesan, yêk jî Osman Sebrîra dibêjin "Apo", Osman Sebrî tê ber çavan, tê ser ziman û lêvan û ji ber vê yekê me jî li ser pertoka wî ev navê hêja danî".

Divêt bêjim, ku di vê pertokêda hemû nivîsarên Osman Sebrî ne hatine çapkirinê, mesele, helbestên "Pîra gendorê" "Xweşxana Çîyayekî", "Cejnepîrozîya welat", "Leheng", "Rewşa xortan" û çend hebên din di vê pertokêda çap ne bûne. Wusa jî têda nivîsarên wî din yên peşxan (çîrok, dîrok, serhatî û hekyat) çap ne bûne. Derheqa vê dîwana xweda Osman Sebrî van giliyên jêrîn dinivîse: "Rojekê ji rojan ne dihat bîra min, ku ev nivîsarên min di nava çil û pênc salanda, di demeke xweser û rewşa kambaxda hatibûn nivîsin û piraniya wan di hin kovar û kitêbokên kurdda hatibûn belavkirin, ho lê bigihin li ser hev û dûrva kitêbêkêda bêne çapkirin. Berî her tiştî ez ne şaîrim, lê gelekî keyfa min ji xwendin wêra tê û car caran jî dinivîsim. Jê pêva bawariya min bi fêda û qenciya şêrê pir mezine. Çi dema şêr, an çîrok bi awakî rêber û rênas bêne nivîsînê, dikarin miletekî serwest û hişyar bikin û ji bo têkuşînek niştimanî pêk bînin". "Di sê salanda hevalê hêja Hemereş di xwestin van nivîsarên han bicivîne serhev û di dûrva kitêbêkêda çapke. Ji ber ku min ev nivîsarên xwe hêjayî welê ne didîtin, min qîma xwe bi daxwezeke welê ne tanî û



her min şûnda dixist. Lê bûyerên van salên paşin, nemaze îsal, pêlên nokerî, keysebazî û nandozîyê ku di nav gelê me ê rebenda bi awakî xurt û kirêt rabûn, hiştin ku qîma xwe bi gotina Hemereş bînin û hîn nivîsarên nuh ji têxme ser ên kevn". "Ji ber ku me kurdên bakur bi zimanê xwe ne xwendine bû û bi zaravê kurmançî nivîsan ne bûbû, nivîsarên min ên destpekê hinekî qels hatine. Heya xwendevan bi karin nivîsarên kevn û nuh ji hev binasin, me tarîxa her nivîsareke li bin danîye. Dawî welatê ku em têda dijîn, he ke bihîştta em bi zimanê xwe bixwînin, teqez min dê îro bi kariya çaktirîn van nivîsara binivîsîya, ji ber ku ziman bi pir xwendin û nivîsandinê pêşve diçin. Lê gelek mixabin ku nehîştine ku ro bi serê me keve û em ji hemû mafê siyâsî, civakî û zanîstî bêpar hiştine. Ji ber vê yeke min nivîsarên xwe holê bi nav kirin: "Gotinen xav nepijîn bê tav".

Eva nîşan dike, ku Osman Sebrî bi xwe nivîsarên xwe şêrbê jî kom kirine û ji Hemereşra şandine. Ew şêr û helbestên wî yên di vê berhevokêda tunene, dibe ku ewî nikar bûye wan kovar û kitêban dest xe, yên ku ew têda çap bûne, yan jî dibe ewî bi xwe nexwestîye wan şêra û helbestana bike nav berhevoka dîwana xwe. Bi gilîkî di vê dîwanêda hemî şêr û helbestên Osman Sebrî çap ne bûne. Têda wusan ji nivîsarên wî din, nemaze nivîsarên peşxan (dîrok, serhatî, çîrok û hekyat) çap ne bûne û bi xwendina vê berhevokê xwendevanên me delal haj pê nabin, pê nahesin nivîsarên wî din hene, çawanin. Eger em dîna xwe bidne ser kovar û rojnamên kurdên Suriyê (kovarên "Hewar" û "Ronahî", "Rojanû" û yên din), emê pê bihesin û bizanbin, ku Osman Sebrî di wextê xweda a'lim û zanyarekî bi hêja bûye, bi pirsên tarîx û êtnografîya neteweyê kurdva mijûl bûye û çend nivîsar li ser wan nivîsîne. Mesele, em navê çend nivîsarên usa bêjin: "Tarîxa kurd û Kurdîstanê" (Hewar N 29,28,30), "Êzdî û ola wan" (Ronahî N 19,20,21), "Nêçir" (Ronahî N18) "Nêçîra xortan" ("Hewar" N 48). "Leheng" (Serhatîya merxa sên serê şêx-Sehîd) ("Çîya" N 3,4,5,6,7), "Çîyayê Sasunê" ("Hewar" N 27), "Ziman û nivîsandin" ("Ronahî, N 24), "Li welatê çînan" ("Ronahî" N 12), "Warên me ne ê kore" (Hewar, N 51), "Terşên şevê" ("Ronahî" N 14), "Şeytanqune kî" ("Hewar" N 55,56,57), û yên din. Divêt wusan ji bêtê gotinê, ku Osman Sebrî bo miletê xwe camêrîke mezin kirî-

ye, ku ewî bi rezadilê xwe dîwana yekem ya Cegerxwûn çapkiriye û li pêşiyê pêşgotineke bi hêja nivîsiye.

Ez li vîra mijûlî lêgerîna van nivîsarên pêşxan yên Osman Sebrî nabim. Min li jorê navê wan nivîsaran nivîsin, ku xwendevanên me delal haj pê hebin, ku xên ji şêr û helbestên wî wusan jî nivîsarên wî peşxan hene. Ez hîvîdarim, ku wextekê têkuşerê rewşenbîrkerên kurdan hemû efirandinên wî kom bikin û li berhevokêda çap bikin, reng û rûyê nivîsarên wî bînin ber çavan, qedir û qîmetê wan bi temamî nîşan bikin.

Herçend navê vê xebata min "Gulçîna Gulistana şêrbêjên kurdaye", ez li vîra şêr û helbestên Osman Sebrî bona xwendevanên xoşevîst û delal çap dikim, ku ew hînî bîr û ramana wî jî bin.

Piranîya şêr û helbestên Osman Sebrî yên welatperweriyêne yên yekîtî û hevkarîya kurdanin, yên rewşenbîrkirina wanin bo xatirê azadî, serbestî û serxwebûna wan û welatê wan. Di şêr û helbestên xweda Osman Sebrî temiyê, şîrêtan û nesîhetan li miletê xwe dike, temî û şîretên wî berê pêşin ji keç û xortên kurdra têne gotin. Di şêr û helbestên xweda ew nîfiran li merivên duru, xwefiroş dike, reng û rûyê kirêt şêx, axa, bega û serekên xwefiroş nîşanî gundî û xebatkaran dike, gazî xort û keçên kurd dike rabin meydana şerê pêşberî stemkarên xelqê kurd, pêşberî faşîstên ereban, pêşberî goveka hukumdarên tirk û fars, yên bûne xûnharê xûna miletê kurd. Ew fikir û bîr û bawar di van şêrên jêrinda têne dîtine :

### HALÊ WELAT

*Divê tu zanibî, ev bûne sê sal  
Min ne dît xwişk û bira, xelkê di mal,  
Ne me dît axa welat, pîra diyan,  
Ne vexwar kewsera gewr ava çîyan,  
Dipirsî iro ji min halê welat,  
Dê bêjim jê diçin sed agir û pêt,  
Çi çîya, deşt û newal, rêl û zimag,  
Çi bajar, gund û kelat avahî pag,  
Heya bi dar û çîya kuç û zinar,  
Bi girîn, kezêb ji min anîne xar.*

Ne kêzan, ne şivan û şîna giran,  
 Sorgerî ava çeman bi xwîna biran,  
 Rojê sed êş û birîn, renc û keser,  
 Ji dil û cergê wan der têne der,  
 An dibin armanc ji bo tîra neyar,  
 An dibin ji nav welat bê, şûn û war,  
 Axivîn ji canê welat diwazde birîn,  
 Herikîn Dicle, Firat deh sala xwîn...  
 Qe nizam hewceye wî halê xirab,  
 Ku ji min cerg û hinav kirîye kebab,  
 Dibêjim bê sor û ber, bê doz û tol,  
 Ji me çûn deşt û çiya, namûs û ol.  
 Pir spas ji xwedê, we ew der ne dît,  
 Tu bê qey nemane mêrxas û egît,  
 Welat dîl, xelkê têda hemî reben,  
 Bê girîn nabîni, rûkî li ken.

### QULING

Ho quling, kude diçi? berva bakur kil dibî her,  
 Te rana ustîyê xwe, pêl bûn ji te bazik û per,  
 Ji bo çi te zu berdan berî demê ew germîyan?  
 Qey diçi nava welêt, zozanên kurd serê çiyân,  
 De fermo, venîşe, tu pêlekî em bipeyvin,  
 Heye ku gelek najo li wî erdî em bicivîn,

Qin.... qin.... qin....

Te çi got? çi dibêji? serwext ne bûm, teyrê delal,  
 Sî sal bûn çavnêriya min dikin gelek heval,  
 Heye li zozanan, te dibînim pirsê dikin,  
 Divê tu bi ser û ber bêji wan vî halê min,  
 Li vira wer her derê em kurd bûne sê kerîyan,  
 Ne yekin, nabine yek wek sêwiyên ber derîyan,  
 Birek jê şêx û axa, yê duduyan dewlemendin,  
 Ê mayî reha mîlet, wî dest û pê li kemendin,  
 Du birran dest dane hev, birrê mayî dixapînin,

Geh bi virr, geh bi zirtan wan li pê xwe radikişînin,  
 Çi dema feyde ne kir xap û derew, zirf û gurran,  
 Dest davên darê neyar, dajone ser wekî guran,  
 Bi destê zorkeran ew serê millet dişkênin,  
 Holê ew bi bêbavî ronîya xwe dirêjînin.  
 Me berê hêviya xwe girêda bû bi hinek kes,  
 Pirr ne çû, xweş xuya bû, ne ew mêr bûn, gelekî qels,  
 Diçin ew li ser şopa bav û kalan hemî reben,  
 Bûne her di nav destên neyaranda listik û ken.  
 Gelê kurd spartina qîlên zorker bi dilreşî,  
 Dixwun xêra welêt digel dijmin ew bi xweşî,  
 Gundî û karkerên kurd ji her mane bêpar,  
 Derketin ji nav gundan, derbi derin, bê cîh û war,  
 Çi cotkar, çî cewêlek mane li ser nanê tîsî,  
 Keda wan tête dizîn bi zorbazî, çelp û pîsî,  
 Jê hinek digihe miwezefên diz û keleş,  
 Yê mayî dê bicive di berîka axayê rûşey,  
 Da salê çend caran pê here Bêrût, Heleb û Şam,  
 Bêereq, cuz û xapîn, tolazîyê wan nînin kam,  
 Bi virr û zirt û pesin rave dibin xweyî rûmet,  
 Herwekî piştmerê çak tîne cêle doza millet,  
 Lê dema tê xebatê, dibêjne me "Em nikarin"  
 Ne wekî we sutalîn, tevda xudan kar û barîn,  
 Di rîya kar û debar her kêmiyê ew hiltînin,  
 Ji bona ku neêşin herdem serê xwe datînin,  
 Wunda bûn, wunda dibin, wecibê xwe ne di birîn,  
 Ne xebat, lê di peyve tev jêhatî gelek jîrin,  
 Bê kirin, him bê kêrin, bi kêr nayên zimandirêj,  
 Ne birin, wan bîr niye, qe bîr nabin, mêjî qirêj.  
 Dewlemend wekî dewar çav danîye bes xwerinê,  
 Nizane rûmet çîye, tenê dirav, keyfa dinê,  
 Daye pey çîpê keçan, reqs û govend û mey,  
 Ji a genc dûr ketiye, careke din nema tê rê,  
 Çi dema jêra tînî çêla rûmet û mêranî,  
 Dibêje: "Birayê delal, hê dem ne hat, tu ne zani,  
 Çi gava keysa me bê, na mikûne, ke em nekin,  
 De hingê bi comerdî derê kasa peran vekin.  
 Îro em get nabinin, keyse ji bo doza welêt,  
 Lê a rast malperestî di wan nema şerm û fihet.  
 Derewe, derewînin, bi derewan nayên xapîn,  
 Van kesan xwe bîr kirin, di wan nema rûmet û vîn,

Bêje wan bazên çîyan, xortên celeng, rewşe piling,  
 Ku kesên bi mêranî wan dinasin, tev bûne ping,  
 Hinek jê eraqê, hinek bi mal, tev serxweşin,  
 Çi dema keysa wan bê, min û millet difroşin,  
 Lê têne navê millet bû kilita pîrr deriyan,  
 Dolar û pawin û dinar xweş digihîne nav berîyan,  
 Heke na, navê millet get ne dihat ser zarê wan,  
 Kesê kurd ne dikarî xwe bigihîne ber arê wan,  
 Lê bira qenc bizanin xortên welêt ku em li vir,  
 Bê tevger get rûnanin, armanca me xebat û kir,  
 Xebatek demokrati, dane ber xwe rewşê gelêr,  
 Xortên me pê rabûne, têda diçin tev wekî şêr,  
 Pîrr najo wê destên me di nav destê xwe bibînin,  
 Nema ew di bin darê "demoqratê" tirk dimînin,  
 De hildin ala rengin li welatê jor û jêrin,  
 Heya ku kurd ji wekî gelên mayî aza bijîn.

### MARŞA AŞÎTIYE

Xortê çak rabe zû me divê dilşadî,  
 Serxwebûn, aşîti, serbestî, azadî,  
 Van tiştan her divê pîrr xebat, west û xweîn,  
 Berî me sed hezar, sed hezar têda çûn,  
 Kolîdar bûne har, wan divê ceng û şerr,  
 Di vê rê pîrr didin dolara zêrrê zer,  
 Agirê şerr dadan, Koriya bû doje,  
 Tang û top qembele xwîna wan dirêje,  
 Ev hemî di reya dewlemendên çillek,  
 Dimirin kiç û kurr, mêr û jin lek bi lek,  
 Mehêlin şerr bibe, aşîti ol û jin,  
 Em bira tev hemî bo çî ev qirr û kîn,  
 Sor û gewr, reş û zer em yekin, tev bira,  
 Hemîyan yek rêye, yek raman, yek çira,  
 Mesîhî, Musewî, Misilman hemdemin,  
 Mecûsî, Êzdî tev kurrên Ademin,  
 Me divê aşîti naxwezin şerr û bend,  
 Bimirin kolîdar şerrxwezên dewlemend,  
 Her bijî aşîti, aştxwez bijîn,  
 Serbilind, serfiraz her wekî baz bijîn.

## DURÛ

Ho reha çepel ! tev grêk û xar,  
 Ji ruçikên çak hemîyan bê par,  
 Ola te qelsî, bawerî, derew,  
 Dilê te qirêj, bes ziman derew,  
 Ramanek ne rast bû rêberê te,  
 Ji rûmet vala maye serê te,  
 Naşî bibêjî, tu gotina rast,  
 Dikarî bêjî: "Reşe rengê mast".  
 Dikî, dibêjî her tiştê kirêt,  
 Xwe jê didî paş bê şerm û fihêt,  
 Ji bo demekê têyî veşartin,  
 Ji terra pirr tişt tene spartin,  
 Lê dawî a rast wek royê tê der,  
 Ew dibî rûreş, her serî di ber,  
 Hinga tê zanîn tu çi hêsani,  
 Ji dûrva meriv rengê sa nî,  
 Zuka biqeşe her ji pêş me,  
 Em bêhn teng dibin bi dîtina te,  
 Rûyê te yê çil navên bibinin,  
 Ji ber kirên te tev dil birînin,  
 Sed hezar xwelî li nav çavê te,  
 Ji hinda pirtir para bavê te,  
 Ku li pê xwe hişt kurekî durû,  
 Bi sermesarî cihan berda çû.

## NEWROZ

Newroz cejna Rohilat bîst yekê avdarê,  
 Ew bû sersala kurdan di destpêka biharê,  
 Newroz yanê nû serê salê dimînin,  
 Nêrgîz sosin renga reng çarmedor ew didin bin,  
 Ewe cejna mezintir, ji bo gelên rohilat,  
 Bûyereke pirr bilind di êvarek wêda hat,  
 Rabû Kawey hesinger bi şoreşa azadî,  
 Dehek têda hat kuştin di Îranê bû sadî,  
 Çi zîvar û belengaz, cewekek tev civandin,  
 Bi camêrî, yekdestî nîrê stem şkandin,  
 Bervaneka hesinker direwşa Kaweyanî,  
 Xemilandin bi gewher ket Methefa Îranî,

Du rojên din di serve zêde kirin şaynet,  
 Cejna bûne sê roja ji hingêva bû adar,  
 Heya stem xurt nebe stemkar wê hiltîne,  
 Dide ser rîya qelsan her pîsiyê dikşîne,  
 Gava stem giran bû, dijvarê xwe ragirtin,  
 Cerg û hinavên merov ji rikî tîn dagirtin,  
 Dema ker digihê hestî heya ên qels har dibin,  
 Bi agirê zinatê yên wek Kawe çar dibin,  
 Dipelixin stemkar, dinê ra dihejinin,  
 Tola dused, sêsed sal bi carekê hiltînin,  
 Gere yê me kurdan ji kêrik gihabe hestî,  
 Nizam heya çî demê dê bîminin rawestî.

### ZOZAN

Tevî pez û koç û gan  
 Derbas dikin rojên geş,  
 Li ser wê nefela xweş,  
 Dilfzin û dibezin,  
 Heyanî koç dakevin.  
 Dema çiya dibin sar,  
 Payz dibe, em tîne xar,  
 Kola dile min zozan,  
 Xasma li nav Kurdistan.  
 Zozanên me bilindin,  
 Tev bi zevî û gundin,  
 Di wan hene avên sar,  
 Tev devî û rêl û dar.  
 Raxerê wan gulçîçek,  
 Firrinde tîn lek bi lek  
 Havîné em diçin wan,

## NEWROZ

Newroz çiqas delalî  
 Her dem û gav di balî,  
 Her sal di vê çaxêda  
 Bi kêf û lîz û govend  
 Gul û kulîlk û çîçek  
 Çem û cobar tijî tîn  
 Berf li çiya dihele,  
 Wekî çînên reşbelek  
 Rûyê erdê ji rûkî,  
 Nêrgiz, gupik û çîçek  
 Di van rojên şîrinda  
 Çi keç û xort û mindal  
 Dikin cejna sê rojan  
 Derdikevin ji malan  
 Ew hildigirin digel xwe  
 Hinek bi saz û sowet  
 Cîh cîh li hev dicivin  
 Hinek ji wan genimgûn  
 Hinek ji wan çavreşin  
 Gehîştina destê wan  
 Li ber çem û çîmenan  
 Direvin û dikenin  
 Li ser gul û çîçekan  
 Her dadinin û radibin  
 Dema ji wan dîyan bin  
 Dibe pîrçe-pîrça wan  
 Dawî di hev dibanin  
 Hinek diben dilokan  
 Bisk û zilfên zeriyan  
 Li ser dêm û rûyên gewr,  
 Dilê xortan ji evîn  
 Bi nêhrîna zeriyan  
 Kal û pîrên qerçimî  
 Demên borî dibîrin  
 Lê çî feyde, nayê dest

Vedikujînî derdan,  
 Tuyî cejna me kurdan  
 Bîst û yekê Avdarê,  
 Me digihîni beharê,  
 Dibişkivin di baxan,  
 Heta perav û şaxan  
 Bes dimînin belekî,  
 Dilgeş dikin gelekî.  
 Giya der tê kesk û şîn,  
 Ji her alî didin bîn,  
 Welatê kurd ser û bin,  
 Kal û pîr û bûk û jin,  
 Bi xweşî û ken û bang,  
 Bi xirroşme qir û bang,  
 Nan û den û sîranî,  
 Hinek bi sergirani,  
 Keçen xweşik û dilber  
 Hinek jê çûrr û gulîzer,  
 Kezi dirêj gewr û boz,  
 Divê gelek dew û doz,  
 Di nava bax û bostan,  
 Cihan dibe gulistan  
 Ew surperî weke hing,  
 Tekra dikne vinge ving,  
 Xortên çeleng û şapik  
 Dibin çîman wek xezal.  
 Vedigerin çend bi çend,  
 Dibe dilan û govend.  
 Ji duzanê der tîn,  
 Dipengizin, terrin tîn,  
 Tijî dibe, dike coş,  
 Tev dibin gêj û serxoş,  
 Her ew didin keseran,  
 Dixwezînin dilberan.  
 Emrê çûyî carek din.



Wekî gula çilmisî,  
 Dilê xwe yê perritî  
 Wê birîna bê derman  
 Dijwarîyek mezine  
 Bizan gelek kirête,  
 Hersê rojên cejna xwe  
 Tev kêr û saz û sowet  
 Diviya bû tişteki bêjim  
 Zanîna min hinde bû

Belgê wê dikevin bin,  
 Bi hezringa dax dikin,  
 Bi xeyalan sax dikin.  
 Qelsiya xwe bir birin,  
 Pîrr jê xweştire mirin,  
 Derbas dikin bi başî,  
 Reqs û dîlan di xweşî,  
 Çend gotinan di newroz  
 Gelo cejna we pîroz.

### DICLE Û FERAT

Ji dil û kezêb evîndarê Dicle û Feratim,  
 Nizam bû çiqas bê dilê xwe dûrî we dijîn,  
 Ev çem ji bakur dadikeve wek dû welat,  
 Yek ta Bîrecik, yê din diçe nav diyarê Zîn,  
 Melê Cizirî îlhama xwe ji wî çemî distand,  
 Gelek mirarî di peravên Dicle da civand,  
 Ehmedê Xanî ji serekî ava wî vexwar,  
 Li ser nivîsî sernava Memê birîndar,  
 Feqê Teyran, Melê Batê pîrr şairên çak,  
 Hespên xwe bezandin di şaxa çemê çalak,  
 Ger Dicle bi xwe kaniya zanîn û evîn bû,  
 Ferat pê gerra gelek şêrên pence bi xwîn bû.  
 Di qada rûmet û mêranî her bê hempa bû,  
 Herdem ji bo her pesnekê hêja û seza bû,  
 Min hêvî heye Dicle-Ferat barê we rake,  
 Di warê ziman li rojhilat xelqê me şa ke,  
 Zimanê mê yê paşda mayî çiçkî bide pêş,

## QADRÎCAN

Nav û dengê Qadrîcan bi nav û dengê Cegerxûn, Osman Sebrî ra girêdayîye. Rast gotî di nivîsarên xweda ew ne qasî wane, nagîje wan, lê di kirina xweda, di nivîsarên xweda di meydana şer pêşve birina ronahkirina neteweyê kurda, di meydana şerê azadkirina welatê kal bavê xweda ewî jî cîkî layq girtîye û hiş û aqilê xwe terxan kiriye bo xatirê serxwebûn û serbestîya kurd û Kurdistanê. Di vî îş û karî da ewî jî mîna herdu şêrên serê çîyaên Kurdistanê dengê xwe ber bi keç û xortan kirîye, di şêr, çîrok û serpêhatîyên xweda temî û şîreta li wan dike, ku yek bin, ji xewa kibîr hişyar bin, xwendevan bin, dest bidne destên hev, bi bin heval û hevkarên hev, bibin şerkerên bê tîrb û xof bî xatirê azadî û serbestîya kurd û Kurdistanê.

Piraniya şêr, çîrok û serpêhatîyên Qadrîcan li kovarên "Hewar", "Ronahî" û "Roja Nû" da çap bûne.

Çîrok û serpêhatîyên Qadrîcan yê çap kirî eve jêrinin :

"Hewar hebe, gazî li dûye" (Hewar, N1, sala 1932)

"Sîlêman Bedirxan" (Hewar, N.3, sala 1932)

"Hîva çardeşevî" (Hewar, N.6, sala 1932)

"Bihara Dêrikê" (Hewar, N.13, sala 1933)

"Tabûta bi xûnê". Şex Ebdurehman Garisî çû rehmete (H.N. II, sala 1933)

"Gelo ne wusane" (Hewar, N.10, sala 1933)  
 "Gundê nûava" (Hewar, N.2, sala 1932)  
 "Dabê" (Hewar, N.14, sala 1933)  
 "Sond" (Hewar, N.33, s.1944)  
 "Guneh" (Hewar, N.39, s.1942)  
 "Rojên derbasbûyî" (Hewar, N.52, s.1943)  
 "Gulçîn" (Ronahî, N.16, s.1933)  
 "Sehên zozanan" (Ronahî, N.14 s.1933)  
 "Tayek porê spî". Li ser şopa Manfleti (Ronahî N.13).

Di hejmarên "Roja Nû" da bir bi bir (parçe bi parçe) zîncî ra tercîma Qadrîcan ya kitêba rêbarê rûs Grigirî Pêtrov "Di welatê Zembeqêda" hatine çapkirinê. Di vê kitêbêda Grigorî Pêtrov basa jîyîn, ayîn neteweyê fînan gilî dike, basa welatê wanî bindest gilî dike, îş û karê şerevan û tekuşerên fînan tîne ber çavê xwendevan û xwendkarên xwe û nîşan dike çawan kom û komelên wan dixebitîn, çawan şer dikirin pêşberî hukmeta Swêdî, ku welatê xwe û neteweyê xwe azad bikin, ku serbest û bi serxwebûn bijîn.

Di pêşgotina wergerîna vê kitêbê Qadrîcan dinivîse, ku bi temî û şêwra doktor Ahmed Necîf ewî ev kitêb wergerande ser zîmanê kurmançî bona xort û keçên kurd, bona wetenper werên kurd. Birên wergerîna Qadrîcan yên vê kitêbê di hejmarên "Roja Nû" yên jêrinda hatine çapkirinê: NN 4,5,6,7, 8,9,10,11,12,13,14,15,16,17 û di yên dinda.

Min baştrin dîna xwe da ser wan hejmarên kovarên "Hewarê" "Ronahî" û rojnama "Roja Nû" û di wanda her sê-çar şêrên Qadrîcan yên çapkirî dîtin. Ew şêr evê jêrînin :

"Cegerxwîn" (Hewar, N.12, sala 1932)  
 "Berdêlk". Ji lorîya Bedirxanra (Hewar, N.6, sala 1933)  
 "Xewna hişyarî" (Hewar, N.13, sala 1933)  
 "Tabûta bi xwînê" (Hewar, N.II, sala 1932)  
 "Dadê" (Hewar, N.14, sala 1932)  
 "Di şorezarekêda" (Hewar, N.10, sala 1932)  
 "Hesinker" (Hewar, N.7, sala 1932)

Ku xwendevanên me delal haj cure û reng rûyê nivîsara şêrên Qadrîcan bînin, ez li jêrê çend hevan ji wan çap dikim. Pêşîyê em guh bidne şêra wî ya bi sernavê "Cegerxwîn"

## CIGERXWÎN

Di dema heşê min wenda dibûyî,  
 Mizgînek ji minra hat û got: bixwîn,  
 Min cegerperitî, min dil hluyî,  
 Mezê kir ev mizgîn bi navê Cegerxwîn.  
 Hevalê xoşevîst, pesna gundê min,  
 Bi ah û keser pêşkêş didî min,  
 Ji nuva pêtek ar da ser daxê min,  
 Derd û kul tevdayîn tewşê Cegerxwîn.  
 Dêrik pir xweşe, hêjaye pesnê,  
 Çi bikim nakeve dest ji ber vê xeşmê,  
 Bi dil birîndarin kurdên vê neslê,  
 Ne ez û tu tenê hemî Cegerxwîn,  
 Ma hindikin ji darên beran,  
 Osmanîye, Sêvêrekî, Mûşa serhedan,  
 Ji çiyaê Torosê heta deşta Rewan,  
 Giş xabin, hin çêtir bizan Cegerxwîn.  
 Dizanim tu zanî, welat giş xweşe,  
 Hin bajar hene ku tu lê ne maşe,  
 Mesele Êl Ezîz ci law keleşe,  
 Bidîta bi çavê şîhrê Cegerxwîn,  
 Hevalo, tu xweş bî, tim bi dilê xwe,  
 Welatê bihuştîn tim bi sazê xwe,  
 Saz biki, di nava tilfîyên destê xwe,  
 Da nezan bizanin tuyî Cegerxwîn.

## HESINKER

Hesinkerek şev û roj dixebitî ji dil û can  
 Xebata wî zincîrek, ku naqete tu caran,  
 Her carekê ku çakûç lédixist, dil xweş dibû,  
 Imuda wî qewitir, heviya wî geş dibû,  
 Çend roj hole pêşveçûn, min jî bala xwe dida,  
 Zincîr hê zincîr bû, dîsa weke xwe dima.  
 Bi wî çaqûçê biçûk ew zincîra qerese,  
 Ma tucar tê şikandin, gelo kî pê hesase,  
 Çûme ez nik hasinker, min jê kire pirsyar,  
 Li her pirsyara min karê xwe kir hebek sar,  
 Lo mamê minî delal; kerem ke erzan ke,  
 Dilopek ji derdê xwe ji minra nû şan ke,

Herçend bala xwe didim ev çakûç û ev zincîr,  
 Tenê bûye derd û kul, tiştêkî din nakeve bir,  
 Heta kengê tê wusan bi reqîn û reqîn kî ?  
 Xêr gunehê vê tokê ji bendera telqîn ke ?  
 - Way ser çavan tu hatî, lo lawikê zemanî,  
 Ji xwe ez bûm çavnehêr, te bi xwe kir biyanî,  
 Hêj hetanî vê demê ku kes ne hat bi meraq,  
 Ne gotin gelo çiyê ev teqîn û ev teraq,  
 Guhdar bibe kurê min, tu hêjayî xuyayê,  
 Sirê ji te veşêrim, ew bo min cezayê,  
 Berî ya min ferztire gotina bav û kalan,  
 Wan gotine "Yê bê sebir, tim tîhin û tim bê"  
 Hûrik hûrik bi derziyê qulteyn dibin sar delav,  
 Ev xebat û cehda min gotina bevanîyê,  
 Ger îro neçe serî, bo sibê hêsanîyê,  
 Bi imudê ne qenc tu destê xwe vemale,  
 Ne ez zêde xweh bidim, ne tu bo min binale,  
 Yekdest em bi repîn kin, heval dibe zilcelal,  
 Bira toqa dîlîyê bibe polayê zelal,  
 Em vê toqa lanetî ji serê xwe biderxin,  
 Hingê bira bibînin ya em gurin ya berxin.

## DI ŞOREZAREKÊDA

Ez û hevalekî xwe li ser rêkêda dimeşin,  
 Em ji kêra hatine, kuda diçin dipirsîn,  
 Ji halê xwe dizanim em rêwînin qedîmin.  
 Çiqas zeman dibore, xwe bê mal dibînin,  
 Sol di lingê me ne man, peritîne cilê me,  
 Neynukên me dirêjin, bûne gulî porê me,  
 Tenê tiştê bi mera ku wekî berê mane,  
 Keşkulê û gopalên di me ewan bi mera wefane,  
 Hêstirên çavbiloq carna diket lingê me,  
 Êşa di van mîratan davit ta ser dilê me,  
 Gava dibû zivistan diricifî canê tazî,  
 Ku havînan germ dihat bêfêde bike gazî,  
 Hêdî -Hêdî canê me qeşm û getiş der dixê,  
 Ber afatan hîn dibin, bivênevê xwe bi xwe,  
 Bi vî halî em diçin bê aqilê xwe bi şîûr,  
 Ev rêya me bê dawî pêva diçû dûr bi dûr,

Rojek dîsan ji rojan qet hal di me ne bû,  
 Ne gund û ne gundiyeke, ew cih pêda tenha bû,  
 Çima şunda hinek deng hate ji nagihanî,  
 Lê bala xwe didimê ew deng pir kûr dinalî,  
 Min dil kir ku bibêjim: Mêze bike bikî hevalo,  
 Meger ev jî bihist, ku gotê :  
 - Ey delalo\_ ev çi denge dinale, gelo li vî cihê ha,  
 Nebe ew jî weke me keramperê ber bi ba,  
 Wusan derket texmîna hevalo jê nik te dan  
 Bextreşekî kurdmanc bû dikir ax û ox û aman,  
 Min jêra got: -Ey bira te çi hal û hewale ?  
 Çima wusan li erdê veketî û dinale ?  
 Wî jî li min vegerand û got: "Derdê min girane,  
 Çiroka min dirêje, bêt nivîsîn ramane,  
 Ez ji kurdên serhedê, Milazgêrde gundê min,  
 Ez derketî heft sale, bi hiş û bi dilê min,  
 Zimanê me bû sebeb, bû telake ji bo me,  
 Merovên çavsor hatin, jêra digotin rome,  
 Zimanê me î delal "yaşax" kirin bi zorî,  
 Zimanê xwe î di xwar bo me kirin mecbûrî,  
 Êdîn curmek mezin bû bi kurdmancî xeberdan,  
 Guh ne danî hedê kê hesp û sungî û zindan,  
 Êdîn wusan ne dibû, me çendekan xwe kar kir,  
 Li hemperê dijmin ne hespê xwe pir xar kir,  
 Lê felekê bi mera ne bir serî, em qela man  
 Weke nokên li kevir em li deran bê kes man,  
 Dê û bavê min hemî bi kevayî wundane".  
 Hevalê minî ewil xwe avête nav-  
 - Gelo tu qet nizanî li kîjan alî mane ?  
 - Lo birao, zinaro, çima tu min nas nakî,  
 Ez Ferzendê birame, emin ji dê û havekî.  
 Herdu bira himbez bûn bi kul û girî û keser  
 Erd û ezman hejîyan, agir kete dar û ber.

## TABÛTA BI XWÎNE

Şêx Evdirehman Garisî çû rehmêtê  
 Li erdê dinêrim dilopên xwînê,  
 Didime şopê çî bibînim ez,  
 Dar û ber, kevir kiç giş dikin şînê,  
 Bê hemdî canê xwe diqîrînim ez.  
 Tabûtek di nava erdê bi xwîn,  
 Melekan kişandin ezmanê jorîn,  
 Tîrskê da ser min, libitîm, ricifîm,  
 Ber çavê min reş hat, dil borînim ez,  
 Ew tabût tabûta Erdrehman bû,  
 Ser dinya derewîn ew yek mêvan bû,  
 Ger tîrk heyat bû, cinet mikan bû,  
 Ber rehma wî şa bin hemî kur û ez,  
 Lê sed heyf ji bo te ey Rehman şêxê,em,  
 Ciqasî kurd hene ji bo te bêxem,  
 Têlekî gazî bê û lêxim, lêxim,  
 Ew hewar hindike jê têr nabim ez,  
 Şehdat, me ne dît wusan bê ibret,  
 Cinayet, xiyanet wusan bi riqet,  
 Ji bona merovê xudan bi himet,  
 Tarîxa roja te şîn qeyd dikim ez.

## DADÊ

Buhara jiyîna min bê te payze, dadê !  
 Bo min diyarê cenet bê te faize, dadê,  
 Çêl kewa ling şkestî li pê hevalên xwe ma,  
 Çêlkew ez bim û negrîm ma qey caize, dadê,  
 Dadê, pir kûr menale, te ceger li min ne hişt,  
 Dewsa kon û lorinê ah û zarîna xwe hişt,  
 Girfî tîrsê dide min, xerab dike sîng û pişt,  
 Êdin xwîn, kêmê dizên kani û karêzê, dadê !  
 Her çend pol û petalên ji ber xanûmanan man,  
 Gelek qenc girê bide li birînên xwe eman !  
 Bijîşkên me çêdikin ji bo derdê te derman,  
 Hinek ji wan sekbanin, hin jî Nafize Dadê !

Daw ne ma me maç kir, paqij ne paqij bê dest,  
 Her kê ev halê me dît, gotina "Parsekiye, geşt",  
 De wer ji ber vî derdî mebe perîşan û mest,  
 Ne eqil ma, ne şîur, ne jî hafize, dadê !  
 Xwerin, vexwerin tune, hebe jî, me sond xwarî,  
 Pariyek bi hêsanî di qirika me narî,  
 Dîtina te miyeser meke xudaê barî,  
 Gav û demên me hemî, rojî ... pehrîze, dadê !  
 Ji ber kêmaniyên xwe, li cem te şermî sarin,  
 Tenê tu kûr menale, em ji te hêvîdarin,  
 Ji çavên me yên melûl hêstirên xwîn dibarin,  
 Jana zirav tov meke, eman ! Pakize dadê !

### XEWNA HIŞYARIYÊ

Ax welato, ax welato !  
 Roja me zû lê hato,  
 Bav û birên me çawanin ?  
 Çima xeber jê ne hato,  
 Işev min dît xewnek bi tirs,  
 Tu kerem ke ji min bipirs,  
 Ez carekê rest pê bikim,  
 Da tu bibîn çiqas bi hêrs.  
 Bayekî reş hate ji jor,  
 Li ser min kire bore-bor,  
 Ber girîn da kaxeza sor,  
 Di nav hebûn du tayên por,  
 Ez çûme cem pîrek zeman,  
 Min got: Falikê vekî, eman !  
 Min daye der ev ruh û can,  
 Derdê minra bibî derman,  
 Pîrê bo min rabû ser xwe,  
 Piyana avê da ber xwe,  
 Li avê xwend, li min nêrî,  
 Dîsa serê xwe da ber xwe,  
 Kaxez bi xwîna biran bû,  
 Her du ta porên xwehan bû,  
 Ma'na wan kor û giran bû,  
 Ji fala pîrê nihan bû,  
 Birayên me têne kuştin,  
 Bi xwînên xwe têne şuştin,  
 Xwehan porê xwe şandine,



Yanê çima hûn runiştine,  
 Îro laşêm pir dêşe,  
 Qenc dizanim ji, çi dêşe,  
 Lê çi bikim derman nîne,  
 Ta'le tune, bextê reşe,  
 Derman ku ez kifş dikim,  
 Bi hêvîna xwe geş dikim,  
 Ji dilbirînên wek xwera,  
 Pelên Hewarê reş dikim  
 Qedri bibêj û binale,  
 Şînê girê de bikale,  
 Namûs ne ma, rûmet ne ma,  
 Ev çi derde, ev çi hale !?

### BERDÊLK

Rabe, mêze ke, hebek li doran,  
 Te xew dirêj kir, em pir li ber man,  
 Êdîn mezîni, lo-lo lawe can  
 Rabe Bedirxan, de rabe lo-lo  
 Hişyar be êdî, niha pir qence,  
 Axa Kurdistanê ji tera qence,  
 Paşîya xewê, bizane, rence,  
 Rabe Bedirxan, de rabe, lo-lo  
 Gurê dev bi xwîn kete nav berxan,  
 Ma nizanî berx? berx zarê kurdan,  
 Bûne armanca rîmanên roman,  
 Rabe Bedirxan, de rabe, lo-lo !  
 Dewra felekê, eger ku kîne,  
 Razan ji mera qet bi kêr nîne,  
 Rabe Bedirxan, de rabe, lo-lo !  
 Îroye namûs, îroye xeyret,  
 Der û poxanan em bûne ibret,  
 Êdîn bes nîne, divê hemyet,  
 Rabe Bedirxan, de rabe, lo-lo !  
 Çerxa felekê, eger nesîme,  
 Pêşî ku her çend kozik kemîne,  
 Çavê xwe veke, xwedê kerîme  
 Rabe Bedirxan, de rabe, lo-lo !  
 Çiman nabêjî gelo çi hale,  
 Sebra me ne ma, binal, bikale,  
 Rabe, ji mera meydan kemale,  
 Rabe Bedirxan, de rabe, lo-lo !

Sala 1957 havînê li Moskwayê Fêstivala cahilên dinyayê bû. Ji hemû welatan, ji welatên Rojhilat û Rojava xort û keçên dêmoqrat, aştîxwez ber bi Moskwayê dihatin, kom dibûn ku bibin nasê hev, bibin heval û hevkarên hev, yekdeng bin, yekdil bin bo xatirê dostî, hevkarî, biratî û aştî li nav miletan û welatan li dinyayê. Hingê xort û keçên Kurdistana dabeşkirî (parçe-parçekirî) berê xwe dabûne welatê Sovetê, ber bi Moskwayê dihatin. Hingê Qadrîcan jî tev wan dihate fêstivalê (mehricanê). Ewî ji bajarê Adêsê ji minra birqî (têlêgram) bi kurmancî bi van xeberan şandibû : têda nivîsî bû "Ez Qadrîcanim, tevî xortan tême festivalê dixwezim te bibînim".

Wî wextî kurdnasê navdar akadêmîk Î.A.Orbêlî serokê înstîtûta me bû, mabeyna min û wî xweş bû, min têlêgrama Qadrîcan nîşanî wî kir, jêra xwend. Ewî ji min pirs kir "Qadrîcan kîye ?" Min got: "Şayrekî kurdaye, dêmoqrat û pêşkevîye, ji Siriyê tê fêstivalê, îznê bide ez herim Moskwayê, dibêjim gelek xortên kurd tene fêstivalê, hewas dare ez wan bibînim". Orbêlî got: "Baş, ezê te birêkir bikim, here".

Sibetira din ewî ez birêkir kirim, ez çûme Moskwaye, Qadrîcan û xortên kurdan bibînim. Ez çûme mêvanxana nimûnga malhebûna gundîyan. Me hev dît, heta 70-80 xortên kurdan ji Sûrîyê û Iraqê hatibûn.

Du-sê rojan ez û Qadrîcan tev hev digerîya, got û bêja me li ser pirsên kurd û Kurdistanê bûn, li ser armanc û bernamên kom û komeleyên kurdan bûn. Ji wan pirsên ewî jî minra gilî dikirin, pirsên here bi hewas û întêrês ew pirs bûn, ku ewî digot: "Niha li nav welatên Rohilat û Roavada deng û bas belav dikin, ku Amêrika dixweze Tirkîye bide înakirinê, ku ew qayl bibe parçên Kurdistanê bigihinne hev, bi serkarîya Tirkîyê hukmeta Kurdistanê serbi xwe saz bikin, ku ew hukmet bibe hevkarê pakta Bexdadê. Dibêjin, niha serok û serwerên hukmeta romê bi vê meseleva mijulin, e'ne'ne dikin". "Pirsa duduwan ewe, -Qadrîcan serda zêde kir got: "dibêjin, ku Amerîka wisan jî dixweze li Wanê ûnîvêrsîtêtê bi kîse xwe veke, lê heta niha Romê qay lîya xwe ne daye".

Min got: "Hevalê delal, bi fikira min Rom qet tu caran bi

van daxweze Amerîkayêva qayil nabe. Lê eger qayl be, wusan bikin, eva yeka jî kurd û Kurdistanêra başe yan na, tu çi dibêji?".

Qadrîcan got: "Ez jî bawar nakim, ku rom qayl bibe, lê bi rastî gotî eger qayl bibe, ew baş dibe, Kurdê bigihîjne hev, qewata wan wê mezin be, bibe yek, hukmeta wan wê hebe, bona paşrojê eva yeka bo azadî û serxwebûna kurd û Kurdistanê wê bere-bere ber bi dêmoqratî û sosîalistîyê herin, xwe heta-hetye tirk û Amerîka namînin hevkar û dostên hev, Amerîka dixweze welatên rohilat rake pêşberî Sovetê, Sovet ji nikare vê yekê bihêle, di vê meselêda em heval û piştîvanên Sovetêne, em baş dizanin û bi çave xwe dibînin, bi guhên xwe dibîhên, ku di vî zem zanîda her Sovetîstan azadkerê miletê bindeste".

Pirsa duwemîn ya here bi hewas û înterês ew pirs bû, ya ku Qadrîcan ji minra gilî kir. Ew pirs pirs partiyên kurdan bûn. Ewî got: "Niha sê partiyên têkuşerên kurd hene. Ew partî evin: Partiya dêmoqrat ya kurdên Surîyê, partiya dêmoqrat ya Kurdistanê Tirkîye, partiya dêmoqrat ya Kurdistanê Iraqê. Tevgirêdana her sê partiya bi hevra heye, di armanc û bernama xweda ew bi hevranin, her sê partî dixwezin Kurdistanê azad bikin, Hukmeta dêmoqrat ya netewe saz bikin, bibin heval û hevkarên milet û dewletên pêşkevtî". Qadrîcan andamê partiya dêmoqrat ya kurdên Sûrîyê bû, ev melûmetî û gilîyên din, yên ewî derheqa kurdan ji minra gilî dikirin, bi min xweş dihatin, gotinên wî, fikir û ramanê wî pêşkevtî bûn, ez şad dibûm, ku merivên wusa li nav kurdên derva hene, min ji xwera digot, dibe merivên mîna wî niha li nav kurdanda gelekî û çaxê çavê min bi xortên hatî diket, ez şad dibûm, min ji xera digot: "şikir şikir" kurd hişyar bûne ber bi rîya azadî û serxwebûnê di çin, dixwezî bibin heval û hevkarên welatên dêmoqratê -pêşkevtî. Paşroja kurd û Kurdistanê li destê xortên kurdanê, ew gulistana her demîne, ewê reng û rûyê welatê xwe biguhêrin, Kurdistanê rewşen bikin".

Bona rastî hev hatine û hevbinê, bona bîranînê min û Qadrîcan me şikilê xwe bi tevayî kişand û ewî deftera çend şêrên xwe yên çapnekirî pêşkêşî min kir. Her çend heta niha ew şêr bi kurmancî ne hatine çapkirinê, ez wana gişka li vê xebata xweda bona xwendevanên me delal çap dikim. Ji

wan şêra, şêra wî ya bi sernavê "Ez diçim Mosko" wextê Fêstivalê bi rûsî hatibû çapkirinê û li rojnama "Îzvêstîyada".

Navê wan şêra evin: "Ez diçim Mosko", "Begê axirzeman", "Rî ya teze", "Gula Sor". Her kesê van her sê şêrên wî bixwîne, wê bê ser wê fikirê, wê remanê, ku Qadrîcan bi wan şêranva derdikeve meydana şêrê têkuşêrên hemû neteweyên bindest, ku ew ji mîna Cegerxwîn bûye bazê serbestî û azadîyê, bûye heyloyê bangavazê dostî, hevkarî neteweyan, bûye dengbêjê aşîtiya nav dinyayê.

## ŞÊRÊN QADRÎCAN YÊN DESTNIVÎSAR

### EZ DIÇIM MOSKO

*Bi agirê dilê zahîdekî diçe heca...  
Bi hewesa evindarê ber bi delala xwe diçe,  
Bi arzûya zarokî radipelike diya xwe dike,  
Ez diçim Mosko.....  
Devê min, dilê min her zere ê laşê min dikeve,  
Her sê zarokên min li dora min dicivin,  
Ji min diyariya Mosko dixwezîn.*

X X X X

*Swarê geştê bûm,  
Teva pênced hevalî,  
Her yek ji wan ji min bêtir bi heyecan,  
Hinek ji wan erebin,  
Hinek jî çerkes, kurd û ermenin....  
Lê hemû yek ziman û yek dilin,  
Zimanê dostanî, aşîfî....  
Weke bira diçin Mosko....  
Stran, govend û dilan,  
Ji cuş û xuruşa wan ra,  
Pêl û masfyên deryayê minêkar,  
Bi vî ahengî em gihîştin Derdenêl,*

Paşê Istembul,  
 Dîyar û bajarê Nazim Hikmet,  
 Nazim Hikmetê zarok di wê derguşêda  
 Hate hejandin ....  
 Diya wî a muhriban li wir,  
 Ji Nazimê zarokra lorîya azadiyê dilurand,  
 Dengê Nazim Hikmetê mezin li wir,  
 Li himber istibdadê kire gurmîn ...  
 Lê îro ev dîyar hezîne,  
 Ji dorketina kurê xwe ê fedakar, wefakar...  
 Ê dinale ...  
 Di bin lingên Emerîkan û niştimanfiroşan

X X X X

Em gîhîştin "Odesa" !  
 Mehşera biratî....  
 Giruh-giruh xelk, jin, mêr, pîr û zaro  
 Li bendê me bûn,  
 Mîna kerfîyê berx û mîyan  
 Em li ser hev keliyan,  
 Me hevdu hemêz dikir,  
 Me hevdu maç dikir,  
 Ji çavan hêsirên kêfxweşî û dilgeşî,  
 Diherikîn ser rûyan....  
 Dengê "Bijî aşîtî û dostanî"  
 Diçû ezmanan ...  
 Ev hal li ser rê, li her bajarî,  
 Heta Mosko wusan bû ....  
 Di nav welatekî buhuştîn,  
 Însanê wek Melekan ...  
 Dil saf ....  
 Dev bi ken ... rû bi kenîn .....  
 Nizanim çawan destên nasiyên ehmaq  
 Li van digeriya ....  
 Xoş, paşê destê wan jî ....  
 Lingê wan jî hate kişandin, ya  
 Mucizê jî eve ...  
 Gava dijmin destê xwe  
 Dirêjî vi welatî dikin,  
 Berxê vî welatî dibin şêr,

X X X X

Ez gîhîştîm Mosko ....  
 Bi germîya dilê zahîde gîhîşte hecê,  
 Bi hewesa evîndare gîhîşte  
 Hembeza dêla xwe ....  
 Bi heyecana zarokî radîpelke memikê dîya xwe,  
 Ez gîhîştîm Mosko .....

MOSKO 26.7.1957

### BEGÊ AXIRZEMAN

Dostê min !  
 Dijminê postê min...  
 Begê axirzeman ...  
 Ew zenbîla tu pê hatî,  
 Nema datê ji ezman.  
  
 Benê wê rizîya,  
 Li nava rê getîya,  
 Ê ket .....  
 Ket nava derîya sor,  
 Derîya sor jêra bû gor,  
 Derîya sor  
 Ji têr xawen û çend xudayê biçukra  
 Bû kefen .....  
 Musa û mirîdên wî hemî  
 Bê pir û bê gemî  
 Ji wê deryaê derbas bûn,  
 Ji cewr û cefayê  
 Li wir xelas bûn.  
 Nemrudê biçûk  
 Me bi agir ditirsîne,  
 Pif ..... meşka vala  
 Ey kevnare ê sala ...  
 Bawarîya dilê me,  
 Taqeta milê me  
 Ji îmana Ibarahîm bêtire,  
 Ne kêmtire ....

Vêya bizan,  
 Ey pexemberê dizan,  
 Dostê min,  
 Dijminê postê min,  
 Begê axir zeman  
 Ev zembila tu pê hatî,  
 Nema datê ji ezman.  
 Meznatî  
 Ne bi pare û male,  
 Ne jî bi germa kale,  
 Meznatî  
 Bi cewherê însane,  
 Bi ilm û bi irfane,  
 Belê, em xizanê malin,  
 Lê zengînê kemalin,  
 Zingînê îdêalîn .....  
 Koşka te a him -vala,  
 Ya bi neynûkê pala  
 Ên bi xayîn,  
 Ên bi birîn .....  
 Te ava kir û di binda rûnişt,  
 Û gelek reben ji birçîna kuşt,  
 Ewê li ser serê te hilweşe,  
 Ger çi dilê me bi te naêşe,  
 Lê em dixezin,  
 Bi dil dibezin,  
 Zaro ên te ên bi guneh,  
 Ku bi hejmar hene neh -deh ...  
 Ji wê talokê xelas bikin,  
 Di rîya rastra derbas bikin,  
 Rîya rast rîya me,  
 Ewe pexemberîya me ...  
 Zincîr şikandin,  
 Armanc gihandin,  
 Babîlûskan bistan,  
 Dîroka rastan  
 Dibêje :  
 Bibêje :  
 Guh mede efsane yê dêwan,  
 Bi şûnda nemîne ji karvan,  
 Karvanê medeniyet,  
 Guruhê beşerîyet,

Xulase,  
 Pêşî û paşîya filosofe,  
 Fîlosofîya me  
 Eve  
 Dîn, mezheb .... îman  
 Bibe însan, bibe însan  
 Dostê min !  
 Dijminê postê min  
 Begê axir zeman,  
 Ew zembila tu pê hatî,  
 Nema datê ji ezman...

### GULA SOR

Gula sor  
 Hil bû jor,  
 Bîn da dor,  
 Gula sor .....  
 Gula sor  
 Li paş çiyayê Qaf şîn bû,  
 A'lem jêra evin bû,  
 Gula sor,  
 Bi me xweş,  
 Da me heş,  
 Em bi bîna wê sermest,  
 Emê pê şa bin serbest.  
 Nazenîn .....  
 Xemrevîn,  
 Xemilîn,  
 Pê zemîn,  
 Guleke bê kelemê,  
 Di nav baxê îreme.  
 Gula sor,  
 Em lê dor  
 Bicivin,  
 Bîn bikin  
 Dor bi dor.



## RIYA TEZE

Ew perdeya reş û tarî,  
 Ku ji şevên reş diyarî,  
 Min ji rûyê xwe kişand  
 Li ber çavên xwe çirand  
 Ê avît .....

Avêt paş sed çiyayê  
 Nava hezar dergayê,  
 Min gemara guhê xwe  
 Bi zimzimeke nuh şûşt,  
 Ê meqrobên canê xwe  
 Bi dermanekî nuh kuşt,  
 Ew kufika tufeylî,  
 Ku di dilda diçerî,  
 Min ji kokêda rakir,  
 Hêlîna wê xerab kir  
 Ê belav kir ....

Li rojên derbas bûyî,  
 Li rastiyên kevnare  
 Li hevalên ne heval,  
 Cara pêşin silav kir,  
 Ew zingora di mêjî,  
 Ku mejiyê min dimijî,  
 Min bi kêrê xeritand,  
 Ê bi agir şewitand,  
 Ê paqij kir .....

Paqij kir ji serê xwe  
 Min avêt ji derê xwe,  
 Bi çavekî bê perde,  
 Bi guhekî bê gemar,  
 Dibin ser rêke teze  
 Bi mejikî bê zengar.  
 Edî bi ditîna xwe,  
 Bi bihistîna xwe,  
 Bi vîna xwe û bi mejî,  
 Bi rêveçûna xwe jî,  
 Ez bûm insanekî nû  
 Peresteşê oleke nû  
 Ê di bajarê dilda  
 Min ava kir holek nû.

(1936).

WEŞANÊN ROJA NU